

# ZEND

Çend Not Li Ser  
Jêderka Newrozê  
■ ŞEFİK BEYAZ

Metoda  
Dîroknişiyê  
■ SIRAÇ BİLGİN


Koçberiya Kurdan û  
Egerên Wê  
■ AHMET KAYA

Hete Vengsaziye  
de Averşiyayına  
Kurmancî û  
Kirmançkî  
■ SAMÎ BERBANG


Cejnên Asûfî-  
Suryaniyan Ên  
Toreyî û OLî  
■ GABAR ÇIYAN

Gelişen Metodolojik  
Ên dîroknişîsına  
Kurdî  
■ İ. ŞERÎF WANLI

Anatomî (I)  
■ GÜLSEREN DENİZ



# zargotin



WEŞANA ENSTITUYA KURDI

*Li bendê bin dê di demekê kurt  
de li ber destê we be*

## Xwendevanê Birêz

Li ser qedr û qîmetê nivîsînê gelek gotar hatine nivîsîn. Heke nivîsîn nebûya şarezahî û kelepura berê dê çawa bigihîşa îro. Şarezahiya îroyîn dê çawa ji nifşen nûhatî re bibûya zengînî. Beriya nivîsînê gotin e. Lê gotin bi nivîsînê nemir dibe. Li gorî gelek bawerîyan gotin pîroz e. Wê demê mirov dikare bibêje ku gotin ruh e, nivîsîn jî goşt, hestî û xwîn e. Dema ku nivîsîn nebe tu wetaya gotinê jî tune ye.

Em kurd ji kevneşopa nivîsînê bêpar bûn. Her çiqas feylezof û edîb û zanyarên me hebûn jî, gotinên wan bi ber bê ketine û firiyana. Yênu ku ji me re bûne zengînî pir hindik in. Dema ku mirov çêla wan dike, pirtûka pîroz, dîwana Meleyê Cizîrî, Baba Tahir, Ehmedê Xanî û çend heb navê din têne bîra mirov. Di dema mirîtiyê de, mîrên gelek gelan ji xwe re katib digirtin. Wan katiban, derbarê binemala mîrê xwe de û bûyerên wê demê de dinivîsîn. Di nav kurdan de ev kevneşop jî tune ye. Heke berhemên bi vî rengî, (Şerefname ne tê de) hebin jî negihîştine dema me. Ji ber vê yekê ye ku gelek kesên biyanî û yên kurd gotine dîroka gelê kurd tune ye, an jî gotine dîroka gelê kurd nehatiye nivîsîn. Ne ku dîroka gelê kurd tune ye. Dîroka gelê kurd pir kevnar e. Lê ji ber ku nehatiye nivîsîn, ev nav lê hatiye kirin. Di sedsalêن dawîn de dîroka kurdan bi destêن biyaniyan hatiye nivîsîn.

Heta salêن 1970'î jî rewş weha bû. Pişti van salan mirovên ku bi siyasetê re têkildar in dest bi lêkolînên derbarê kurdan de kirin. Çawa ku dîroka kurdan bi destên biyaniyan were nivîsîn çewt be, dema ku bi destên mirovên ne pispor were nivîsîn jî çewt e. Van salêن dawîn hinekî hêvî hene. Êdî mirov ber bi pisporbûnê ve diçin. Ev pêşveçûn dilê mirov hênik dike. Em bawer in ku êdî lêgerîner û nivîskarêن ciwan û jêhatî êdî dê derbarê wêje, dîrok, aborî û beşen din de xebatêن li gorî metodeke zanistî bikin. Di binê banê Enstituya Kurdî de, qadroyêن ku hêviyê bi mirov re çedîkin digihîjin.

Di vê hejmara me de endamê Enstîtuyê Ahmet Kaya derbarê aborî û civaka Kurdistanê de nivîsarek amade kiriye. Dîsa, derbarê zimêن de endamê Enstîtuyê Zana Farqînî û Samî Tan derbarê zimêن de nivîsarek lêkolînî amade kirine. Şefik Beyaz li ser dîroka Newrozê ku bûye roja kurdan a vejîn û serhildanê, nivîsarek amade kiriye. Endama Enstîtuyê Gûlseren Deniz jî lêkolînek li ser anatomiya mirov kiriye. Ev lêkolîn dê di du hejmaran de were weşandin. Di vê hejmarê de anatomiya laşê mîran, di hejmara ku bê de, anatomiya laşê jinan dê were weşandin.

~ O ~

Sedsalemîn salvegera rojnamegeriya kurdî, dê di meha Avrêlê de, li gelek devran were pîrozkirin. Yekîtiya Rojnamegerên Kurdistanê sala 1998'an wekî sala Rojnamegeriya Kurdistanê daxuyand. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî, dê pêşkeşiyê bike ku li Stenbolê, bi hevkariya çapemeniya Kurdistanî, di nav hefteyekê de pêşangeh, sempozym, panel, forum bêne lidarxistin. Ji bo danasîna çapemeniya Kurdistanî dê broşurek were amadekirin. Axaftina ku di van çalakiyan de dê were kirin û teblîxên ku dê bêne pêşkeşkirin, weke pirtûk dê bêne çapandin. Ji niha ve em salvegera rojnamegeriya kurdî li we pîroz dikin.

# N A V E R O K

Kovara sê mehî ya lêkolîn û

lêgerînên zanistî

(Üç ayda bir yayınlanır)

Li Ser Navê Mezopotamya

Basın Yayın A.Ş.

**Xwedî:**

Yıldız GÜLTEKİN

## **Gerînendeyê Giştî yê Weşanê**

Hasan KAYA

## **Berpîrsiyara Nivîsaran**

Zeynep YAŞ

## **Berpîrsiyarê Teknikê**

Turabi ŞEN

## **Cihê Kargerîvê:**

Istiklal Cadd. Turhol Han

No: 373 Daire: 2

Beyoğlu / İSTANBUL

## **Navîşana Kovarê:**

Atatürk Bulvarı.

Ceylan Palas Apt.

No: 154/12 Aksaray

**Tel:** 527 19 11

**Fax:** 527 61 49

## **Çapxane:**

Ceylan Matbaacılık

## **Sala Weşanê:**

Payız 1996

Çend Not li Ser Jêderka Newrozê

**Şefik Beyaz**.....3-6

Metoda Dîroknîvîsiyê

**Sıraç Bilgin**.....7-13

Ji Aliyê Binyadî ve Lêkerên Me

**Zana Farqîmî** .....14-16

Koçberiya Kurdan û Egerên wê

**Ahmet Kaya**.....17-31

Viren ra Nika Cînû û 8ê Adarê

**Edibe Şahin** .....32- 34

Elfabeya Zimanê Kurdî ("AB" ya Kurmancî)

**Deham Abdulfettah**.....35-37

Di Dîroka Me ya nezik de serokekî serhildanê: Şêx Seîd

**Haydar Zağros** .....38-49

Cejnên Asûrî-Suryaniyan ên Toreyî û Olî

**Gabar Çiyar** .....50-54

Hete Vengsaziye de Avverşiyayina Kurmancî û Kirmancî

**Samî Beîbang** .....55-59

Dîroka Başûrê Kurdistanê ya Nezik (II)

**Zülküf Kışanak** .....60-71

Gelşen Metodolojîk ên Dîroknîsîna Kurdî

**Î. Şerîf Wanli** .....72-77

Hemleyeke li Dijî Kurdan

**Helmut Van Moltkena** .....78-81

Ziman (II)

**Feqî Huseyn Sañîç** .....82-85

Ji Şaristaniya Arya Ber Bi Kurdan Ve

**Kerem Soylu** .....86-89

Anatomî (I)

**Gülseren Deniz** .....90-96

Lêk û Dawineyên Kurdî

**Torî** .....97-104

Tuwêjewanîk le mer gjîj û giyay dermanî û  
pizişkayetî resen û suninetî le Kurdistan da.

**Ehmed Şerîfi** .....105-109

Lêgerînek li Ser Meleyê Bateyî

**Mehmet Reşit Irgat**.....110-112

## ŞEFİK BEYAZ

Mîtos, parçeyek ji çanda gel û berhemên însên in. Jêderka têmên mîtolojiyê di pêvajoya azadbûna însên a dijî xwezayê û berî demên şaristanî de xweza bi xwe bû. Dema ku mirov li hem-

mên mîtolojîk jî êdî zêde namîne û hebûnên mîtolojîk jî, wekî kesên leheng derdikevin pêş me.

Di mîtosa afirandin û çêbûna gerdûnê de, her wiha di mîtosên kozmogonîk de xwedayê ronahiyê û ejderha

mên de derbas dibe, di mîtolojiya şaristaniyê kevnare tev de heye. Pêwendîya mîtosên kozmogonîk bi mîhrîcana sersalê re heye. Ev jî, orjinalîteya astrolojîk a têmayê ye. Şirovekirina bûyêrên xwezayî, bingeha mîtolojiya rojhilata kevnare ye. Peyva ejderha di gelek ziman an de wateyê xwe ya astrolojîk heye. Ev jî, mijarê dixemilîne.

Ejderha di mîtolojiyê de sîmgeha tariyê, ziwhiyyê, zordesiyê, neqenciyê, zivistanê, sermayê û nezanînê ye.

**Xwedayê ronahiyê**, sîmgeha zêdehiyê, qenciyê, duristiyê, ronahiyê, biharê, germahiyê û zanînê ye.

Hîtitî, Mîhrîcana pruliya-sê ya sersalê (roja ku xwedayê bagerê Mar, ejderha Îlu-yankayê dikuje) di 21'ê Adarê de pîroz dikirin.

Babîlî, Mîhrîcana Enuma Eliş-Mîhrîcana Akîta (roja ku Marduk, Tiamât dikuje) di 21'ê Adarê de pîroz dikirin.

**Di Mîtolojiya Hîndoyî** de têma nakokiya xwe da îndra û ejder Uitra bi xwe re Mîhrîcana sersala nû tîne. An ku

### Jêronot

\* Mirovên ku Newrozê bi awayeki dibin bi Ergenekonê ve girêdidin li dixwazin ku di nêvbera wan de pêwendîyekê daynin, an ji rastiyen dîrokê bê haydarin, an ji dixwazin ku rastiyen berevaji bikin. Mixabin ku vê xirabiyê jî, li ser navê zanyariyê dîkin. Lî zanîn ku bûyera Ergenekonê, di sala 552 an de ye. Dewleta Hûn a Mezin jî Bz. di salên 209-174 an de jiye. Zanyarê Tirk Prof. Dr. Rûza Nur di nêvbera Newroz û Cemsid de pêwendîyek datine û destpêka Newrozê digihîjine Bz. 2000'î. Pro. Dr. Süheyî Ünver destpêka Newrozê dibe digihîjine Bz. sala 5000'î.

Ev nîvis ji metna tirkî ya Konferansa Newrozê hatiye wergirtin.

## Çend Not

## Li Ser Jêderka

## N e u r o z ê

berî xwezayê azadtir dibe û digihîje gehîneka şaristaniyê, hingî nepenên (sirên) tê-

li dijî hev in û her tim di nêvşer de ne. Di dawiya vî şerî de xwedayê ronahiyê, jdêr dikuje û gerdûnê ji nû ve difirîne. Ev roja ku gerdûn ji nû ve tê afirandin, ji hêla gel ve wekî destpêka sala nû tê zanîn. Ev jî, tê wê wateyê ku bûyêrên astrolojîk li ser duyalîzma mîtosên kozmogonîk serwer in.

Avesta, nakokiya ku di nêvbera Thraeton û Azhî Dabaka de derbas dibe, wiha dide zanîn. Nakokiya ku di nêvbera ejderha û xwedayê ronahiyê, rojê, bagerê û asîmên de derbas dibe, di mîtolojiya şaristaniyê kevnare tev de heye.

Pêwendîya mîtosên kozmogonîk bi mîhrîcana sersalê re heye.

bi awayekî pêwendiya wan bi hev re heye.

**Di Mítoliyiya Egîpta Kevnare de** (Misira kevin) Nakokiya ku di nêvbera xwedayê rojê Re û Mar Apo-

2- Mirin û vejîna xweza-yê/mítosa xwedayê ku dimire û vedije.

3- Nakokîya di nêvbera gelên Mezopotamyayê û yên din de.



tîs de derbas dibe, bi xwe re Mîhrîcana sersala nû tîne. Orjîna van destanan tev yek e.

**Mítosa Sumerî ya Dumanûzî**, roja ku tav dikeve birca berên di 21'ê Adarê de dihat pîroz kirin. Sala nû, an jî sersal, di mítolojiyê de sîmgeha guherînê, rûdanê, zayînê, bi taybetî jî, sîmgeha vejinê ye. Mítosa Newrozê jî, vejin e.

Newroz, di 21'ê Adarê de tê pîroz kirin sedemê wê jî, ev e: Xweza bi biharê re vedije, bihar û havîn serweriya xwe ya li ser zivistanê diyar dîkin. An ku Newroz vejîna hêzîn jiyanî ya xwezayî ye.

Rewşa duyalîst a Newrozê:

1- Duyalîzma astirolojîk/ronahî-tarî

rîna Newrozê heye:

1- Ev roj, roja dawiya afirandina însen e. Xweda, afirandina mirovahiyê di vê rojê de qedandiye.

2- Giyana bav û kalên mîrî, di vê şevê de ji asîmîn berjîr dibe û tê serlîdانا malan.

3- Xweda, agir di vê şevê de afirandiye.

4- Dirêjahiya rojê ji şevê zêdetir dibe. Roj, ji şev dirêjtir dibe, li hemberî tariyê ronahî bi ser dikeve

Ji alî orjînalîteya dîrokî ve mîhrîcana sala nû Newroz, di nêv gelên kevnare de destpêka sala nû, bi taybetî jî, ji hêla bûyarênekînoksa bihar û payîzê, an jî solstîza havîn û zivistanê ve dihat diyarkirin. Ji xwe pîrozkirina Newrozê jî, di ekînoksa biharê, an ku 21'ê Adarê de ye.

Li Mezopotamyayê, di çerxa kevnare de mîhrîcana Newrozê, bûna-zayîna xwedayekê, an jî, salvegera bûna geleki tevlî hev bûne û di yek rojê de hatine pîrozkirin. Her wiha rojên bi wate yên rizgariya gelan jî, tevlî wan bûne, ketine nav hev û bi hev re hatine pîroz kirin. Gelên ku Newrozê di çarçova mítolojîk û mîhrîcanê de pîroz dîkin, ji hev cihêreng şirove dîkin.

Newroz, ji bo serwer û zordestan, parastina rewş û statuya heyî ye. Gelên bindest Newrozê bi ramana

4- Li dijî zordestî û kole dariyê tekoşîna azadiyê ya gelên bindest.

Li gorî baweriya kevnare ya gel, çar sedemîn pîrozki-

*Li Mezopotamyayê, di  
çerxa kevnare de  
mîhrîcana Newrozê,  
bûna-zayîna  
xwedayekê, an jî,  
salvegera bûna geleki  
tevlî hev bûne û di yek  
rojê de hatine  
pîrozkirin. Her wiha  
rojên bi wate yên  
rizgariya gelan jî, tevlî  
wan bûne, ketine nav  
hev û bi hev re hatine  
pîroz kirin.*

azadbûnê, ji bo rizgariya xwe, ji bo ku rewşa xwe ya xirab biguherînin pîroz dîkin. Gelê kurd jî, bi sedî sal in ku li dijî sazûmanên zordest têdikoşe û bi vî rengî Newrozê pîroz dike.

Piştî ev çend gotinê kurt, niha ez dixwazim ku derbarê dîrok û bingeha Newrozê de hinek agah-darî bidim.

Dema ku ci-vak dev ji koçberiyê berdide û li warekî bi cih dibe, hingî mîtolojî jî, dest pê dike. Mîtolojî, di pê-vajoya kedî-kirina sewalan de derdi-

keve holê. Li gorî belgeyên di dest de, sîteyên herî kevnare Tolf Half (Bz. 10200) û Newala çorê (Bz. 8600) ne. Ev sît, li zagrosê Mezopotamyayê ne. Ev sît, ji bo jê-derka mîtosan gelek girîng in. Li gorî dîroknasên çerxa kevnare, kasîfî ku nifşen Gutiyan in Bz. di sala 1896'an de Babîlê dagir kirin. Serweriya kasîtiyan a li vê herêmê, ta sala Bz. 1176'an dom kir. Navê vê dewletê ya di nêv gel de Cemşîd e. Çawa ku ji dewleta Medê re Ferîdun jî dihat gotin.

Cemşîd Bz. di sala 1896'an de ji Demawendê

ber bi Babîlê ve dest bi rê-wengiyekê dike. Di vê rê-wingiyê de rûyê Cemşîd wekî tava rojê diçûrise. Ev jî wekî nîşana ronahiyê û zê-dahiyê hatiye şirovekirin. Baweriyeke wisa di nêv gel de çêbûye ku ew roj li asîmîn cot roj hatiye dîtin. Ev bûyer, rastî roja 21'ê Adarê tê.

kem hatiye damezirandin. Dewleta Kasît, Mîtanî, Hîtît, Asûrî û ya Misrî ya Firawû-nân hemçerxî ne. Kastî, erdê Babîliyan Bz. di sala 1530'î de dagir kirin û li ser şarista-niya Babîliyan rûniştin. Dewleta Kasît, ji alî Asuriyan ve Bz. di sala 1171'î de hat rûxandin. Urartu, Medî Kasîtî û êlîn din, piştî çend sed salî, ji nû ve xwe birêkxistin û Bz. di sala 612 an de êrîş birin ser Nînovayê û dawî li dewleta Asûriyan anîn. Carek din dewleta Medê dame-zirandin.

Dewleta Medê Bz. di sala 534 an de ji alî qralê persiyan Kuraş ve hat hilweşandin.

Bûyera Newrozê û pîrozkirin wê, ji bûyera serhilda-na Kawayê Hêsinker û ji damezirandina dewleta Medê cihê ye. Newroz, ifadeya çanda kevneşopî ya gelê kurd e. Kawa, di pêvajoyeke dûve dirêj de hem kesên navdar û dîrokî ne hem jî, sîmgeyîn lehengî yê mîtolojîkî ne ku di her gehîneka pêşveçûna gerdûnê de rolên giring lîstîne.

Sîmgeyîn kozmîk, hem navên şiklî yêndewrewî ne,

Li gorî agahdariya pîrtûka pîroz Awesta Newroz, Bz. di sala 1600'î de dest pê dike. Gutî, gelekî pir kevnare ye û Bz. ji salên 800'î vir de li Zagrosê jîne û disa Bz. di sala 3100'î de dewlet ava kirine. Qralê Gutiyan ê yekem Emnatum Bz. di salên 3100'î de jiye. Huşeng, yek ji qralên dawî yê Gutiyan e. Gutî, Bz. di sala 2550 an de welatê Sumeriyan tev dagir kirin. Serweriya Gutiyan a li ser axa Sumeriyan 50 sal dom kir. Asurî, Bz. di sala 2390'î de dîsa derketin ser sahnê. Dewleta Gutî, 2450 sal berî dewleta persî ya ye-

ku makro kozmos, maddeya xwe ya xav jê distîne, hem jî bi vî karekterê xwe yê duyalî ve dibe mijara nîqaşê ya felsefeya bilind. Hem di Avestayê de, hem jî di pirtûkên din ên pîroz de, çend versiyonê Kawa hene. Versiyona yekem a Kawayê gerdûnî Kawa Kawata ye. Ev jî, di mîtolojiyê de şirovekirina kota xuyayî ye. Kawateyê guheriye û bûye navê versiyona ronahiya yezdanî; ya ku ber bi maddebûnê ve diçe ku di afirandina gerdûnê ya maddî de, rista sereke lîstiye. Ji Kawa Kawateyêye dîtbar Kawa Gaus peyda bûye. Ev jî, wekî gamêşê mîtolojîk û qralê çiyê tê zanîn. Neviyê Kawa Kawateyê, Kawa Hûşeng e ew jî, wekî mirovekî lîgerîner û yê ku gerdunê dilivîne, tê zanîn. Kawa Tagma Urupa (Bz. 3377) lawê Kawa Hûşeng e. Ew jî, hêzeke kozmîk e.ku hêmanên asîmên di nêv sazumaneye yezdanî de bi cih dike.



Threatona-Kawa (di Avestayê de wiha derbas dibe. Lî di şahnameya Firdewsî de Ferîdun tê bi nav kirin) avakarê sazûmana li ser rûyê erdê ye. Li gorî şahnameya Firdewsî Dehaq dikeve bin bandora şeytên. Bavê xwe qral Mêrdês ji holê radike û li cihê wî rûdinê ser text. Şeytan, di bin maskên curbe cur de têkiliyên xwe bi Dehaq re didomîne û her tim riya xirabiyê şanî wî dide. Dehaq zordestiyeke mezin li hemwelatiyên xwe dike. Dehaq bi artêseke mezin êrîş dibe ser Cemşîd. Cemşîd têk diçe, welatê wî dikeve bin serweriya Dehaq û li ser vê axa fireh demeke dirêj serweriya xwe didomîne. Piştî demeke dirêj Dehaq, xewneke xirab dibîne. Dehaq, li ser vê xewnê, hemwelatiyên xwe berhev dike û ji wan re gotinên xweş dibêje. Di wê civînê de Kawa derdikeve pêş diqîre û dadê dixwaze. Ji Dehaq re dibêje ku tu nikarî

dad belav bikî. Ji ber ku qra-liya te li ser zilmê ava bûye. Ji bo ku gel azad be û bikare azad bijî, divê tu dev ji qraliyê berdî. Gel li dora Kawa berhev dibe û êrîş dibe ser serayê. Serîhildan bi ser dikeve, Dehaq ji têxt dikeve. Gel digihîje azadiya xwe.

Bayê bagera azadî û serx-webûnê yê sala 84'ê Gelawêjê xweliya li ser êgir belawela kir. Bizot di demeke kin de ges bû, pêtên wî bilind bû û çar hêlê Kurdistanê ronî kir. Gelê kurd iro Newrozê bi serîhildanê mezin hembêz dike.

**Versiyona yekem a  
Kawayê gerdûnî  
Kawa Kawata ye. Ev jî,  
di mîtolojiyê de  
şirovekirina kota  
xuyayî ye. Kawateyê  
guheriye û bûye navê  
versiyona ronabiya  
yezdanî; ya ku ber bi  
maddebûnê ve diçe ku  
di afirandina gerdûnê  
ya maddî de rista  
sereke lîstiye. Ji Kawa  
Kawateyêye dîtbar  
Kawa Gaus peyda  
bûye. Ev jî, wekî  
gamêşê mîtolojîk û  
qralê çiyê tê zanîn.**

# METODA

# DÎROKNIVÎSIYÊ

**SIRAÇ BİLGİN**

Werger: Hesen Zinar

X ebat û hewldana kurdan a derbarê lêkolîna dîroka kurdî û nivîsîna dîrokê ya ku bi keda xwe bi rê ve dibin, hêj di dema çarlepikan de ye. Ji ber vê yekê, tiştekî si-ruştî ye, berhemên ku hatine nivîsîn bi sînor in. Berhemên ku hatine dayîn, bi gellementî xwediyyê çewtiyê

*Gelekî ku ziman, çand, mîtolojî û dîroka wî hatibe dagerkirin, hêsan nîn e ku zarokên wî rabin lêkolînan çêbikin. Mirovîn ku bi vî karî re têkildar dibin, xwe dikine binê barekî giran. Ji bo lêkolîneriya dîrokê, metoda ku ez pêşniyar dikim ev e: Beri her tiştê ku mirov ji bo lêgerînê hilbijartîye, divê ku mirov di sere bere hinek agahiyân derheqê wê de bîn bibe. Ev rade pir girîng e.*

zanistî ne. Helbet sedema vê yekê heye. Mirovîn ku nivîsa min bixwîne, dê hêj di serî de bêje, bila lêkolînerî û nivîskariya dîrokê bi hêviya kesen ku xwedîyê kariyerê ne ve were berdan. Li gorî wan çareserî ev e. Heke pêşniyareke wiha hebe, di cihê xwe de ye, rast e. Li hemû deverên cîhanê, pispor bi yek karî re têkildar in. Lî li nav kurdan, tu dinerî ku şâtrek dîrokê dinivîse, bijîskê mirovan bi lêkolîneriya mîtolojiyê re têkildar e. Çima? Ji ber ku mirovîn ku di karê xwe de pispor in, ji dewletên dagirker re dixebeitin. An ji karê xwe ji dil nakin, di ser guhê xwe re diavêjin. Ji ber ku pêşbaziyeke ku wan pêşve bibe tune ye, dibêjin min çekir, çêbû. Bi vî awayî çend pitikan rêz dîkin.

Lê, lêkolînerî karekî pir girîng e, barekî giran e. Gelekî ku ziman, çand, mîtolojî û dîroka wî hatibe dagerkirin, hêsan nîn e ku zarokên wî rabin lêkolînan çêbikin. Mirovîn ku bi vî karî re têkildar dibin, xwe dikine binê barekî giran. Ez dê di vê nivîsara xwe de, ji bo kesen ku li ser dîroka kurdî dixebeitin, pêşniyariya lêgerî-

neke ku wan ji rê û encamên çewt biparêze bikim. Ev pêşniyar dê riya lêkolîneran veke.

**a) Radeya zanebûnê ya sere bere**

Ji bo lêkolîneriya dîrokê, metoda ku ez pêşniyar dikim ev e: Beri her tiştê ku mirov ji bo lêgerînê hilbijartîye, divê ku mirov di sere bere hinek agahiyân derheqê wê de hîn bibe. Ev rade pir girîng e. Hêke radeya agahiyê bi awayekî rêk û pêk derbas bûbe, beşike girîng ji astengiya riya me qediyaye. Lê pêwist e ku di vê radeyê de mirov xwe ji dafikê biparêze. Ew dafik jî biryardayina bi lezgînî ye. Di radeya zanebûna di sere bere de, heke derheqê tiştê ku lêkolîn dê li ser were çekirin, di serê mirov de, bîryara bi lezgînî hebe, bila bête zanîn ku di vê radeyê de mirov bêalibûna xwe ya zanistî winda dike. Dema ku rewş wiha be, mirov agahiyên ku pêwistî bi wan heye hîn na-be, bêtir tiştê ku di serî de cemîdiye hîn dibe. Heta ji mirov tê, xwe ji vê çewtiyê dûr bigre. Bîryara bi lezgînî, di radeya hînbûnê de, berhe-

mên ku mirov li ser wan lê-kolînê çêdike û delîlan dike rewşike ku mirov wan çewt şirove bike.

Weke mînak, em bibêjin, em li ser jiyan û kesatiya Zarathuştرا (Zerdeş) lêkolînê dîkin. Heke em bi derbekê bibêjin Zarathuştرا kurd e, sê Zerdeş hatine ser rûyê er-dê û hwd. bila bête zanîn ku wê demê ev biryarêñ lezgî-nî, me nagihînin ramanêñ durist. Heke encama ku em gihiştinê rast be jî, delîlêñ ku me hilbijartine dê pir qels bibin. Li hemberî vê rewşê, divê ku em riyeke dijwartir hilbijêrin. Divê ku em biryârêñ bi lezgînî yên di serê xwe de deynin cihekî, em li gorî pîvanêñ zanistî bi rê ve herin. Bi vî awayî em dikarin, ji delîlêñ ku emê wan di lêkolîna xwe de bi kar bînin re rê vekin.

Heke em bi kurtî bibêjin, divê ku pêşî tiştê ku têkiliya wan bi lêkolîna me re heye, yên nivîskî hemûyan bê westan peyda bike, ji serî heta dawî bixwîne û bibe xwedî agahî. Helbet evqas bes nîn e. Divê ku em xwe bigihînin hemû delîlêñ arkeolojîk. Bi vî awayî wêneyekî Zarathuştرا yê têkîlhev dê di nav serê me de çêbibe. Wê demê ev rade diqede. Êdî em dikarin bêjin nêrîneke me jî derheqê vê ramanê de heye.

### b) Vegetandina Agahiyân

Pîstî radeya agahdarbûna ji rêsê, divê ku berhemên heyî, yên lekolînî û agahî ci-hê cihê bêne beş kirin. Divê pêşî berhemên lêkolînerên

ku heman baweriyê diparêzin bêne vegetandin, ferase-ta van baweriyêñ cihê bête dahûrandin û dawî li ser se-dema cihêtiya van baweri-yan bête rawestandin. Bi vî awayî mirov dê qelsiya van baweriyân jî hîn bibe. Ji bili-vê yekê mirov dê, delîlêñ he-

pencî heb lêkolînê bi rêk û pêk hene, bi dehan lêkolîne-rêñ zêde ne jêhatî jî, li ser vê mijarê hinek tişt gotine. Tê zanîn ku nêzî bîst lêkolîne-rêñ Ereb û musliman jî, derbarê Zarathuştرا de nîqaş ki-rine. Hinekan ji van agahdarîne pir girîng dane. (Li Mesûdî, Kazwînî û yên weke wan binêrîn). Derbarê Zarathuştرا de, çavkaniyêñ Zerdüştîyêñ Tradîsyonel jî agahiyyêñ zengîn pêşkeş kirine. Ev berhem hemû jî bi zimanê pehlewî hatine nivîsîn. Bi şeweylekî mîtolojîk hatine honandin û berhemên olî ne. Dema ku ev berhem bêtîn vêkolîn, divê ku ev taybeti-yêñ wan neyên ji bîr kirin. Ev berhemên Pehlewî tev li zimanê rojava hatine wergêrandin. Wergerandin bi şê-weyekî nişmî pêk hatiye. Di-vê ku em Avestaya Mezin a ku ji sê pirtûkan pêk tê û Avestaya piçûk (Xurde Avesta) ji bîr nekin.

Dema ku ev berhemên tê-kûz hatine vekolîn, wê demê nêrîna me bi hebûna sê Avestayan hebe jî ew dê we-re guhertin. Ji bo erênikirina vê ferasetê, ne di Avestayê de, ne di berhemên Pehlewî de tu delîl tune ne. Di encamên ku lêkolîner gihiştinê de jî tu baweriyeye wiha tu-ne ye. Piştî ku mirov di van radeyan re derbas bû, dê ji xwe bipirse; feraseta ku dibêje sê Zerdeş hene ji ku derket. Delîlêñ ku lêkolîner pêşkeş dîkin didine xuyakîrîn ku Zarathuştرا li Kurdis-tanê bûye.

*Heke em bi kurtî  
bibêjin, divê ku peşî  
tiştê ku têkiliya wan bi  
lêkolîna me re heye,  
yên nivîskî hemûyan  
bê westan peyda bike,  
ji serî heta dawî  
bixwîne û bibe xwedî  
agahî. Helbet evqas bes  
nîn e. Divê ku em xwe  
bigihînin hemû delîlêñ  
arkeolojîk. Bi vî awayî  
wêneyekî Zarathuştرا  
yê têkîlhev dê di nav  
serê me de çêbibe. Wê  
demê ev rade diqede.  
Êdî em dikarin bêjin  
nêrîneke me jî derheqê  
ve ramanê de heye.*

vûdin pûçkirina van ferase-tan jî hîn bibe. Ji bo ku he-vûdin pûç bikin serî li kîjan rêyan didin derdikeve holê.

Em vegeerin ser mînaka Zarathuştرا. Piştî agahdar-bûna ji rêsê, em dibînin ku derbarê Zarathuştra de nêzî

### c) Delîlên Arkeolojîk

Di radeya duyemîn de, em dê xwe bigihînin delîlên arkeolojîk û van delîlan binirxînin. Divê ku ev delîl bi awayekî rast bêne nirxandin

bide ber hev, sûdeke hêja dê derkewe holê. Her çiqas Mîthra, di Gathoyê Zarathuştرا ya ber destê me de cih negirtibe jî, di Avestaya teze de xwediyê cihekî gitîng e. Hejmara Gathayê

sîn. Her zanyarê ku nasnameya Zarathuştرا vedikole, pêşî van nivîsaran vedikole. Em jî dikarin van nivîsaran ji hêla zimanzaniyê ve bida-hûrînin. Bi vî awayî em dê derbarê Zarathuştرا de, der-

*Delîlên derbarê zimên de, ji tabletên kîlê, ji nivîsarên zinaran û çavkaniyên din têne bi dest xistin. Em mînakên xwe bi Zarathuştرا didomînin; helbet em dê ji Gathayê nivîskî û jiberkirî, yên ku heta niha jiyyîne sûdê wergirin. Gatha metnên ku di Avestayê de bi zimanekî şîrî batine nivîsin in. Ev metn ji Zarathuştرا bi mane. Weke ku min li jor jî got Gatha di hivdeh sureyan de batine berhev kirin.*

*Zimanê Gatha geleki kevn û seretayî ye.*

û tu aliyê wan neyê ji bîr kirin. Divê ku nirxandin neyê guhertin û mezin kirin. Em dikarin carek din vegeerin ser Zarathuştرا. Heke ji me were, em dê cihêne weke kenîst, sarîç û hwd ên ku zeredeştiyan li pey xwe hiştine şirova bikin, heke ji me neyê em dê şiroveyên arkeologên jêhatî, bi çavekî rexnegîr bixwînin. Hûn dê mettel bimînin ku pêmayiyên heyama Zarathuştرا tune ne. Bila ev yek me bêzar neke. Bi inad em li pêmayiyên kenîstên êgir bigerin. Her çiqas ji hev de ketî bin jî, mirov li ser delîlên ku mane hûr bibe, wan binirxîne û bigihîje hinek encaman. Bi taybetî jî kenîstên Mîthra yên ku li cîhanê pir in binirxîne, delîlên ku li ser dîwarêwan wan bide ber delîlên ku di pirtûkên Zerdeştiyan de ne. Dema mirov van delîlan

orjînal, 72 heb têne pejirandin. Dibe ku di nav 52 heb Gathayê winda de navê Mîthra hebe. Lê dîsa jî divê mirov bi şik li delîlên derbarê vê babetê de binêre.

### d) Delîlên Zimanzaniyê

Delîlên derbarê zimên de, ji tabletên kîlê, ji nivîsarên zinaran û çavkaniyên din têne bi dest xistin. Em mînakên xwe bi Zarathuştra didomînin; helbet em dê ji Gathayê nivîskî û jiberkirî, yên ku heta niha jiyyîne sûdê wergirin. Gatha metnên ku di Avestayê de bi zimanekî şîrî batine nivîsin in. Ev metn ji Zarathuştra mane. Weke ku min li jor jî got Gatha di hivdeh sureyan de batine berhev kirin. Zimanê Gatha geleki kevn û seretayî ye. Bi zimanê Îndo-Ewrupî, beşa Iranî hatine gotin an jî nivî-

barê naverok û taybetiyên wê de, agahiyêن hêja hîn bîbin.

Di lêgerîna ku min çêkirîbû de, di navbera peyvên ku di Gathayan de hatine bikaranîn û Kirdkî de min pêwendîyeke xurt dît. Peyvên hevpar ji 600 î bêtir in. Divê ku were pirsîn: Di navbera hemû zimanên Iranî de pêwendî heye. Rast e. Lê em dikarin hinek delîlên din jî bikar bînin. Wê demê nêzîkayıya zimên dê xebata me xurt bike û em dê hêsanitîr bikarîbin bibêjin ku Zarathuştara li Medyayê ye. Min xebata xwe ya derbarê vê mijarê de bi awayekî têkûz qedendibû (li xebata min a bi navê Gathayê Zarathuştara binîrin).

Gatha bi awayekî din jî dikarin ji me re bibin alîkar. Gotina, “mirinê dûr dike...” bi kêrî me tê. Ev gotin rast û

rê qala "Homa" dike. Di Avestayê de, peyva "Homa" û rengdêra "mirinê dûr dike" di heman wateya de hatine bi kar anîn. Weke ku tê zanîn sureyên Avestayê yên nehemîn, dehemîn û yazdemîn, ji Homa re hatine diyarî kirin. Min, ev sure wergendibûn û tevî şiroveya wan belav kiribû. (Li xebata min a bi navê Mîtolojiya Aryan binîrin.) Di van hemû sureyan de, "Homa" û "Homayê pîroz ê ku mirinê dûr dike" di yek wateyê de hatine bi kar anîn. Tiştekî pir girîng û balkêş e ku li tevê cîhanê, bi tenê li Kurdistanê peyva Homa dijî. Kurdêñ ku bi kirdkî diaxivin, ji xwedê re "Homa" dibêjin. Ev yek ji ber çavê lêkolînerên Rojavayî winda bûye. Hayâ war ji vê rastiyê tune. Heke bizaniyana dê iro delîlên xurtir, pêşkeş bikirana. Peyva homa di navbera mîtolojiya ku di Avestayê de derbas dibe û di civaka kurd a îroyîn de pireke xurt ava dike.

Bi vê destnîşankirinê dixuyê ku zimanzanî çiqas girîng e ji bo mijara me.

### e) Antropolojiya Fizîkî

Dî lêgerîneriya dîrokê de, antropolojiya fizîkî beşeke girîng e. Ev beş, bi taybetî li zankoyêñ Cambridge û Kolombia û tevê cîhanê weke beşeke alîkar tê pejirandin. Pêwendîya di navbera dest û rûyê mirov de, dikare pêwendîya mirovên heyama kevnare û yên civaka îroyîn derxe holê. Lê dîsa jî, lêgerînerên van zankoyan ji bir

nakin ku nîjad di pêvajoyeke pir dûvdirej de tê guhertin û xwerutiya xwe winda dike. Ji ber vê yekê Antropolojiya fizîkî bi tenê weke beşeke alîkar, belê weke alîkareke girîng tê pejirandin.

### f) Nivîsarêñ destkî, yên li ser keviran û hemdem (contemporary)

Alîkarekî ku lêgerînerên dîrokê li pey digerin û jê sûde werdigirin û weke delîl dipejirînin, nivîsarêñ destkî yên li ser keviran û hemdem in. Di pirêzê de, her gav gençgaz nîne ku mirov xwe bigihîjîne delîlên ku rast û rê bi tişte ku mirov vedikole re têkîldar bin. Hinek caran derbarê tişte ku mirov vedikole

de tu tişt li rastmalê tune. Lêgerînerên ku derbarê Bi-rêz Musa, Isa û Zerdeş pêxember de dixebeitin, ji ber vê yekê gelek astengîyan dibînin. Her çiqas cihû dibêjin gelek beşen Ahîta Kevanare rast û rê berhema birêz Mûsa ye. Lê gelemeperiya lêgerîneran dibêjin ev nivîsarêñ hanê piştî wî demek dûvdirej, bi destê hevalbendêñ wî hatine nivîsin. Zimenê di van nivîsaran de ji hev cihê ye. Mêjûya wan ji hevdû nagre. Delîlên wiha, lêgerînerên Tewratê yên jêhatî mafdar dikin ku Ahîta Kevnar rast û rê berhema Mûsa nîne. Ev lêgerîner xwediye delîlên xurt in. Lê yên li hemberî wan, delîlên qels ên ku bêhna bawerîyan ji wan tê, yên ku bi xurtî û li gorî bawerîyen olî derdixin pêş in. Di vê navê de, hinek lêgerîner ewqasî pêşve diçin, dibêjin, ji xwe bi navê Mûsa tu kes nejiyaye.

Sensê lêgerînerên ku derbarê Zarathuştî de, dixebeitin heye. Lewra, di destê wan de, Gathayêñ ku nivîsarêñ bijarte ne bene. Her kes li ser hem fîkr e ku ev nivîsarêñ Zarathuştî ne. Her çiqas wiha be jî, di navbera Zarathuştî, Gatha û van berheman de nivîsarêñ hemdem nayêñ dîtin. Lê beriya zayînê 500 salî û pê de gelek nivîsarêñ ku bi destê Greko-Romenan batine nivîsin û derbarê Zarathuştî de gelek işaretan didin peyda dibin. Hinek ji van nivîsaran rast û rê, hinek jî ne erast û rê ne. Gelek çavkaniyêñ weke "pirtûkêñ Maguyan" Gere-

*Sensê lêgerînerên ku derbarê Zarathuştî de, dixebeitin heye. Lewra, di destê wan de, Gathayêñ ku nivîsarêñ bijarte ne bene. Her kes li ser hem fîkr e ku ev nivîsarêñ Zarathuştî ne. Her çiqas wiha be jî, di navbera Zarathuştî, Gatha û van berheman de nivîsarêñ hemdem nayêñ dîtin. Lê beriya zayînê 500 salî û pê de gelek nivîsarêñ ku bi destê Greko-Romenan batine nivîsin û derbarê Zarathuştî de gelek işaretan didin peyda dibin.*

ko-Romenên ku dibêjin ez xwediyyê 70 gotarê Zoroasterê me ehene. Dive ku neyê jîbir kirin ku navê Zarathuştرا li ba Greko-Romenan, Zoroaster (li bi Greki-

keve holê û zelal bibe. Weke mînak em li ser Zarathuştرا rawestin. Kevneşopê neteweyî yên weke Newrozê ku niha di nav gelê Kurdistanê de dijîn, pirê qewîn in.

***Divê ku pêmayiyêن baweriya olî yên veşartî û eşkere, yên mirovê îroyîn, bêne vekolîn. Pir û pêvendiya di navbera bawerîyan û rabirduyê de, dê gelek derfetan bide ji bo ku tiştê dîrokî yê ku vekolîn li ser çêdibe, derkeve holê û zelal bibe.***

yan) û Zoroaster (li Romanan) ye.

Nivîskarêن Greko-Romen derheqê nasnameya Zarathuştرا de dibine sê bes:

**A) Zarathuştرا ji Baktriyyâye.**

**B) Zarathuştra Medî ye**

**C) Zarathuştra Persî ye.**

Ji ber ku naveroka van nîqaşan gelekî dûvdirêj e, ez li vir nikarim binivîsim. Lê lêkolîneke min a têkûz a derbarê vê mijarê de, di nav weşanên Enstîtuya Kurdi ya Stokholmê de der çû. Dawiya dawî zarathuştreyê ku magu ye ji Medî pê ve nabe yê tu kesî. Magutiya wî ji aliyê Gerek-Romenan ve hatiye destnîşan kirin. Hatiye gotin ku Magu jî Medî ne.

**g) Delfîlê Mítolojîk**

Divê ku pêmayiyêن baweriya olî yên veşartî û eşkere, yên mirovê îroyîn, bêne vekolîn. Pir û pêvendiya di navbera bawerîyan û rabirduyê de, dê gelek derfetan bide ji bo ku tiştê dîrokî yê ku vekolîn li ser çêdibe, dê-

vî pêxemberî ve girê didin.

Divê ku baweriyêن van girseyen olî bêne dahûrân din, sedema wê were pirsîyarîkirin ka çima bi tenê li Kurdistanê ev bawerî hene. Bersiva van pirsan dê pir gi-ring be ji bo lêgerînerên dîrokê. Divê ku pirs ne ji rêzê bin. Pêwist e ku pirsên dorfereh bêne kirin. Heke weha nebe, encameke bi rêk û pêk dernakeve holê. Divê ku neyê jîbir kirin ku li Kurdistanê ji xeynî ola Zerdeştiyê, ola Manî jî jiyiye. Divê ku cudahiya di navbera van her du olan de, têkûz bête nirxandin, her du ol baş bêtin



zanîn û felsefeya wan were dahûrandin.

### **h) Delîlên Derbarê Erdnîgariyê De**

Girîngiya erdnîgariya tişte ku tê vekolîn heye.

Ez van nîqaşan, tevî işaret û delîlên ku min bi ser ve zêde kirine diweşînim. (Bînérin li Zerdeş, Pêxembe-rekî ewil ê kurd, di nav weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stokholmê)

### **Lêgerînvaniya dîrokê bi qasî ku tê gotin**

*bêjan nîne. Heke lêgerîner bêyi ku amade û gîbiştî bin hinek tiştan binivîsin û berhemên ku wan afirandine bêyi ku rexne li wan bê girtin, bêne weşandin û bêne xwendin, ew dê gelek agahiyên çewt têxin serê mirovan*

Tiştê ku lêkolîn derbarê wî de çêdibe, qewm, gel an jî kes li ku derê jiyyî. Dever ango erdnîgarî delîlên xurt dide lêgerîner. Em dizanîn ku ji gelan re, bi taybetî jî, ji gelên rojhilata navîn re, di pêvajoya dîrokê cihekî xweser û sabît tune ye. Gel her dem geriyane, çûn û hatine. Sumerî ji Bakur, ji Zagrosan, daketine Mezrabotan a Başûr, ev never ji xwe re kirin cih û war. Akadî ji hin cihê din, ji Rojava hatine û bûne cîra-nê wan. Ji xwe çîroka Arayanê ku li vê herêmê bi cih bûne tevlihevtir e. Hê jî serpêhatiya Aryanan tê nîqaş kirin. Ji ber vê yekê, dema ku lêkolînen arkeolojîk ên ku bi daneber-hevkî çedibin, lêkolînen zi-mîn û işaretên Antropolojîk bi hev re bêne nirxandin, wê demê girîngiya erdnîgariyê derdikeve holê. Cihê ku Zarathustra lê bûye, an jî cihê ku ew lê jiyyîe her dem hatiye nîqaş kirin. Hê jî tê nîqaş kirin.

### **ENCAM**

Weke encam em dikarin wiha bibêjin: Lêgerînvaniya dîrokê bi qasî ku tê gotin hêja nîne. Heke lêgerîner bêyi ku amade û gîbiştî bin hinek tiştan binivîsin û berhemên ku wan afirandine bêyi ku rexne li wan bê girtin, bêne weşandin û bêne xwendin, ew dê gelek agahiyên çewt têxin serê mirovan. Divê ku lêgerîneren kurd baş bizanîn ku gelek hêzên ku dixwazin neteweya kurd ji qada dîrokê winda bikin, di kemînê de sekinîne. Ji ber vê yekê divê ku lêgerîneren kurd bi hiş û bi awayekî baldar bixebeitin. Heta ku xwe baş amade bikin û têr bigihîjin, divê ku sebrê bikşînin. Piştî vê merhale-yê binivîsin. Wê demê dê berhemên ku pir hindik çewtî tê de hene binivîsin. Ya ku li wan tê jî ev rê ye.

### **Çand Stranê Zerduşt**

**Transkripsiyon:**  
**Ehmed Şerîfi**

### **Xurşîd Yeşit (Pesendî Xor)**

#### **XOR**

Çekamey tîşik û espî spî  
Şadman û kuit  
Serwerî pîrozî zana  
Bê Merig xûdayan asa  
Serawjêr dêyte xuwar  
Zerduşt wesay fermowe  
Her wa bê

#### **Horî 1**

Heta biweşê û bidirexişê  
betireffî sitayg û  
pesand

kelol û matim  
Sikoy tîşk û nuwêjî  
rûnakî  
Hovtirîn gerdûney bi-dew, le katî helatin  
Le satî cêwarbûnî-tîşk-Sed hezar le eyzedekan,  
bo tîşk cinînî xor

Radeperin dêñ  
Heta em mezinî û şiko-ye berewxuwar bêñin

Ewan mizgêñî bexişî  
em xak en  
Bo bûjanewey behar û  
hûşyarî  
rêge û goteý raşit û başî  
gelan

#### **Horî 2**

Katê ke xor heldê  
Zewî Yezdan dafirê

Awî rewan û  
Kaniya û rubar, her we-  
sa ziriyakan dejinewe

**Horî 3**

Ah [xuway ne xuwasite]  
eger mirdbay ey tîşik  
Le gel dêw û dirinc û  
hezar serekân, belan  
Çiman deba kirdiba  
Çak û başekan ke bêmal  
û xêw awaren  
Sergerdanin  
deba çiyan kirdiba

**Horî 4**

Ewiy ke le tîşika ye  
Be suwarî esip û mîranî dê  
hatuwe  
Yane dê  
Heta tomarı tarîkî û resî  
têkewe pêcê  
Heta hogirî û kenîn û  
xoşewîstî zal ka  
Ewî ke wa evîndarane  
bangihîştinî keyn

Bize û hogirî û şadîman  
bang kirduve  
Aw û soretyay haye hayî  
Teniya her ew in

**Horî 5**

Ez lew im gêrawetewe  
giyanî giyanan  
Belê: Awat û amance  
kantanim  
bang hêşitîn kirduve  
Ke ew dilovan û mîhi-  
rawerî riziq û rojiye  
Be hemû derd û pejare-  
yewe

Hezar perî perîşanî bo  
heramiyan, helal sipêrû  
çalakane dê

Ez ewey ke le naw ma-  
níg û rangelî rojanetane  
debûre.

Sitayış dekem.

**Horî 6**


Her ke: Le nuwêjê bibi-  
mewe, bê biyanu gazî de-  
kem.

Ewey ke  
Ke wek nûrî tîşikî şadî  
hênerî sozitan debînim.

Ew:  
Yor,  
Kale seherî ber beyanî,  
le yalî esipî  
Detîkê  
Ke waye berhemî dar  
noşî bîr yo bênin  
Ke be ser sipyay xorêk da  
Pê dekenê  
Bîrî pak û gotarî gula-  
say eywe  
We kirdewetan  
Kirdewey beriz û resa,  
resa, resay  
Yengehe hetam

**Horî 7**

Yeta ahû  
Silawit lê bê ey nûr  
Yeta ahû  
Silawit lê bê ey mezînî  
Yeta ahû  
Silawit lê bê ey mirov.

**Ferhengok:**

- 1- Xursid: hetaw, xor, avta, roj, roc
- 2- Yeşit: pesend, sitayış, heldan, te-  
rifskirdin
- 3- Çekame: bozan, şîâr, helbest
- 4- Tîşik: nûr, nûrî xor, tîrej
- 5- Ser wer: mezîn, gewre, kelem-  
per, heja
- 6- Horê: goranî, awaz, stran
- 7- Betiref: bedhal, zar, zebûn
- 8- Sitayış: situden, pesendkirdin
- 9- Kelol- Zar û zebûn-xirab-bêhal
- 10- Gerdin=Felek-asiman-çerxerdin
- 11- Xak= A., zewî cihanî hestî
- 12- Büjanewe=Jiyanewe-hestane ser pe
- 13- Rubar= Çem-com-Rûdxane
- 14- Heramiyan=Karî xirap-napesand
- 15- Yange hatam=Goteleyekavîstaîye
- 16- Yeta ahû= Goteleyekavîstaîye

# Ji Aliyê Binyadî Ve Lêkerên Me

## ZANA FARQİNİ

Di vê xebata xwe de min xwest ku ez li gorî zanîn û baweriya xwe hinek mijara lêkeran ronî bikim. Ji ber ku gava em pirtûkên li ser rêzimana kurdî li hev dixin, em dêhna xwe didinê ku tiştên li ser lêkeran hatiye gotin û senifandina ku ji bo wan hatiye kîrin, hev nagirin. Tevliheviyek di wan xebatan de xwe dide der. Ev tevlihevî, ne tenê di warê navlêkirina lêkeran de, di warê senifandina wan de ye ji.

Eger em baş bala xwe bidine pirtûkên li ser rêzimana kurdî yên F. Huseyn Sağrıç, Celadet Bedirxan û Roger Lescot, Qanatê Kurdo, Mûrad Ciwan, Kemal Badıllı ... û A. Bali em dê vê rewşê bi terhekî têr baş bibînin. A rast, di destpêkê de ez fikirîm ku ez li ser gotin û raveyên wan ên der barê lêkeran de xebatek lêkolînî bikim. Lê ez tê fikirîm ku mijar dê pir berfireh bibe û dê bibe mîna xebateke rexneyî ya li ser xebatê wan. Her wiha ez ji dê ji mebesta xwe ya bingehîn averê bibûma. Ji lew re r. in ew fikra xwe ya ku di destpêkê de ji min re çêbûbû, terikand.

Tiştekî din jî divê bê aşke-rekirin, ku ew ji ev e: Ji bo ku mijar belawela nebe û mebesta me ya hîmî winda nebe, me tenê ji aliyê binyadî ve lêker hildan destê xwe. Wekî ku tê zanîn lêker ligel ji aliyî binyadî, ji aliyên erkî, kirdeyî û teşeyî (formî) ve ji têne senifandin.

Em dubare bikin, dabaşa vê xebatê tenê ji layê binyadî ve lêker in. Me awayê din li derveyî wê hiştin.

Bi awayekî gelempem, ji hêla binyadî ve lêker li çar biran lêk ve dibin, ango dibine çar beş:

- 1) Lêkerên sade
- 2) lêkerên çêkirî
- 3) lêkerên hevedudanî
- 4) Lêkerên biwêjî

### 1) Lêkerên sade

Ji wan lêkeran re tê gotin ku ew ji berê de bi tena serê xwe hene û bi alîkariya çu pirtik û qertafî nehatine çêkirin. Her wekî ji nav jî xuya dibe, tenê ji peyvekê hatine pê û sade ne. Ji lew re ji wan re lêkeren resen û xwerû ji tên gotin. Ji bo lêkeren sade em çend nimûneyan bidin: *kirin, dan, firotin, bûn, firîn, hiştin, stendin, xwestin* ....

### 2) Lêkerên çêkirî

Em dikarin van lêkeren çêkirî bikin du bes û wisa li ser wan rawestin:

a) Ew di hîmê xwe de ne lêker in. Ew ji peyvîn celebêن navdêran, bi gotineke din ew an ji navdêrekê an jî, ji rengdêrekê hatine çêkirin. Ev lêker bi alîkariya sê parkîtan (paşgiran) têne pê. Ez vê ji bibêjim ku di pirtûkên li ser gramerâ kurdî (kurmançî) de, heta niha ez rastî parkîta -andinê tenê hatime.

Ev parkît ev in: *-andin, -ijandin, -isandin*

Bi van parkîteyên lêkerçêker, ji navdêr û rengdêran lêkeren gerguhêz (têper, derbasî, gerandî) têne çêkirin. Nimûne:

nav + andin = navandin  
hundir + andin = hundirandin

germ + ijandin = germijandin  
nerm + ijandin = nermijandin

rep + isandin = repisandin  
tep + isandin = tepisandin

Ji bo rewşa wan a negerguhêz (netêper, nederbasî, negerandî) ji parkît ev in: *-în, -ijîn, -isîn*

nav + ïn = navîn  
hundir + ïn = hundirîn  
germ + ijîn = germijîn

nerm + ijîn = nermijîn

rep + isîn = repisîn

tep + isîn = tepisîn

**b)** Ev di hîmê xwe de lêkerêne sade ne. Bi alîkariya pêrkîten (pêşgirên) lêkerçêker, ji lêkeran lêker têne çêkirin. Em van pêrkîten lêkerçêker jî dikarin di du beşan de vekolin:

**I** Ev pêrkîten lêkerçêker (ku hinek wan mîna daçekên lêkerçêker jî bi nav dikin), bi tena serê xwe ne xweyî tu wateyî ne. Tenê gava têne pêşiya lêkerê, dibin sedem ku wateyeke din ji lêkerê re çêbibe. Ên ku me ew selmandine an go peyîtandine ev in: *ber-, da-, der-, hil-, ra-, ro-, ve-, wer-*

Hema em yekser ji bo van, nimûneyan bidin:

ber + dan = berdan  
ber + anîn = beranîn

da + dan = dadan  
da + kirin = dakirin

der + anîn = deranîn  
der + xistin = derxistin

hil + dan = hildan  
hil + avêtîn = hilavêtîn

ra + dan = radan  
ra + çandin = raçandin  
ro + kirin = rokirin  
rû + niştin = rûniştin

ve + dan = vedan  
ve + xwarin = vexwarin

vê + ketin = vêketin  
vê + xistin = vêxistin

wer + kirin = werkîrin

wer + gerandin = wergerandin

Der barê van neh pêrkîten

lêkerçêker de me divê ku em çend gotinan li ser *hil-, ro- û wer-ê* bibêjin; **hil-** wekî **hel**, **ro-** wekî **rû** û **wer** jî wekî **wel** di nav gel de derdikevin pêşiya me. Ji xwe di zimanê me de dengê */e/ û /i/, /l/ û /r/, /o/ û /û/ bi hev diguhirin. Em di nivîsa xwe ya bi navê "Di kurmancî de guherîna dengan" de bi dörfirehî li ser vê mijarê rawestiyabûn, ku di hejmara 2. a Zendê de derketibû. Nimûne:*

**hilkirin helkirin**  
**rûniştin roniştin**  
**wergerandin welgerandin**

Der barê **ro-**, û **rû-** yê de pêwistî bi gotina çend peyvan heye. Di kurmancî de bi vê pêrkîta lêkerçêker ez heta niha rastî sê lêkeran hatime: rokirin, rûniştin û rûdan. İcar me divê ku em bênen ser pêrkî-

**Eger em baş bala**  
**xwe bidîne pirtükên li**  
**ser rêzimana kurdî yê**

*F. Huseyn Sağrıç,*  
*Celadet Bedirxan û*  
*Roger Lescot, Qanatê*  
*Kurdo, Mûrad Ciwan,*  
*Kemal Badilli ... û A.*  
**Bali em dê vê rewşê bi**  
**terbekî têr baş bibînin.**

**A rast, di destpêkê de**  
**ez fikirîm ku ez li ser**  
**gotin û raveyêñ wan**  
**en der barê lêkeran de**  
**xebatek lêkolînî bikim.**

**Lê ez tê fikirîm ku**  
**mijar dê pir berfireh**  
**bîbe û dê bîbe mîna**

**xebateke**  
**rexneyî ya li ser**  
**xebatêñ wan.**

têne xwe yên lêkerçêker ku me ew (*ro-, rû-*) eynî pêrkît pejirandine. Ji ber ku ev her du pêrkît, ji layê kok û rehê ve yek in. Di kirmancî (kirdkî, zazakî) de **rûniştina** me **roniştene**.

der barê *hil-*, û *hel-* de jî em vê daxuyaniyê bidin: Di kurmanciya xwarê (soranî) û di kirmancî de di şûna pêrkîta *hil-a* me de *hel* tê bikanîn. Nimûne:

<b>hilketin</b>	<b>helkewtin</b>
(bi kurmanciya xwarê)	
<b>hilkirin</b>	<b>helkerdene</b>
(bi kirmancî)	

Ez vê gavê nikarim der barê teşeyê wan ên kevn de zêde tiştan bibêjin. Li ser wan hinek raman bi min re çêbûne, lê niha têrî nakin. Ji lew re ez vê dabaşê zêde venakim.

Ez li ser çê-yê jî dixwazim çend gotinan derpêş bikim. Ew niha mîna pêrkîteke lêkerçêker derdikeve pêşiya me, lê ew di rastiya xwe de ne daçekek e. Çawa ku em dibêjin filan tişt çêbû hin ji me jî dibêjin *durist* bû, peyva çêbûn û duristbûn, an jî çekirin û duristkirin heman tişt e, hemwate ne (sînonîm in). Bi gotineke din çê û durist yek tişt e û bi serê xwe xwedî wate ne, lewma ew di hîmê xwe de ne pêrkîteke lêkerçêker e. Hema em dikarin wê (çê) mîna pêrkîteke lêkerçêker a awarte bijimêrin.

**II** Ev pêrkîten lêkerçêker ku em dê li ser wan rawestin, ew jî di hîmê xwe de ne da-

çek in. Lê bi qonaxa demê re wisa bûye ku li pêrkîtan da- geriyane û bi saya wan ji lê- karan lêker hatine pêkanîn.

Ew jî ev in: *jé-, lê-, pê-, tê-*  
Ev bi awayen *jék-, lêk-, pêk-, têk* jî têñ bikaranîn.

Ji bo van em çend lêkeran ji bo nimûne pêşkêş bikin:

jê + kirin = jê kirin  
lê + kirin = lê kirin  
pê + kirin = pê kirin  
tê + çûn = tê çûn

Lê ev pêrkît di rastiya xwe de cînavkên veşarî ne, ku te- nê kesê sêyemîn ên yeke- jimar dinimînin, ci mî û ci jî nîr. Nimûne:

*kiras ji wî/wê bike*  
*kiras jê bike*  
*avê li wî/wê bike*  
*avê lê bike*  
*dest bi wî/wê bike*  
*dest pê bike*  
*rûn di wî/wê diçe*  
*rûn tê diçe*

Weñki ji van nimûneyan jî dixuye, **jê** ji daçeka/ji/û ji cînavka kesê sêyemîn a yeke- jimar /wî/wê/yê; **lê** ji daçeka /li/ û ji cînavka kesê sêyemîn a yekejimar /wî/wê/yê; **pê** ji daçeka /bi/ û ji cînavka kesê sêyemîn a yekejimar/wî/wê/yê; **tê** ji daçeka /di/ û ji cînavka kesê sêyemîn a yekejimar /wî/wê/yê hatiye pê. Ev pêkhatin (an jî li gorî hin devokan ev pêhatin) ji ber bi ser hev de hatina daçek û cînavkan hatine çêbûn.

Me divê ku em li ser cînavkeke me ya din a veşarî jî

rawestin, ku tenê kesê sêye- mîn a yekejimar dinimîne, ci mî ci nîr. Ev cînavka me -ê ye û tê dawiya lêkerê. Nimû- ne: *Min nan dayê*

*Ez defterê didimê*  
*Ez çümê*

### 3) Lêkerêñ hevedudanî

Ev lêker ji navdêrek (an jî rengdêrek) û ji lêkerekê çê- dibin. Ji van lêkeran re lêke- rên alîkar jî tê gotin. Hin ji van lêkeran ev in: *kirin, bûn, dan, xwarin, ketin, xistin, girtin, man*

deyn + kirin = deyn kirin  
sor + kirin = sor kirin

teng + bûn = teng bûn  
bar + bûn = bar bûn

bang + dan = bang dan  
reng + dan = reng dan

sond + xwarin = sond xwarin  
gef + xwarin = gefxwarin

nexweş + ketin = nexweş ketin  
kêm + ketin = kêm ketin

masî + girtin = masî girtin  
kêm + girtin = kêm girtin

buha + xistin = buha xistin  
nexweş + xistin = nexweş xistin

dereng + man = dereng man  
rût + man = rût man

### 4) Lêkerêñ biwêjî

Lêkerêñ biwêjî ew lêker in ku bi hindikî ji sê hêmanan têne pê. Ev lêkerêñ biwêjî ji daçekek, ji cînavkeke kesin a yekejimara kesê sêyemîn an, ji cînavka "hev", an jî, ji navdêrekê (rengdêrekê) û ji lêkerekê -ev lêker dibe ku sa- de, çêkirî an jî hevedudanî

be- çêdibe. Nimûne:

*bi hev kirin*  
*bi wî sad bûn*

*ji hev çûn*  
*ji wî vekirin*  
*li hev dan*  
*li wê wergerandin*

*di hev werkirin*  
*di wê dan*  
*bi serî kirin*  
*bi pêş xistin*  
*ji çek kirin*  
*ji çav derketin*  
*li paş man*  
*li serî ketin*  
*di nav re çûn*  
*di dev re avêtin*

Di dawiyê de ez vê bibê- jim, heta ji me hat em neke- tin nav kitekitan (teferû- atan), bi awayekî serkî lê bê- yî ku mebesta me winda bi- be, me xwest em ji aliye bin- yadî ve lêkerêñ xwe bisenifi- nin. Em tiştekî din jî bibêjin, ku di warê têgînêñ (terîmêñ) rêziman de enflasyonek he- ye. Her kesê ku dest avetiye xebata ser ziman, li gorî xwe têgîn çêkirine. Ji ber vê yekê jî termînolojiyek tevlihev hatiye himatê. Mirov şaş di- mîne kîjan peyvê bi kar bîne.

Min bi xwe, heta ji min hat min têgînêñ Celadet Be- dirxan ên der barê rêziman de bi kar anîn. Ji ber ku min nexwest ez bi xwe jî di vî warî de bibim sedemê gere- mo û sergêjiyeke din. Jixwe têra xwe aloziyêñ me hene.

# KOÇBERIYA KURDAN Û EGERÊN WÊ

**AHMET KAYA**

(Werger: Memed Serhedî)

## Destpêk

Mirovahî ji destpêkê heta roja îroyîn herdem di nav liv û lebatê de ye. Ji ber egerên leşkerî, çandî, olî, ramyari, mercen erdnîgar û karîgeriya kîşwerê koçberiyeyeke herdemî rû daye. Belam bi pêşveçûna qapîtalîzmê re di qarakerê koçberiyê de guherînen mezin derketine himatê.

Koçberiya ked û sermayeyê bi qapîtalîzmê re mora xwe li dîroka mirovahiyê xistiye. Qapîtalîst ji layekî ve sermayeya xwe li jêderkêñ daringa xav, warêñ pazarê û keda erzan dinirxînin, ji layê din keda erzan dişînin cihêñ ku nîrxê wan lê ne û bi vî rengî dixebeitin. An jî bi pergal (sistema) a ku afirandine re kedê dişînin cih û warêñ ku wêberhênan (yatirim) lê zêde û gur e.

Netewebûna ku bi derketina qapîtalîzmê re hatiye pê, di heman demê de parvekirina deshilatdariya qapîtalîst an û li gorî vê dizaynkirina hêmanêñ aborî û gelhe (nûfus) yê ye. Ji bo vê jî di navbera mirovan de cudahiyêñ ku di radeya nijadperestiyê de ne hatine kirin û koçber-

kirin pêk hatine. Hema bêje komelkujî derketine holê.

Kurdan jî ji vê pêvajoyê para xwe standine. Ji layekî mafen xwe yên neteweyî bi dest nexistine û sermaye necivandine ji layê din ji koçberî û qirkirinê bê par nemaye.

## A-“DI SERDEMA KOMARA TIRK DE KOÇBERIYÊN GİRÎNG Û EGERÊN WAN”

Carinan, bandora egerên siyasî û olî giran bin jî egera

*Mirovahî ji destpêkê beta roja îroyîn herdem di nav liv û lebatê de ye. Ji ber egerên leşkerî, çandî, olî, ramyari, mercen erdnîgar û karîgeriya kîşwerê koberiyeyeke herdemî rûdaye. Belam bi pêşveçûna Qapîtalînmê re di qarakerê koçberiyê de guberînen mezin derketine himatê.*

bingehîn a tevgerên aborî ye. Rûdanêñ koçberiyê ji qonaxêñ gelek kevn dest pê kir. Lê bi destpêka bi pişekariyê re gurbûn û pirbûna gelheyê re, girîngtirîn bû. Ji ber egerên daxwaza ji pest û pêkutîyen civakî, olî û siyasî rîzgarbûnê an jî ji daxwazêñ xwe gihadina hin arman-can, ne tenê li welatê me li gelek deverên cîhanê bi rengekî gur koçberî derkete holê.

Koçberiya derveyî ya herî mezin a sedsala dawî piştî şerîn cîhanê yên yekemîn û diwemîn derketiye holê. Welatê me jî ji bandora van şerîn cîhanê para xwe standiye û ketiye ber pêlêñ koçberiyê. Di gel Komara Tirkiyê ya ku di navbera van rûden û qewmînêñ ku di pêvajoya şerê cîhanê yê yekemîn de derketine holê, hatiye avakirin, rewşa welatê me yê ku mêtîngeheke navneteweyî ye encamêñ girîng derxistine himatê. Ji van yek jî koçberî ye. Dema mirov li dîroka 70 salî ya Komarê dinêre xuya dibe ku koçberî li Kurdistanê di sê heyaman re bihuriye.

**Ya yekemîn:** Di çarçowejâ statikoya ku li welatê me



pişti şerê cihanê yê yekemîn hate pê de ( Bi peymana Lozanê re bû mêtîngeha Navneteweyî) di dema dageriya leşkeri de, pelçiqandina Serhlidanan û di encama wê de bi derxistina zagona iskanê re hate meşandin.

Ji bo ku rêber û ronakbîrên kurdan û gelê kurd ê welatparêz ji têkoşîna neteweyî qut bikin û wan di hundirê Tirkiyeyê de bîhelînin metodeke bi vî rengî hate şopandin. Gelê me yê ku di çarço-weya zagona îşkanê de hate koçberkirin, bi destê dewletê li gelek herêman hate belavkirin û bi cih kirin. Li Ege, Trakya, Marmara û bi taybetî jî li Anadola Navîn hate bi cih kirin. Dema li nexseya Tirkiyeyê tê nêrîn, xuya dibe ku di konevaniya bicihkiranê de gelê me bi taybetî li Anadola Navîn û ba-

jarêن Tirkiyeyê yê din tê bi cih kirin. Li bajarêن wekî Edene, Yozgat, Kayseriyê ku li ser tixûbê Tirkîye û Kurdistanê ne, konevaniyê neteweperest û nîjadperest têن meşandin û pêwendiyêن gelê me yê li Kurdistanê û yê koçber tê qutkirin. Dibin Serdem ku kurd li herdu aliyan jî bi neteweperestiya tirk re rû bi rû bimînin. Ger beşek ji gelê me yê koçber di pêvajoya demê re vegeiyabe welêt jî, beşê din li herêmên ku lê sirgün bûye maye û jiyana xwe li wir domandiye. Dîsa her çiqas beşek ji van heliyebe û nasnameya xwe windakiribe jî, beşê din li gor dab û nêrit û kevneşopiyêن kurdan jiyana xwe didomîne. Mirov dikare bibêje gelê me yê li van herêman bi rengekî çalak piştgiriya têkoşîna aza-diyê dike. Pêkan e ku di nav

gerîla de kurdên Koçhisarî, Karamanî, Konyayî û Kirşehirî bêne dîtin. Tirkiyeya ku di şerê cîhanê yê diwemîn de bi pêşveçûn û rûdanêñ aborî û siyasi yêñ cîhanê rasterê bi împeryalîzmê ve hate girêdan, kete nav guherîn û sazbûneke nû. Di vê serdemê de welatê me yê ku bi awayekî leşkerî hate dagirkirin û bindestkirin û di warê aborî û siyasî de kete bin nîrê dewletê, koçberiya bi meseta aboriyê bi xwe re anî. Ev pêvajoya ku di 1950'an de dest pê dike û di 1960-70 an de bi lez û bez dibe li welatê me heyama koçberiyê ya diwemîn tîne pê. Di vê demê de carinan egerên ramyarî xuya bin jî egerên aborî girantirîn in. Di serdema ku ji ber hêmanêñ aborî koçberî pêk hatiye de, koçberî li Deryaya Reş a ku zêde lê wêberhênan (yatirim) nebûye û welatê me yê ku ji bo mebesta mêtîngeriyê jêderkêñ wî jê derxin, wêberhênan pêk hatiye. Bo nimûne; Dema mirov li Stenbola ku ji layê aborî ve têr û tijî ye dinêre koçberiya kurdan li wir roj bi roj zêde dibe û di nav gelheya giştî de rêjeya kurdan bilind dibe. Mînak; Dema li "tabloya 1." tê nêrîn, xuya dibe ku di hejmartina gelheyê ya 1950'an de gelheya Stenbolê bi giştî mîlyonek 167 hezar e û ji vê hejmarê û ji vê hejmarê tenê ji sedî 5 ji gelheya welatê me

pêk tê. Ji vê heyama ku Koçberiyê nû dest pê kiriye heta-nî 1980'yi hêza ked, serma-ye û mêtî zêde bûye û ji sedî 12'yê gelheya Stenbolê ku 4 mûlyon 742 hezar e gelê me ye. Ev rêje derketiye ji sedî 13'ê gelheya ku di 1985'an de 5 mîlyon 843 hezare, ji sedî 15'ê gelheya ku di 1990'an de bi tevayî 7 mîlyon 309 hezar e. Yanê di hundirê gelheya Stenbolê ya ku her roj zêde dibe de rêjeya hejmara gelheya kurdan jî zêde dibe û koçberî bi lez di-be. Ji xeynî vê, hejmar rasti-yeke din jî eskere dikan ku koçberiya ji welatê me ji rê-jeya bilindbûna gelheya Stenbolê zêdetir e. Dema mirov li ser hûr dibe, xuya dibe ku koçberiya kurdan ne tenê li Stenbolê, li gelek bajarê din jî xwe dide der. Ev jî nîşan dide ku guncaneke (Hacim) mezin derdikeve holê. Dema li metropolên din jî tê mîzekirin istattistik diyar dikan ku di rêza koçberiyê de, rêjeya koçberiya kurdan ji ya Deryaya Reş zê-detir e. Bi bilindbûna şer re,

bi taybetî jî di 1990'an de ki-rinê dewletê wekî hemî istattistik, agahiyê derbarê Stenbolê jî serobin kirin.

Yek ji bajarê dûr ên ku herî zêde koçê didin stenbo-lê jî Qers e. Renginiyeke et-nîkî ya lihevhatî ya bajarê Serhedê, Qersê heye. Ev renginî ji kurd, tirkmen, eze-rî û terekemeyan pêk tê. Qersê demekê bi sewalxwedîkirin, bi hilberîna penêr û şîr pêşveçûn û stewîn (ol-gunlaşma) a xwe pêk anîbû. Belam di van 15 salêna dawîn de bi pêşveçûna teknolojiyê re di sewalxwedîkirinê de hilberîn kêm bûye. Di tevaya 70 salî de, di palûke (fabrika) yên ku vebûne de ji ber hin egeran hilberîn rawesti-yaye, lewre jî ji Qersê koçberiyê dest pê kiriye. Qersi-yen ku ji bo jiyaneye baş û çak bajarê xwe terk kirine, li metropolan belav bûne.

Gelê me li cihênu ku lê bû-ye penaber di jiyanê de leqa-yî gelek nakokiyen bûye û ji vê jî girîngtir bi pirsgirêka xwarin û tazîbûnê re, rû bi rû maye. Ji ber vê jî bi rîbazên li gorî xwe ketiye pey çare-

seriyan. Nemaze ji bo gelşa xwarinê û kincan çareser bi-ke di sekforê teng û giran de kar kiriye û ji bo bicihbû-nê jî berê xwe daye çêkirina kolît (Gecekondu) an. Kolît wiha têne nasandin: "Beyî girêdana mijade (mevzuat) û hikumên giştî yên ku kar û barêna avasazî û çêkirinê se-rerast dîkin, li ser zevî û er-dimên ku ne xwediyyê wan in, bêyî destûra xwediyyê wan çêkirina avahiyê bê-destûr" in. Di gel ku gelê me ji welatê xwe bi dek û dola-ben konevanî tê dûrxistin û ji bo xulamî û xizmetan tê bi-karanîn jî tu gelşen wî yên girîng û jêneveger nayêne çareserkirin û ji bo vê yekê hewldanek tune. Dîsa bi ser de jî em kolîtan encama, şer û çewsandinan nebînin û yên ku wan çêdîkin tawanbar bi-kin emê têkevine nav çewti û saftiyan.

Lê di serî de serokê Bele-diyeja bajarê mezin, İzmirê Burhan Özfatura û serok û birevebirêne gelek bajaran herdem kolîtan hildiweşînin û dixwazin kurdên ku ji ber şer revîne nekevin bajaran û rê li ber wan digirin. Bi tet-bîqên wekî vízeyê dixwazin hevkar û nokerên wan têke-vin bajaran lê yên ku wekî wan naponijin asteng bikin.

Dîsa ji bo ku gel di binê qontrola xwe de bigirin li-darxistina pêşnûme (Proje) yên wekî; "Pergalê Agahi-yan ên Bajaran" di rojevê de ne.

TABLO 1

Jidayîkbûn	1950	1980	1985	1990
-Stenbol	53	40	38	37
-Deryaya Reş	12	19	21	22
-Marmara	8	8	7	6
-Ege-Deryaya Spî	4	4	4	4
-Anadolu-Navîn	6	11	11	11
-Rojhilat û Başûrê Rojhilat	5	12	13	15
-Balqan	10	-	-	3
-Welatên Din	2	6	5	1

Çavkanî: DIE, Hejmar (Hezar)

Di gel van tiştan, mirov kolîtan bi navê Kurdistanê binavîne ne çewt e. Bi ser de jî mirovên ku li taxên kolît (gecekondu)an dijîn hema bêje ji heman bajar û herêmê ne. Kurdistan li aliyekî, mirov dikare rastî mirovên ji heman bajar û eşîra in were.

Bajar û metropol nikarin bersiva pêdiviyêن koçberiya bêhed bidin. Awayê hilberînê û kar û bar ên gundiyyêن ku dev ji ax û zeviyêن xwe berdidin û têne bajaran diguhere. Guncan û hêza ku bikaribe bersîva vê çalakiya hilberînê bide û derfeta dîtina kar bide, ne li bajarêن kurdan heye û ne jî metropol dikarin ve gelsê çareser bikin. Ev ê jî bi xwe re di warê aborî, çandî, cîvakî û siyasî de qêran û tengasiyan bîne. Li şûna mercen aborî yên ku hatine sazkinin çalakiyyêن ne rewa yên wekî dizi, şelandin û mafya serdest dibe. Dema mirov barûdoxa aboriya Tirkîye û Kurdistanê dide ber

hev hebûna cudahî û ciyawaziya berbiçav li ser jiyana civakî jî bandorê çêdike. Karkerêن ku ji welêt diçin û gelê me yê ku tê koçberkirin nîşanayeke girîng a ferqa aborî û civakî ya di navbera Tirkîye û Kurdistanê de ye. Lewre, kurd di nav jiyana civakî ya kolîtan û guhêن taxan de hatine hîştin û kakilêwan hatiye valakirin. Ji ber vê dîsa li gel pûçbûna kulturî, nakokî û pevcûnêن siyasî, çînî, neteweyî û olî jî dê derkevin holê û li şûna piştgirî û aşitîyê, ser û xirecirêن derkevin holê. Li welatê me, pêla koçberiyê ya sêyemîn bi pêşveçûn û xurtbûna têkoşîna azadiyê re derketiye holê.

Têkoşîna azadiyê geşbû, belavbû, bû gelêri û bi xwe re serhildan anîn û gihîşte radeya serxwebûna neteweyî; lê Komara Tirk bi rîbâzêن klasik rê li ber negirt û nebû asteng. Vê jî bi xwe re koçberî anî. Komara Tirk ji bo ku rê li ber têkoşînê bigire û

têkiliya gel bi gerîla re qut bike û gel biçewisîne, ji gemaro (ambargo) yê bigire hetanî valakirin û şewitandina gundan û tevkujiyan gelel rîbâzêن cur bi cur bi kar anîn û gel ji welêt dûrxist.

Di navbera vê koçberiyê û yên din de ciyawazî û cudahîyên girîng hene. Herdu koçberiyêن din di bin qontrol dewletê de pêk hatin. Bo nimûne; şerîn cîhanê yên ye kemîn û duyemîn ji bo dewletê keys û derfetê konjokturel anîn pê û dewletê ji vê fîrsendê sud wergirt, berê xwe arasteyî kurdan kir û gelê kurd li gorî daxwaz û armancen xwe koçber kir. Di pêla yekemîn ya koçê de gel bi mebestêن siyasî hate mişextîkirin û li cihêن kifş û di-

---

*Di navbera vê  
koçberiyê û yên din de  
ciyawazî û cudahîyê  
girîng hene. Herdu  
koçberiyêن din di bin  
qontrol dewletê de pêk  
hatin. Bo nimûne  
şerîn cîhanê yên  
ye kemîn û duyemîn ji  
bo dewletê keys û  
derfetê konjokturel  
anîn pê û dewletê ji vê  
fîrsendê sud wergirt,  
berê xwe arasteyî  
kurdan kir û gelê kurd  
li gorî daxwaz û  
armancen xwe  
koçber kir.*

---



yar hate îskankirin. Koçberiya duyemîn bi mebestê aborî derkete himate, ji bo xurtbûn û geşbûna pişkarî û sektora xizmetê, koçberiya çavkanî, sermaye, ked û mêmîjî hate rojevê. Lê belê di koça sêyemîn de mebest û konenvaniyeke dewletê ya diyar nîn e. Berevajî vê di salên 1980'an de li gorî pêşveçûnên konjokturel ên cîhanê, bi pawan (tekel) ên navneteweyî re kete hevkariyê û sermaye xwe ya herêmî kire navliv û lebatê. Bi projeyên wekî GAPê berê xwe arasteyî Kurdistanê kir û içar ne bi riya koçberkirinê, berevajî vê bi riya politikayê ku di cih de mêtîngîriyê pêk tînin ke te nav hewldanê.

Belam, pêşveçûna tekoşîna rizgariyê meşandina vê politikayê dijwartir kir û carâ pêşîn însîyatîfa wê ya ku li ser welatê me bi kar tîne asteng kir. Di vê serdema ku bi salên 1980'an re dest pê kir de, di mijara koçberkirinê de israra dewletê û li dijî vê di bin pêşengiya PKK ê de berxwedana gelê kurd pêk hat û ev pêvajo bi vî rengî bîhûrî. Di koçberiya ku pêk tê de israra dewletê û ji bo ku dûmahîka wê were kîrinêñ leşkerî û siyasî diyar in.

Dewlet demekê ji bo ku koçberiyê qontrol bike kete hewldanê û ji bo vê hin politika meşandin. Bi hineta "Projeya Serhildana Rojhilat

û Başûrê Rojhilat" bi idîaya-pêkanîna vegera gundan, dewletê xwest ku gel di bin qontrola xwe de, di gundêñ navendî de bi cih bike. Hate çesipandin ku mirovên ji gund û mezrayêñ xwe koç kirine li gel gelşen aborî di mijara ewlehiyê de jî ji bo desthilatdariya dewletê metîrsî û tehdîte derdixin holê. Bi idîaya kesen ku ji çolteran hatine bajaran ji bo rêexistînen nehêni potansiyela xebatê ne û ger ev koçberî bido me wê ji bo ewlehiyê pirsgirêkan derxin, ketin nava liv û lebatê. Di xebateke derbarê vegera gundan de hate kirinde ji bo ku tiştekî wekî gundêñ navendî (toplu olan) ku îsraîliyan bi navê kîbütz li

*Di vê serdemaku bi  
salên 1980'an re dest  
pê kir de, di mijara  
koçberkirinê de israra  
dewletê û li dijî vê di  
bin pêşengiya PKK ê de  
berxwedana gelê kurd  
pêk hat û ev pêvajo bi  
vî rengîbîhûrî. Di  
koçberiya ku pêk tê de  
israra dewletê û ji bo  
ku dûmahîka wê were  
kîrinêñ leşkerî û siyasî  
diyâr in.*

Filistînê tetbîq kiribû were kirin ketin xebat û lebatê. Ji bo vê ji fona îskanê ya Ewrûpa alîkarî hate xwestin. Lê ji ber ku yarmetî nestandin û gel eleqe nişanî vê kirinê nedâ û venegeriya ev proje xitîmî û derfeta jiyanê nedît. Ji bo kesen ku dê vegejîyana gundan pêşî dê lêpirsîna ewlehiyê bîhata kirin, nasnameyên nû bîhata dayîn û dê bîbûna xwedî statuyeke cuda.

Dema ku mirov li peywir û tevgera wezîrê dewletê yê bi eslê xwe kurd e û ji mafêñ mirov an berpirs e ku beşdarî daxuyandina vê projeyê bûye û peywira wî veşartina qırqiran e Necmeddin Cevheri, wezîrê karê hundirîn Nahit Menteşe, Serkaniya Giştî û Fermandariya Giştî ya Cendermeyan, Şêwirmendiya Gencîneyê, Waliyê OHALê Ünal Erkan, Waliyêñ ku li Herêma Awarte û Hesas peywirdar in ên 22 bajaran mêze dike, diyar dibe tiştên ku diponijin bi tevayî ji bo mebesta şer e. Lê derketiye holê ku bi ser neketîne, tiştên ku ceribendine encam û inîsyatîfa tevgera azadiyê diyar e. Projeya vegera gundan û gundêñ navendî ya hikumetên Refah-yol û Anasol-D yê tenê gotin e, ne pêkan e ku derfeta jiyanê bibîne.

Dema ji vê hêlê ve bê nêrîn pêkan e ku mirov koça kurdan bike du beşan.

✓ Ya yekemîn: Koçberiya

ku di bin kontrola Komara Tirk de ku bi mebesta ji hêla aborî û konevariyyê ve sazkirina mêtîngiriyê pêk hatiye.

✓ **Ya duyemîn:** Koçberiya ku di encama li dijî mêtîn geriyê berxwedan kurdan de derketiye holê.

Di herdu rewşan de jî, ali-yê ku bûye egera koçberiyê dewlet e. Lê di gel vê yekê jî di navbera herduyan de hîn ciyanwazî hene. Koça dawî:

✓ **Ya yekemîn:** Koçberiya ku bi daxwaza dewletê pêk hatiye, nîne.

✓ **Ya diwemîn:** Nikaribûye girseya ku bi darê zorê koçber kiriye îskan bike.

✓ **Ya sêyemîn:** Polîtîkaya koçê saz nekiriye: Tenê gund valakirine, lê cihê ku gelê bi cih bibe diyar nekiriye

✓ **Ya çaremîn:** Di çarço-weya polîtîkaya koçberiyê ku hewl daye ku pişt re bi awayekî destkarî (mûdahale) saz bike de xwestiye ku projevên wekî “çewlîkên yekbûyi”, “gundêñ navendî”, “vîzeya ketina metropolan” bixe jiyanê. Lê ev yek pêk nehatiye û bi ser neketiye.

Di encama vê de, gelê ku koçî bajarêñ Kurdan û metropolan kiriye, neketiye bin qontrolê. Gel ji welatê xwe were dûrxistin û koçberkirin jî ìnîsîyatîf dîsa di destê têkoşîna azadîyê de ye. Ji ber ku:

✓ **Ya yekemîn:** Gundiyê ku li gund bi gerîla re pêwendiyê de bûye û pişt re bi çewsandin û zora dewletê re

rû bi rû maye politize bûye. Cihêñ lê bi cih bûye jî ji bo dewletê rewşeke dijber derxistîyiye holê.

✓ **Ya dîwemîn:** Bajarêñ Kurdan di Kurdevariyyê de kelijîne û bûne eger ku polîtîkayê pişaftinê serobin bibin.

✓ **Ya sêyemîn:** Bi vê koçê re girseya karmandan û sermayeyê ya ku hevkarê sistêmê ye koçber bûye.

✓ **Ya çaremîn:** Li bajareñ Kurdan daxwazê neteweyî û çînî zelal bûne û gel bi tevayî politize bûye.

✓ **Ya pêncemîn:** Gelê ku

beriya dawî baştir zelal bibe divê em kirin û rûdanêñ giştî yên ku derketine holê mêze bikin:

### B- KOÇBERIYA KU BI 1980'AN RE DEST PÊ KIR Ü EGERÊN WÊ

Li Kurdistanê yek ji bajareñ ku herî zêde bûyerên şer û koçberiyê lê diqewimin Amed e. Di gel ku eger û encamên wê têne zanîn jî rîjeya koçê nagihêje radeya ku tê texmînkirin. Ji ber kirinêñ dewletê bi xebatê zanyarî jî eger û encaman teqez dernakevin holê. Lêkolînêñ ku têne kirin jî kêm in û herême-

*Lî Kurdistanê yek jî bajarêñ ku herî zêde bûyerên şer û koçberiyê lê diqewimin Diyarbekir e. Di gel ku eger û encamên wê têne zanîn jî rîjeya koçê nagihêje radeya ku tê texmîn kirin. Ji ber kirinêñ dewletê bi xebatê zanyarî jî eger û encaman teqez dernakevin holê.*

koçî metropolan bû, di warêñ legal de birêkxistin bû û li dijî pergalê wekî hêzeke konevanî ya fîlî radiweste.

✓ **Ya şeşemîn:** Ev birêkxistinbûn li ser bingeha berjewandiyê neteweya Kurd û li ser bingeha daxwaza hilweşandina statikoyê di daxwazê aştiyê de bi israr e. Her roj ji hêla kedkarêñ li cîhanê û Tirkîyeyê ve piştgiriyê distîne û alîkariyyê qezenc dike. Ewrûpa jî di nav metropolan de ye.

Ji bo ku taybetiya koç-

ke bêtir teng dihewînin. Ji xeyînî vê, ji ber mercen şer ku rewşeke awarte derxistîye holê, ne pêkan e ku lêkolînêke azad were kirin û xebatê ku encameke mîsoger pêk bînin, derkevin holê. Di gel vê jî mesajên girîng dide.

Hetanî 1990'î Diyarbekir bajarekî ku koç dida bû. Lê li gorî lêkolîn û hejmartînê TMMOB'ê li gorî encama hejmartina gelheyê ya 1990'î zêdebûna rîjeya gelheyê ya salane ji % 4,82 ye.

Ger li gorî vê rêjeyê bê hejmartin ji bo 1995'an diviyabû gelhe (nûfus) bigihîsta 494.880 kesî. Lê dema encama lêkolinan tê mêze kirin ku 327.957 kesê "koma gelheyê ya rewşa awarte" ku rêjeya wê ji % 66,27 e ku serkanîya wê şer e, lê tê zêde kirin gelheyeyeke ku ji 822.837 kesan pêk tê derdi keve holê.

Li gorî vê hejmartinê, gelheya navenda Diyarbekirê ya ku li gorî hejmartina 1990'ı 381.144 kes dixuyê, di 1996'an de digihêje 822.837 kesî. Her wiha diyar dibe ku di navbera salên 1990-1996'an de gelheya navenda Diyarbekirê ji %

116 zêde dibe. Anglo du qatî jî bêhtir dibe. Li gel vê hejmartinê, kesen ku dibêjin gelheya Diyarbekirê Mîlyon û nîveke jî hene.

Tê diyar kirin ku egera koçberiya mecbûrî ya yeke mîn ji % 58 valakirina gundan e. Ya diwemîn ji % 43,63 jî bûyerên ku di encama şer de derdikevin in. Di anketê de şewitandina gundan û şer her çiqas cuda bêne nîşandayîn jî diyar e ku ev herdu bûyer jî ji heman encamê tê. Di dawiyê de bi şer re ci Gund hatibin şewitandin ci nehatibin şewitandin gel ji bêgaviyê koç kiriye. Ev çewti di iştatistîkan de jî xuya dibe. Bo nimûne; gundênu ku hatine valakirin bi gelempêri di iştatistîkan de têne diyar kirin. Lê belê ji aliyê dewletê ve rasterast nîne be jî ji ber gefan, dîrûniyan şer û zîhabûna jêderkêna aborî jî hejmara kesen ku gundênu xwe terk kirine jî pir in.

Beriya 1990'ı egerêne koçê guherîneke bi lez û bez nîşan daye. Koçberî beriya 1990 iji ber tunebûna axê, destengiyêna aborî û hwd. pêk hatiye. Pişti 1990'ı mirrovênu ku di rewşa rev û bezê û tengasiya parastina canê xwe de mabûn ji ber egerêne wekî şewitandina gundan" û "bûyerên li herêmê" ji bêgaviyê cih û warên xwe terk kirin. Bi awayekî din mirov dikarê bibêje ku ji % 73,7'ê xaniyêne koç Diyarbekirê kirine ji bêgaviyê koç kirine.

xaniyêne koç Diyarbekirê kirene ji bêgaviyê koç kirine.

(83 malbatênu ku pişti 1990'ı koç kirine bi iştîma leke mezin ji ber heman egeran koç kirine, lê ji ber ku egeren wan nehatine çesipandin li derveyî nirxandinê mane) Bi ser de jî ev hejmar di encama bûyerên ku di navbera salên 1990-1996'an de rûdane derketine himatê. Lê beriya 1990'ı ji ber şer koçê ber bi Diyarbekirê dest pê kiribû.

Sekreterê Giştî yê Odeya Bijîşkên Diyarbekirê Nejdet İpekyûz diyar kir ku ev bûyerên ku li herêmê diqewimin ji koçberiyê bêtir tehcîr e. Bajar û navçeyên ku berê koç didan, niha koçê distînîn. Ev dibe sedema teqîna koçê. Ev koçberî ne ji aliyê aborî ve başbûna bajaran ve ne jî bi bedewbûna wan ve têkildar e. Ü li herêmê di demeke kin de zêdebûna gelheyê bi tevayî bi rengeki bêplan û ji derveyî vîna mirrovan pêk hatiye. Dema mirrov ji her aliyî ve dîna xwe bidê, çesipandina tehcîrê bêtir li cihguherandinê vê dema dawî tê.

Tê texmînkinin ku di navbera salên 1993-95'an de 4 hezar gund hatine valakirin. Necdet İpekyûz di lêkolîneke xwe ya bi navê "Li Başûrê Rojhîlat Gengeşiyê Koçberiya Hundîrîn û Layê Ten durustiyê" de li ser egerêne sereke yên valakirin ev ce-

sipandin kirine:

✓ Gund bêparastin mane, gundiyan cerdevanî nepejirandine an jî li gorî idîayan alîkarî dane PKK'ê

✓ Tirsa di navbera gundên cerdevanan de mayînê.

✓ Mérkujiyên kiryar nedîyar, bûyerên revandinê, kuştinên bêdarizandin.

✓ Bi awayê gefxwarinê pere berhevkirina kesên ne dîiyar û herdem hebûna ope rasyonên leşkerî

✓ Tirsa hingaftin, girtin û binçavkirinê.

✓ Ji ber qedexebûnê bika rmeanîna zozanan.

✓ Ji ber tunebûna ewlehiya can, tunebûna xizmetên wekî perwerde, tendurustî , rê û hwd.

✓ Bi idîaya ku dê ji PKK'ê re here, gemaro (ambargo) ya xwarinê

Ji ber egerên wekî; di warê çandinî û sewalxwedîkirinê de kêmbûna hilberînê, bi vê re xizanbûn û destengiya aborî, pest û çewsandinên dewletê û cerdevanan, mirov şevekê gincir û palazên xwe hildidin û bi zarok û zêcên xwe ve derdikevin devê riyan.

Piştî guleya pêşîn a ku di 1984' an de teqîya, koçberî ji ber hêmanên leşkerî û siyasî bi lez û beztir bû. Bi taybetî bi rengekî bêteşe (aşiri) ji ber ku gundi ji cih û warêن xwe hatin dûr xistin ber bi bajaran herikîn leztir bûye. Ji van gundiyan ên ku

zarokên wan li metropolan ji xwe re kar dîtine, ên ku rewşa wan a aborê baş e û jiyanâ metropolan ecibandine û jiyanâ li wir nas kirine koçberî metropolan bûne.

Lê yên ku rewşa wan a aborî nebaş e, ji derveyî vîna xwe koç kirine, yên ku wekî jiyanâ gundan nîn be jî jiyanâke nêzîkî jiyanâ gundên xwe dixwazin, debara xwe bi çandinî û sewalxwedîkirinê dikin û yên ku bi bazirganiya sewalan re têkildar in û esnafêن biçuk ji bêgavî koçberî bajar û navçeyên derdor bûn. Koçberbûna li bajaran

bandora xwe herî zêde li ser erd û zeviyan kiriye. Bajariyên ku erd û zeviyên wan hene bi bilindûnabihayê erd û malan re mal û erdên xwe difiroşin, ji vê rewşê sûd werdigirin û derdikevin derveyî bajaran. Ev rewş ji bo bajariyê ku berê nikaribû erdê xwe bifiroş, geleki xweş e. Jê re qezenceke zêrin e. Her wiha kurdên koçber ci hîn ku kesên giştî bi eslê xwe tîrk in ku ji ber paşvemayîna bajaran valakirine ti jî dikin. Ji xêynî vê ji ber ku di encama koçê de hevkêsiya bajaran xerab dibe, hêza aborî ya bajariyan qels dibe û di warê pişekarî û bazirganiyê de hilberîn kêm dibe, bajarî berê xwe didin metropolan. Dîsa girseyeke ku di dema ser de zengîn bûye jî derketi holê.

*Di erdnigariya  
Kurdan a ku di nava  
liv û lebateke mezin de  
ye de; koçberî ji gund  
ber bi bajêr, ji gund  
ber bi metropolan û ji  
bajaran ber bi  
metropolan diberike.*

*Lê di hejmarên  
îstatistikian de layê  
koçberiyê leza wê û  
taybetiyênen wê yên din  
xuya nabin. Ev jî ji bo  
ku dewlet guncan û  
rastîya şer bi taybetî ji  
gelê Kurd ji raya ya  
Tîrk û cîhanê veşêre  
astengeke zaneyê ye.*

Di erdnigariya Kurdan a ku di nava liv û lebateke mezin de ye de; koçberî ji gund ber bi bajêr, ji gund ber bi metropolan û ji bajaran ber bi metropolan diherike. Lê di hejmarên îstatistikian de layê koçberiyê, leza wê û taybetiyênen wê yên din xuya nabin. Ev jî ji bo ku dewlet guncan û rastîya şer bi taybetî ji gelê kurd, ji raya giştî ya tîrk û cîhanê veşêre astengeke zaneyî ye. Lêkolînên derbarê vê babetê de asteng dike. Kesên koçber bûne ji ber ku qeydên xwe hilnadın cihen ku lê koçber in, di vê mijarê de hejmarên fermî

yên teqez tune ne. Lewre jî sedhezaran mirov wekî gelheya winda tê helsengandin. Di dawiyê de ji ber ku xebateke rast û bi rêk û pêk nehatiye kirin, lêkolîn û lêgerînê ku têne kirin jî li hev nayêñ û encameke hevbeş dernakeve holê. Hejmarañ rasteqînî herçiqas ji hev cuda bin jî dikare bê gotin ku derbarê cihêñ jê koçberî pêkhatiye û cihêñ lê koçberî pêkhatiye de hin xalêñ hevbeş bi destxistine.

Derbarê guncana koçê de, oode, sendîka, yekîtî, saziyêñ çapemeniyê û saziyêñ dewletê bi awayekî domdar xebatine cur bi cur kirine. Di vê mijarê de li gor agahiyêñ istattîkî yên ku di tîrmeha 1995 an de hatine amade kirin bi giştî 988 gund û 1976 mezra hatine valakirin.

**Li gorî hejmarañ fermî yên dewletê yên ku di tîrmeha 1995 an de daye, hejmara gund û mezrayêñ ku hatine valakirin.**

TABLO 2

Bajar	Hejmara gundêñ ku hatine valakirin	Hejmara mezrayêñ ku hatine valakirin hejmara malbatan	Beri valakirinê hejmara malbatan	Mêjera gelheyê ya beri valakirinê
Elîh	37	54	1997	14.819
Cevlik	150	194	8508	52.332
Bedlîs	76	95	2854	22.471
Amed	115	196	9153	52.843
Mazra	8	6	561	3.672
Cülcünerg	38	93	2738	21.713
Mêrdîn	184	58	7025	43.528
Mus	30	65	2336	7.280
Seri	86	82	496	33.633
Sînêx	96	110	7668	45.184
Dêrsim	154	657	6336	28.836
Van	8	64	1141	8.843
Bi gîstî	988	1676	56275	345.154

Ev gund û mezra berî ku bêne valakirin 55 hezar xane û bi tevayî 345 hezar 154 kes bûn. Li gorî van istattîkî fermî herî zêde, gund û mezrayêñ Mêrdîn, Dêrsim, Çewlik, Amed, Bedlîs û Şernexê hatine valakirin. Lê tê zanîn ku armanca van lêkolînê ku têne daxuyandin agahiyêñ kêm ên ji bo veşartina rastiya şer in. Di demêñ cuda de berpirsêñ devletê an jî mebûs qala valakirina ji 2500 î bêtir gundan dikin an jî dibêjin ku gelek gund hatine valakirin. Lê ev jî di binê hejmarañ rast de ne. Dîsa lêkolînê ku sazî û dezgehêñ sîvîl û rêxistinêñ girseyî yên demokratik dikin encamêñ cuda didin. Ji bili vê dema mirov li Kurdistanê digere û an jî li rewşa bajar û metropolan mêze dike û çavdêri-

yên biçûk dike baş diyar di-be ku ev hejmar gelekî zêde ye.

Lê belê ji ber mercen şer ên iroyîn, rewşa gund û mezrayêñ ku hatine valakirin, gelheyêñ girseya ku koçber bûye, dîsa dewlet û birêve-beriya wê ya herî bilind Serkaniya Giştî bi awayekî baş û bi rêk û pêk dizane. Lê ji ber ku aliyekî şer e, vê yekê bi awayekî ku ji mebestêñ wê yên leşkerî û stratejîk re xizmet bike, bi kar tîne.

**Mînak:** Di Rezbera 1994 an de li herêma Dêrsimê ji gundêñ ku hatine şewitandin û valakirin 20 malbat li Xozatê ji bêgavî di saloneke dawetê de bi cih bûbûn û 200 malbat jî koçberî Elezîz, Stenbol, İzmir û Mêrsînê bûbûn. Wezîrê wê demê Sinan Yerlikaya dadixuyand ku,

hetanî wê rojê 250-300 gund hatine valakirin. Li gorî Yerlikaya, şekir û bacanê sor jî yek bi yek didine mirovêñ ku di konan de di nav tazîbûn û birçibûnê de dijîn. Dîsa pişt re di gel ku tê zanîn ev herêm jî di nav de gelek gund hatine

şewitandin û valakirin û hejmar zêdetir bûye jî, dewletê hetanî 1995 an 988 gund valakirine. Ev jî ji bo nîşandayîna helwesta dewletê girîng e.

Saziyeke ku derbarê koç-

### **Li gorî Kovara Aksiyonê istatistikâ derbarê ji ber egerên şer li ku çiqas koçberî pêk hatiye de**

Tablo 3

Amed	750 bin
Êlih (Batman)	200 bin
Mardin (Qoser)	220 bin
Meletî	20 bin
Dilük (Enteb)	350 bin
Van	300 bin
Ruha	400 bin
Hatay (İskenderun)	15 bin
Edene	1 milyon
Mersin	700 bin
Antalya	120 bin
Muğla (Fetiye)	20 bin
İzmir	200 bin
Manisa	50 bin
Stenbol	40 bin
Cûlemêrg	40 bin
Cewlik	45 bin
Agirî	20 bin
Evrûpa	

Çavkani: Kovara Aksiyon 3-9 Pusper 1995

beriyê de lêkolînê dike jî Aksiyona ku koma medyayê ya ku rojnameya Zamanê jî di nav de ye derdixe ye. Kovara Aksiyonê derbarê rengê lêkolînê, çavkaniyan û ji kê sûd wergirtine de agahiyan nade. Lê di navbera hejmaren wê û hejmarênu ku dewletê dane de gelek cudahî û ciyawazî hene. Li gorî danêr (verî) ên dewletê mêjera giştî ya mirovînu ku koçber bûne li dora 350 hezar kesî ye. Lê

li gorî kovara Aksiyonê ji xêynî Stenbolê girseyek ku ji 4 mîlyon 490 hezar kesî pêk tê koçber bûye. Ger koçberen li Stenbolê jî li vê hejmarê bêne zêdekirin hejmarê gelekî bilind bibe. Lê dema li van hejmarañ tê mîze kirin, rastiya wan bi rengekî baş nayê zanîn. Aksiyona ku kovareke vê saziya medyayê ye ya ku jêderka nûçeyên wê MÎT'ê, dema van hejmarañ dide PKK'ê wekî sedema bingehîn ya koçberiyê nîşan dide û li gorî xwe hewl dide ku ji ber terora PKK'ê kam-baxiyeke çawa derketiye holle nîşan bide. Bo nimûne; Dewlet di gel ku hemî saziyên xwe bi kar tîne, bi împeryalîzmê re hevkariyê dike û senaryoyan çêdiike jî idîayênen xwe nikare bipeyitîne, lê kovara Aksiyonê tiştên ku dewlet nikare bipeyitîne wekî ku hene nîşan dide. Bi vê re jî li gorî xwe senaryoyinan hildiberîne û wiha dibêje: "Zarokên li guhêñ taxên koçberan jî dizanin ku PKK van mirovan bi Evrûpayê re di dan û standinêñ narkotikê de, birin û anîna mirovan de û di her karêñ xwe yên kirêt de bi kar tîne". Bi van idîayênen bêbingeh û pûç hin senaryoyan hildiberîne û dixwaze ku zordarî û çewsandi-nêñ dewletê yên li ser Tevgera Azadiyê û gelê kurd veşê-re û jî bo ku girseya xwe bi-xapîne nûçeyen bi vî rengî

pêşkêş dike.

Wekî ku tê zanîn ev hel-west û nêziktêdayîn ne tenê ya van e. Çapemeniya tirk dema egerên koçberiyê vedi-kole bi giştî bi "teror" û "hinceta ewlehiya dewletê" şirove dike û derbasî encamê dibe. Bi zimanekî sivik di ser hinceta ewlehiya dewletê re derbas di-be û mijara terorê tenê tê bi nav kirin.

Yanê qest dikin ku PKK'ê gundek şewitandiye an jî bûye egera koçberbûna cih û warekî lê vê bi rengekî zelal nikarin nîşan bidin. Lê digel ku di koçberiyê de hêmana herî diyar dewlet e jî bi rengekî şelu di ser dewletê re derbas dîbin.

### **Li gorî lêkolîna ODTÜ' yê di sala 1995 an de cihêñ ku herî zêde jê koçberî pêk hatiye û rîjeya koçberiyê .**

Tablo 4

Dersim	135 bin
Qers	81 bin
Erzerom	66 bin
Gümüşhane	57 bin
Sêwaz	56 bin
Agirî	55 bin
Artvin	54 bin
Mûş	52 bin
Cewlik	46 bin
Giresun	45 bin

Di rapora bi navê Tevgerêñ Gelheyê yên Herêma GAP'ê ku pisporêñ beşa ci-vaknasiyê ya ODTÜ'yê amade kirine de li gorî tablo-ya. ku rewşa rîzkirina baja-

rêñ di rêza yekemîn de cih digirin de herî zêde Dîlûk, ji %30.4, koçê distîne. Pişti Dîlûkê, Semsûr, Ruha, Diyarbekir û Mêrdîn têñ. Bajarêñ GAP'ê yên ku koçê didin herêma Edene-Mêrsînê bi rêzê ji % 42 Riha, ji % 25,29 Mêrdîn, ji %24.4 Amed in û yên ku herî kêm koçê didin Semsûr û Dîlûk in. Îzmir koça herî bilind ji 71.9 ji Amedê, Ji %25 ji Mêrdînê distîne. Stenbol jî ji Mêrdînê ji %63,9 û ji Diyarbekirê ji % 25 distîne.

Li gorî raporê Edene û Mêrsînen ku herî zêde koçê distînin ji ber ku di warê erdnîgarî de nezik e û 50 sal e bi riya koçberiya demsalî tê nasîn, ji bo mîrovêñ herêmê wekî mebesta sereke ya koçberiya mayînde ye.

Li gorî vê lêkolînê, li gorî rîjeya gelheya ku ji bajarêñ koçê didin, koçber bûne Dêrsim ji hezarî 135' i ve wekî bajarê ku herî zêde koçê dide, dixuyê, Qers ji hezarî 82'an ve di rêza duyemîn de ye. Lê rîjeya koçê ya ku li van deran dixuyê ne di pêvajoya berî pêk hatiye de dixuyê. Ne di pêvajoya şer de, di pêvajoya ku ji ber egerên aboriyê koçberî pêk hatiye de dixuyê. Ji ber egerên şer tevgera koçberiyê bêtir li herêmê Kurdistanê yên navîn derketiye holê. Di gel ku Diyarbekir, Elîh, Wan, Bedlîs û Şernex û bajarêñ wekî wan di bin bandora koçberiyê de

mane jî ev di ïstatîstîkêñ ODTÜ'yê de wekî ku diviyêñ, naxuyêñ. Di van ïstatîstîkan de bajarêñ bakurê Kur-

yarbekir Wan, Mêrsîn, Edeñe, Antalya, Stenbol bêtir koçberî standine û her wiha divê rîzkirin cuda bûya

*Li gorî raporê Adana û Mersîna ku herî zêde koçê distîne ji ber ku di warê erdnîgarî de nezikê û 50 sale bi riya koçberiya demsalî tê nasîn, ji bo mîrovêñ herêmê wekî mebesta sereke ya koçberiya mayînde ye.*

distanê û Deryaya Reş di rêza koçberiyê ya yekemîn de ne. Ev ji diyar dike ku ev danner (verî) ên serdema ku ji ber egerên aborî koçberî gure ne.

Li gorî vê lêkolîna ODTÜ'yê bajarêñ ku herî pir koçberiyê distînin bajarêñ metropol ên wekî Kocaeli, Stenbol, Bursa, Îzmir û hwd. in. Lê bi pey encamên heybeş ên ku di dema şer de hatine veşartin û ên wekî Di-

**Li gorî lêkolînêñ ODTÜ' yê bajarêñ ku di 1995'an de herî zêde koçberî stendine û rîjeya koçberiyê.**

TABLO 5

Kocaeli	135 bin
Stenbol	81 bin
Mêrsîn (İçel)	66 bin
Bursa	57 bin
Îzmir	56 bin
Antalya	55 bin
Eskisehir	54 bin
Edene	52 bin
Aydîn	46 bin
Enqere	45 bin

Derbarê koçberî û koçberînê de çesipandan Sekterê Giştî yê Komeleya Ma-fêñ Mirovan Hüsnü Öndül: "Li gorî danêren İHD'ê di 1993'an de 874 gund hatine valakirin. Ev hejmar, bi pey danêren Wazera Karê Hundirîn di heman salê de 871 e. Konevaniya valakirina gundan di sala 1994'an de jî hante meşandin. Bi pey daxuyandina Wezareta Karê Hundirîn di 1994'an de 1244 gund hatin valakirin. Ji bo ku çapemeniyê daxuyand ku tevaya gundêñ ku hatine valakirin 2115 ne, hejmarêñ ku ji bo sala 1993'an dabûn jê derxistin. Di sala 1994'an de 1500 gund hatine valakirin. Dema ku danêren sala 1993 an lê tê zêdekirin, hejmara 2374 derdikeve holê. Bi 172 gundêñ ku di 9 mehîn pêşîn ên 1995'an hatine valakirin re hejmara gundêñ hatine valakirin digihê 2546 an."

Li gorî Öndül ev yek di hundirê planekê de pêk tê. Ji vê planê raya giştî haydar nîn e. Mirovên ku li ser herê-

### C-HERÊMÎN KU KOÇBERIYÊ DISTÎNIN Û GELŞÊN WAN

Li cihêن wekî Amed, Elîh, Edene, Mêrsin, Antalya û hwd. dîmena giştî ya ta-xên koçberan wiha ye: Wekî Amedê bi lûleyan av hatiye kuçeyên taxên nû, di saetên diyar ên ku av diherike de di navbera jinan de pevcûn û xire cir pêk tê. Qanalizasyon bi gelempêrî tune. Li dû hev elektrîk tê birîn, ji ber vê jî praniya amûrên elektrîkê xirabe ne. Dibistan û xwendin nayê bîra tu kesî, ji xwe kesen ku dixwazin bixwînin jî tune ne. Rê teng in û di navheriyê de ne.

Wan, jî ber ku nêzîki Colemêrgê ye, kete ber pê-lên koçberiyê yên ne asayı. Ji ber valakirina gundan piraniya kesen ku koçberî vî bajarî dîbin, li vir bi cih dîbin. Beşek ji wan jî koçberî bajarên din dîbin. Bo nimûne: Hezar 200 kesen ku ji Uzundereya Çukurcayê koç-

ber bûn li Wanê bi cih bûn. Koçberênu ku li pênc cihêن cuda, di mercêñ gelek xerab de hatin îskankirin, tenê bi alîkariya mirovan debara xwe dikin. Di nav wan de dem bi dem nexweşînên perok (salgin) derdikevin; derbarê diwaroja wan de tu hêvî tune ne. Uzundereyiyê ku berê cerdevan bûn ji ber ku dewletê berê xwe li wan guherî, bêçare man lewre jî ji bêgavî koçber bûn. Beşek ji wan li kampüsa zanîngeha Yüzüncü Yılê di holikên prefabrik de hatin bi cih kirin û beşa dîn jî li taxên Edremit, Kale, Şerefiye û Akköprüyê hatin belav kirin.

Kesen ku koçberî Ede-ne, Mêrsin û Egeyê dîbin bi giranî di baxçe û zeviyan de kar dikin. Di rojê de 16 saet kar dikin, li gorîbihayê 1995'an 150 hezar TL distînин. Ev mehaneyeke zor hindik e. Li metropolan kesen karêñ paqijiyê dikin jî hene. Hejmara kesen ku vî karî di-

meke diyar dijîn û ji bêgavî dê herêma xwe an jî gundêñ xwe vala bikin jî ji vê planê bêagah in. Mirovên ku dê gundêñ wan werin valakirin, yên ku li devereke diyar dijîn in û binyada wan a etnîkî diyar e. Valakirina gundan di heman demê de bi polîtîkayeke înkârê re tê meşandin.

Dema hejmara salêñ 1995, 1996 û 1997'an li hejmara 1994'an tê zêde kirin hejmara gundêñ valakirî derdikeve ser 4 hezarî. Ji xêynî vê bi gurbûna tetbiq-kirina gundêñ yekbûyî û gundêñ navendî hwd. re piraniya gundêñ heyî têne valakirin. Êdî wisa tê xuya kirin ku teşeyê gundêñ Kurdistanê yên klasik ji holê radibe.



kin pir e. Wekî ïzmîr û Manisayê kesên ku ji naylon ji xwe re malan çedikin û debara xwe dikin jî hene. Yênu ku rewşa wan xedartire jî hene. Diyar dibe ku kesên herî belengaz û reben, yên ku li Kurdistanê dimînin in. Yênu ku koçberî Tirkîyeyê dibin her çiqas karên erzan bibînin jî dixebeitin. Bi rastî yên ku vî karî dikin kêm in. Li Kurdistanê derfetên peyda-

tîkê, dizî û şêlandinê rû didin û bi vî hawî dê bidome jî. Di ciwanan de çiqasî şik û gumana fêrbûna jiyana metropolan zêde dibe, li pey riya sûdwergirtina metropolan digerin. Dema ku di mercen asayî de kar nabînin ji bo peydakirina kar li gorî xwe rîbazan diafirînin. Ev jî bi xwe re karên wekî firoseriya seyar, karkerî, barkêşî ji bili vê karên nehêni û çeteyî tî-

tin Karayê ku li ser kurdêni ji mecbûri koçber bûne ên li guhê bajarê Wanê hatine bi cih kirin ku di holikan de dijîn lêkolîn kiriye, wiha dibêje: “Em di lêkolînen xwe de leqayî nexweşînên psîkolojîk ên di rîjeya bilind de bûn û her wiha dibêje ku di mîran de nexweşînên depresif ên gur xwe didin der.

Dîsa dibêje ku di holikêni biçûk de deh-bîst kes dijîn, ji ber tengbûna cih jin li menzelêni cihê bi tevayî, mîr jî li menzelêni cihê bi tevayî dijîn. Ci ji ber barê ku civakkê li mîr bar kiriye ci jî ji ber travmayê zerareke bilind dîtiye, di mîran de li gorî jinan bûyerên travmatik di radeyeke zor bilind de ye. Kara dibêje: “Hestê bêbaweriye ji xwe tiştê ku em li bendê ne ye. Tiştê ku em matmayî hîştin kûrahiya wê ye.” Kara dibêje ku bi taybetî koçberên ciwan dema ku da-dikevin navenda Wanê, xwe pir bêçare û tenê dibînin, dikevin guman û tirsâ şopandinê û her wiha “taybetiya herî girîng a kirûya ku em li ser lêkolînê dikin di demeke kin de pişkivîna bingeha eşîri ye.”

Kara der dibe ku di hesta xwedîtiyê ya mirovan de serobinbûneke mezin rû dide û di navbera bertekêni jin û mîran de cudayıyêne mezin rû didin û di navbera bertekêni jin û mîran de rîjeya depresyonê bilintir e. Egera

**Mîrovêni ku dê gundêni wan were valakirin, yên ku li devereke dîyar dijîn û bînyada wan a etnikî dîyarê ne. Valakirina gunda di heman demî de bi polîtikayeke încarê re tê meşandin.**  
**Dî ciwanande çiqasî şik û gumana fêrbûna jiyana metropolan zêde diba, li pey riya sûdwergirtina metropolan digerin. Dema ku di mercen asayî de kar nabînin jî bo kar peydakirinê li girî xwe rîbazan diafirînin.**

kirina kar qet nîn e. Heta pîraniya wan ji bo ku herin na-venda bajêr ji xwe re kar peyda bikin nikarin diravê rê bibînin. Gelê ku nikare di nav jiyana bajaran de bikeli-je, karên ku li gund pê re tê-kildar bûye didomîne.

Li herêmêni ku koçber tê de bi cih dibin, bandora komîn olî yên ku piştgiriya dewletê distînin giran e û dixwazin gelê li vir ji têkoşîna azadiyê qut bikin. Ol, wekî navgînekê bi kar tînin. Di gel vê li van deran rewşen wekî firotina jinan û narko-

ne. Ev rewşeke apolîtik e û dewlet ji vê sûd werdigire. Lê ji bo ku rê li ber were gitin, ci li Kurdistanê, ci li metropolan divê saziyên kurdan baş werin birêxistin-kirin. Gel dê bi riya van saziyan valahiyêni di derûniya xwe de bi çalakiyêni siyasi, çandî û cîvakî ji holê rake û pêsiya pişäftinê bibe asteng.

Di encama lêkolînan de diyar dibe ku koçberiyê li ser gelê me rûxandineke mezin çekiriye. Mînak: Di komcivîna psîkyatrî ya tirk-alman a diwemîn de Hayre-

vê jî mîr, geleki di bin bandora pişkîvîna eşîrê de dimîne û berpirsiyên mîr li gorî jinan pirtir e. Rêjeya depreşyonê li bajarêñ din ji % 5'e, ev hejmar di kurdêñ ku ji mecbûrî koçber bûne de derdikeve ji % 29'an û di jinan de jî ji %17 ye.

A. Rezzak Oral'ê li ser koçberiyê lêkolîn kiriye û ji bo rojnameya Milliyetê rêzenivîs amade kiriye wiha dibêje; "Em diçin taxêñ Edeneyê yên ku herî zêde koçberiyê distînin".

Xaniyên kavil û xerabe, avahiyên ku banêñ wan nehatiyê lêkirin, holikêñ duçav, di navbera kuçeyan de dezgehêñ ku brîketan hildiberîn... Di serî de dağlıoglu, taxêñ Gülbahçesi, 19 Mayıs, Barbaros, Anadolu ... heman dîmîn dixuyêñ, sitareyên ne bi rêk û pêk, malêñ bêpergal û pejmûrde û avahiyêñ ku çêkirina wan didome..." A. Rezzak Oral bi vîrengî encamêñ ku Kara cesipandine dirastîne.

### Dema tespîtên giştî bêne kirin

Mirovîn ku koçber bûne mîsoger di nava tenêhiyê de namînin. Lewre jî li cihêñ ku lê dimînin ji bo ku bêne cem hev dikevin hewldanê. Bo nimûne: Mirovîn ku ji wela-tê me koçber bûne li metropolan taxêñ hevbes ava dikin û jiyana xwe bi heman nirxan re lê li erdnîgarêyeke ci-

hê didomînin. Ev mirov li van herêman, bi temamî notî berê najîn, awayê jiyana wan a nû jî li jiyana metropolan nayê û jiyana li vir ji paş ve dişopînin.

Koçberî bi xwe re bêewle-hiyê tîne. Bêagahiya ji awayê jiyânê, kîşwer (iklim) ê û taybetiyêni siyasi yêñ li erdnîgariya lê koçber in, arîşeyêñ lihevkirinê, paşdemayîna welatê me bi xwe re têkiliyên rû bi rû û bi sînor, bi rengekî bi rêk û pêk bi kar neanîna demê tîne. Di vê jiyânê de derfeta giştikirin û razberkirinê nîn e. Li cih û warêñ ku bi cih bûne, jiyana bi tevayî li gorî rêzikên li dijî wan hatiye sazkirin. Bi si-rushtî bandora ku vê çêkiriye vediguhêze çewsandinê û ev jî psîkolojiya parastine diafirîne. Yanê gel li ser hêjahi-yêñ xwe stewîn û kemilîneke xwezayî dernaxe himatê. Ber bi cih û warêñ ku jê ne agahdar e tê ajotin. Pişt re bi jiyanekî biyanî re rû bi rû dimîne. Koçberê ku li dijî vê rewşê şaş û matmayî dimîne li pey mirovîn wekî xwe digere. Dema ku wî-wê dibîne jî nikare wekî berê bijî, xwe nikare adapteyî jiyana nû jî bîke. Lewre jî dikeve nava tevera ferasetên parastinê û jiyanekî girtî.

Mirovîn koçber ji ber vê rewşa xwe dikevin kompleksa xwebiçûkdîtinê. Îcar dema ku ev mirov keysê dibînin dixwazin rêzikên vê per-

galê bi awayekî paşverû bi kar bînin û li ser pergala ku li hemberî wê xwe piçûk dibînin, bîbin serdest. Dîsa dema keysa li ser cîhana ku ew çewsandine û neheqî li wan hatiye kîrin serdestbûnê bi-bînin ev dê hesteke bêtir bi hêz a mafdariyê di xwe de bibînin. Yanê di heman demê de serdestbûn û bindestbûn rewşeke pir bi aloz û tevlî-hev derdixe himatê.

Têkiliya xwe bi xwe re, bi giştî nabe eger ku ji xwe re rêz û hurmetê nîşan bidin. Berevaji vê dijwartir dike. Lewre ji bo ku li ser piyan bîmîne tiştîn ku divê bike-carinan koneyî, carinan dek û dolap û carinan xîyanetherî baş bi xwe dizane. Van kirinan çîqas ji dest were wê hewl bide ku veşêre, lê nako-

### Koçberî bi xwe re bê ewlehîyê tîne.

Bêagahiya ji awayê jiyânê, kîşwer (iklim) ê û taybetiyêni siyasi yêñ li erdnîgariya lê koçber in, arîşeyen libevkirinê, paşdemayîna welatê me bi xwe re têkiliyên rû bi rû û bi sînor, bi rengekî bi rêk û pêk bi kar neanîna demê tîne. Di vê jiyânê de derfeta giştikkirin û razberkirinê nîn e.

kiyên wî-wê dê gur bibin, ji bo ku xwe mafdar nîşan bi-de, bi piranî, dê mirovên din tawanbar bike.

Ji ber vê psîkolojiya xerab, hêmana evîn û hezkirinê jî rûxiyaye. Awayê jiyanê yê ku di mercên xwezayî yê Kurdistanê de kemiliye, ji stres û tîrsa pêşerojê dûr e û têkûz e, hezkirin û sedeqatê jî watedar dike. Ferasetên hezkirinê yêni mirovê di vê rewşê de li metropolan wate-ya xwe winda dike. Awayê nû jî baş fêm nake, ji xwe mercên heyî jî derfetê nadîn vê yekê. Li şûna vê ferasete-ke hov serdest e. Mînak: ji bo ku hêz û qudra ta xwe nîşan bide tiştinan dike. Li şûna kolîtan di apartmanan de rûniştin, li şûna kincen kev-neşopî lixwekirina kincen zengînan, wekî zengînan por û rih qusandin û li şûna zi-manê zikmakî hilbijartina tirkî. Bi vî rengî xwe dixapîne. (ji ber ku bilêvkirina tirk û kurdan ne yek e bi giştî ne mimkune ku wekî tirkan bi-peyîvin). Dîsa kişandina ci-xareyên biyanî, lidarxistina dewat û dîlanên luks, dax-waza bi qîzên tirkan re ze-wacê, li qehwexaneyên li gu-hêñ bajaran bi diravên mezin lîstika xumarê, xwe nepi-xandin û xwe pesinandin yêni li hemberî xwe biçûkdîtin û li wan tinazkirin. Di gel ku ne di nav tebeqeyên zen-gînan û tirkan de ne jî xwe wekî ku di nav wan de ne nî-

san didin. Dîsa dibêjin ku em xwediyê derdoreke fireh in û em dikarin her karî pêk bînin. Bi vî rengî bi zimanekî dirêj xwe dixapînin. Ke-sên ku nagihêjin vê radeyê û xwe ji vê rewşa teng nafilitî-nin -Ev piranî ne- li hemberî çarenûsa xwe serê xwe dite-wînin, her çiqas berxwedêr bixuyêñ û xwe wekî mîrovêñ bi hêz û wêrek nîşan bidin jî di rastiyê de tirsonek in. Bi civakê re lihevkirinê, xwe derbirinê û ji jiyanê ditirsin.

Koçberên ku di mercên zi-vistanê yêni sar de êzingan

nabînin di heman demê de kinc û xwarinê jî bi dest na-xin. Di sergoyan de berma-hiyen xwarina leşker û kamendêñ tirk dibînin û bi vî awayî zikê xwe têr dikin. Mirov dikare li Hekarî, Wan, Elîh û Amedê her tim rastî dîmenêñ wisa bê. Her wiha birçîbûn, dibe destpêka nex-weşînêñ ku ji egera bêxwîni-yê peyda dibin. Gelê ku ji bo venegere, gundêñ wî hatine şewitandin, bêçare û kam-bax e. Ji ber pirbûna karke-ran mehaneya kesen ku dix-wazin kar bikin gelekî kêm e.

Di nêzîktêdayîna pirsgire-kê ya komeleyen koçberan ku bi mebesta federasyonbû-nê hejmara wan bêtir tê zê-dekirin de du mîl xwe didin der: Mêla yekemîn, cih dide pirsgirekên xanî, bêkarî û binçavkirinê. Mêla duyemîn, li gel van pirsgirêkan dixwa-ze ku komele li dijî tevkujîya Kurdan a ku di demeke dûv û dirêj de hatiye belav-kirin derkevin. Li gorî vê bîr û baweriyê divê komele li gel başkirina mercan, mafê li ser axa xwe jiyanê wekî prensîp bingeh bigire û der-barê perpirsêñ ku bûne egera koçberiyê de dozêñ hiqûqi yêni navneteweyî vekin. Her wiha mebesta rêkxistina fe-derasyonê esasgirtina dax-waza vege-re ya koçberan e û bi vî awayî di çapemeniya derive û hundir de ji her layî ve ragîhandina arîşeyê û afi-randina raya giştî ye.

*Mêla yekemîn, cih  
dide pirsgirekên xanî,  
bêkarî û binçavkirinê.  
  
Mêla duyemîn, li gel  
van pirsgirêkan dixwa-  
ze ku komele li dijî  
tevkujîya Kurdan a ku  
di demeke dûv û dirêj  
de hatiye belavkirin  
derkevin. Li gorî vî bîr  
û baweriyê divê komele  
li gel başkirina men-  
can, mafê li ser axa  
xwe jiyanê wekî pren-  
sîp bingeh bigire û der-  
barê perpirsêñ ku bû-  
ne egera koçberiyê de  
dozêñ hiqûqi yêni nav-  
neteweyî vekin.*

# VIREN RA NIKA CÎNÛ Û 8Ê ADARÊ

**EDİBE ŞAHİN**

P ersa cînû viren ra nika weşıya însون de caye muhîm gureto.

Nika onca persa cînû weşıya ma de ge rind, ge kolay caye xo cena, more xo nanepira, pêniya weşıya kom gegane ke-na bine tesîra xo. Verve nika cînû bine bandure de, zilm û zordariye de mende, nika jî qayit beme reça nayinû cînû sero vîneme. Persa cînû her ke şî jedîna, weşıya giran nino wontene. Bi-ne zilm û zordariye de halê cînû her ke şî peyser sona name cînû orte kom de nîno vatene. Qayite cînûnê kirmancî ke beme weşıya xo ko-lewuna têpiya wo. Ma zoneme ke lete kom cî-nûna yeno meyda. Eke lete kom ke kole bî, ma nişikeme vajîme nû kom xo sere wo, bine bandure de niyo.

Hete dîrok ra ke qayitbeme, caye cînû orte komo

viren de je nika niyo, gore nika tenina rind yawseno. O waxt cînû û cuwamerdû-na piya gureyenê, her çiye xo piya barekerdenê, domon ke biyene hete maye-

arakê cînû cuwamerdûna jêdero. Cînû hem zerede, hemik tevera gureyenê.

Zomon ra tepiya weşıya kom virîno. Cuwamerd ke tevera sone sayd, o waxt emeg û karê cuwamerdû weşıya kom de cawo giran ceno. Caye cînû orte kom de her ke şî beno se-nik. Endî cînû û cuwamerd hete cisn ra benê ciya. Cînû peyser manenê, cuwamerd ave sonê kune vireniya cînû. Pira pira sinif kune-we orte kom. Taye inson benê fekir, taynek beneve dew-lemend. Cînû rind kune bine bandura cuwamerdû. Name cînû çiqas ke orte kom de yeno won-dene, bine xo tol o. Kom weşıya xo de çi kesit ke qayite mal-milkê xo benê eve o çim ra qayite

cînû benê. Yane cînû endê je mal-milkê xo vînenê. Orte kom de fêlên, dekba-jên çiyo kolay ke bî, name



ne xo de manenê, orte kom de name mayenê xo ra amene wendenê. O waxt weşıya inson de emeg û

cînû ra yeno vatene. Mînakê ney Destane Gilgameş de ji vîneme. Destane Gilgameş Dîroka. Mezopotamya de caye giran ceno. Destan de yew agîto, mîr-xas êsto, name xo Enkîdu yo. Kes pê dey nişkîno. Pêniye de pê cînike ra xapnenê ąne raye. Nû mînak he-te cînûna mînake de rind niyo. Dîroka ma de tenya mînake niyanêñ cînê, mînake rindek estê. Taye caye de cînû beneve tanrıça, taye caye de beneve cuwanike duste dismen de dane-pêro. Dîroka ma kirmancû de mînakê niyanêñ zof e.

Kom zomone ra tepiya jedîno beno hîra. Hete in-sonetiye ra ave şono, lewe awu de xo re bon virazenê, hard kinenê, pira pira ver-ve cîte sonê. Niyadame ke cêpa cînû ra dowa nêviryo. Însonetiyê ave şiya hama cînû herke şîye kote bine bandura cuwamerdi. Waxtê axayêñ de je.kolewu. gureye. Hem tevera hemik zere de gureye. Cuwamerd bandura xo serê cînû de rind kerde mikerem. Endê cînû besenêkerde wayîre ked û arake xo be. Niyadame ke her ke şî na-me cînû biyave vînd.

Qayite kapîtalizm ke be-me, her çî je vatena cuwa-merdû sono. Waxto ke burjuvazî duste axayêñ de do-vepêro, orte kom de cînû ū xeyli poşt gureta. Cînû bine bandura axayêñ ra xele-sîne ke wayîra ked û arake

xo be. Hama hal hîn nêso-no. Burjuvazî çutir ke beno wayîre iktidar na raye ke burjuvazî bê însaf ked û arake cînû keno bine bandura xo, ceno ve xo dest. Bine name “özgürlük” de burjuvazî bandura xo cînû sero her ke şî jedneno. Cînû endê biye çante herme cu-wamerdû. O waxt devrîmî burjuvazî hete xo yo newe keno wîndî.

Ma ke qayite dîroka devrîmu beme, çond raye ke devrîm biye cînû her raye en verde caye xo guretê û dove-pêro. Kare giran gure-te xo ser devrîm poşt cînû ser biya berze. Xeleşian

*Ma ke qayite hale  
cînûne kirmancû ke  
beme jede rind  
nêvîneme. Cîniye  
kirmancû verve nika  
besenêkerde derdê xo  
biyarozuwan. Cîniye  
kirmancû zere çê xo  
de je kolewune. Hete  
jû ra axayêñ, hete bîn  
ra ke kapîtalizma  
çewte welate ma sero,  
bine koloniya na  
kapîtalizma çewte de  
mende. Zilm û  
zordariye cînûne  
kirmancû sero kat ve  
kat jêdiyo.*

ra dime iktidar de caye cî-nû sayeke cînî biyo. Cînû xo bine bandura cuwamer-dû ra nêxelesno, tesîra cu-wamerdû dewam kerda. Cînû weşiya xo besenêkerdo ara xo dest kere, biçar-ne. Cuwamerd ke çutir wasto hen şîyo. Rev ra nika bilimsel sosyalizm ra qeder, weşiya cînû nêviryo, raye nêwiye cînû re sosyalizm kerda ra .

Ma ke qayite hale cînûne kirmancû ke beme jede rind nêvîneme. Cîniye kirmancû verve nika besenêkerde derdê xo biyarê zu-wan. Cîniye kirmancû zere çê xo de je kolewuñe hete yew ra axayêñ, hete bîn ra ke kapîtalizma çewte wela-te ma sero, bine koloniya na kapîtalizma çewte de mende. Zilm û zordariye cînûne kirmancû sero kat ve kat jedîyo. Hete iktidar ra ke qayitbeme qederê milletê ma kirmanc şiyero qederê cînû. Hurdenek bine bandure de re, xo ser niye. Eke hen biyo weşiya cuwa-merdene ma ji xo ser nêbiyo. Leyê cînûne xo de, çê xo de axayêñ kenê, ha-ma teverak koleyê. Cînûk bine bandura cuwamerdene niyanêñ de helbet bene koleyê kolewu. Cîniye kirmanc di kat bine bandur de re. Weşiya înson ke deste înson de nebiye, înson xo sere nêbiye ne ruhê înson, ne ke mezzê înson beno özgür û xo ser.

Çiqas ke weşiya cînûne

kirmancû viren ra nika jede rind nêbiyo, onçak taye caye de cînû tek tek vejiye, idara kom gurete xo dest, biyeve pîlê aşîrû. Mucadela Netewî de caye xo guretê duste dismen de dovevêro. Dîroka ma kirmancû de viren ra nika mînak zof e. Bese û Zarîfa ra orte nayînû ra di teneyê. Dîroka mucadela netewî de qale cîniyê kirmancû ke kenê vanê xo yar û diyarûna este bine, xo ra dismen dest nêfiştê. Nika ke kayite mucadela gerîla beme mînake niyanê onca zof e. Saya cînûne kirmancû ra zuwane ma, töre û çanda ma amave na çağ. Cînû ke nêbiyene kirmanciye dariyenê, biyene vindî.

Perse cîniyê kirmancû, perse milet xo ye kirmancû ra ciya niyo. Milet ma wo kirmanc ke nê serone peyeno sare dardeve, mü-

*Cîniyê kirmancû ni-  
ka saya mucadale râ  
weşiya xo de eve xo  
karar dane, wayîrê  
mucadela xo vejînê.  
Zonene ke mucadela  
ke çîne bî, baka  
cînûk çîna.*

cadela xo ke kerdeve berz, biye hîra cîniye kirmancû na raya ra şîye, sare dardave. Cînû ke kote zere mücadale xo virna, ave sî. Orte kom de cînû ke xo virna zere çeyê biye tê ser, tê bîne ra. Çond sero welatê ma de herve henone kevçil esto ke, bare ney giraniye yena poşa cînû ser..

Heştê Adarê roza cîniyê emekçûne. Cînû sevta haka xo, sevta ked û arakê xo,

sevta özgûrêna xo mucadele kenê. Sera 1857 de Amerîka de çewres hozor cînû amey tê lewe kote grev. Na mucadele de adir kuno fabrîka, xeylî cînê vêsenê, mirene. Na raya cînûney rind famkene ke xelesiyana cînû mucadela ra vêrena. Na roze ra 50 sere dime sere 1907 de cîniyê dûgelûne bîno yew kongra (kombiyayış) virazenê. Clara Zetkin benave serok. Kongra 2 ne de sera 1910 de yenê tê lewe vatena Clara Zetkin ra kararê 8 Adarê cenê. A sere ve nika cîniyê kedkarana dûgelû 8 Adarê de roza xo bimbarek kenê.

Hete ma cînûne kirmancû de roza 8 Adarê, roza mucadele ya, roza xelesiyana ma cînûna. Cîniyê kirmanc ver ve nika dustê koleyen de, zordariye de, zulum de xeylî mucadela kerdê. Ewre mucadela ma wo netewî xeylî ave şîyo, ma cîniyê kirmancû eve şîarê "weşiya newe, însongo newe" kume orte na kavxa.

Cîniyê kirmancû nika saya mucadale ra weşiya xo de eve xo karar dane, wayîrê mucadela xo vejînê. Zonene ke mucadela ke çîne bî, haqa cînûk çîna.

Ma cîniyê Kirmancû wazeme ke eve mucadela xo weşiya însong rind keme, eve deste xo dîna reng û reng bixemelnême, eve vengê xo, eve rengê xo ma ji leyê cînûne dûgelûne bîn de caye xo bijere me.



# Elfabeya Zimanê Kurdî

## (“AB” ya Kurmancî)

**DEHAM ABDULFETTAH**

Em dizanin, ci dengê ku ji dev û qirikê dertê, bi nîşandakeke taybetî dadikeve ser kaxezê. Ew nîşandek bi navê “tip”<sup>(1)</sup> yan jî, “pît” tê nasîn. Nîşandekên tevaya dengên zimanê Kurdî sih û yet “31” nîşandek in. Anglo, “31” tip in. Ew jî ev in:

(a,b,c,ç,d,e,ê,f,g,h,i,î,j,k,l,m,n,o,p,q,r,s,ş,t,u,û,v,w,x,y,z)

Kurdên bakur û rojavayê Kurdistanê bi vê “AB” yê dinivîsin. Lê yên rojhilat û başûr, di bin nîrê elfabeya erebî de, bi tipên erebî dinivîsin. Kurdên Sovyetistana berê, bi tipên Kirîlî dinivîsin, û niha ew jî, bi tipên latinî kar dikan.

A) -Ev elfabeya latinî, Celadet Bedirxan, ji bo xebitandina zimanê kurdî damezirandiye û ji aliyê kurdan ve jî hatiye pejirandin. Lê çend têbinî, derbarê (AB) ya Celadet de, di nav hindek zimannasên kurdan de têne tevdan. Ew jî, bi kurtî, ev in:

1) -Tipa “i”, bo sanahiya nivîsin û çapkiranê, gerek bêyî xalê (nuqte) bihata nivîsin. Anglo, bi “I” bihata, ne bi “i” yê.

2) - Tipa “î” jî, xalikek ji devla kumikê bihata ser (i) yê. Anglo, li şuna “î” yê “i” bihata nivîsin.

Bi rastî ev herdu têbinî, ji hêla denganiyê ve, ne girîng in. Tenê ji hêla teknikî ve, li ber wan tê rawestan.

### 3) -Tipen dubare:

Hindek tip, bi lêv kirinê, du dengên yeksane li pey hev didin. Pêwîst e, ew tip weki ku têne bi lêv kirin, bêne nivîsin jî. Anglo, dubare bibin.

Weki “kirrin”, “gulle”, “gurrin”.

4) - Her tîpekk ji van her çar tipan (ç,k,p,t), du dengên nêzî hev dide. Di hindek peyvan de dengekk sert dide, û di peyvine dîtir de dengekk nerm dide.

### Weki:

#### Sert:

- Ç:çûn, çap
- K:Kat, kîn
- P:Pir, pak
- T:Têr, teşî

#### Nerm:

- çem, çerm
- kew, kanî
- pez, penêr
- tûr, teng

Ji van tipan re, tipen cêwî tê gotin. Têbîniya dêrbarê wan de jî, ew e, ku nîşandek piçûk li ser tacêwiyyê nerm bête danîn, da kû her du tacêwiyyê nerm û sert, ji

hev bêne nasîn.

Ji bilî têbîniya li ser tipa dubare, her sê têbîniyê dîtir ne pir girîng in, û ne hêjayî çi guherîna “AB” yê ne. Çunkî, heger em ji bo her tîpeke cêwî nîşandekê daynin, û ji bo her tîpeke beranberî tîpeke erebî ku di “AB” ya kurdî de nebe jî, em nîşandekê daynin, hingê, nîşîna kurdî, dê bibe wekî

**Kurdên bakur û rojavayê Kurdistanê bi vê “AB” yê dinivîsin. Lê yên rojhilat û başûr, di bin nîrê elfabeya erebî de, bi tipên erebî dinivîsin. Kurdên Sovyetistana berê, bi tipên Kirîlî dinivîsin, û nuba ew jî, bi tipên latinî kar dikan.**

1- Li başûrî Kurdistanê ji dêvla “tip”, “pît” tê gotin

Celadet Bedirxan gotiye: Pirbûna nîşandekan nivîsînê gemarî ðike.

### B)-Taybetiyâ hindek tîpan:

Hindek tîp ji (AB) ya kurdi, bi şeweyekî taybet, digel hindek tîpêñ dîtir bi kar têñ.

Ji wan tîpa:

1) - "i":

1/1) Ev tîp, tu caran di serê peyvîn kurdî de nayê. Anglo, heke peyvek di zimêñ de bi "i" yê dest pê bibe, ew peyv ne peyveke kurdî ya resen e.

Wekî:

(Imkan, insaf, imza, inkar...)

1/2) - Di rawoyêñ hindek bêjeyan de, carinan tîpa "i", bi egera sivikbûnê, nayê bi lêv kirin;

Hingê nayê nivîsîn jî.

Wekî:

(Kevin, sivik, têvin...)

- Kev ...nar = kevnar.

- Siv ...kayî = sivkayî.

- Tev ...na pîrê = tevna pîrê.

1/3) - Ji bilî daçek û cînavan, tîpa "i", li dûmahiya bêjeyen Kurdî nayê?

Wekî: (li, di, bi, ci ...).

2) - "X+W":

Dema ku ev her du tîp "X, W", di peyvekê de, li pey hev bêñ; hingê dengekî du çeng didin<sup>(2)</sup>.

Wekî: (xwîn, xwar, xwes-tin, xwê, pêxwas...)

3) - "È, Î":

3/1) - Ev her du tîpêñ

dengdêrên dengdirêj, ku tîpa "y" li pey wan bê; hingê dengêñ her du tîpan "È, Î", bi sivkayî kurt dibin û rastni-vîsa wan jî, bi "i" yê têñ nivîsîn.

Wekî:

- Rê: riya min dirêj e.

- Dê: dilê diya min fireh e.

- Masî: masiyêñ deryayan mezin in.

- Kanî: ava kaniyê zelal e.

3/2) - Lî heke "y", ne bi "È, Î" yê ve be, hingê "È, Î" bi "i" yê têñ bi lêv kirin û xwendin,<sup>(3)</sup> lê wekî xwe, bi "È, Î" yê têñ nivîsîn.

Wekî: - Ev kî ye?.. Dengê kê ye?..

4) - "Û": (Dawîtip be).

Dema ku tîpeke dengdêr, li pey "Û" yê bê; hingê pê-wîst e ku tîpek navbir (nav-bira dengan) bikeve navbera her du dengdêran. Ew navbir jî, yek ji van her du tîpan e "W", yan "Y" ye. Hingê:

4/1) - bi "W" yê re, tîpa "Û", bi "i" yê tê bi lêv kirin û pê jî, tê nivîsîn.

Wekî:

-Rû: riwê xwînmijan reş be.

- Berû: Kakilê beriwê tal e.

4/2) - Bi "Y" re, tîpa "Û", bi "U" yê tê xwendin, pê jî, tê nivîsîn.

Wekî:

-Rû: ruyê xwînmijan reş be.

-Berû: Kakilê beruyê tal e.

5) - "E":

Heke "E" dawîtipa bêje-yekê be, wekî "perde", û "E" yeke dî li pey wê hat, hingê

bêje bi du şeweyan tê nivîsîn:

5/1) - Tîpa "Y", dikeve navbera her du "E" yan.

Wekî:

- Perde: Ez ê perdeyekê bikirim.

- Mase: Remo Maseyek kirri.

5/2) - Her du tîpêñ "E" yê bi hev re dibin "A"

Wekî:

-Perde: Ez ê perdakê bikirim.

-Mase: Remo masak kirri.<sup>(4)</sup>

### C) - Cureyêñ tîpan:

Tîpêñ elfebaya zimanê kurdî, du cure ne, tîpêñ dengdêr û tîpêñ dengdar.

1) - Tîpêñ dengdêr:

Tîpêñ ku xweber û bi tena xwe dikarin dengan bidin, ji wan re dengdêr tê gotin. Anglo, ew bi xwe dengan didêrin. Ew jî ev in:

(a, e, ê, i, î, o, u, û) Ji van tîpan (3) tîp dengkurt in; û (5) tîp dengdirêj in.

Tîpêñ dengkurt ev in: (e, i, u)

Tîpêñ dengdirêj jî ev in: (a, ê, î, o, û)

2) - Tîpêñ dengdar:

Tîpêñ dengdar, bêyî alîka-riya tîpêñ dengdêr nayêñ bi lêv kirin; û ew bi tena xwe dengan nadîn. Tîpêñ dengdar (23) tîp in. Ew jî ev in:

(b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z)

Ç) - Rast e, ku em bibêjin, ji van tîpan hemû bes û cure-

Tacêwî: Yek ji cêwîyan.

2- Duçeng, navlêkirina Reşîdê Kurd

3- Durist e ku "È, Î" bêne xwendin, û durist e jî, ku bi sivkayî "I" bêne xwedîn

- Durist e ku (ruwê, beruwê) jî, bête lêvkirin û nivîsîn

4- Egerêñ guhertina dengêñ tîpan mijareke denganî (fonetik) e. Em nikarin di vê gotarê de wê bi firehî rave bikin.

yên peyvan têñ sazkinin.

Lê pirsa herî girîng ev e: Gelo, bi tîpêñ vê elfebeya ku me berî nuha çêl wê kiriye, em dikarin tore û kelepûra xwe ya kevneşop (kilasik) bi şêweyekî rast û sergihayî binivîsin?

Em tev dizanin, ku berî bikaranîna tîpêñ latînî, tevaya nivîsarêñ zimanê kurdî bi tîpêñ erebî dihatin nivîsin. Ji bo ku ew kelepûr, bêşûde nemîne; pêwîst e ku dîsan ew, seranser bi tîpêñ latînî bê nivîsin.

Aloziya vê babetê ew e, ku çend tîp di elfabeya erebî de hene, dengêñ wan bi tîpêñ kurdî, xweş nayêñ der; pêdi-vî yê ku çareser bibin. Ew jî ev in:

(d(dat), z(zê), ğ(ğeyîn), e(eyîn), z(zal), h(hê), s(sê))

Digel ku hindek nîşandek, li ser çend tîpêñ ku dengêñ wan nêzî dengêñ wan tîpêñ erebî hatine danîn jî; lê herî ew dengêñ erebî bi sergihayî nehatine der; û ew alozî çareser nebûye.

Pêşniyaza min derbarê vê pirsgirêkê de ew e, ku her tîpeke erebî di elfabeya kurdî de tune be, gerek beranberî wê tîpeke kurdî, nêzî wê bête nîşankirin.

Seydayê hêja Osman Sebî di "AB" ya xwe de çend tîp ji bo vê mebestê bi vî şêweyî nîşankirine:

(H=hee, X=xeyîn, T=tê ...HD). Ango, du xal li ser tîpêñ kurdî danîne.

Di zimanêñ Ewrupî de,

yên ku bi tîpêñ latinî têñê ni-vîsin, nîşandekên wan tîpêñ erebî yên ku di wan zîmanan de peyda nabin, bî danîna xelekê li bin Hindek tîpan pêk hatine.

Wekî: (H=hee, S=sad, D=dat, T=tê, Z=zê)

Beranberî tîpa (xeyîn). yê, (G) hatiye danîn. Berçav e ku hemû tîpêñ latînî, yên ku nêzî tîpêñ erebî ne, bi danîna xelekê li jêra wan, dibin nîşandekên tîpêñ erebî, tenê tîpa (G) yê, ku bo dengê (xeyîn) yê ye, xal li jora wê hatiye danîn.

Herdu tîpêñ erebî (see<sup>(5)</sup>, zal) bêyî nîşandek û nîşankirina tîpêñ latînî mane. Ew jî, ji ber ku ev her du tîp (t, z) nêzî dengêñ wan du tîpêñ erebî ne: Jî hêleke din jî, berê (t, z) boyî (b, zee, ti) bin-xal bûne.

Ev nîşandek, li ser asteke navneteweyî, bi tîpêñ latînî bi kar têñ. Zimanê kurdî jî, bi tîpêñ latînî tê nivîsin, gerek em jî, wan nîşandekan (tenê bo nivîsîna dengêñ erebî) bi kar bînin.

Di "AB" ya kurdî de, tîpa "X" li şûna her du tîpêñ erebî (ğê, xeyîn) bikar tê. Bo "xeyîn" yê, duristir e ku xalek li bin "X" yê bête danîn, "X".

Di zimanêñ Ewrupî de, beranberî tîpa (ayîn), bêhnokeke berûvajî('), li ser tîpêñ dengdêr hatiye danîn.

Wekî: (Se 'id, saîd, 'Abid=abid, 'Ebdal, ebdal)

Bikaranîna van nîşande-

kan, çend armancêñ girîng ji me re pêk tîne.

1) - Bi şêweyekî saz û sergihayî em dikarin hemû kelepûra xwe ya kevneşop, ya ku bi tîpêñ erebî hatiye nivîsin, ji nû ve bi tîpêñ latînî binivîsin.

2) - Ci nivîsarêñ ku li başûr û rojhilatê Kurdistanê, bi tîpêñ erebî têne nivîsin, em dikarin wan bi tîpêñ latînî binivîsin û bixwînin.

3) Zimanê kurdî jî, wekî piraniya zimanêñ Ewrupî bi tîpêñ latînî tê nivîsin.

Bikaranîna van nîşandekên navneteweyî, girêdanek dîtir, di navbera zimanê kurdî û yên Ewrupî de peyda dike. Kurdnasêñ Ewrupî bi hêsanî dê karibin hemû bêjeyen nivîsîna kurdî bixwînin, tev ên erebî jî, û bi vê yekê jî, zimanê kurdî nêzî hevpariya xebitandina nîşandek û sembolêñ zimanêñ navneteweyî dibe.

Ev jî gaveke pêşketî ye ji bo zimanê me.

d- Di hindek peyvan de du tîpêñ dengdêr digihijin hev. Dengdêra pêşîn bo sivikbûnê tê avêtîn.

Wekî: (di+avêje=davêje)

Ji bo bê nasîn ku tîpeke dengdêr hatiye avêtîn pêwîst e; bêhnokek li jora şûna degndêra avêtî, bê danîn.

Wekî: (bi+avêje=b'avêje)

Li gora dîtina min, bikaranîna wan têbinî û pêşniyazan, (AB) ya zimanê kurdî û sergihayî dike.

Amûdê 5/3/1997

# DI DÎROKA ME YA NÊZÎK DE

## SEROKEKÎ SERHILDANÊ:

### ŞÊX SEÎD

#### HAYDAR ZAGROS

Ji bo ku em bigihêjin şexsiyetekî ku wê dîrokê çêbike an jî bi kemasî di dîrokê de wê bibe xwedî meşike mutewazî, divê em berî her tiştî mêtûyê bizanibin; li ser vê bingehê jî divê em şexsiyeta serokan, ew ên ku mîmarên dîrokê ne nas bikin û ji kiranen wan û ji taybetiyên wan ên erêni û neyînî dersan bigirin. Ev tişt li ber çavan e. Di vê çarçoveyê de dîsan li ber çavan e ku, divê em pêşî cih bidin lehengên dîroka xwe.

Şêx Seîdê ku di dîroka dûv û direj a Kurdistanê de demeke kurt ketiye jiyanê û digel vê yekê welat û cihan hejandiye. Emê bi nasandina malbata wî dest bi nivîsê bikin.

#### Malbata ku Şêx Seîd jê tê:

Malbata Şêx Seîd, berî ku koçî Paloyê bike, li başûrê Kurdistanê li herêma Silêmaniyê dijî. Ev malbat, di dema Kalikê Şêx Seîd, Şêx Elî de ji Silêmaniyê vediqe-

te. Şêx Elî neviyek ji neviyên mezin ê Şêxê Qadirê Şêx Hecî Huseyn e. Şêx Hacî Huseyn jî li gorî Martîn Van Burînesssen, dibe ku ji malbata navdar, Malbata Berzencî be.

Piştî ku Şêx Elî ji Silêmaniyê derdikeye, rawestgeha wî ya pêşin Şam e, ya duymîn jî, cihê ku lê tekiyayek vekiriye; Amed e. Di xortâ-

niya xwe de Şêx Elî, Li Amed û Cizîrê dest bi hîndekariya xwe dike. Dûv re Şêx Elî, bi xelîfeyê Mewlana Xalit Şêx Ahmedê Erbilî re hevdîtinekê pêk-tîne û dikeve nava terîqeta Neqşîbendî (Şêxê Neqşîbendî Mewlana Xalit ê ku ji eşîra "Caf" e, di sala 1826'an de li Şamê wefat kiriye). Dîsa di wê demê de dihere Şamê, cihê ku rîberê wî Mewlana Xalid lê niştecih e. (Li gorî hinekan Şêx Elî, li Şamê ne ji aliye Şêx Ahmed ve, lê ji aliye bîrayê Mewlana Xalit Şêx Mahmûd Sohîp ve tê perwerdekirin).

*Ji bo ku em bigibêjin  
şexsiyetekî ku wê  
dîrokê çêbike an jî bi  
kemasî di dîrokê de wê  
bibe xwedî meşike  
mutewazî, divê em  
berî her tiştî bi mêtûyê  
bizanibin; li ser vê  
bingehê jî divê em  
şexsiyeta serokan, ew  
ên ku mîmarên dîrokê  
ne nas bikin û ji  
kiranen wan û ji  
taybetiyên wan ên  
erêni û neyînî dersan  
bigirin.*

Şêx Elî li Şamê jî pênc salan perwerdehiya xwe didomîne û dûv re ji aliye Şêx Mewlana Xalid ve bi vatinî ber bi Paloyê ve tê şandin. Lê ji ber kirinên neyînî yên Dewleta Osmanî nikare li Paloyê bisekine; ji wir jî vedigere ber bi rojhilate derdorê Mûşê û Bedlîsê. Ew li wê derê xebata xwe didomîne. Di wê demê de gelek şêxen Qadirî tevlî terîqeta Neqşîbendiyan dike. Di vi warî de jî gelek jêhatî ye. Di

naveka sedsala 18'an de, Şêx Elî li gundekî Amedê ku navê wê Septî ye bi cih û war dibe. Lê li wir jî pir na-sekine, derbasî Paloyê dibe. Ji ber gengeşiyên ku di navbera wî, apê wî û begên heremê de hene, bi awayekî kotevê ji herêma navborî ve-diqete û derbasî Xinûsê di-be. Bi temenê xwe yê navse-re, di demeke kurt de bando-ra xwe li ser giregirên herêmê çêdike û bi saya hewldanêna axa û begên herêmê ca-reke din vedigere Paloyê. Di wê demê de pênc lawên Şêx Elî hene û mezinê wan jî ba-vê Şêx Seîd, Şêx Mahmûd e.

JiNEYNÎ Şêx Seîd, pênc la-wên Şex Mehmûd ên din jî hene. Navên wan Adil, Bahadîn, Ebdurrehîm, Mehdî û Tahir e. Dû re ji van Adil li nêzîkî Helebê, Bahattîn jî li Xinûsê dema ku Quranê di-xwînin, têne kuştin. Ebdurrahîm jî di sala ku Bahadîn tê kuştin de dimire; piştî raperînê, Mehdî li gundê Kelhesî ji ber biberketina birayêñ xwe timî janê dikşîne. Lê emê di vê nivîse de jî bi-bînin ku Tahir, bi radeyeke herî bilind li cem Şêx Seîd dî raperînê de cih digire.

**Şêx Seîd û jiyana wî ya berî beşdarbûna tevgera neteweyî.**

Şêx Seîdê ku navê wî di-dîroka tevgera neteweyî de wekî serokê serhildana 1925'an derbas dibe di sala

1865 an de tê dinyayê. Di-nava gelê me de ew bi navê-mîna "Şêx Seîdê Kal" û "Kekê Şêx Seîd" jî tê bi nav-kirin. Di nav gel de bikaranî-na van navan bi taybetî, ji ber rola Şêx Seîd a di serhil-danê de ye. Sifata "Şêx" jî, ji ber ajotina adetên feodalî, ji bav û kalêñ wî yêñ feodal û esîl, jê re dimîne.

wan re têkiliyan datîne. Per-werdehiya wî ya bilind, çan-da wî ya olî, xurtbûna veko-lîna wî ya li ser Quranê û zî-rekiya wî dike ku navê wî belav bibe; zû bala gel dikşî-ne ser xwe. Ji ber vê jî her ku diçe qedrê wî bilintir dibe. Bi hestêñ xwe yêñ xurt ên neteweyî, bi iradeya xwe ya bilind, bi baweriya xwe ya

*Navên wan Adil, Bahattîn, Ebdurrehîm,  
Mehdî û Tahir e. Dû re ji van Adil li nêzîkî  
Helebê, Bahattîn jî li Xinûsê dema ku Quranê  
dixwînin, têne kuştin. Ebdurrahîm jî di sala ku  
Bahattîn tê kuştin de dimire; piştî raperînê,  
Mehdî li gundê Kelhesî ji ber biberketina birayêñ  
xwe timî janê dikşîne.*

Şêx Seîd di dema nişte-cihbûna wan a di Xinûsê de hê xortekî nûgihîşti ye. Di bin qontrola bavê xwe de, perwerdehiya xwe ya olî bi serfirazî diqedîne. Li ser Quranê lêkolîn û xebateke baş û kûr pêk tîne. Şiirêñ Herîrî û Bedîuzeman ji ber dike. Piştî mirina bavê xwe, berpirsiyariya malbatê û dergehê jî di destê xwe de kom dike. Piştî vê pêvajoyê li herêmê digere, xwe bi der-dorê dide pejirandin û bi vî awayî li ser gel û çinêñ serdest bandora xwe çêdike. Di wê demê de giregirên herêmê yêñ mîna axa, beg, şêx û serbazêñ hêzên Hemîdiyan yêñ kevn tevan nas dike û bi

hemdem, bi duristbûna xwe, jê tê hezkirin û pejirandin. Wisa jî di warê olî de jî ne paşverû ye. Wekî mînak, di pêvajoya Serhildanê dê, çi-qas bi suniyan re di têkiliyê de be ew çend jî dixwaze bi elewiyan re jî têkeve nava dan û standinan. Di vî warî de dibe xwedîyê hewldanê jî. Dîsan di pêvajoya serhil-danê de jî, yekî mîna Fehmî Bîlal Efendî ku bi dîtinêñ xwe, yêñ li ser îslamê ne li gorî civatê ye, tê naskirin. Şêx Seîd di nava tevgerê de wezifeyeke pir bilind dide wî. Ji wî re nabe asteng. Çawa ku piraniya şêxan li ser eşîretan xwedî giranî û oto-riîte ne, ev tişt ji bo. Şêx Se-

yên zewacê bandora Şêx Seîd a li ser derdorê zeximtir dike.

Hêza aborî ku di dest Şêx Seîd û malbata wî de gîhiştiye ser hev, di zeximbûn û çalakbûna bandora wî de roleke mezin dilîze. Ev, ji hebûna sed û bîst şivanan diyar dibe ku xwediyê bi hezeran sewal e. Û ev jî dide xuyakirin ku di vê demê de, ji nava çend dewlemendên li Kurdistanê yek jê Şêx Seîd û malbata wî ye. Mîna ku em dizanin hêza şêxa ya aborî ji xelatên maddî yên ji gel distînin tê. Û sermayeya feodolan ji van derametên ji xelatên maddî hatiye komkirin pêk tê. ji xeynî vê tu riyên xwezayî û mafdar tune ne. Heger hebe jî ev, biriyên selefkariyê, nijdevaniyê û talankirinê hwd. re gengaz e.

Lê em ji vê derdixin ku, ga-va Şêx Seîd û malbata xwe bi van riyên nehiqûqî ev ser-wet dabin ser hev, di pêvajo-yeke mîna serhildanê a pir-dijwar de gel heta mirinê bi wan re dimeşıya. Em ji tev-gerên gel tê derdixinîn ku wan ev mal ne bi rîbazên li rî dane serhev. Mirov ji gotî-nîn wî jî tê derdixe ku Şêx Seîd dijî tîştîn wisa ye. Di axaftineke xwe de ji bo terî-qata Nakşîbendî dibêje “Şer-kevê gangster”.<sup>(1)</sup> Ev gotin ji

bo wê demê û wan mercan hem pir bi cesaretû hem jî pir watedar e. Heger ev gotin ji bo kesen ku bi pirsgirêka neteweyî eleqeder nabin û tarîqetê ji bo berjevendiyê xwe yên şêxsî bi awayekî pêxwasî, ji bo bêtir dewle-mend bibin bi kar tînin, li ser vê bingehê civakê û çandê dejenera dikan hatibe gotin; (ji xwe qasî ku tê xuyakirin terîqeta Nakşîbendî hatiye merhaleyek wisa) ev dîyar dike ku, Şêx Seîd ji aliyekî ve li gel xwedî derdikeve, ji aliyê din jî li dijî dewle-men-diya ku bi riyên ne hiqûqî, mafyawarî hatiye bi dest xis-tin derdikeve. Ciye xwe li cem gel û rastiyê digire. Ji aliyê din xuya dibe ku dijî kevneperestiya olî derdikeve û berê xwe dide pêşverûtiye-ke nûjen.

Gelek kirûyen din hene ku pêwendîya Şêx Seîd bi polî-tikayê re dide xuyakirin. Ra-porêñ îstîxbarata İngîlîz ên ku vê pêwendiyê didin xuya-kirin heger rast bin, Şêx Seîd bi nûnerên kurd ên li meclîsa Tirkîyeyê ne re axifiye û ji wan damezirandina rêxi-stinê radîkaltır dixwaze.<sup>(2)</sup> Ev diyar dike ku Şêx Seîd ne dûrî bûyerên polîkî yên demê ye û ji nêzik ve bi pêşve-çûnan dişopîne. Di wê gavê de diyar dike ku nêzîkbûnen

îd bêtir xurt û eşkere ye. Vê derheqê de eşîretan tevayî wekî hev dibîne. Ser û ge-leşeyen di navbera eşîretan de bi aştiyê çareser dike. Şêx Seîd navberkariyeke bi edalet dimeşîne.

Di vê mijarê de Şêx Seîd, mîna mirovîku bi adetan ve pir girêdayî kar û barêñ xwe bi cih tîne ye. Şêx Seîd li gorî pêwîstiyê demê tev-digere û di hundir vê çerço-wê de adetên hilawîtiye bi cih tîne, keçen malbata xwe bi kesen hilawî yên mîna xwe, bi kesen axa, şêx û beg re dizewîcîne. Dîsa ew jî bi xwe, bi vî awayî ji eşîra Cibraniya dizewice. Ew tekili-

1- Şêx Seîd ev gotin, di ifadeyeke wisa de bi kar anîye: “Şêx Naqşîbendî, li Kurdistanâ me şerkevê gangster ava kiriye” Di çavkaniyê de wiha derbas dibe (Bi tirkî). “Nakşîbendî şahu Kurdistan’ımızda bir gangster şebekesi kurmuştur. (şereke-tê gangster)”

2- Robert Olson “Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Sait Ayaklanması”

wî ji ewil ve li ser bingehêke radikal e. Ev bûyer aliyê Şêx Seîd ê neteweyî jî dide dest û dipeyitîne. Ji ber vê yekê pir girîng e. Ji xwe xuya dibe ku malbata Şêx Seîd jê hatiye, di serî de li hember metîngeriyê xwedî rawej û tevgerekê ye. Ya yekemîn; Şêx Elî ji aliyê rîberê xwe Mevlana Xalid ve bi wezîferkarî hatibû Paloyê. Hêzên mêtînger mecbûr kiribûn ku ber bi rojhilat ve here. Ya duyemîn; neviyê Şêx Seîd Abdülmelîk Fırat ji çapameniyê re dibêje ku di sedsala 17 an de kalikê wî ji aliyê Sultan Muradê 4. hatiye bidarve-

kirin. Îcar li gorî van herdu kırûyan, gihîştina meriv ya encama hanê wisa qet ne dijwar e. Ji bo em jiyana Şêx Seîd politikî ji niha û pê de fêm bikin dîvî em pêşî di wê demê de politikayê dijmin ku li Kurdistanê pêk hatiye û li dijî vê politikaya an jî ber-teka gelê kurd hatiye nîşandan, ya ku li ser Şêx Seîd te-sîr kiriye binêrîn. Ka em po-

lîtîkayênu ku Komara Tirk di wê dema ku Şêx Seîd tê de jiwaye, li Kurdistanê ajotiyê, ji serokê Partiya Karkerênu Kurdistanê hîn bibin: "Sîste-meke zordest ya neteweyî sîstema aboriyê derdixe (pêşve dibe). Lê çarçoveya aboriyê ya Birjûvaziya tirk ji bo pêkanîna metîngeriyeyeke wisa, ewqas ne fireh e. Per-

dikare bifikire? Qet di cihekî cihanê tiştekî wisa hatiye dîtin? Wê birjûvaziya tirk êrîş bike ser şertên jiyana maddî ya gel. Ji ber ku nikare vê pêk bîne wê, navgînê hilberînê birûxîne. Wê gel, bi zorê bide şixulandin û bi zorê bişîne leşkeriyê."<sup>(1)</sup> Ji xwe li hember vê zordariya dijmin wê berpeyiya gel jî çebibe. Ka em dîsa li Serokatiya Partiya Karkerênu Kurdistanê binêrîn: "Li hemberî vê pir bi şîdet, tu bivê nevê dê berpeyiya gel derkeve holê, û ji ber sazûmana ku gel paş ve maye, ev berbeyiya gel li Kurdistanêq pir kevnare û mîna ku xweber çêbibe bûye. Ar-

çekirina neteweyî dike armanc, dixwaze çand û ziman asîmîle bike, lê ji bo vê hêza birjûvaziya tirk a neteweyî têrê nake (zeîfe). Taliyê birjûvaziya tirk ji bo ku bibe ci-vatek, ji bêçaretiyê, wê êdî qedexekirina zimên bîne hollê. Ne dikare zimanê xwe bi-de hînkirin ne jî destûrê dide ku bi zimanê xwe bipeyive. Qet civakek bê ziman mirov



1- Serokatiya Partiya Karkerênu Kurdistanê "Kurdistan'da Zorun Rolü".

2- (SP) (ibid)

îfadeyek ev berpeyî û berxwedana çinêñ kurd ên serdest di sala 1922'an de mîna rûexistinêñ din, rûexistina azadî ji ya ku haziriya rapêrîna bi navê Şêx Seîd hatiye bi nav kîrin kiriye, damezirandine.

Rûexistina Azadî bi navê "Kürt İstiklal Cemiyeti" (Komeleya Serxwebûna Kurd) di bin serokatiya Mîralay Xalid Begê Cibrî de ji aliyê mebûsê Bedlîsê Yusuf Ziya, rojnamevan Kemal Fewzi û rewşenbîrêñ mîna Dr. Fuad ve tê damezrandin. Ev komeleya li Erzeromê bi dizî hatiye damezrandin. Serokê wê yê yekemîn Xalid Begê Cibrî yê ku di artêşa tirk de serbazî dikir bû. Mîrov dikare bibêje xeta rûexistinê li ser bingeha Serxwebûn û azadiya demokrasiya birjûva hatibû danîn. Li gorî wê demê ew dibe sedema çend kirinêñ baş. Bi kurtî rewşa siyasetê li Kurdistana wê defnê wisa ye. Mîna ku me li jor ji da xuyakirin Şêx Seîd bi awayekî xwezayî dikewe nava vê rûexistinê. Pêşveçûna herî dawî vêyekê di-de xuyakirin.

### **Beşdariya Wî Ya Rêxistinê û Tekoşîna Wî Ya Polîtikaya Berî Serihildanê**

Hîn di serî de ji ber ku ji hêla çandî, civakî, aborî û polîtikî ve di desthilatiyek mezin Şêx Seîd, bala rûexistina navborî dikişîne. Pişte

endamekî navendî yê Azadî yê Yusuf Ziya gava ku di da-wiya havîna 1923'an de pêşniyara beşdarbûnê ji Xalid Begê Cibrî tîne pêşkêsi Şêx Seîd dike. Şêx Seîd vê pêşniyarê, wê gave qebûl dike û di ser re bi Yusuf Ziya re, li ser serihildana ku wê bê pêkanîn li hev dike. Di beşdarbûna Şêx Seîd de tesîra dos-tiya Şêx Mehdiyê birayê Şêx Seîd ku bi Xalid Beg re hebû û dîsa tesîra zewaca Şêx Seîd ku ji eşireta Xalid Beg bû (li gorî Robert Olson, pîreka Şêx Seîd xaltiya Xalid Beg e) wê bibe sedema tekiliyên erênî.

Pişti têkiliyên bi vî awayî awayî têñ çêkirin, Azadî bi Şêx Seîd re li berêmê dest bi xebatêñ derheqa serihildanê de ne dike. Di nava rêberên kurdêñ elewî yên ji eşira Xormek in û Cibraniyan de nakokî heye. Gava rêberên wê eşirê dibihîzin an ji dibînin gesbûniyên wisa li herêmê çedîbin, wê gavê vê rewşê li Akarê îxbâr dikin. Pişti vê rewşa han, bi fermana Mustafa Kemal, Xalid Begê Cibrî û nûnerê Bedlîsê Yusuf Ziya li Bedlîsê têñ girtin û dikevin girtîgehê. Pişti girtina wan, Yusuf Ziya, ji bo ku li dijî Şêx Seîd şahidiyê bike, dawetî dadgeha Bêdlîsê tê kirin, lê ji ber ku Şêx Seîd fêm dike ku di vî karî de dek û dolab hene nexwesiya xwe dike hincet, dibêje ez nayêm, heger hûn bixwazin ez dikarim îfade xwe bidim dadgeha Xinûsê. Ji ber ku bandora Şêx Seîd li Xinûsê pir e hêzen zabit mecbûr dîbin ku daxwaza wî qebûl bikin. Ji bo here ifada xwe bide, dadgeha Xinûsê bangî wî dike. Li Xinûsê dîsa bi hêza bandora xwe ya li herêmê daristan dixe bin te-sîra xwe. Dûv re ji bo ku xwe ji destê dijmin bifilitîne ji Xinûsê derdiikeve diçe Çepexçûrê.

Di vê merhaleyê de "Tev-gera serxwebûna kurd, Azadî" hewcedariyê dibîne ku kongreya xwe ya yekemîn bicivîne. Kongre di dawiya havînê an ji di destpêka pa-

têñ çêkirin, Azadî bi Şêx Seîd re li herêmê dest bi xebatêñ derheqa serihildanê de ne dike. Di nava rêberên kurdêñ elewî yên ji eşira Xormek in û Cibraniyan de nakokî heye. Gava rêberên wê eşirê dibihîzin an ji dibînin gesbûniyên wisa li herêmê çedîbin, wê gavê vê rewşê li Akarê îxbâr dikin. Pişti vê rewşa han, bi fermana Mustafa Kemal, Xalid Begê Cibrî û nûnerê Bedlîsê Yusuf Ziya li Bedlîsê têñ girtin û dikevin girtîgehê. Pişti girtina wan, Yusuf Ziya, ji bo ku li dijî Şêx Seîd şahidiyê bike, dawetî dadgeha Bêdlîsê tê kirin, lê ji ber ku Şêx Seîd fêm dike ku di vî karî de dek û dolab hene nexwesiya xwe dike hincet, dibêje ez nayêm, heger hûn bixwazin ez dikarim îfade xwe bidim dadgeha Xinûsê. Ji ber ku bandora Şêx Seîd li Xinûsê pir e hêzen zabit mecbûr dîbin ku daxwaza wî qebûl bikin. Ji bo here ifada xwe bide, dadgeha Xinûsê bangî wî dike. Li Xinûsê dîsa bi hêza bandora xwe ya li herêmê daristan dixe bin te-sîra xwe. Dûv re ji bo ku xwe ji destê dijmin bifilitîne ji Xinûsê derdiikeve diçe Çepexçûrê.

Di vê merhaleyê de "Tev-gera serxwebûna kurd, Azadî" hewcedariyê dibîne ku kongreya xwe ya yekemîn bicivîne. Kongre di dawiya havînê an ji di destpêka pa-

yiza 1924 an de dicivê. Endamên tevgerê yên pêşengî, fermandarê hêzên Hamîdiye yên kevn û bi gelek şêx, axa û begên Kurdistanê yên xurt re Şêx Seîd jî dawetî vê kongreyê dibe. Ji nava beşdarvanan tu kes bi qasî Şêx Seîd ne bi kêf û coş e. Li vir Şêx Seîd derdikeve pêşiyê, di mijara serhildanê de bî-yarbûna xwe, jidilbûna xwe, hêza xwe ya iknakirinê derdixe hole. Û herkesî di mijara serhildanê de qanix dike.

Pîstî vê civînê bi derketinâ Serhildana BeytulŞebê re endamên pêşeng ên tevgera Azadî ku li pey Xalit Begê Cibrî û Yusuf Ziya mabûn tev ji aliyê dijmin ve têngirtin. Îcar di hundirê tevgerê de valahiya serokatiyê derdikeve holê û digihîje merhaleyeke girîng. Li hember vê rewşê her ci qas bêdil be jî Şêx Seîd, tê serokatiya tevgerê. Di vir de rîvebirêne tevgera Azadiyê difikirin, dibêjin; şexsiyetek olî û manewî dê , li nav gel bêtir bê pejirandin û propagandeyek olî wê bêtir bi tesîr bibe. Ev raman dibe sedemeke bi tesîr ji bo ku Şêx Seîd bibe serokê tevgerê. Ji xwe tu riya din jî tune ye. Lewra di serê sed-sala 19. de pîstî li Kurdistanê "Mîrîti" ji dîrokê têngirin ji ber ku eşîrên kurd tim bi hev re xwînî ne, peywira mîran, Şêx bi cih tînin. Her ci-

qas serokekî birjûva dernekeve jî ji bo armanc bê cih şêxitî derdikeve pêş. Di wan mercen Kurdistanê de serokatiya birjûvazî nikare bibe serokatiyê tevgerê û gel di bin navê şêxitîyê de bi vî awayî derdikeve holê. Ev serokatiya bi vî rengî rastiya xwe ji ber mercen civak û politikaya wê demê digire. Her ci qas ji bêçaretiyê Şêx

qûqî ye. Rûxandina vê komarê li ser hemî misilmanan ferz e, yên rîvêberiya vê komarê bike û ji vê komarê re bibe alîkar, standîna mal û canê wî li gor şertê îslamê helal e.”<sup>(1)</sup> Di vê civîna ku li vî gundi çêkirine de li ser rewşa eşîrên Mûş , Warto û Xinûsê jî radiwestin. Van eşîretan li ba dijmin cih gitibûn. Ji bo van eşîran bikişî-

*Pîstî vê bi derketina Serhildana BeytulŞebêre  
endamên pêşeng ên tevgera Azadî ku li pey Xalit  
Begê Cibirî û Yusuf Ziya mabûn tev ji aliyê  
dijmin têngirtin. Îcar di hundirê tevgerê de  
valahiya serokatiyê derdikeve holê û digihîje  
merhaleyeke girîng.*

Seîd tê serokatiyê pêk tîne. Xebat û hazırlıyan serhildanê zûtir dike. Di nav van hazırlıyan de armanca xelaskirina Xalid Beg, Yusuf Ziya û endamên politik yên kurdan û girtiyan rizgar bike jî heye.

Di vê seferberiyê de râwestgeha Şêx Seîd ya yeke-mîn gundi Kirikan e. Şêx Seîd li vî gundi fetwayek wi-sa dide “ji roja Komara Tirk hatiye damezirandin û hetairo dixwaze olê îslamê ji holê rake, Mustafa Kemal û hevalên wî li diji emrê Quranê derdikevin, xwedê û pêxamberan înkâr dikin. Û xelîfeyê pêxamber nefî kirine. Ji ber vê jî rîvêberiya wan ne hi-

ne ba xwe di bin ronahiya vê ramanê de Şêx Seîd ji wan re nameyan dinivîsîne û di namayan de banga besdariya serhildanê li wan dike. Bangen Şêx Seîd ên ji bo qezzenckirin û lihevhatina van eşîran nabe çare. Lewra van eşîran li ba tirkan cihê xwe girtiye. Dewsa ew eşîr besdarî serhildanê bibin, li hemberî serhildanê derdikevin û diyar dikin ku wê di refê komara tirk de cih bigirin. Ev eşîran Lolan, Xormek, Eşîretên Dêrsim û hinekêne din in. Ev fikrîn Şêx Seîd ên ku digot: “ Kemalist dê olê ji holê rakin, ji bo Elewî û Sunnî şeref û ol xwe biparê-

zin divê bi hevre hevkariyê bikin.”<sup>(1)</sup> Ev gotin li hember “Lîktî” ya kemalîstan Elewiyên kurd iqna nake. Li ser van rûdanêneyîn di 6’ê çileya 1925 an de Şêx Seîd û hevalên wî, li ser vê mijarê hin nirxandin û planan çêdikin.

Hêzên ku dê bi ser van eşîran de herin û yên ku dê bibin destek diyar dîkin. Di pey vê civînê re, Şêx Seîd seferberya xwe didomîne. Diçe Kanîreşê. Li vir bi serokê eşîran re civînê çêdike û ji wan re dibêje dest bi heziriya serîhildanê bikin. Ji wir jî diçe Solxan, gundê Melekan. Ji bo ku li ser planen serhîldanê biaxivin, bi Şêx Evdileh re hevdîtinekê çêdike. Piştî Şêx Seîd û yên bi wî re karê xwe yê li gundê melekan diqedînîn, di nîvî çileya 1925 an de li navenda Dara Hênen, Licê, Çepexçûr û Semsûrê digere; lezê dide xebatên serhîldanê. Di 5’ê reşemiya 1925 an de ji Hênen derbasî Pîranê dibe. Ev bûyer, ji bo Şêx Seîd ji ber ku destpêka serîhildanê ye

xwedî girîngiyeke dîrokî ye.

### Şêx Seîd û Destpêk û Daviya Serîhildanê

Gava Şêx Seîd leşker û hevalên xwe hê li Piranê ne

wisa de Şêx Seîd bersivê di-de leşkerê tirk, mîna ku jê tê hêvîkirin nazîk û bi hilawî ye; dibêje; “Em bi hevre hatine vê derê û ev kes hevalên me ne. Rica min ji we heta

### *Ev fîkrê Şêx Seîd ên ku digot:*

*“Kemalîst dê olê ji holê rakin, ji bo Elewî û Sunnî şeref û ol xwe biparêzin divê bi hevre hevkariyê bikin.” Ev gotin li hember “Lîktî” ya kemalîstan Elewiyên kurd iqna nake. Li ser van rûdanêneyîn di 6’ê çileya 1925 an de Şêx Seîd û hevalên wî, li ser vê mijarê bin nirxandin û planan çêdikin. Hêzên ku dê bi ser van eşîran de herin û yên ku dê bibin destek diyar dîkin. Di pey vê civînê re, Şêx Seîd seferberya xwe didomîne.*

serpêlekî tirk û taximek leşkerê wî têna mala Ebdulrehîm. Ji mêvanê Ebdulrehîm yanî ji Şêx Seîd deh mirovîn mehkûm yên li mala gundiyeğî ku navê wî Bahri ye xwe veşartibûn, dixwazin.

Ev serpêlê ku navê wî “Husnî” ye esasen haya wî ji amadekariyê serhîldanê heye. Ji bo provakasyonekê derxe destûr ji hikumeta Encereyê standiye. Lewra li hember Şêx Seîd heta dawî israr dike. Di ser re jî dizane ku Şêx Seîd van mirova na-de. Em dibejin “Dizane” lewra yekî mîna Şêx Seîd feodal ew kesen bi awayekî ketine bin stara wî, an jî xwe avêtine bextê wî, herkes dizane ku' nade. Di' rewşeka

ez li virbim hûnê tu xerabiyen li wan nekin, piştî ez ji vir derketim hûn dixwazin çi bikin hûn serbest in”.<sup>(2)</sup> Li ser vê di 8’ê reşemiya de pêşveçûnên em pê dizanin derdikevin; leşkerên hatine hin dîl têna girtîn û hin jî têna kuştin. Ev bûyer dibe destpêka her tiştî. Ü provakasyon digihîje armanca xwe. Hem jî di merheleyeke ku amadekariyê serhîldanê herî sift û herî hesas de, li hember vê bûyerê haya Şêx Seîd ji rastiyê heye, wê rojê Pîranê terk dike. Diçe Dara-hênen, gundê Hakîkê. Armanca wî bûyerê, di tixûbêñ Pîranê de bigire û nehêle zêde fireh bibe. Lî ji ber bê-kordînasyoniyê fermandarê

1-Yê ku guheztiyê, Robert Olson (ibid)

2- Yê ku guheztiye, Prof. Dr. M. Arsenoviç Haretyan “1925 Kürt Ayaklanması”

Şêx Seîd, Şêx Tahir gava bû-yerê dibihîze di 10'ê Reşemiyê de li Licê dest datîne ser postexanê û di 11'ê reşemiyê de mal û alavênu ku dest daniye ser. Li Hakîkê Şêx Seîd li vir bêçare dimîne û digihêje vê encamê ku divê êdî serîhildan dest pê bike. Dibêje; "xuya ye ku ev qedera me ye".<sup>(1)</sup> Û di reşemiyê de li Hakîkê bi serokên eşîran re civîneke pir girîng çê-dike. Di civîna Hakîkê de navê serîhildanê datînin "Cihad" li vir Şêx Seîd, nîşana "Emîrul Mucahiddîn-fermandarê mucâhidan" digire. Bi kurtî van biryaran distînin: "Darahêne dê bê stendin, 40 leşkerê li wir ku li ber xwe bidin wê bi çekan herin ser wan, ên di serîhildanê de bimirin dê li gorî şertî îslamê şehîd bênen diyarkirin, ji bo leşkeren di şer de bimrin jî "şerra i qisasa û diyet" wê bê pejirandin"<sup>(2)</sup> Li gorî van biryaran di 16 'ê reşemîya 1925 de digirin ser Darahêne Qet berxwedan çenabe û bajar tê bi dest xistin.

Li Darahêneya ku hat stendin dezgehêne mêtîngeyan tênilî hilweşandin û li dewsa wan wekî tê maneya dewletekebicûk, dezgehêne polîtik û idarî tênilî sazkarin, rêk û pêkêne têvel ên civakî tênilî pêkanîn. Dîsa şexsiyeta Şêx Seîd, hîn bêtir bilind dibe,

dibe efsane û serokbûna wî digehêje merhaleyeyeke qarîzmatîk. Ev tev ji ber ku, bi qasî gel dibîne, ev serîhildan destê gel û yên keda wan tê xwarin digire, alîkarê bindestan e, li dijî împeryalîstan e, serxwebûnê dixwaze û xwedî wesfê îslamî ye.

Şêx Seîdê ku bi van serfiraziyan hêza wî xurtir dibe serîhildanê bi pênc eniyan

têkçûnek pir girîng digrin û gelek hacetan li paş xwe dihêlin û ji neçarî ji şûn vedi gerin. Piştî vê bûyerê Şêx Seîd dibihîze ku hêzên dijmin Darahêne û Pîran şûn ve stendine. İcar Şêx Seîd hêzên xwe ji şûn ve, ji gundê Harî cihê ku lê ne diqetin û rasterê berê xwe didin Dara Hêne û Pîranê. Di 22'ê Reşemiyê de şer dest pê dike û

*Dîsa şexsiyeta Şêx Seîd, hîn bêtir bilind dibe, dibe efsane û serokbûna wî digehêje merhaleyeyeke qarîzmatîk. Ev tev ji ber ku, bi qasî gel dibîne, ev serîhildan destê gel û yên keda wan tê xwarin digire, alîkarê bindestan e, li dijî împeryalîstan e, serxwebûnê dixwaze û xwedî wesfê îslamî ye.*

sererast dike. Ew bi xwe jî dibe fermandarê eniya ku ji van eniyan yek e. Şêx Seîd û fermandarêne xwe yên eniyêndin, konseyek mîna konseya şer saz dikan. Li aliyê din ew jî mîna şêxên din bi xwe şer dike.

Şêx Seîd bi vê hevdesaziya kêm û sist derdikeve hemberî dijmin. Piştî livbaziya Darahêne roja 21'ê rêssemê li gundê Hezanê ku li başûrê Lîcê ye, agahîyan dîstîne, ku hêzên dujmin êrisî Lîcê kiriye. Şêx Seîd, leşkeren xwe kom dike û êrîşê dibe ser dijmin. Hêzen tirk

dîsa hêzên dijmin têkçûnek mezin distînin. Leşkeren hêzên Siwarî ku hatibûn alîkariya wan leşkeran jî têk çûbûn, li ser rêça Kebanê dikevin kemînê û leşkeren hêzên siwarî wan tev dîl digrin. Bi van serfiraziyan her diçe nav û dengê Şêx Seîd li nava gelê kurd û li neteweyan digere û bilind dibe. Şêx Seîd, bi besdariya hêzên di bin fermandariya Hecî Hesen, Emerê Faro, Salih Begê Dara Hêne û leşkeren ji eşireta Bafa û Mistan ji geliyê Dara Hêne hatin û bi ser Amedê meşîyan.

1- Yê ku guheziye, Prof. Dr. M. Arsenoviç Haretyan (ibid)

2- Yê ku guheziye, Aziz Aşan

Gava Şêx Seîd fam dike hêzên wî ji bo bi dest xistina bajér hindikin, ji bo wext di-rej bike bi rêvebirên tirkên yên bajér re, dest bi hevdîti-nan dike. Dixwaze di hundi-re vî wextî de gel bîghîne hev û serîhildanê bi alikariya gel ji hundirê bajér ve dest pê bike. Dû re bangî rêvebir û serpêlên li bajér dike ji bo bajér teslimî wan bike. Lê ji ber ku tirkan bang qebûl ne-kirin- ji xwe zanîbûn wê alî-karî ji Enqereyê were- Şêx Seîd biryara êrisê stend. Di 7'ê Adarê de ji çar aliyan bi hev re êrisî ser bajér dike. Hêzên Şêx Seîd û hêzên dij-min dikevin şerekî diiwar. Her diçe şer bêtir tuñd dibe, carekê şervanên Şêx Seîd derfetê dibînin û di cihok kê-zînê re dikevin bajér. Lê ji ber kevinbûna çekan û ji ber ku gel di wexta xwe de neha-tibû rêkxistinkirin, beşdarî û alîkariyek xurt û ji gelê bajér nehat. Li himber hêzên dij-min ên nûjen û topêن ji bedenan têن avêtin nikarin zê-de xwe bigrin û mecbûr di-bin şûn de vedigerin. Roja di pey re yanê di 8'ê Adarê de hêzên derdorê bajér girtibûn, ji ber topêن ku ji bedenan tên avetin, dest bi belav-bûne dikin. Di ser re Şêx Seîd, di 11'ê adarê de xwe dide ser hev û dike ku dîsa êrisê bibe ser bajér. Hêzeke taybet dişîne ser Deriyê

Merdînê ji bo ku bikevin ba-jér. Ev hêz ketina bajér bi serfirazî pêk tîne û dikeve nava alîgiran, dikeve şer û d-ruşmeyeke wisa bang dikin; "Bijî serxwebûn. Bijî Kur-distan".<sup>(1)</sup> Lê belê Şêx Seîd dibîne ku vê carê jî hewldan-nen wan tev bê encam dimî-ne. (Li vir talankirina bajér jî tesîrek ne baş li ser gel çedi-ke) û eniyê din agahiyê têkçûne distîne. Mecbûr di-

mîne ferмана "paşvekişînê" dide hêzên xwê.

Piştî vê têkçûnê Şêx Seîd ji giregiran re dibêje ji bo em rewşê sererast bikin, divê em mirov û emrazêñ bargir têxin dewrê. Lê, wê ji ber tesîra bêmoraliyê ji hêbe ku bangêñ hatine kirin tev, li hember hêzên dijmin ên xwedî imkanêñ fireh nabin çare. Şêx Seîd û yên pê re bi şûn de, ber bi geliyê Hêne ve vedigerin. Li wir bi hêzên Şêx Ebdulrehîm yên ku li Erxe-niyê têk çûn re dibin yek. Hêzên Şêx Seîd û ên Şêx Ebdulrehîm her ci qas li vir hinekî li ber xwe didin jî ew, tu encamê nastînin; ji ber vê zêde li ber xwe nadîn û mecbûr dimînin ber bi Dara Hê-nê ve vedikişin. Li wir hêzan ji hev diqetînin û şopa xwe li nav daristanêñ Palû, Dara Hê-nê û Çepexçûr winda di-kin. Şêx Seîd, bi şêx û serokêñ eşîran re di 27'ê Adarê de ji Dara Hê-nê derdikeve, bi şêxen Warto, Gêxî û Xar-pêt re diçin Çepexçûr, xwe vedîşerîn. Li wir li hêviya Evdila Şafi disekekinin.

Di vê pêvajoye de Şêx Seîd û peşengêñ girîng ên serî-hildanê, fam kiribûn ku êdî dawiya serîhildanê hatiye. Di 3'ê Nîsana 1923 an de li gundê Kirwas ê ku di nava Çepexçûr û Solxan de ye ci-vînek çêdikin. Armanca ci-vîne ji bo ber bi Iran an ji

*Piştî vê têkçûnê Şêx  
Seîd ji giregiran re  
dibêje ji bo em rewşê  
sererast bikin, divê em  
mirov û emrazêñ bargir têxin  
dewrê. Lê,  
wê ji ber tesîra  
bêmoraliyê ji be ku  
bangêñ hatine kirin  
tev, li hember hêzên  
dijmin ên xwedî  
imkanêñ fireh nabin  
çare. Şêx Seîd û yên pê  
re bi şûn de, ber bi  
geliyê Hêne ve  
vedigerin. Li wir bi  
hêzên Şêx Ebdulrehîm  
yên ku li Erxe-niyê têk  
çûn re dibin yek.  
Hêzên Şêx Seîd û ên  
Şêx Ebdulrehîm ber ci  
qas li vir hinekî li ber  
xwe didin jî ew, tu  
encamê nastînin.*

Iraqê ve birevin, çêkirina planan e. Di vê demê de dijmin her alî girtiye. Derfetên xelasiye pir hindik maye. Serokên serhildanê li gorî planêni di civînê de standine, ji bo neyên girtin an jî neyên kuştin peşî, di ser axa mura-dê re nêzîkî pira Abdurrahman Paşa dibil. Lê wê roja ku salname di 14'ê Nîsana 1925 nişan dide aliyê pirê yê

***Belê, mîna ku li jor tê  
dîtin encama  
serihildanê, çirokeke  
teslîmbûnê ye. Hem jî  
ji tema jebra ku gewa  
mirov dişewitîne ye. Lî  
piştî tê girtin rawêja wî  
ya dema darezandinê,  
ji ya girtinê ne cudatir  
e. Heger ne pir neyînî  
be jî lê ji hêviyan re  
nabe bersiv jî. Ev  
îfadeya daye dadgehê,  
vê rewşê baş şîrove  
dike. Di ifada xwe ya  
dadgehê de dewsa  
doza neteweyî, doza oلى  
diparêze. Dibêje  
“Medrese hatin girtin.  
Wezareta ol û weqfa  
bate rakirin û  
dibîstanêن oلى bi  
wezareta hêvotina  
neteweyî re hatin  
girtin.***

din leşkerê dijmin girtiye. Üji derbasbûna wan re dibe asteng. İcar Şêx Seîd hevalên xwe di ser Xopê (Bulanik) re bi hesabê ku wê derbasî Îranê bibin, ji şûn ve vedigerin Wartoyê. Piştî rojek din yanî 15'ê Nîsana 1925 an de gava ber bi “Pira Çarpûk” ve nêzîk dibil, li ser îxbar û îxaneta “Binbaşı Kasım” Şêx Seîd û hevalên wîdikevin kemîna îxanetkarên eşira Xormek û leşkerên dijmin. Ji niha şûn de emê ji îfadeya Şêx Seîd bixwînin “Ji bo em dîsa di eniya tekoşînê de cih bigrin pêngavêne me çêbûn, ji bo ku hêza me ya manewî xerab bûbû, nemesiya û ji ber hevalên me didîtin edî derfeta berxwedanê û tevgerê nemaye hebûn. Ez bi çend xizmetkaran re dinav Solxan re hatim Milazgirê. Li vê derê Şêx Evdila, Qasim Beg, birayê İsmâîl Beg, Elî û Selîm Beg û hinkesên din ku navêne wan na-yê bîra min li vir amade bûn. Me li wir agahkarî û muzakere kirin. Li vê dere em nikarin bistirin. Lewra leşkeran her der girtibûn, ji bo vê em vekişîyan Gimigim (Var-to) ê. Emê di Şahpîran û Merwe re derbasî cem Nuh Begê Mûsi bibana û li wir me yê li gorî hal û rewşê hereket bikira. Îşev em li Gerdes, şeva din jî em li gundê

Çîpan man û em ji vir derketin, em li girê pêşîya Methe-lûn bûn yek. Me şêwir li wir pêk anî, em di encam şêwira xwe de gihiştin vê biryarê; me dev ji çûna cem Nûh Beg berda û me biryar da ku em teslimî Osman Nûri Paşa bibin. Wekî ku em hatin ber pira Abdurrahman Paşa fikrek ket ser dilê min. Min got ezê bi serê xwe bazdim teslim nabim. Reşît Beg û Kasım Beg qayîl nebûn. Li ser ve pirê ji Osman Paşa re nameyek nivîsandin. Heywan û firaqên bi xwe re birin Çarbor, Firaqê me û kemberamin di xurçik de bû. Di xurçik de qasî 4500 “Lira” diravên min li wir, li ba leşker ma. Diravên min diravên madenî bûn ji wê derê em hatin navenda Gimigim, em çûn ba Hazretî Paşa û teslim bûn. Temamê meselê ev e.<sup>(1)</sup>

### **Şêx Seîd û Dema Dari-zandinê**

Belê, mîna ku li jor tê dîtin encama serihildanê, çirokeke teslîmbûnê ye. Hem jî ji tema jehra ku gewa mirov dişewitîne ye. Lî piştî tê girtin rawêja wî ya dema darezandinê, ji ya girtinê ne cudatir e. Heger ne pir neyînî be jî lê ji hêviyan re nabe bersiv jî. Ev îfadeya daye dadgehê, vê rewşê baş şîrove dike. Di ifada xwe ya dadge-

hê de dewsa doza neteweyî, doza olî diparêze. Dibêje "Medrese hatin girtin. Wezreta ol û weqfa hate rakirin û dibistanên olî bi wezareta hêvotina neteweyî re hatin girtin. Di rojnameyan de hinêk niviskarênen bê ol heqaretê li ol dîkin. Êdî wirin dîkin. Ziman dirêjiya nebiyan dîkin. Îro ji dest min bê ezê ji bo ol ku bilind bikim, cehd û şer bikim."<sup>(1)</sup> Ev gotin her tiştî derdixe holê. Di parêz-nameyê de rawêjek eşkere tune, hêviya stendina cezayekî sivik heye. Dewsa ku bêje ev doz, doza rizgariya Neteweyî ye, dibêje ya olî ye. Sedema derxistina serî-hildanê wisa eşkere dike. Sî-rovekirina vê "parastinê" tiştekî din çenab e. Dîsa rewşa Şêx Seîd ya dadgehê ne ji vê xerabtire. Dîsa berpirsyariya serîhildanê raste rast û bi awayekî eşkere (Lê bi awayekî şexsî) digire ser xwe. Mîna ku em ji van gotinê wî yên li dadgehê derdixin ku rawêjên wî yên erênitir ji hene. Wisa dibêje li dadgehê: "Derheqê serîhildanê de, ji tu hêlî ve telqîn nehatin min. Min serîhildan li gora fîkr û ramanê xwe, bi baweriyê xwe, mengiyê xwe hazir û amade kiriye. Xebatêن xwe ji min bi tenê

kiriye. Ji xwe li ser weazek ku min li Pîranê da, min bir yara xwe da ku ez mengiyê xwe bi cih bînim."<sup>(2)</sup> Dîsa xuya dibe ku Şêx Seîd tu carî dest ji doza Kurdistanê bernedaye. Di wan mercen dari-zandinê de jî, ev rewş derdi-keve holê. Mîna ku berî we-re bi dar ve kirin gotinê ku kirine pir manîdar in: "Di pêşerojê de neviyê me li hember dijmin, ji ber me fedî nekin ew besî me ye."<sup>(3)</sup> Lê eşkereye ku ji serî heta dawî ne xwediyyê wê rawêjê ye. Û ev, rewşek neyînî ye. Rawêja wî ya erêni piştî diçe ber ben û fam dike êdî xelasî nemaye doza neteweyî derdixe pêş û mebesta xwe ya bingehîn derdixe holê. Mîna ku berî wî bi dar ve bikin ev hînem wî ji bo roleyêne pê hatine pir watedar û bi bandor e: "Min ji bo berjewendiyêne gelê kurd dest avête çekê. Ji ber vê ji ez qet ne poşman im. Xemgîniyamin ji ber têkçûna min e. Lê bele ez mirinê ji xwe re şeref dibînim. Ez bi dilekî pak û hêsan diçim ba şehîdên kurdan. Lewra, ji çar milyonî bêtir kurd, bê guman wê tola min bistînin."<sup>(4)</sup>

Mîna ku tê zanîn Şêx Seîd û hevalên wî piştî van gotinan ji aliye "İstiklal Mahke-

mesi" (Dadgeha Serxwebûnê) ve têne idam kirin. Li gorî zagonên tîrkan kesen di temenên Şêx Seîd de, cezayê wan ê idamê nayê bi cih anîn. Lê dîsa Şêx Seîd û ji cil û heft hevalên wî cil û pênc kes têne idam kirin. Idama wan tevan di rojekê de, sala 1925 an şeva 28'ê pûşperê ku bi 29 ê ve dihat girêdan li hewşa dibistana dadgeha Amedê (Li gorî îro li hewşa "Cumhuriyet Lisesi") tê pêk anîn.

Bi mirina Şêx Seîd re, serhildanek ji serîhildanê kurd ên herî mezin, herî hevdes-azkirî û herî bi xwîn a dinê ji bi dawî bû. Ev têkçûn bi vî awayî bi şexsê Şêx Seîd re niqteya dawî tê danîn. Lewra ji amadekirina vê serhildanê heta dawiya wê, ji nav wan kesen ku mora xwe li bin wê serhildanê xistine, ew ê herî pêş e. Berpirsiyar û xwediyyê serkeftin û binketinê, bidestxistin û windakirinê, yê pêşin ew e. Berpirsiyarê girseyîbûn û berfirebûna serîhildanê, birêkûpêkî, coşî û giredayiya girse û şervanan, ji şexsiyata Şêx Seîd a mute-wazî, bi esil, zana, fedakar û ku ji gel û welatê xwe dike ye. Derheqê neyîniyêne wî de ji em dikarin vê bibêjin: Şêx Seîd, bi Sunnî û Elewiyan,

1- Li têbiniya 12. e

2- Li têbiniya 12. e

3- Yê ku guheziye, Prof. Dr. Arsenoviç Haretyan (ibid)

4- Yê ku guheziye, Amed Tigris, Aso Germiyanî "Diroka Kurd û Kurdistanê"

temamên gel, tevî hemî cehdên xwe nikare hembêz bi-ke. Di ser re, girseya ewqas enerjîk ku daye dora xwe jî, negihandiye otorîteyek ığı-haşti ku wan sevq û idare bi-ke û ji wan fêdeyekê bigire. Şervanê xwe tev bêdisiplîn, bê qontrol û belavbûyî hiştîye; hêzên xwe bê koordîne hiştîye û bi metodên kevnare daye şerkirin. Di serîhildanê de îtîfaqêن xwe yên hundirîn û derveyî têr û baş pêk ne-aniye. Mesela xelkê gundî, ji ber ku biçûk dîtiye ji bo şer bang li wan nekiriye; hêzên

eşîran bes dîtiye. Dîsa serîhildan bêhazırî û berî wextê xwe derketiye. Wekî tê dîtin, ev tev neyînî ne. Ev neyînî tev jî berhemên ne pêşdîtini-ya wî ya politikî, heta cihekî paşverûtiya wî ya olî. Mese-la teklifîn îtîfaqê ku ji erme-niyan hatiye, gotiye "Xiristiyan in û qebûl nekiriye. Dûrbûna ji rêxistînek hemdemî, kêmasiya derxistina taqtîk û stratejîk ê politîk û şerkerî ya wî ye. Û ya ku dawiya serîhildanê aniye jî, bi gelempêrî taybetiyêن wî yên eşîrî û qerekterâ wî ya feodalî ne. Ji ber vê yekê, ev şertîn hundi-rîn û derveyî-navnetewî yên ku ewqas pir hawe bûn, Şêx Seîd ji wan îstîfade nak û welat ber bi rizgariyê ve na-be; tevgera wî ya politîk, di rûkarekî taqtîk de dimîne. Ü taybetiyêن serhildaneke kevnar û herêmî yê ku bi tixû-ben eşîrtî, terîqetvanî û mez-hepvaniyê hatiye tixûbkirin derbâsnake. Ji vê hêlê ve Şêx Seîd, her çiqas bi mane wî xurt be jî û çiqas li heqi yan be jî xwe negihandiye serokatiyeke ku di sewiya hemdemî û neteweyî be. Be-lê; têkçûna Şêx Seîd a ku di demeke pir kurt de û bi awa-yekî trajîk pêk hatiye, xwe dikane bi van nikqteyan rave bike.

Ser dawiyê; Şêx Seîdê ku ji idîayêن gel mîna ku piştî wefata wî dibêjin: "Me ew li cih û quncêñ cur be cur de dîtiye" tê xuyakirin, li ser

gel bandoreke mesîhwari ke-riye, ji gelê me re mîratekî belkî nayê biçûkdîtin ê serîhildanî û berxwedanî hiştîye. Lî, sazûmankariyek ku bê nimûne dîtin, feraseteke hemdemî ya politîk, teherék serokatiyek şerkerî ku serfi-raziyê tîne nahêle. Tevî vê jî ji bo ku em hînî mirovîn dîrokî yên xwe bibin û derhe-qê militanî, welatparezî û mirovahiyê de bigihêjin de-receyeke hîn xurtir helbet, emê serokatiyêن xwe yên dîrokî û manewî yên wekî Şêx Seîd, baş hîn bibin. Ü dîsa ji bo em, ji xwe re bikin mînak emê wî nas bikin. Ji bo vê em dibêjin ku: Şêx Seîd, bi erêni û neyîniyêن xwe, pêşketin û li paşmayêن xwe û bi mîrasa xwe ya hiştî di dîroka gel û welatê me de bi rûmetî wê bê bi bîr anîn! Heyf û tola ku Şêx Seîd dix-waze neviyêن gelê kurd hilînin wê, xurtir bê stendin û iro tê stendin jî.

#### CAVKANI

- 1- "Kürdistan'da Zorun Rolü" SP.
- 2- "Kürdistan'da Kişiîlik Sorunu" SP
- 3- "Ayaklanmalar Üzerine"...
- 4- "Kürtler'de İttifaklar ve Dip-İlomasi"...
- 5- "Diroka Kurd û Kürdistanê" Aso Germiyani, Amed Tigris
- 6- "1925 Kürt Ayaklanması" Prof. Dr. M. Arsenovic Haretyan
- 7- "Kurdoloji Belgeleri" Meh-met Bayrak
- 8- "Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Sait Ayaklanması" Robert Olson
- 9- "Şeyh Sait Ayaklanması" Aziz Aşan

**Emê serokatiyêن xwe  
yên dîrokî û manewî  
yên wekî Şêx Seîd, baş  
bîn bibin. Ü dîsa ji bo  
em, ji xwe re bikin  
mînak emê wî nas  
bikin. Ji bo vê em  
dibêjin ku: Şêx Seîd, bi  
erêni û neyîniyêن xwe,  
pêşketin û li paşmayêن  
xwe û bi mîrasa xwe  
ya hiştî di dîroka gel û  
welatê me de bi rûmetî  
wê bê bi bîr anîn! Heyf  
û tola ku Şêx Seîd  
dixwaze neviyêن gelê  
kurd hilînin wê,  
xurtir bê stendin û iro  
tê stendin jî.**

# Cejnê Asûrî-Suryaniyan

## Ên Toreyî û Olî

### GABAR CIYAN

Folklor ci ye û çima em cî didin rengên din?

Folklor, çîrok û stran û edetên gelekî hemêz dike. Ew edetên ku li ser axakê, bi sedan sal berê li ser pêwîstiyen hatine holê û heta îro jiyane, ketine jiyana mirovan.

Nirxên folklorik herdem bala mirovan kişandine. Gelek kes li ser stran û edatan kûr bûne û analîzên cur be cur kirine. Ev yek jî bûye sedem ku mirov bêjeya "folklor" ê, bi wateya "zanîstiya xelke" jî bipejiyîne.



Kurdistan, welatekî pir çand e. Dîroka pirçandîbûna Kurdistanê, pişta xwe dide bi sedan sal berê. Gava mirov li stranê kurdî dinêre, bi dehan stranê ku li ser "Meyro", "file" an jî "Îsayê Meyremayê" hatine gotin, tê dîtin. Ev alî, di çîrok serpêhatî û edatên kurdan de jî xuyanî dike. Pirçandîbûna li welatê me bûye sedem ku em bêjeyên nû peyda bikin, edat û olên gelên ku cîran in nas bikin û di nirxên xwe yên folklorîk de qala wan rengan bikin. Yanê pirçandîbûna li welatê me, riya pêşketina folklor û zîmanê kurdî vekiriye, pêxistiye. Ev dewlementiyek mezin e. Baş e, ev gelên ku bandora xwe li ser folklora kurdî kirine, kî ne? Berisiva vê pirsê hêsan e: Gelên sereke ku rengên cewaz didine welatê me, ermenî û asûrî ne. Divê bê gotin ku folklora kurdî jî teşîra xwe pir li ser ya wan kiriye. Li ser pirsê, dîrokzanê suryanî P. Emanuel Aydin, di

xebeta xwe ya bi navê "dîrok, ol û edebiyata suryanî" de, dîtinek pir balķes û xweş tîne: "Di pêvajoya dîrokê de li devera Mezopotamyayê ku di navbêra avên Dicle û Ferat de dimîne, pir gel bi cîbûn. Gelek gel hatin vir û ji vir bar kirin, çûn. Gel li vir mîna ewrêni li esmîn tevlihev bûn û car caran ji hev veqetîyan. Di rastiya xwe de, li Mezopotamyayê gelek gel hatin holê, şarwerî li vir çêbû û bi pêş ket. Wisa çêbû ku mirov îro nikare li wir qala nijadekî û gelekî safî bike." Belê, demâ ku qala folklora kurdî bê kirin, divê piengbûna Kurdistanê ji bî-

ra mirov neçe. Ü pêwîst e em, dîtinêن xwe yên folklorîk li ser rastiye welêt ava bikin. Wê demê analîzêن me wê rast bin û bi hêz-tir bin.

Di vê hejmârê de, min xwest ku ez hine-kî qala cejnêن suryaniyan ên olî û gelerî bî-kim. Pişt re min baştır dît ku ne ez, lê bi sohbetek dostanî bi keşeyekî re, em li ser vê pirsê bisokinin wê baştır bibe. Ü min wisa kir. Ez bi keşeyê hêja Gabriel Işık re rûniştîm û me qala cejnêن wan kir.

Weke tê zanîn her cejnek, rengê xwe ji çand û edatên gelan digire. Yêن olî jî, li gel awirêن xwe yên olî ve, di bin tesîra edat û çandêن cewaz de dimînin û têن guhertin. Yanê, cejnêن olî jî pişti demekê hinek rengêن xwe ji çand û edatên gelan digirin. Heta devereke dîbin malê wan gelan

Cejnêن gelên li Mezopotamyayê bêhtir berê xwe didin qenciyê. Ew bratiya nav mirovan xurt dîkin, rê vedikin ku pirsgirê-kên hene bi danûstandinê bêن çareserkirin, alîkariya hejaran tîne bîra mirovan û bi mesajên xwe, aştixwaz in.

Belê rola cejnan wisa ye. Îca emê li keşeyê xwe yê hêja guhdarî bikin, ku ji me re hinekî qala cejnêن suryaniyan bike.

**Ebûne, hûn dikarin hinekî qala xwe bikin, Gabriel Işık kî ye?**

**Gabriel Işık:** Ez 47 salî me. Çar zarokêن min hene. Ez bi eslê xwe ji Tora Evdînê me. Ez çend sal li Elmanya mam û paşê, di sala 1986 an de ez hatim Swêd.

**Hûn dikarin hinekî qala wateya cejnêن xwe ji me re bikin?**

**G. Işık:** Cejna me ya yekemîn, bi munesebeta "jidayikbûna İsayê Meyremayê" tê pîrozkirin. Me, yanê "Dêrêن Rojhelat" ev cejn di navbêra 6-7 çileya paşin de pîroz dikir. Piştre me jî dest pê kir û mîna Ewrûpiyan di 25 ê çileya berî de pîroz kir. Berî roja cejnê, 25 roj, rojî dihat girtin. Paşê dêrên me rewşa gel li ber çavan girt û girtina rojiyê bi 15 rojan sînor kir. Niha 10 roj, rojî tê girtin. Sedemêن rojîgirtinê ev in: Pêşî di-

vê rihê mirovan ji nû ve pak bibe. Mirov, xwe bi xwe, bi xwe re têkeve têkiliyê û hesabê xelatiyêن xwe binirxîne. Soz û peyman bide ku wan xeletiyan dubare neke û bi dilekî pak û bêguneh bixêhatina cejnê bike. Ya duyemîn, gava mirov bi rojî be, birçî dimîne. Birçibûn, kesen hejar tîne bîra mirov. Rojî, ji bo alîkariya kesen hejar, rîvekir e. Di rojiyê de xwarinê bi goşt û yên ku ji heywanan tê bi dest xistin, nayêن xwarin. Lê masî têن xwarin. Em masiyan mîna heywanan nahejmîrin. Ji ber ku heywan bi fetisandin, an jî şerjekirinê dikarin bimîrin. Lê masî gava ji avê derkeve dimre.

Li gorî baweriya me, jidayikbûna Hz. Isa, rizgarbûna dayika me Hawa û bavê me

*Weke tê zanîn ber cejnek, rengê xwe ji çand û adetên gelan digire. Yêن olî jî, li gel awirêن xwe yên olî ve, di bin tesîra adet û çandêن cewaz de dimînin û têن guhertin.*

*Yanê, cejnêن olî jî pişti demekê hinek rengêن xwe ji çand û adetên gelan digirin. Heta devereke dîbin malê wan gelan*

*Cejnêن gelên li Mezopotamyayê bêhtir berê xwe didin qenciyê. Ew bratiya nav mirovan xurt dîkin, rê vedikin ku pirsgirêkên hene bi danûstandinê bêن çareserkirin, alîkariya hejaran tîne bîra mirovan û bi mesajên xwe, aştixwaz in*

Ademê gunehkar bi xwe re tîne. Em roja jidayikbûna Mesîh bi vê mizgîniyê pîroz dîkin. Yanê, mirov tev ji Adem û Hawa ne. Adem û Hawa ji ber xeletiyek xwe, gunehkar bûn. Nijada wan jî paya xwe ji vî gunehî girtine. Kesên xwedîguneh, ji bo felatê, bi dilekî xweş li benda jidayikbûna Îsa ne. Hêmû kes, li dêran nimêj dîkin û çalakiyên cewaz dîkin. Em hevdu pîroz dîkin. Û ji Yezdanê heq re spasiyên xwe tînin zimên ku Îsayê Meryamayê anî dînyayê û em ji gunehan pak kirin. Ev cejn dibe sembola rîzgariyê û em jê re dibêjin “Cejnâ jidayikbûnê”.

**Ez dibînim ku li cem we bêhtir cejnê olî têن pîrozkirin, çîma? Berî pîrozkirina vê cejnê li dêran amadekariyên we çî ne?**

**G. Işık:** Mîna gelên din, cejnê me yên neteweyî jî hene. Piştî ku bandora dêran li nav me zêde bû, cejnê me jî bi me re ketin nava dêran. Di bin cil û bergên dêrê de, cejnê me têن pîrozkirin, an ku harmoniyek ji cejnan pêk hatiye.

Li dêran amadekarî berî cejnê bi 8 yekşeman dest pê dike. Her sal pîrozkirina “salvegera avakirina dêran” tê pîrozkirin. Bi şêweyekî din ku mirov bêje; yekşema pêşî, roja pîrozkirina dêrê ye. Yekşema duyemîn, roja nûkiriña dêrê ye. Di wê rojê de li ser paqîjî û firehkirina dêrê tê rawestin. Gava dêr teng be, li ser avakirina wê biryar tê gitin. Paşê bi dorê, mizgîniya Hz. Zekeriya, pîrozkirina Hz. Meryemayê ku ew, jinek pir giranbiha tê İlankirin; serîlêdana Hz. Meryemayê bo Elîzabet, jidayikbûna Hz. Yuhanayê waftîzkêr û xewna Hz. Üsif tê. Bi van yekşeman armanc ew e ku, kes dilpak bibe û bi bedenek pak cejna xwe pîroz bike.

### Amadekariyên li mal çî ne?

**G. Işık:** Berî cejnê, em li ser paqîjiyê pir disekezin. Her mal ji nû ve tê raçavkirin, kîmasiyê hene tên sererastkirin. Li gorî mecalâ cilêن nû tên kirin û li xwe kirin. Yanê divê her kesek xwedî tiştek nû be û bi di-

lekî şikestî bixêrhatina cejnê neke.

Berî cejnê bi du rojan, em xwarina xwe ya toreyî, “şorba pîvazan” didin ser agir. Goş, pir hûr tê hûrkirin û li gel pîvazan tê sorkirin û paşê kelandin. Şorbe, li teniştâ savarê tê ser sifran. Şorba pîvazan, xwarinek neteweyî ye.

### Cejn li dêrê çawa tê pîrozkirin?

**G. Işık:** Roja cejnê, barê keşan pîr giran e. Em serê sibehê, 9 caran nimêj dîkin. Piştî nimêja duyemîn, metran derdikeve pêşberî xelkê û bi xaça di destê xwe, wisa dibêje: “Mizgîniya min li we, Mesîhê rîzgar-kêr ji dayika xwe bû. Li esmîn û li erdê di nava hemû tebayan de aşitî û xweşî bila pêk were”. Piştî wî, kesên li wir tev bi hev û du re dibêjin: “Me pejirand. Spas ji Yezdanê Mezin re, ku em pê bawer dîkin”.

Li cem me, mizgînî pêşî ji dêrê derdikeve. Pêwîst e aşitî li wir dest pê bike. Kesên ji hevdu xeyidi bin, nemînin. Berî ayînê, hemû kes silavê didin hev û du. Bêyî silavê li hev û du bikin, ayîn dest pê nake. Ji bili vê, nîşanên me yên taybetî jî hene. Wekkî mîsal, buxura “farmo” heye. Berî ayînê, her kes di ber wê re derbas dibe, silav dike û bêhna vê buxurê diçe wan. Bi destan, îşareta dilxweşbûnê tê nîşandan. Buxur, di herdu destên “şemmaz” de ye. Gava şemmaz bi herdu destan buxurê negire, ev tê wê wateyê ku, di nava hinek kesan de nexweşî heye. Bêyî çareserkirina pirsgirêkên wan, ayîn dest pê nake. Gava şemmaz bê û her sê zincirên di destê keşê de bigre, ev tê wê wateyê ku, di nava kesên li wir de, tu pirsgirêk tune ye. Gava problem tune bin, wê demê keşe nimêja aşitiyê dide dest pê kirin.

Keşe, ber bi dawiya nimêje ve, li ser wateya cejnê dipeyive. Bi dû peyvîn wî re, hilbijartina sembolîk ya her sê qralan tê. Ew her sê qral, berî jidayikbûna Îsa, stérkekê li esmîn dibînin. Vê stérîkê, mizgîniya jidayikbûna Îsa dabû wan. Her sê qral didin pey stérkê heta têن Yerusalemê. Li Bethle-

hemê, li ber deriyê şkeftekê dibin şahidê ji-dayikbûna wî. Her sê qral yadîgariyên di destê xwe de pêşkêşî wan dikan.

Bî bîr û baweriya min, di dêrên me de, di hilbijartina her sê qralan de neheqî li kesên feqîr dibe. Ji ber ku berendamên ku hene bi yadîgariyên xwe derdikevin pêş. Wê demê kesên ku pereyên xwe hene, bêhtir yadîgariyan pêşkêş dikan û dibin qral. Feqîr jî, ji ber pirsreka aborî nikarin bibin qral. Ev yek li dijî dîtinêni Îsa ye. Ji ber ku Îsa li ali-yê hejaran bû. Divê ev yek bê guhertin û hilbijartina qralan ne li gorî giranbihabûna yadîgaran, lê bi dorê bibe.

### Pirozbahiyêni li malan çawa ber-dewam dikan?

**G. Işık:** Hemû kes cejna hev û du pîroz dike. Şekir û şerap tê dayin. Serîlêdana li dost û nasa berdewam di-be.

**Ebûne,** wekî ku hûn jî dizanîn, li welatê ku suryanî lê dijîn, rengên din jî he-ne. Di cejnan de nêzîkbûna wan rengan li hevdû çawa ye?

**G. Işık:** Nijad-perestî di nav me û kurdan de zêde tune ye. Kurd, bi suryanî qise dikan û em jî, bi kur-di. Di cejnêni me de, kurdan jî li gorî toreyen me, cilêni nû li xwe dikirin û dihatin malêni me, cejnêni me pîroz dikirin. Di cejnêni wan de, me jî wisa dikir. Rewşek xwe-zayî hebû. Di rojêni cejnê de, kî misilman, kî file bû, zêde ne diyar bû. Car caran kesen nebaş derdiketin, lê hêza wan têr nedikir ku toreyen me bidin rawestandin. Deve-

ra ku ez lê mèzin bûm, 7 gundêni kurdan hebûn. Di cejnêni me de, ew dihatin cem me û di yên wan de, em diçûn nik wan. Me nikaribû hev û du li dêr an jî mizgeftan ziyaret bikira. Lî cejn dibûn pirêni dostanî û xurtkirina biratiyê di nav me û kurdan de. Lewma cejnêni me yên olî, pişti cihekî ren-gêni neteweyî digirtin û em nêzîkî hev û dù dibûn.

### Di nav keşe û meleyan de nakokî derdiketin, an na?

**G. Işık:** Car caran derdiketin. Lî bi tevayî, em ji hev û du re baş bûn. Wekî mîsal, kalikê min, keşe bû. Lî gelek caran ew û meleyê gundê cîran dihatin cem hev û pirtûk dixwendin, ji ditînêni hev sûdêni pir alî digirtin. Li gundan, ji bo çareserkirina pirsgirêkan, ji rîcipî û oldaran komek pêk dihat. Wan kesan pirî caran problemen di nava civatê de çareser dikir. Di nava vê komê de, kurd û suryanî hebûn. Ew tev li mala kalikê min kom dibûn û pirsgirêk çareser dikirin.

### Hûn li derveyî we-lêt çawa dikarin toreyen xwe bidin jiyan-din? Ci dijwariyên we hene? Hûnê çawa wan çareser bikin?

**G. Işık:** Di dema cejnan de, em sê rojan li mal diman. Me qet kar nedikir. Lî li derveyî welêt, mirov li cem hinek kesen din kar dike. Divê mirov here kar. Dema tu xwedî kar be jî, divê cihê te ji bo xelkê bê vekirin. Ev dijwarî û gelek dijwariyên din jî hene. Ji ber van pirsgirêkan em roj bi roj

ji toreyên xwe bi dûr dikevin.

Divê dêrên me li hember paşveçûnan bisekinin. Divê em, rojêñ xwe li gorî yên we-latê ku em lê ne sererast bikin. Em jî di wan rojan de pîroz bikin. Ev û gelek problemên din pêdaketenêñ zanyarî dixwazin. Divê em li ser wan rawestin.

Ber bi dawiya salê ve, gelek cejnêñ we hene: Di 29 ê payiza paşîn de bi munasebeta Mar Yakûbê Surucî, 25 ê payiza paşîn ji-dayikbûna Mesîh û hwd. Pirsa min ev e. Amed di sala 503 an de dikeve ber êrişên Iraniyan. Gelek kes bar dikin û diçin bajâ-

rêñ din. Lê dîrokzan, helbestvan û oldarê suryanî Mar Yakubê Surucî gazî gel dike ji bo ku ber xwe bidin û welêt bernedin.

**Di navbera Mar Yakub û oldarêñ îro yên suryanîyan de çi ferq hene? Gaziya wî ji bo vegera welêt, di rojek wisa de çi wezîfeyan datîne ser milêñ we?**

**G. Işık:** Em gelekî dûrî wî ne. Armanca wî ne tac û text bû. Di demêñ herî dijwar de kar û xebat dabû ser milêñ xwe. Hêviya min jî ew e ku em wî ji xwe re mîsal bigrin û li dû wî herin.

Ji bo ku ez karibim bîr û baweriya vegera welêt têxim dilê xwe, divê berî hemû kesan ez bi xwe biryara vegera welêt bidim. Xwezi me kariba vegeerin ser axa bav û kalan. Lê gava em riyekê felatê hil-nebijêrin, riya ku em niha tê de diçin, wê xeterêñ mezin bîne pêşıya me. Suryaniyêñ ku berî me çûbûn Emerîkayê, îro ziman û toreyên xwe ji bîr kirin û bûn Emerîkanî. Gava em ber xwe nedin, hinek ji em wê bibin Elman û hinek jî Swêdî. Ev rastî li pêşıya me ye. Jiyan li welatê Ewrûpa, pir dûrî toreyên me ye û ev cih nikare ji me re bibe welat. Belê, merc çiqasî dijwar bin jî divê em amadekiriya vegera welêt 'bidin pêşıya xwe. Gava em bibêjin: "Wa ye hinek şer dikin, em bisekinin, gava wan rizgar kir, em dê jî herin.", ev dîtin şaş e. Divê bi xwêdana xwe, em jî keda xwe tevî ya wan bikin.

**Banga we ji gelê kurd re çi ye?**

**G. Işık:** Kurd jî gelek ji yê wê deverê ye. Me tu caran ew înkâr nekirine. Asûrî-suryanî jî gelek e. Mirov, bi rêzdariya li hemberî hevûdu dikare li hev nêz bibe. Mesîh wisa gotiye: "Bi parastina mafê kesen din, ez mafê xwe jî diparêzim". Li ser vê gotina wî ya xweş ez jî dibêjim: Divê hez ji hev bikin û mafê neteweyêñ din jî ji bîr nekin. Kurd vê kîliyê ji bo rizgariyê şerekî pir dijwar dikin. Ez serkevtinê ji wan re dixwazim. Spas.

*Lê gava em riyekê felatê  
bilnebijêrin, riya ku em niha tê de  
diçin, wê xeterêñ mezin bîne pêşıya  
me. Suryaniyêñ ku berî me çûbûn  
Emerîkayê, îro ziman û toreyên xwe  
ji bîr kirin û bûn Emerîkanî. Gava  
em ber xwe nedin, hinek ji em wê  
bibin Elman û hinek jî Swêdî. Ev rastî  
li pêşıya me ye. Jiyan li welatê  
Ewrûpa, pir dûrî toreyên me ye û ev  
cib nikare ji me re bibe welat. Belê,  
merc çiqasî dijwar bin jî divê em  
amadekiriya vegera welêt bidin  
pêşıya xwe. Gava em bibêjin: "Wa ye  
hinek şer dikin, em bisekinin, gava  
wan rizgar kir, em dê jî herin.", ev  
dîtin şaş e.*

# Hetê vengsaziye de averşiyayina kurmancî û kirmancî

**SAMÎ BERBANG**

**E** di homarê heşt ê kovara The Kurdish Studies de jew wekinitenê Hamîd Mahemedî vejiyabi, min a nûsîn qandê (serva) homarê jûyin a Kovara Zend açarnabi kurmancî ser. A nûsîn vurîna vengê ziwanê kurdî ser bî. Nûştox peyniya nûştin de vatibi ke ziwanê kurdî û partî (pehlewî) eynî ca ra yenê, hurdina jî nezdîyê jew bînî yê. Edi nûsîne de çiyê ke balê min ant, ay bi ke nimûneyê ziwanê kurdî, lehçeya kurmanciya cêrîn (soranî) ra amêbi weçînayin, tayn ca de çekûyê kurdî nezdiyê farîsî bi, la belê wextê min qiseyê kirmancî ardi vîra xo, min dî ke zafîr nêzdiyê partî ya. Xora, nûştox jî vatibi lehçeya guranî zafîr nezdiyê partî ya. Zey ke yêno zanayin miyanê goranî û kirmancî de eleqeyêde xurt esto.

Ancî ma wazim, cayê çekûyê kurmanciya cêrî de, çekûyên kirmancî binûsim, bewnim senî bena?

A. Hevey hempariyê kurdî û partî, edi averşiyayina vengsazî de

I. Gw û GwH'ya hînd û ewrûpî (HE) ke jew nîm-vengîn dim ra yena, edi ziwanê sanskrîtiyê de bena /C/ û /H/. Hurdina veng jî iraniya kon de benê /Ç/

HE	Gwîwo	GwHen
Skr	Civa	Han
Av	Çva	Çan
FK	Çîwa	Çan

/Ç/'ya iraniya kan farisiya miyanî de bena /Z/, labelê edi partî de bena /J/, kurmancî, soranî zey partî yê. Dema ke ma bala xo, dame kirmancî, mardim vîneno ke tayn ca de zey partî, tayn ca de zey farisiya miyanî û tayn ca de jî nêzdiyê avestayî ya. Zey mînak, çekuyê *ciwanêne*, *cenî* û *roc* de zey sanskrîti yê, çiyê ke edi avestayî de /ç/ edi

kirmancî de /c/ ye. Mînaka "çî" ebi tema-mî zey iraniya kan a. Çekûyê *jî*, *roj*, *nêjdî*, *jan* û çend hevey bîn zey partî û çekûuya *roz*, *nezdî*, *zî* û êb. zey farisiya miyanî ya.

Parthî	jîw	jîwah
		jîwahrêñ jîwandag
F.N	zistan	zinda
F. M	zwist-ziw	zihr zîhrêñ zindag
Av	Çivya, çvaya, çuya, çuva, çvan, çitay (f.), çyatav, çotû	

Kurmancî	kirmancî
Jiyan	Ciwanêne
Jin	cenî
roj	roj, roz, roc
nezîk	nezdî, nejdî
jî	zî, jî, kî, çî
Parthî	jan jîr
Farisî	zan zîrek
F.M	zan zîr
Av	çanay çeney çîra
Skr.	

Kurmancî	kirmancî
jan	jan
jîr (zîrek)	jîr
mêjî	mezg
mîzgîn	mîjgan (mîjdan)

II. /Q/'ya hînd-ewrûpî, avestayî de bena /S/ û Farisiya kan de bena Ø (zey /dal/a erebî û /the/'ya îngilizî), na veng miyanê çekûye de bena /H/, edi serê çekûye de bêna /S/.

HE	Qmto	
Av	sata	sareda
FK	sata	øarda
Iranî	sad-	sal, sar
		Edi kurdî de tayn çekûyên ke /S/ 'ya partî ya ke cayê /H/'ya farsiya miyanê gênê estê.
Parthî	mes	des
FK	maø	
FM	mah, deh, mahî, ahen, ahû	
Av	mas	dasa-

Kurmancî	kirmanckî
masî	mase
deh	des
sal	sere
hesin	asin
ask	ask-i (zey nameyê bize)
meh	meng

III. Taybetiyedê bîn ê kurdî jî parastina /Z/’ya partî û avestayî ya ke edi farisî û farsiya miyane de bena /D/. Ebi na tewr, no veng edi tayn çekûyanê hempar ê zafêñ ziwanê iranî de jî vînayeno. /Z/’ya avesteyî (edi farisiya kan de /D/) /G/ û /GH/’ya hînd û ewrûpî ra yenê, ke edi sanskrîti de benê /C/ û /H/.

HE	greyos
Partî	zirêh
FK	drayah-
FM	drayâb
PP	drayab û zréh
Fnewe	derya

HE	*eĞHom
Partî	az
FK	adam
Av.	azem
Skr.	ahem

Partî	zamad
FM	damad
PP	damat, damad
Av.	zamatar-
Skr.	camatar

Fnewe	zimistan
PP	zamistan, damistan
Av.	zyam, zayana
Skr.	him

Partî	zan-, zanad
FK	dan-, adana
FM	danist, dan-
PP	danistan
F.N	danistan
Av.	zan-, paîtî, zanata
Skr.	can-, canatî

Partî	zird
Av.	zered, zaresaya-
FK	*dird
PP	dil

F.newe dil  
Skr. hrd, hrdaya  
Nika ma şikinê bêna kirmanckî û kurmançî ser, bewnim ke no veng kurmancî û kirmanckî de senî vurîneno.

Kurmancî Kirmanckî  
zerya derya/zerya  
ez ez  
zivistan zimistan  
zanîn zanayin  
Dil zerî, zere, zerya  
hundir, zik zere  
Zek yêno vînayin, çekuyên kirmanckî û kurmancî ebi zaffîn nêzdiyê partî yê. Ebi tenya “dil”ê kurmancî zey farisî ya. Fina çekûya kurmancî hundir, nêzdiyê çekûya sanskrîti ya.

KW’ya hind-ewropî ke ebi hetkariya leb û ziwanî ve淫ena û jew vengî û nîm-vengî ver yena, edi sanskrîti re de bena /S/, edi avestayî û farisiya kan de beno /ç/, tayn çekayan re ayseno ke kurdî partî dim şiro.

Partî rôj Kurmancî kirmanckî  
FK rauçah roj roz, roc, roj  
FM rôz tûj têj, toj  
PP rôz tirêj tirêj, tic, tije, tize  
Av. raoça  
Skr. rôças

Lehçeya kirmanckî de hîrê şeklê ci estê. Tayn ca de formê farisî û tayn ca de jî formê, partî gêna.

Tw’ya hînd-ewropî skr. de TV dano, la belê no veng avestayî û farisiya kan de bena øw, û farisiya miyanî de bena /h/ û edi partî partî de bena /f/.

Partî çafar Kurmancî kirmanckî  
F.M çahar çar çar, çeher, çihar, çok  
FN cahar  
Av. çaoŵâre  
Skr. çatvâras

Xencî çekûya “çuwar” a soranî çî mînakêde bîn çînyo ke mardim vaje, kurdî zey partî aver şiya. Zek cor de asyseno kurmancî û kirmanckî de no vengê /w/ gêna waro, tayna herêman dê çeku zey formê farisî yêna ebi lewkerdin.

Jew xusûsiyeta kurdî ya tewre girîng jî, averşiyayina /m/’ya ke jew herfa vengînî ver yena. Na vengîn kurdî de bena W/V-na averşiyayin edi xeylê çekûyen partî de jî esta.

Îraniya kan ham—sarda	
Parthî	hawsar
FM	hamsar
FN	hamsar

Mînakêde bîn;	
Parthî	angaw
FM	hamgam

Kurmancî	kirmancî
gav	gam
hember	hember
nav	name
xew	hewn
heval	heval, hembaz

Zek nê mînakân rê jî yena vînayin, kirmancî edi zaf çekûyan de zey farisî ya, la belê edi tayn çekûyan de jî zey kirmancî û parthî, fina tayna çekûyên kirmancî jî zey farisî yê.

Hevey averşiyayinê vengsaziye yên hempar edi kurdî û farisiya miyanî de:

/y/'ya îraniya kan cagenoya /y\*/'ya HE ya edi parthî de a zey dema kan manena, la belê edi kurdî û farisî de bena /C/

FM	car car car
Parthî	yawa yawar yawar
Av	yar (sere) yare drayah
PP	yatûk, cadûk
FN	cadû
Av	yatav, cayw
Skr.	yatav

Fnewe	cegar
Av	yakar
Parthî	yuwanagîft
PP.	yuwan, cuwan
Av.	yuvan-yvan,yavan, yûn
Skr.	yuvan, yûn

FM	cayedan, cayedanag
PP	cawîdan, cawîdan
Fnewe	yawedan
Av.	yava
fina,	cô
FN	cô
PP	yawa
Av.	

Kurmancî	kirmancî
car	caran (qet)
cadû	cazî
cerg	cîger
ciwan	ciwan
ceh	cew
Yek	yek, jû, yew, jew

Tiya de kirmancî û kirmancî zaf mînakân de zey farisî ya, miyanê mînakê farisî de jew mînak estê ke parthî dim ra averşiyaye, a mînak jî çekuya “yawedan” a, fina “yek û yew” kurdî jî zey parthî û avestayî ya.

DW'ya farisiya kan û DW(B)'ya ziwanê avestayî ebi giranî, edi parthî de bena /b/, la belê edi farisiya newe û kurdî de bena /d/.

PP.	dar
FM	dar
FN	dar
Parthî	bar
Av.	dvar
Skr.	Dvarau, dura

Mînakêde bîn,	
FK	duviytiya
FM	dodig
Parthî	bid, bidîg
Av	dva bitya, bityaî

Kurmancî	kirmancî
dar	dar
du	di
din	bîn

Di kirmancî de jû mînak esto ke nêzdiyê parthî ya, a jî çekuya “bîn” a, edi kirmancî de hemverê na çekuye “din” esto ke ebi îhtî-balêdo gird, peywendiyê ci ebi homare “di” ra esto.

C) Tayn averşiyayinê vengsazî ke edi parthî, farisiya miyanî û kurdî de ca genê.

\*RD an jî LD'ya hînd—ewropî edi avestayî û farisiya kan de benê RD

La belê \*RĞ an jî LĞ'ya hînd—ewropî edi nê ziwanan de benê RZ. RD'ya Îraniya kan, edi parthî de zey xo maneno, edi farisiya miyanî de vurînena, bena L(R). Fina RZ'ya îraniya kan, edi farisiya miyanî de bena /L/, la belê edi parthî de zey xo maneno.

Kurdî edi zâf mînakân de zey parthî averşiyaye, tayn mînakên ke hurdina awayan jî nîşan danê estê.

Parthî hişt hirz  
FM heşt  
Av. ✓hrz

FN malîdan  
Av. ✓mrz  
Av. merezav

Parthî burz, burzénd  
FM buland  
Av. berzant, barez,erez

Kurmancî kirmancî  
malaştin  
male mele  
bilind berz

Teyna edi mînaka “berz û bilind” de kurmancî û kirmancî jû bîn ra ciya bena.

ND’ya Îraniya kan a peyniya çekûye edi parthî de zey ND manena, la belê edi farisiya kan de bena NN. Tayn mînakên ke raya gelemerî teriknenê estê. Gaganê mardimî vaje, çekûya “bann” zey benda parthî jî yêna vînayin.

Edi kurdî de hurdîna awa jî estê:

Parthî band  
FM bann, band  
FN band  
Jew mînakêde bîn  
Parthî bandistan  
FM bannistan

Fina;  
Parthî gandag (bêhna genî)  
FM gamag  
PP gannek, gannag  
FN gand  
Av. gaîntî

Kurmancî Kirmancî  
ban ban  
bend, ben bend  
Li bendê mayîn bende di biyayîş  
genim genim genî  
gend gend

Hevey xususiyetên bîn ên vengsaziye edi kurdî de

XI. Zek edi paragrafa VI’în de ame vaten.

jew xususiyeta girîng a kurdî vurînena /m/’ya peyniya jew herfa vengîn ebi V/W’ye ya. Na xususiyetê edi kirmancî de de kem yêne vînayin, tiya de kirmancî nêzdiyê parthî û farisî ya. La belê fina jî, hevey mînakên ke nê xususiyeta kurdî miyanê xo de nimitene estê.

Parthî	nam
FM	nam
PP.	nam
Av.	naman û
Parthî	ham
FK	ham
FM	ham
PP.	ham
Fnewe	ham
Av.	hêm

Jew mînaka bîn;	
Av.	sam
Parthî	zamîg
FM	zamîg
PP	Zam, zamîg, zamîk
FN	zamîn

Kurmancî	Kirmancî
nav	nam
hev	hem
havîn	hamnan
îro	emro, ewro
hevîr	mîr
dem	taw
hem	him
zevî	zime
simêl	zimêl
nimandin	nawiyayîn
navroj	nawroce
Tayn ca de /W/’ya farisiya miyanî edi kurdî de bena /M/.	

Parthî	îzban
FM	îzwan
PP.	ûzwan
FN zeban	
Av.	hizu-, hizva

Kurmancî	Kirmancî
Ziman	ziwan

Jew xususiyeta xoser a kurdî jî vurînena

SM' û XM'ye ebi W/V'ye ya.

Belûcî	çam
Parthî	çaşm
FM	Çaşm
Av.	Çoşman
Fina,	
Belûcî	şom
Fnewe	şoxm
Jew mînakêde bîn,	
Belûcî	tom
Paştûyî	toxm
FK	tauma
FM	toxm
PP.	tohm, tam
FN	toxm
Av.	taoxman
Kurmancî	Kirmancî
Çav	çim
tov, toxim	toxim
hîv	aşm
çem	çem

Jew xususiyeta kurdî ke aye heme ziwanê ojawayê irane ra ciya kena, parastina koka kone çyu (çûn) ya.

Paştûyî	c—
waxî	çaw
Osetî	Çaev
Parthî	şud, şuw
Av.	şiyav, şav
Skr.	çyawata, syavayatî

Kurmancî	kirmancî
çûn	şiyayin

Tiya de kirmancî zey parthî ya.

XIV. Kurdî di forman; "paiti"ya avesteayî û "be"ya farisi pêro parêzene

Parthî	pad
FK	patiy
FM	pad
PP.	pad, pat
FN	be
Av.	pait

Kurmancî	Kirmancî
bi, pê	ebi, pey

par, behr	bare, par
-----------	-----------

XV. Edi kurdî de /W/ ya sereyê çekûye ya ziwanen miyaniya irane ca ebi ca zey parthî ma-

nena, tayn ca de jî zey farisiya newe bena /b/.

PP.	warz
FN	barzîgar
Av.	vareza
û mînakêde bîn;	
Parthî	wafr
FM	bafr
FN	barf
Fina;	
Parthî	varan
FN	baran
PP.	vara
Skr.	vara
Her wina,	
Parthî	wad
FN	bad
PP.	wat, wad
Av.	vata

Kurmancî	Kirmancî
berx	vera
berf	vewr
baran	varan
ba	va

Tiya de kirmancî ebi giranî nêzdiyê partî ya, la belê kurmancî nêzdiyê farisi ya.

Wextê ke mardim farisi û kurdî muqayese kena, jew xususiyeta kurdî a bîn vejiyena; /B/ya miyan û peyniya çekûya farisi edi kurdî de zey /W/ xo dano nîşandayin.

FN	Kurmancî	Kirmancî
ab	av	aw
sebz	sewz	sewz
çoban	şivan	şîwan
abrîşam	hevrişm	hewrişm

Edi peyniyê de mardim şêno vaje ke, zaravayê kirmancî ebi giranî formê parthî pawena, la belê tayn cayan de formê farisiya kan jî gêna. Ci yê balkêş o wo ke çekûyên kirmancî de jübînî çînyo, gorey herêman vuriyenê. Mardim şêna di- hirî formê çekûyê piya, bivîno.

#### Cêrenot:

- FK: Farisiya kan
- FM: Farisiya miyanı
- FN: Farisiya newe
- PP: Pehlewîyê pertikan
- Skr: Sanskritî
- Av: Awestayî

## ZÜLKÜF KİŞANAK

Ji tirkî: Memed Serhedî

### Pevçûna Di Navbera Dewleta tirk, YNK, PDK û PKK ê De

Piştî têkilî û dan û standînen di navbera YNK, PDK û Tirkîyê yên ku li Enqereyê û li başûrê Kurdistanê pêk hatin, di 2'ye kewçêra 1992 an

1992 an de, ji hêla Bakur ve ji hewa û ji bejahiyyê bi çekên giran êrisî baregehê ARGK ê kir. Artêşa tirk bi 15 hezar leşker, bi dehan tanq, top, firoke û balafirênu ku sedan sortî pêk tînin re kete başûrê Kurdistanê. Artêşa tirk 25 km ji tixûb derbas bû û gelek navçe û herêmên başûrê Kurdistanê dagir kir. Di vê Tevgera dageriyê ya ku hey-

herêma Soran, di naverasta tixûbê rojhilatê Kurdistanê de, li cihekî bi çiya bi cih bûn. Vê peymanê dawî li pevçûna di nav kurdan de anî û bû sedema şadî û dilgesiyê. Gelê başûrê Kurdistanê ji ber tangên artêşa tirk ên ku ketibûne xaka başûr, pir mebisî û stûxwar bû. Bi mebesta vê peymanê, gel hinekî ges bu. Her çiqas cara pêşîn êrisîn PDK û YNK wekî li-hevxistinên navxweyî yên kurdan dihate xuyan jî, pişt re hate fêmkirin ku bi mebesta ji holê rakirina PKK ê, bi hêzên Başûr re tevgereke hempar ya artêşa tirk e.

Leşkerên ku girêdayî Dew-

# DÎROKA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ

## YA NÊZÎK

(I) (II)

de hêzên lêşkerî yên Eniya Kurdistanê ku ji YNK û PDK ê pêk hatibûn, êrisî çeperên gerîlayên ARGK ê kîrin. Dewleta tirk li gel ku alî-kariya kel û pelên leşkerî dabû YNK û PDK jî wekî deh rojan ji derveyî şer ma. Di hundirê vê pevçûnê de, di encama hilbijartina kurdan a yekemîn ku 30'ê gulana sala 1992 an pêk hat de di 4'ê kewçêra 1992 an de Dewleta Federe ya Kurdan hate damezirandin. Lê li artêşa tirk baş xuya bû ku li pêşberî van êrişan PKK têk naçe û berxwedana wê naşkê. Lewre jî di bin fermandariya Mete Sayarê ku bi şewitandin û kavilkirina Şernexê bi nav û deng e de, di 12 yê kewçêra

vekê domiya de artêşa tirk sed mîlyon dolar xerc kir. Serkaniya Giştî ya artêşa tirk daxuyand ku di vê pêvajoya dageriyê de li dor 1500-2000 gerîlayên ARGK ê batine kuştin. Lê di rastiya xwe de li dor 170 gerîlayên ARGK ê jiyana xwe dest dabûn. Di navbera endamê komîteya navendî ya ARGK ê Osman Öcalan li gel fermandarekî ARGK ê û serokwezîrê Hikumeta Federe ya Kurd û berpirsiyarekî hikumetê de di 30 yên kewçêra 1992 an de, agirbes û proto-kola aşîtyê hate destnîşan kîrin û dawî li şerê di navbera gerîlayên ARGK ê û pêşmergeyên Eniya Kurdistanî de hat. Gerîlayên ARGK ê li

*Artêşa tirk 25 km  
ji tixûb derbas bû û  
gelek navçe û herêmên  
başûrê Kurdistanê da-  
gir kir. Di vê Tevgera  
dageriyê ya ku beyvekê  
domiya de, artêşa tirk  
sed mîlyon dolar xerc  
kir. Serkaniya Giştî ya  
artêşa tirk daxuyand  
ku di vê pêvajoya da-  
geriyê de li dor 1500-  
2000 gerîlayên ARGK ê  
batine kuştin. Lê di ras-  
tiya xwe de li dor 170  
gerîlayên ARGK ê jiyana xwe  
dest dabûn.*

leta Federe ya Kurd in li bajarê Hewlêr ê di 19 ê Gelewêja 1992 an de girseya ku dixwest tevkujiya ku dewleta tirk li Şirnexê li dijî sivîlan pêk anîbû, protesto bike, gulebaran kirin û du kês kuştin. Vê carê Devleta Federe ya Kurd, kurdên sivîl qir dikir. artêşa Îranê di adara sala 1993 an de bi çekêن giran û bi tevgereke leşkerî ya dorfi-reh başûrê Kurdistanê dagir kir. Îranê ji bo vê dageriyê erîşen ser PDK-Î yên û li dijî hêzên leşkerî yên xwe wekî hincet nîşan dida. Di pêvajoya dageriyê de Îranê sedan gundên kurdan ên li ser sînor şewitandin û vala kirin. Sedan malbatên kurd ji axa wan qetand û ber bi deverên

hundir ve şand. Ci YNK ê û çi jî PDK ê li hemberî vê ye-kê reaksiyon nîşan nedan. Berevajî vê herdu rêxistinan xwestin ku PDK-Î li ser ti-xûb çalakiyan li dar nexe û baregehêن xwe ji ser tixûb rake.

Artêşa tirk di hemî pêvajoya 93 an de li başûrê Kurdistanê operasyonên xwe yên leşkerî domandin. Leşker herdem ji sînor derbas bûn û bi gerîlayên ARGK ê re ketîn şer. Di van lihevxitinan de gelek gund hatin şewitandin û şeniyên van gundan çûne herêmên hundirîn. Di van êrîşan de ji ber ku sivîlên Başûrî jî zerar dîtin, YNK ê û PDK ê hin reaksiyonê xwe wekî helwest diyar nediki-

rin. Dewleta tirkîyê di salên 1993-1994 an de 13.5 milyon dollar yarmetî da PDK û YNK ê. Dîsa ji bilî vê ji bo 1995 an soza 12 mîlyon dollar alîkariyê da van herdu hêzan. Di van salan de di navbera K.T û başûrê Kurdistanê de dan û standinê bazirganî hene. Tê texmînki-rin ku mîjera vê dan û standina bazirganî li dora 200 mîlyon dollarî ye.

Mesût Berzanî di 2'ê Gelawêja 1994 an de daxuyani-yek da Al-Safirê. Di daxuya-niyê de got ku Dewleta tirk ji bo me bû pira têkiliyê .

Di sala 1994 an de, di navbera PDK û YNK ê de li hemî herêmên başûrê Kurdistanê lihevxitineke dijwar pêk hat. Di vê lihevxitinê de li dor 2000 mirovî jiyana xwe dest da. Di pûşpera 1994 an de bi navçîti-ya DYB û Dewleta tirkîyê re lihevxitin bi

“Agirbesêke demde-mî” rawestiya. PKK beşdari van lihevxitinan nebû û bi rengekî alînegir her car bang kir ku pevçûnên di navbera xwe de rawestînin YNK ê guh neda van bangan û Hewlêra ku di bin deshilatdariya hiku-meta hevpar de bû dorpêç kir û di rîben-dana 1995 an de kire bin destê xwe. Ev rû-



dan bû sedema bêhtir gurbûn û firehbûna şer. Balafirên şer ên tirk di 28-29 ê 1994 an de li dû hev li dijî biryargeha navendî ya ARGK ê ku li Zelêya li ser tixûbê û Iran û Iraqê ye êrişen hewayî li dar xistin. 52 balafirên şer êriş li dar xistin. Di vê bombekirinê de bombayên bi navê "Qezan, guşî, dewisandinê" ku li gor peymanên navnete-veyî qedexe ne hatin bikaranîn. Dema ku berdevkê çapemeniyê yê serkaniya giştî Doğu Silahçıoğlu ku di hêzên hewayî yên tirk de peywirdare li ser nexşeyan derbarê bombekirinê de agahî didan, digot ku bi tevî rêberên qadro 2 hezar gerîlayên ARGK ê hatine kuştin. Lê di encamê de diyar bû ku piraniya bombeyan li ser 7 gundênu ku ji wan 4 heb li Rojhîlat û 3 heb jî li Başûr in hatine bikaranîn. Welayetî di daxuyaniya xwe ya fermî de diyar kir ku li gundê serves yê ku di nav tixûbê û Iranê de ye neh gundî hatine kuştin. Li dijî van daxuyaniyan wezîrê karê derive yê Dewleta tirkîye Hikmet Çetin ê sosyal demokrat ku bi binyada xwe kurd e wiha digot: "Dibe ku hêzên hewayî yên tirk xetayan bikin." Di vê êrişê de windayiyên ARGK ê 7 bûn. Dîsa 9 gundiyyên rojhîlatê Kurdistanê û 10 gundiyyên başûrê Kurdistanê ku ji wan 4 zarok û dudu jî jin bûn mirin. Wekî hemî tevgerên leş-

kerî di vê operasyonê de ji sivil dihatin qirkirin.

### **Li başûrê Kurdistanê Tevgera Leşkerî Ya Herî Mezin Ya Artêşa Tirk**

Artêşa tirk di 20 ê Adara 1995 an de di bin fermandariya Qorgeneral Hasan Kundakçi de bi navê "çelik hareketi" (tevgera polayî) hêzeke ku ji 12 general, 2000 serbaz û herî kêm 35 hezar leşkerî pêk hatibû ve başûrê Kurdistanê dagir kir. Li gor daxuyaniyi fermî maliyata tevgerê 65 milyon dollar bû. Li gor pisporê leşkerî jî malîyeta tevgerek wiha dorfireh û mezin gelekî di ser daxuyaniyi fermî re ye. Di nûçeyen çapemeniyê de hatin weşandin ku ev tevger gelekî

ji tevgerên dageriyê yên Qibrîs û Koreyê firehtir û mezintir e. Daxuyaniyi fermî jî ev rastî diçespanidin.

Dewleta tirkîye dermafê vê tevgerê de YNK û PDK agahdar nekir. Lewre van herdu rêkxistinan, reaksiyon nîşan dan. Pişt re di serî de NY(BM) gelek saziyên navneteweyî û dewlet li hemberî vê dageriyê derketin û xwestin ku artêşa tirk rojek berî rojekê ji Başûr vekişe. Her çiqas Dewleta tirkîye xwest ku li hemberî van reaksiyanan derkeve jî, pişti demekê daxuyaniyek bi rengê ku "operasyon bi serkeftî qedîya" da û diyar kir ku dê bi paş ve vekişe. Meh û nîvekê pişti dageriyê, leşkerên dawî yên tirk ji Başûr vekişian. Li gor daxuyaniyi fermî di pêvojaya tevgerê de 555 gerîleyên ARGK ê hatine kuştin, lê PKK ê diyar kir ku ev daxuyanî pûc û bê bingeh in.

**Ev rûdan bû sedema  
bêhtir gurbûn û  
firehbûna şer.  
Balafirên şer ên tirk di  
28-29 ê 1994 an de li  
dû hev li dijî  
biryargeha navendî ya  
ARGK ê ku li Zelêya li  
ser tixûbê û Iran û Iraqê  
ye êrişen hewayî li dar  
xistin. 52 balafirên şer  
êriş li dar xistin.**

Li dijî vê tevgera dorfireh û mezin bertekine erêni jî hatin nîşandayîn. Û Iranê ji vê tevgerê haydarbûna xwe diyar kir û daxuyan ku dê di ti-xûb re derbasbûna gerîlayên ARGK ê asteng bike. Iraqê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku; dibe ku em jî pişgirîye bidine operasyonê. Rûsyâ bê deng ma.

Di heman salê de artêşa tirk di nevbera 5-11 Tîrmeha 1995 an de kete Başûr ji ti-xûb 15 km ber bi hundir ve çû lê ji paş ve vegeriya.

**Hevdîtinê Dûblînê.**

Di encama daxwaz û hevdîtinê piralî yên DYB yê de di navbera YNK, PDK, DYB û Brîtanya de û wekî çavdêr bi besdarbûna Dewleta tirk-yê re, di destpêka Gelawêja 1995 an de hevdîtinê Dûblînê pêk hatin. Lê ev hevdîtinê pêşîn bê encam man. Di 12 ê Gelawêja 1995 an de belavoka dawî dêbihata weshandin. Lê ji ber daxwaza di belavokê dawî de bi cih kirina xala "PKK Rêxistineke Terorîst e" hevdîtin feşkilî avêtin; lewre YNK li hemberî vê yekê derket.

Mebesta hevdîtina Dûblînê ya herî girîng, ji başûrê Kurdistanê dûrxistina PKK ê bû. PKK ji PDK ê xwest ku bila dev ji biryarên ku dê li dijî wê di hevdîtina Dûblînê de bêñ girtin berde, lê bi ser neket. Hevdîtina di navbera rayedarê herdu rêxistinan de bê encam ma. Lewre gerîlayê ARGK ê di 5 ê Gelawêja 1995 an de bi navê tevgera "birûsk" li dijî PDK ê tevgereke leşkerî da destpêkirin. Gerîlayan li bîst cihan êrisî çeperên PDK ê kir. Lihevxitin nêzîkî 4 mehan li seranserî başûre Kurdistanê domiya. Di van lihevxitinan de gelek mirov mirin. Lihevxitin di 10 ê berfanbara 1995 an de bi peymana ku di navbera PKK û PDK ê de pêk hat re qediya. Di pêvajoya pevçûnan de Mesûd Berzanî di daxuyaniyeke xwe de

got ku; Me 1000 gerîlayê ARGK ê kuştine û ji iro pê ve metirsiya PKK ê ya li dijî hevalbendê me Dewleta tirkîye qediya.

Dîsa artêşa tirk di 6 ê kewçêra 1995 an de, di dema li hevxistinan de, bi firoke û balefirêne xwe ji sînor 3 km ber bi hundirê başûrê Kurdistanê ve çû. Lê piştî demeke kurt bi paş ve vekişiya. Hevdîtinê li navçeya Brîtanyayê Dûblînê dest pê kir. Cara diwemîn li bajarê Dogeha ku li ser Brîtanyayê ye bi navê Hevdîtina Dûblînê ya diwemîn di 12 ê Kewçêra 1995 an de pêk hat. Piştî ku ev jî bê encam ma, hevdîtin di navbera van hêzan de li DYB, Brîtanya, Dewleta tirk û başûrê Kurdistanê domiyan. Serokê Daîraya Karê Bakurê Qafqasyayê ku giredayî wezaret, karê derive ya

DYB yê ye Robert Deutsch li Enqereyê û başûrê Kurdistanê hin hevdîtin pêk anîn, lê ji van hevdîtinan jî tu encam derneket. YNK ê parek ji qezanca ku ji deriyê tixûbê Habûrê dihat dixwest; li pêşberî vê PDK ê ji YNK ê dixwest ku ji Hewlêrê (Paytaxta başûrê Kurdistanê) vekişe. Herdu rexistinê kurd ji ber berjewendiyê xwe li hevnehatin û rê li ber hevdîtinan girtin. Ji xêynî vê DYB, Ingilistan û Dewleta tirkîye dixwestin ku qaşo "Hêza Aştiyê" ya ku tirkmen jî di nav de cih bigrin saz bikin.

**Libevxistin di 10 ê berfanbara 1995 an de**

*bi peymana ku di navbera PKK û PDK ê de pêk hat re qediya. Di pêvajoya pevçûnan de Mesûd Berzanî di daxuyaniyeke xwe de got ku; Me 1000 gerîlayê ARGK ê kuştine û ji iro pê ve metirsiya PKK ê ya li dijî hevalbendê me Tirkîyeyê qediya.*

Rêxistinê kurd her çendî dubare kirin ku ev dê tirkmenan hêztir bike û ji bo demeke dirêj li dijî kurdan bike hêzeke leşkerî jî, di encamê de bi ser neketin.

Rojnameya Turkish Deily News (TDN) ya ku li Dewleta tirkîye bi zîmanê Ingilizî derdikeye û wekî tê zanîn li nêzîkî dewletê ye di 5 ê Gulana 1995 an de bi serokê YNK ê Celal Telebanî re hevpeyvînek çêkir. Di hevpeyvîne de Telebanî wiha got: "Em PKK ê wekî rêxistinê terorîst napecirînin, PKK rêxistineke siyasi ye." Dîsa di heman rojê de di TDN ê de Wezîrê Parastina Neteweyî yê Dewleta tirkîye Mehmed Gölhan wiha digot: Ewlehiya Dewleta tirkîye încax li bakurê Iraqê bi deshi-

latdarbûna dewleta Iraqê re mimkun e. Rojtira din di guhana 1995 an de di rojnameya "Yeni Yüzyıl"ê de Nêçîrvan Berzanî got ku "PKK ne tenê ji bo Dewleta tirkîye, her wiha ji bo me jî metîrsî ye." Di 8'ê gulana 1995 an de di TDN ê de Samî Evdirehman wiha digot: Em bawer in pirsgirêka kurd di nav Iraqa demokratik de, bi federasyonê çareser dibe, ne bi xudmuxtariyê. Nûnerê ûrûnê yê Enqereyê Bagerî di 5'ê berfanbara 1995 an de, di hevpeyvîna ku rojnameya Cumhuriyetê bi wî re kiribû de; Piştî ku di dermafê pirsgirêkên ûrûn, Iraq, Surî û Dewleta tirkîye de, daxuyanî dan, wiha got: Ên ku dirav û çekan didin wan (kurdan) ên ku li wir piştgiryê didin kesen ku dixwazin meclisê damezrînin li vir hewl didin ku dewleta kurdan damezirînin. Tişte ku haya wê jê tune lisikîn îsaîl û DYN yê yên li

bakurê Iraqê ne. Em matmâyî ne, hûn çawa deskariya van dewletan a li wir nabînin? Bi vî rengî nêrîna fermî ya ûrûnê ya li dijî gelşa kurd bi awayekî zelal xwe dida der. Bi hewldanê Fransayê re YNK û PDK ê di pûşpera 1994 an de hatin cem hev û biryarê hilbijartînê, yekirina hêzên leşkerî, birêvebiriyeke hempar û amadakirina zagineke bingehîn a nû girtin. Piştî vê biryarê Dewleta tirkîye diyar kir ku ev qewimîn li heremê destpêka avakirina dewleteke Kurdan e û bi gef û gur bi ser hêzên basûrê Kurdistanê de çû. Di qonaxa vê civînê de wezîrê karê derive yê tirk Mümtaz Soysalê sosyal-demokrat bi xwe çû Fransayê û dûmahîka civînê asteng kir. Sosyal di dema vegera xwe de pîrsên rojnamevanan bi vî rengî di bersivand: Min frensî şiyar kirin. Tu têkilî û dan û standin bêyi berjewendiyêne we latê min ne pêkan e were

meşandin, bila herkes hay ji xwe hebe. Em tu car amadekirina zagona bingehîn a ku ji bo avakirina dewletekê destpêk e napejirînin, ji sibê pê de emê çûn hatin û dan û standinê deriyê Habûr ê ti-xûb kêm bikin. Şêwirmendê pêwendiyê navneteweyî yê Denktas, nimînende û pisporê Dewleta tirkîye yê derbarê qirkirina ermeniyan de Mümtaz Soysalê, sosyal demokrat îcar derdikete pêşberî kurdan.

Hevdîtinê aşîtiyê yên ku li Franseyê pêk hatin ji ber dijrabûnê tund ên Dewleta tirkîye nîvco man. Her qewmînê erêni yên di nav kurdan de di serî de dewleta tirk; ji aliye dewletê ku bi kurdan re gelşen wan hene yên herêmê ve hatine asteng kirin. Gefa Soysal a li kurdan dixwar yek ji van astengan bû.

#### Pevçûnê di navbera YNK û PDK ê de

Pevçûnê berfireh ên di navbera herdu rêxistinêne mezin ên Başûr, piştî ku YNK ê Hewlêr dorpêc kir û kire bin qontrola xwe, destpê kirin. Herdu rêxistinêne Başûrî di gel ku gelek caran agirbest ilan kirin jî, di nav xwe de peymaneke aşîtiyê pêk neanîn.

PDK ê di destpêka rezbera 1996 an de hêzên xwe li háwirdora Hewlêrê bi cih kir û amadehiya cerdeke mezin kir. Di rezberê de ji nişka ve



bi piştgiriya yekîneyên bi zirx ên hikumeta navendî êrişî çeperên YNK ê kir û Hewlêr bi dest xist. Hêzên YNK ê li pêşberî êrişên PDK ê xwe negirtin û ber bi Silêmaniyê ve vekişyan. PDK-I yê bi piştgiriya hêzên Iraqê cerd û êrişên xwe gur kirin. Di encamê de, di serî de bajarê herî mezin ê diwemîn ê Başûr, Silêmaniye û hemî herêma Soran kire bin destê xwe. YNK bi serokênen xwe û nêzîkî 100 hezar alîgîrên xwe ve derbasî rojhilate Kurdistanê bû û xwe sparte, Îranê YNK di dîroka xwe de di nav têkçûna herî mezin de bû.

Di dema van pevcûnan de avahiyê Parlementoya Federale ya Kurdan ji layê PDK ê û hikumeta Iraqê ya navendî ve hate rûxandin û talankirin. Awayê damezirandina wê çawa dibe bila bibe, parlementoya ku di dîroka Kurdistanê de, pişti komara Mehabadê cara yekemîn li ser axa welêt hate sazkirin û ji layê rêxistineke kurd ve di hate hilweşandin û rûxandin. Ev yek bû egara şasbûn û matmayîna gelê kurd, lê mi-xabin ev jî rastiyeke me ye dilkovan bû. PDK ya ku neyarênen gelê kurd bûye bela û xiyanet ji bo xwe wekî awa-yekî jiyanê pejirandiye, dibû eger ku nayarênen gelê kurd bibêjin: "Kurd nikarin dewletê damezrînin, ji ber ku ewqasî pêş ve neçûne." PDK

ê ji bo ku rêxistina başûrê Kurdistanê bişkêne bi sedamê ku yek ji mîrkujêngelê kurd e û xwînxwarê Halepçeyê ye re hevkarî pêkanî û bû egara kuştina ji hezarî zêdetir kurdî û panaberbûna deh hezeran. Di pêvajoya şer de yekîneyên Sedam sedan kurdên ji rêzê girtin û di cih de kuştin. Dîsa sîxûrên nelînî yên Iraqê bi ser saziyên kurdan de girtin û gelek agahî û belge desteser kirin. Cîhan careke din dibû şahidê

pevcûnên navxweyî û xiyaneta kurdan. Di dema pevcûnen navxweyî dê tevgereke din a xiyanetê ya ku kurd, lerizandin derkete holê. DYA yê pênc hezar kurd kiribûn ajan û leşkerên xwe ên bidrav. Dageriya Iraqê ya başûrê Kurdistanê DYA û tevgera sîxûran kire nav tirs û xofê; ji ber vê yekê di navbeyna hefteyekê de sîxûr bi malbatênen xwe re bi lez û bez di ser Dewleta tirkîye re derbasî Girava Gûma ku li ser Pasifikê ye bûn. Di heman rojan de navenda fermandariya Hêza Çakûç a ku li zaxoyê bû ji nişka ve biryar girt û derbasî Sîlopiyê bû. Bi vî awayî polîfikaya DYA yê ya li ser Başûr têk diçû. Ji aliyekî din ve digot ewqas hewldanen Dewleta tirkîye Hêza Çakûç li Başûr ji holê rabûn. Hêza leşkerî ya heves a ku qaşo ji bo parastina kurdan hatibû sazkirin, îcar bi navekî din dikete bin qontrola Dewleta tirkîye.

YNK ya ku di rezberê de ji PDK ê derbeyeke giran xwar bi piştgiriya Îranê re di 13'ê rezbera 1996 an de êrişî PDK ê kir û Silemaniye carêke din kire bin destê xwe. PDK ya ku îcar bê destek ma li dijî êrişên YNK ê hetanî ti-xûbê Hewlêrê ji paş ve vekişya. Bi vî rengî bajarê Hewlêrê kete bin qontrola PDK ê û di hevdîtinên çar alî yên ku dê dest pê bikin de di dan û standinan de para bazarê ya

*Di rezberê de ji  
nişka ve  
bi piştgiriya yekîneyên  
bi zirx ên hikumeta  
navendî êrişî çeperên  
YNK ê kir û Hewlêr bi  
dest xist. Hêzên YNK ê  
li pêşberî êrişên PDK ê  
xwe negirtin û ber bi  
Silêmaniyê ve  
vekişyan. PDK-I yê bi  
piştgiriya hêzên Iraqê  
cerd û êrişên xwe gur  
kirin. Di encamê de, di  
serî de bajarê herî  
mezin ê diwemîn ê  
Başûr, Silêmaniye û  
hemî herêma Soran  
kire bin destê xwe.*

YNK ê hate daxistin. Di vê navberê de hêzên yekgirtî moşek, du moşek şandin raqê û yekîneyên bi zirx ên raqê ji Hewlerê derxistin.

Nûnerê Enqerê yê Iraqa ku tanqên xwe derxistin derveyî Hewlerê El Tîkrîttî bi rayedarên tirk re hevdîtin pêk a-nîn. Di van hevdîtinan de van pêşniyaran pêşkêş dike: ji bo ku Telebanî û Berzanî werin Bexdayê bi ser wan de herin. Bila valahiya bakure Iraqê ji navê rabe û em bi hev re PKK ê biqedînin. Iraq û Dewleta tirkya ku di platformên navnetewî de tu car li hev nayêñ dema ku kurd têne rojevê, di heman kêliyê de bi lez û bez têne cem hev û ji bo xalêñ hevbeş di-bînin.

Lê sed mixabin kurd li  
hemberî hevkariyên ku li di-  
jî wan pêk têن helwesteke bi  
vî rengî nîşan nadin. Li bere-  
vajî vê kurd li şûna gelşen di  
navbera xwe de bi xwe çare-  
ser bikin, bi hêzên biyanî re  
li riya çareseriyê digerin.

Berdevkê wezareta karê  
derve Onur Öymen ji şêwr-  
mendê serokê Dewleta Iraqê  
yê Sedam Huseyn Hemîd  
Usif Hemediyê ku di 11ê  
Rezbera 1996 an de hate  
Dewleta tirkîye xwest ku  
bandora xwe ya li ser PDK ê  
bikarbînin ku PDK hêzên  
ARGK ê yên li başûrê Kur-  
distanê xe, ji bili vê Öymen  
pêşniyaz kir ku bila Iraq û  
Dewleta tirk, ji bo ku li dijî

kurdên li derveyî sînor şer bikin di nav xwe de peymanekekê çêbikin. Dewleta tirk bêyî peyman jî ji xwe herdem dikete Başûr; lê mebest ew bû ku ji bo wan ketin û derketinan dirûvekî bi zagon bibîne. Dewleta tirkîyê her çiqas nedixwest jî, dema dikete Başûr carna mecbûr dima ku agahiyan bide PDK ê. Dewleta tirkîyê li şûna PDK ya hevkara xwe ya ku wekî partiyeke kurdan dihate pejirandin, bi Iraqa ku jî layê hemî cîhanê ve hatibû cudadîkirin re têkîlî datanî. Lê ci YNK ê û ci jî PDK ê ev rastî nedidîtin. Lewre dibûne egerên pevçûnên di navbera kurdan de. Dîsa di encama pevçûnên di navbera rêexistinê kurd ên Başûrî de gel êş û jan li pişta xwe bardikir. Di 19 ê Rezbera 1996 an de ji komek kurdên ku dixwestin ji Başûr derbasî Dewleta tirkîyê bibin 19 kes ji aliyê hêzên şer ên tirk ve hatin girtin. Pişti ku dest û lingêwan hatin girêdan bi awayekî hovane hatin gulebaran kirin. Ev qirkirin ne destpêk bû ne jî dawî. Xwespartina Îranê ya YNK ê xwe spartina Iraqê ya PDK ê Dewleta tirk û DYAK kire nav teşqeleyê. Alîgirê wezîrê karê derive yê DYAK yê Robert Pelletreau di 22'ê rezbera 1996 an de, li Sîlopiyê di Tûgaya Piyadêde, bi Berzanî re derbare rûdanê dawî yên başûrê Kurdistanê de hevditîn pêk anî.

Di vê hevdîtinê de bi beşdar-bûna DYA, Dewleta tirk, YNK û PDK ê re bê şert û merc biryara hevdîtinê hate girtin. Di heman rojan de serokê YNK ê Telebanî li Enqereyê bi Wezîra Karê Derve ya Dewleta turkyê Tansu Çil-lîrê re hevditîn pêk dianîn. Li pey rojekê an jî du rojan piştî ku Pelletreau li Enqerê bi Telebanî re hevditîn çêkirin, diyar kir ku ji herdu serokan jî soza agirbesê girtiye. Bi vî rengî serokên kurd ên Başûr bi ferмана hêzên derve re li ba hev jiyîn pejirandibûn. Di heman hevditinan de, biryara sazkirina qaşo hêza aştiyê ya ku dê agirbes qontrol bi-

*Lê ci YNK ê û ci ji  
PDK ê ev rastî nedidîti-  
n. Leurre jî dibûne ege-  
rên pevçûnên di navbe-  
ra kurdan de. Dîsa di  
encama pevçûnên di  
navbera rêxistinên  
kurd ên Başûrî de gel  
êş û jan li pişta xwe  
bardikir. Di 19 ê Rezbe-  
ra 1996 an de ji komek  
kurdên ku dixwestin ji  
Başûr derbasî Tîrkiyeyê  
bibin 19 kes ji aliyê hê-  
zên şer ên tirk ve hatin  
girtin. Pişti ku dest û  
lingen wan hatin girê-  
dan bi awayekî hovane  
hatin gulebaran kirin.*

kira hate standin. Qaşo hêza aştiyê ya navborî, di bin fermandariya fermandarekî tirk de: dê ji leşkerên tirk, tirkmen, asûrî û ji çavdêrên leşkerî yên DYA û Brîtanyayê pêk bihata.

Dema ku li Dewleta tirkîyê hevdîtinêñ pir alî didomîyan, serokê PKK ê Abdullah Öcalan bangî serokêñ herdu rêtixtinêñ kurdêñ Başûrî dikir û wiha digot; Dev ji hev gevizandinê berdin, ji kê tê bila bê li dijî her cure pêkuñ û çewsandinêñ li ser gel derkeve û gel biparêze. Öcalan li gel banga qedandina pevçûnêñ navxweyî, xwe ji bo navçîtiyê pêşniyar dikir. Lê li dijî van bangan serokwezîrê hûkumeta ku PDK ê li Şâqlavayê damezirandibû Nûrî Roj Şaves, di 29 ê Kewçêra 1996 an de di hevpeyvîna ku Hürriyetê bi wî re kiri-bû de wiha digot: Heyeta PKK ê li herêmê nikare tiştekî erêñî bike. Telebanî dikare bi wan re hevdîtin pêk bîne, lê ez bawer nakim ku Berzanî bi wan re biaxive. Em di navbera xwe û Telebanî de tenê hewldanêñ Dewleta tirkîyê û DYA yê girîng dibînin. Em li wan bawer dikin. Em hewldanêñ PKK ê nabînin. Serokê YNK ê Telebanî di MED TV ê de di girêda-neke zindî de ji PKK ê dixwest ku li dijî PDK ê alikariyê bide YNK ya ku di tengasiyê de ye û li gel wê êrisî PDK ê bike. Lê PKK ê heta-

nî dawiyê alînegiriya xwe domand. Di vê navberê de Parlemenâ Kurdistanê li Derveyî Welat, PKDW ê heyeteke aştiyê şand başûrê Kurdistanê. Heyeta PKDW ê bi PDK û YNK ê re hevdîtin pêk anîn. Lê di van hevdîtinan de encameke erêñî bi dest nexist. Herdu rêtixtinan jî hev û du bi xiyanetê tawanbar kirin. Ev heyet heta-nî dawiya şer li herêmê ma û hevdîtinê aştiyê domandin. Di navbera 30-31ê Kewçêra 1996 an de bi besdarbûna PDK, YNK, DYA, Dewleta

tirk, Brîtanya û Tirkmenan re li Enqere du rojan li pey hev civîn pêk hatin. Di van civînan de biryarine hevbes hatin girtin û ji bo agirbesa di navbera PDK û YNK ê bidome li hev hatin. Ev civîn bi navê Belgeya Enqereye hate navandin. Hin xalêñ di belavôka encama civînê de cih digrin ev in:

**1- Divê peyman zerarê nedîn yekîtiya axa Iraqê**

**2- Divê ewlehiya Dewleta tirkîyê û welatên cîran di paş guh re neyê avêtin.**

**3- Alîyîn şer ji bo ku pevçûn bêhtir mezin û fireh nebin û ji bo destkariya hêzêñ din nebin li hev hatine.**

**4- Ji nîvê şeva 23 yê Kewçêre pê ve cihê ku hêzêñ PDK û YNK ê lê ne wekî xeta agirbesê tên pejirandin.**

**5- Alî dê di çeperêñ parasînê de bimînin û dê êrişan pêk neynin.**

**6- Bi mebesta çavdêriya dê hêza çavdêriyê ya aştiyê (BÎG) were sazkirin. Dê ji Tirkmenan û partiyêñ alînegir ên kurd û suryaniyan ku herdu alî jî li ser hev dikin hêzek were sazkirin û ev hêzê demek berî demekê vê peywirê hilgire.**

**7- Ji bo qontrolkirina kar û barêñ Qomîteya Çavdêriya Aştiyê û ji bo li ser gilî û ga-zincen aliyan lêgerîn bêñ kîrin, Qomîteya Qontrolkirin û Çevdêriya Aştiyê (BÎDK) hatîyê damezirandin.**

**8- BÎDK dê li Enqereye**

*Öcalan li gel banga qedandina pevçûnêñ navxweyî, xwe ji bo navçîtiyê pêşniyar dikir. Lê li dijî van bangan serokwezîrê hûkumeta ku PDK ê li Şâqlavayê damezirandibû Nûrî Roj Şaves, di 29 ê Kewçêra 1996 an de di hevpeyvîna ku Hürriyetê bi wî re kiri-bû de wiha digot: Heyeta PKK ê li berêmê nikare tiştekî erêñî bike. Telebanî dikare bi wan re hevdîtin pêk bîne, lê ez bawer nakim ku Berzanî bi wan re biaxive.*

were bi cih kirin û dê ji nûnerên Dewleta tirk, DYA, Brîtanya, PDK-I, YNK û BÎG ê pêk were. Kom dê di hefteya yekemîn a sermawezâ 1996 an de, bicide û dê azîneyên xebata hundirîn kifş bike.

**9-** Alî dê, dîlan serbest berdin û miriyan li hev vegeŕinin.

**10-** Aliyên derbarê ewjiliyaya personelên alîkariya mirovî û malbatêwan de mutabiq in.

**11-** Aliyan, bi besdarbûna tirkmen, suryanî û hemî komên nîjadî û partîyan re li Bakûrê Iraqê damezirandina Birêveberiyeye Herêmî ya Demdemî (GYY) wekî prensip pejirandine û di vê mijarê de ji bo domandina hevdîtinan lihevhatinek pêk anîne.

**12-** Divê derametên rijiye û bacêñ din bi rengekî zelal werin berhevkirin û ji bo berjewendiyen hevbes ên gelê herêmê bi awayekî wekhev werin bikaranîn.

**13-** Hilbijartinê nû dê di demeke rewa (uygun) de pêk bêñ.

**14-** Aliyên şer di sérî de PKK ji bo astegnkirina çalakiyên bizavêñ terorist li hev hatine.

**15-** Besdarvan dê ji bo girtina baregeha Etrûşê û ji bo vegera hemwelatiyên Dewleta tirkî alîkarî û piştgiriyyê bidin xebatêñ Qomîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyê Yekbûyi.

Li dijî vê belavoka ku wekî belgeyeke hevbes hate pêşkeshkirin û di hevdîtinê pêncalî de li ser hate rawestîn reaksiyonike YNK ê ya girîng diyar nebû. Lê PDK ê tenê xalêñ derbarê agirbes û aشتîyê dipejirandin, li dijî xalêñ din demeke dirêj dîmeneke neyînî nîşan dida. PDK ê di civîna ku 15 ê Sermawezâ

dibû, li aliyê din jî, bi Bexdayê re têkilî saz dikirin û li ser modela Otonamiyê dixebitî. Yek ji şêwirmendêñ Seddam, Ezîz Nûrî hate Dihoka ku bajarekî girîng yê başûrê Kurdistanê ye û bi Nêçîrvan Berzanî re le ser federasyonê û xudmuxtariyê hevdîtin pêk anîn. Lê ji berpest û pêkutiyêñ DYA yê,

### *Mebesteke girîng ya vê saziyê jî*

*çavdêrikirinâ kurdên Bakûrê Kurdistanê yêñ ku li baregeha Etrûşê bi cih bûbûn bû, ji bo belavkirina vê qampê hincet dîtin bû.*

1996 an hate dubarekirin de, dîsa heman helwest diyar dikir. Piştî civîna 15 ê Sermawezê Pîrot Ehmedê ku serokatiya heyeta ku li ser navê PDK ê besdarî civînê dibû dikir wiha digot: "Tu nîşaneke ku PDK ê li dijî PKK ê şer bike tune." Di vê navberê de, artêşa tirk di navbera 4-9 ê sermawezâ 1996 an de li herêma ku di bin desthilatdiriya PDK ê de ye, operasyoneke berfireh pêk anî. Di heman tevgerê de gundine ku di bin qontrola PDK ê de ne jî, hatin bombekirin. PDK ê dijî bombekirina gundan da-xuyaniyên tûj dabûn. Lê ji bo ku têkiliyên wan bi Dewleta tirkî re xerab nebin bi baldar bû. PDK li aliyekî besdarî civînênu ku hikumeta navendî ya Iraqê derve dihişt

hevdîtinê Berzanî û Dûrî ji bo demekê şünde hatin avêtin. Çalakiyên BÎG pir bi lez û bez dixebitî û hemî rûdan û pêşveçûn yek bi yek wekî rapor amade dikir û dişande Enqereyê.

Mebesteke girîng a vê saziyê jî çavdêrikirinâ kurdên Bakûrê Kurdistanê yêñ ku li baregeha Etrûşê bi cih bûbûn bû, ji bo belavkirina vê qampê hincet dîtin bû. Qomîseriya Bilind a Neteweyê Yekbûyi li ser daxwaza Dewleta tirkî Baregehê Etrûşê girt. Hinceta girtina qampê jî raporê bêbingeh û çewt ên BÎG ê bûn. İcar leqayî helwesta NY ê ya derveyî mirovahiyê dibûn. Li ser biryara girtina baregehê li dora 1000 kurdên sivil xwe spartîn hêzîn ARGK ê yêñ li warê şer.

Kurdên ku li baregehê man jî bi rojan ketin berxwedana greva birçîbûnê û pişt re xwe spartin Mûsûla ku di bin desthilatdariya Seddam de bû. Kurdên Bakurî yên ku ji ber zilma artêşa tirk xwe spartibûn kurdên Başûr, îcar ji ber xiyaneta kurdên Başûr direvîn û xwe dispartin merkuj û xwînmijê Helepçê Seddam. Bi vî rengî rûpelekî reş dîsa li dîroka kurdan a kambarax zêde dibû. Li aliyekî valakirina baregeha Etrûşê domdikir, li aliye dirr jî tevgera hewayî û bejayî ya artêşa tirk ku di 30 ê Berfanbara

1996 an de destpêkiribû di-domiya. Artêşa tirk di 2 yê rîbendana 1996 an de li başûrê Kurdistanê gundê Bazennî bombebaran kir. Di enca-ma vê bûyerê de 5 kes mirin. Ji wan sê kes zarok bûn. Dîsa 9 kes jî birîndar bûn. Li dijî vê rûdanê PDK ê, tu ber-tek nîşan neda, lewre pêwîs-tiyêne pêvajoya Enqereyê ku di meha kewçêrê de, destpê kiribû dianî cih. Tevgerên artêşa tirk ên ku di 30'ê Ber-fanbarê de, li başûrê Kurdistanê destpê kirin, bi sala nû re bi hemî lez û beziya xwe ve domiyan. PDK û YNK a ku ji layê DYB, Dewleta tirk û Brîtanyayê ve teslim hati-bûn girtin ne li dijî tevgerên leşkerî yên artêşa tirk ên li Başûr û ne jî li dijî çalaki-yên BÎG ê yên nû, tu deng dernedixistin. Berevajî vê ji bona ku ev êris bêhtir bi bandor bin ji destê wan ci dihat dikirin.

**Kurdên Bakurî yên  
ku ji ber zilma artêşa  
tirk xwe spartibûn  
kurdên Başûr, îcar ji  
ber xiyaneta kurdên  
Başûr direvîn û xwe  
dispartin merkuj û  
xwînmijê Helepçê Sed-  
dam. Bi vî rengî rûpe-  
lekî reş dîsa li dîroka  
kurdan a kambarax zê-  
de dibû.**

**Tevgera Dageriyê Ya Ar-  
têşa Tirk Ku Li Başûrê  
Kurdistanê Di 14'ê Gulana  
1997 An De Destpêkir û  
Piştgiriya PDK-I Yê.**

Artêşa tirk di 14 ê Gulana 1997 an de, ji hewa û ji beja-yê dest bi tevgera dageriyê kir. Tevgera ku di bin fer-mandariya Tumgeneral Yusuf Soybaş de, destpêkir herî kêm bi 140 hezar leşker, 250 teng, sedan kel û pelên bizirx û filoyen balafir û firokeyan

ve didome. Dewleta tirkîye ji sala 1993 an vir de li başûrê Kurdistanê 190 tevgerên leşkerî li dar xistin. Li gor hin dîtinan ev hêza bi navê "çe-kûç" tevgera leşkerî ya herî dorfireh û domdirêj a dageriyê bû. Lihevxitinêni di navbera hêzên leşkerî yên tirk û şervanên ARGK ê de, didomin. Di vî şerî de, PDK ê bi çekêن giran alîkarî da artêşa tirk. Li Kurdistanê xiyanate-ke nedîti xwe dide der.

Hevdîtinêni di navbera PDK ê û Dewleta tirkîye de, yên ji bona li dijî PKK ê êri-şike hevbes pêk were hatin li dar xistin, demeke dirêj domiyan. Li gorî nûçeyeke ku di hejmara 12'ê Kewçêra 1996 an a Milliyetê de cih digirt; Balyozê Dewleta tirkîye yê Qahîrê Yaşar Yakış bi sekreterê Giştî yê Yekîtiya Ereban İsmet Abdulmecid re hevdîtinekê pêk tîne. Pişti hevdîtinê vê daxuyaniyê di-de çapemeniyê. "Daxwaza me ew e ku leşkerên Iraqê ti-xûbê tirk û ereban biparêzin.

Lê ger ev ne pêkan be, di-vê bi M. Berzanî re peyman bê çêkirin! Ji daxuyaniyên balyoz diyar dibe ku; ger Dewleta tirk karibe wê bi destûra Iraqê başûrê Kurdistanê dagir bike hetanî ku Iraq ji tecrîta navneteweyî bifilite. Dema ku Iraq ji tecrîta navneteweyî filîti jî dê başûrê Kurdistanê bi destê xwe dîsa têxe bin qontrola

dewleta Iraqê. Di vê navberê de dê van kar û barê xwe bêyî hevkariya PDK ê pêk bîne. Ji ber ku PDK di dawiye de rôexistineke Kurd e. Lê di serî de Iraq, hemî cîhana ereb vê yekê red dikin. Lewre ji Dewleta tirkîye bawer nakin, ji aliyê din ve di heman rojê de di rojnameya Hürriyetê de, nûçeyek derdikeve. Di 12 ê kewçêra 1996 an de birayê M. Berzanî yê biçûk Dilşad Berzanî li Enqereyê ye. Dilşad Berzanî pêşniyazeke wekî pêşniyaza Dewleta tirkîye wiha dibersivîne. "Em niha bi Telebanî re di têkoşînê de ne. Ger em li bakurê Iraqê desthilatdariyê hilgirin, ji bo ku PKK ji bo Dewleta tirkîye nebe metirsî emê gavinan biavêjin." Bi rastî ji piştî ku PDK ê YNK ya ku ji komên cihê pêk tê û bi nasnava Sosyal-Demokratî nasîn bi êrişa rezbera 1996 an re bêtêsîr hişt; bi Dewleta tirkîye re têkilîyê xwe gelekî xurt kirin û îcar jî berê xwe da PKK ê, PDK ê di destpêka gulana 1997 an de êrişî ARGK ê kir. Êrişeyeke mîna êrişa 1992 an lê ji wê mezintir û firehtir pêkanî. Di vê êrişê de, Dewleta tirkîye jî piştgiriya PDK ê kir. PDK ê tenê êrişî hêzên leskerî yên PKK ê nekir. Di heman kêliyê de êrişî saziyên sivil kir û bi dehan mirovên sivil kuşt. Di nav van saziyan de: Nexweşxane, navendên çandê, buroyên çalakiyên ramyarî,

buroyên çapemeniyê avahîyê kurdên Bakurî jî hebûn. Li Hewlêrê işkence li 9 nexweşen ku li nexweşxaneyâ Heyva Sor bûn kîrin. Pişt re ew derxistin derive û li ber çavên gel gulebaran kîrin. Ji wan 9 kesan 5 kes jî jin bûn. Tirkmenen ku di bin ferman-dariya generalê tirk ê ku xwedêgiravî agirbesa di navbera PDK û YNK ê qontrol dike de ne, û pêşmergeyê PDK ê ev kes bi rengekî hovane kuştin. Cendek bi pey erebeyan ve hatin girêdan û li navende bajêr hatin gerandin. Xiyaretê disa bi awayekî nedîti û bi azîneyê hovane xwe dabû der. Kirinên deriveyî mîrovahiyê yên qaşo hêza aştiyê BîG a di bin fermandariya genaralê tirk û PDK ê de bi livbaziyên giyanbazane ve hatin bersivan-din. Welatparêzên Başûrî û Bakurî li dijî vê hovîtiyê li pey hev çalakiyên giyanba-

zan li dar xistin. Di encama van livbaziyan da çeteyê xiyanetê sist bûn. Li ser reaksiyonan, PDK ê kir ku tirkmenan li dijî sivilan bi kar bîne. Bi tawanbarkirina tirkmenan re xwest ku ji berpirsiyariya tevkijiyan bifilite. Ji aliyê din jî tirkmenan xwestin kû berpirsiyariya van komkujiyan li PDK ê bar bikin.

Lê gelê kurd qomploya navneteweyî û karêñ kirêt ên tevgerên xiyanetê dinasî û rastiya wan dîzanibû. Komara tirk bi piştgiriya DYAYA û Brîtanyayê ya eşkere û bi hevkariya PDK ê dixwaze başûrê Kurdistanê dagir bi-ke. Hat fêm kîrin ku ev dage-î li dijî PKK ê operasyone-ke hevbeş ya DYAYA, Îsraîl, Brîtanya, Dewleta tirk û PDK-I yê ye. Lê PKK ê li dijî vê operasyonê bersiveke tund da. Lewre ev operasyona ku mebesta wê ji holê râkirina PKK ê bû di destpêkê



dê, kete xetereyê. Her çiqas çapemeniya birjûva dageriya Başûr bi sernavêن “pelçiqan-din buhurîn”, “Çiya û banî bi alan dorpêç bûn”, “Mehmet-çik paqîj dike”, “PKK bi bir-çîbûnê re rû bi rû ma”, “Zap di bin destê Mehmetçik de ye” diyar kirin jî ev rast nîn bû; Bi şerê pîskolojîk ve berrevajîkirina rastiyan bû. Li qada şer li dû hev ketina balafiran û mirina fermanadarên eniyê rastî bi rengekî zelal nîşan dida. Du balafirên bê-hempa yên ku ji layê DYA û Frenseyê hatinê çêkirin li başûrê Kurdistanê ketin. Li gor serkaniya giştî û çapemeniya tirk ev balafir xwedêgiravî ji arizeyên teknîkî ketine. Li gor çavkaniyên PKK ê jî hejmara balafirênu ku ketine 6 heb bûn. Heman çavkaniyan diyar dikir ku ev cara pêşîn e ku moşekên ji bo ji êrişen hewayî parastinê, hatine bi kar anîn. Cara pêşîn bikaranîna çekeke evqas girîng mezinayî û firehiya şer bi awayekî berbiçav dida der. Li gorî serkaniya giştî di 24 rojên pêşîn ên şer de, 2 hezar 3 sed gerîlayêñ ARGK ê hatine kuştin, sedan çek, sed hezaran muhîmat, pencsêd tonî bêhtir xwarin hatinê desteserkirin. Li pêşberî van hejmaran, 11 serbaz û 90 leşker hatine kuştin. Di daxuyaniyên heman demê yên PKK ê de diyar bûku ev tevderew in. Li gor PKK ê: 6 balafirênu şer ên tirk hatine

xistin. 190 leşker ku ji wan 13 heb serbaz in hatine kuştin, 250 birîndar bû. Li dora du sed pêşmergeyên PDK ê ku ji wan du heb fermandar in hatine kuştin. Dîsa PKK ê diyar kir ku 36 mirov hatine kuştin û li dora 40 kesî jî birîndarên wan hene. Ji alîgîrên wan 58 kes ji layê PDK ê an hatine kuştin anglo dil hatine girtin. Çavkaniyên serbixwe daxuyaniyên PKK ê yên derbarê windayiyan de rastir didîtin.

Li Bakur û Başûr şer bi hemî lez û beziya xwe didomîya. Di vê navberê de, ji fermanadarên PKK ê Xelîl Ataç li Beyrûda Peytaxta Lutmanê daxuyaniyek da çapemeniyê. Li gorî Ataç: Tirkîyê bi hevkariya PDK ê û bi piştgiriya Îsraîl û DYA yê Başûr dagir kiriye Îsraîl û DYA jî ji iro şûn de di nava hedefen me yên giştî de ne. Li Dewleta tirkîyê rewşa şer heye. Bila tu tûrîst neçin Dewleta tirkîyê. Em ji tiştên ku bêne şerê tûrîstan berpirs nîn in. PKK ê cara pêşîn Îsraîl û DYA di nava hedefen xwe de, nîşan dida. Tevgera dageriya başûrê Kurdistanê ya artêşa tirk ku di 14 ê gulanê de dest pê kiribû di pêvajoya salê de domiya.

Li gor stratejiya Bülent Ecevit, şerê ku didome Başûr û Bakurê welêt kiriye yek û pevçûn li hemî Kurdistanê belav kiriye. Bi taybetî jî hemî hêzên Başûr ên we-

latparêz li dijî artêşa tirk û PDK ê li dora PKK ê civiyanê û bi PKK ê re ketine têkoşîna hevbes. Di dîrokê de, têne di dema Şêx Ubeydullah de, him li Rojhilat him jî li rojavayê Kurdistanê serhildanek pêk hat. Pişti vê serhildanê ev cara yekemîn bûku ji bo têkoşîna rizgariya neteweyî derfetek bi vî rengî derdikete holê. Têkoşînê Bakur û Başûr kire yek. Di dîrokê de, kurdan gelek caran ji bo rizgariya neteweyî seri hildane û herdem winda kiri-ne. PKK û rêberiya wê şerê vejîn û felata kurdan bi awa-yekî biryarder didomîne. Şerê hebûn û tunebûnê yê kurdan ber bi sedsala 21. bi rengekî tûj didome.

*Di dîrokê de kurdan  
gelek caran ji bo  
rizgariya neteweyî seri  
hildane û herdem  
winda kirine. PKK û  
rêberiya wê şerê vejîn  
û felata kurdan bi  
awayekî biryarder  
didomîne. Şerê hebûn  
û tunebûnê yê kurdan  
ber bi sedsala 21. bi  
rengekî tûj didome.*

# GELŞÊN METODOLOJÎK

## ÊN DÎROKNIVÎSÎNA KURDÎ

I. ŞERİF WANLI

(Werger: Hesen ZINAR)

**P**eyva "Hîstorîgrapie" bi eslê xwe Latînî ye. Di Frensi de wateyeke vê peyvê ya eşkere û zelal heye. Ev, karê dîroknivîsarê ku ji aliye mîr ve hatiye wezifedarkirin e. Naxwe, ev tiştê ku tê nivîsin, dîroka fermî ya mîrîtiyê ye. Li gorî dilê mîran nivîsin tê ev awayekî dîroknivîsîna Bîsansî ye. Berhema bi navê heşt bihuşt a ku bi destê İdrîsî Bedlîsî hatibû nivîsin, ji bo ku dilê Sultanê Osmani Selîmê yekemîn xweş bibe hatiye nivîsin. Dîrok ev tişt nîne. N. Marîê ku Gurcî ye di nivîsareke xwe de, derheqê kurdan de weha dibêje: Gelê ku ji aliye dîrokê ve hatiye ji bîr kirin." Dikaribû hêj rastir weha bigota: "Gelê ku dîroknivîsinê ew ji bîr kiriye gelê kurd e." Di ingilîsi de wateya peyva "Hîstrograpie, berevajiyê ya jorîn e. Metodolojiya dîroknivîsinê ji vedihewîne û dorferehtir e.

Gelşen ku derdikevine pêşberê dîroknivîsen kurd an ji yên ku derbarê kurdan de dinivîsin pir in. Divê ku ev gelş bêne çareserkirin. Hinek ji van gelşan gelempêri û hinek taybetî ne. Yên bingehîn ev in:

### 1) amanên Dogmatîk, Dek û Dolabêni Di Dîroknivîsîna Kurdî de

Hinek mirov ne tê de, bi gelempêri dîroka kurdan û erdnîgariya Kurdistanê ji aliye gelekan ve li ber çavan nehatiye girtin, an ji hatiye biçûk kirin. Pirsgirêka ku diçê û tê, ji bîr kirin, seb û lew, dek û dolab û ji bîr kirina bi qestî ye. Bi taybetî beriya şerê cîhanê yê yekemîn û di dema şer de, dema ku Kurdistan ber bi serxwebûnê ve diçû, di weşanê Ingilîzan de, pesnê kurdan dihate gotin.

Ji ber ku kurd serbixwe nîn in, di nav çar dewletan de hatine parvekirin, têne pelçiqandin û di mêzîna bazar û siyasetê de sivik tê, bi ser de ji, ji ber ku kurd nebûne yek, perçê perçê û kom bi kom in, dostêwan, derbarê dahatû û paşeroja wan de pîrsan dikin. Ji bîr dikin ku kurd xwediyê çandeke kevnar in, û yek ji çar gelên rojbilata navîn ê mezintirîn in.

Careke din em bi bîr bînin, pêşiyêndan kurdan beriya dîrokê, li Kurdistanê teknolojiya çandiniyê, pişt re cara

ewil wan şarezayiya bajravaniyê afirandiye. Kurd xwediyê mîrata gelên kevnar, Hurrî-Mîtanî, Urartu û Medan in. Ji bo pêşveçûn û parastina îslamiyetê ew xwediyê neqşen giranbiha ne. Lê, divê neyê jibîrkirin, piştî ku me serxwebûna xwe winda kir, hêdî hêdî me ga-vêñ çandî û civakî paşve avêtin. Kurd ketine rewşike xerab. Li paş man. Divê ku ev yek bête pejirandin.

Şarezayiya serdema navîn a Kurdistanê, piştî şerê Çaldiranê yê ku di sala 1514 an

*Ji ber ku kurd serbixwe  
nîn in, di nav çar  
dewletan de hatine  
parvekirin, têne  
pelçiqandin û di mêzîna  
bazar û siyasetê de sivik  
tê, bi ser de ji, ji ber ku  
kurd nebûne yek, perçê  
perçê û kom bi kom in,  
dostêwan, derbarê  
dahatû û paşeroja wan  
de pîrsan dikin. Ji bîr  
dikin ku kurd xwediyê  
çandeke kevnar in, û yek  
ji çar gelên rojbilata  
navîn ê mezintirîn in.*

de qewîmibû, di bin lingên Persan de hate tar û markirin. Kurdistana roja îro nexasim ji aliyê leşkerî û aborî ve bi destê tirkan hatiye dagirkirin.

Dema ku rewşa kurdan bête dahûrandin, divê ev xalneyên jîbîrkirin. Dîroknivîsîna di bin bandora Kemalîzmê de, dek û dolap, seb û rîp in. Ji belgeyên zanînê û rastiyê xalî ne.

## 2) Qada Lêkolîna Erdnîgarî

Weke ku ji bo hemû gelan çêdibe, divê ku yê kurdan ji dîroka wan ji hemû welatêwan were pê. Ji ber ku Kurdistan ne dewleteke serbixwe ye û sînorê wê nehatiye naskirin û pejirandin helbet ewê bibe pirsgirêk. Dema ku Sultanê Osmanî, Kanunî Silêman navê welatênu ku ew ji xwedîtiya wan kîfê werdigre dihejmîre navê Kurdistanê ji bi lêv dike. Dewleta Tirk, serê xwe dixe nav xweliyê, naxwaze gelê kurd û welatêwan Kurdistanê bibîne.

Divê ku em ji hemû herêmên ku kurd bi piranî lê dijin re bêjin Kurdistan. Ev râvekirineke teorîk e. Ne ku tu pirsgirêkan dernaxe holê. Kurd heta kengî bi piranî bûn, ew ci dem bû?

Dîrokeke ku tevê Kurdistanê vehewîne dikare bête nivîsîn. Divê ku tevê Kurdistanê dîroka hemû dewletênu ku Kurdistan dagerkirine ji vehewîne. Xebateke weha ince bî destê kesekî-ê an ji komeke ku pir bi disiplîn be,

ji birêveçûna dîrokê fam bîke dikare bête çêkîrin. Divê ev kom, pisporêni ji herêmên cihê, demêni cihê, ji zanyarêni jêhatî pêk were. Dîrokeke weha bi geleimperî bi destê Fernand Braudel, binavê "Li Behra Spî Dîrok" hatiye nivîsîn. Ji bo Frengîyan xebatêk hêja ye.

Dîroka Kurdistanê dikare bes bi bes, lê bi vî awayê ku li jor hatiye gotin were nivîsin. Mînak, di çarçoveya herêmekê, bajarekî, newalekê, mîrnîşînekê de. Bi vî awayî dê hesanîtir be.

Suriya ku hinek xaka Kurdistanê di nav de ye û dewleta Eyubiya ya ku li Misrê hatibû damezirandin, dîroka dewletênu ku ji aliyê kurdan

*Dîroka Kurdistanê,  
weke ku me li jor qala  
wê kir, dîroka gelê  
kurd a ku ji gelên  
cîran cihê pêşve çûye;  
ya şaristanênu ku ji serî  
beta iroj batine ye .*

*Girîng nîne ku  
Kurdistan serbixwe  
nebûbe, herdem navê  
welêt batibe guhertin,  
bav û kalên kurdan bi  
heman zimanî  
neaxivîbin. Şaristanî  
gub nadîn sînoran. Ev  
qaîde ji bo dîroka*

*hemû gelan weba ye.  
Ferensa ango Galyaya  
berê, ber dem di binê  
banekî de nebûbû  
dewlet. Navê xwe yê iro  
yê ku ji Cermenî tê  
piştî sedsala  
pêncemîn girt*

ve hatine avakirin û hatine birêvebirin, dîroknivîsê kurd têkildar dike. Keda gelê me ya ku tevî şaristanîya vê herêmê bûye, divê ku were berçavan. Dewleta Shaddadîta ya ku li Kafkasyayê çêbûye, Shwankara ku li başûrê Iranê û Kakawayhîdesa ku li İsfahanê ava bûye, bi destê kurdan lê li derveyê welatê wan hatine avakirin. Divê ku dîroknivîsê kurd hay ji van hebe.

## 3) Qada ku di Pêvajoyê de Were Dahûrandin

Dîroka Kurdistanê, weke ku me li jor qala wê kir, dîroka gelê kurd a ku ji gelên cîran cihê pêşve çûye; ya şaristanênu ku ji serî heta iroj hatine ye. Girîng nîne ku Kurdistan serbixwe nebûbe, herdem navê welêt hatibe guhertin, bav û kalên kurdan bi heman zimanî neaxivîbin. Şaristanî guh nadîn sînoran. Ev qaîde ji bo dîroka hemû gelan weha ye. Ferensa ango Galyaya berê, her dem di binê banekî de nebûbû dewlet. Navê xwe yê iro yê ku ji Cermenî tê piştî sedsala pêncemîn girt. Wan salan Frank ji paş çemê Rhînê dihatin, êris dibirin ser Galya yê. Mirov dikare bêje ku tu têkildariya Frengîya îro bi zimanê Keltî yê Galyayîyen berê re tune ye. Niştecihênu ku piştî sedsala pêncemîn ji (Berîya Isa) Bohemya û Bavyerayê hatin û navê Galyayê lê kîrin. Ew ne Şeniyîn ewil in. Tevî vê yekê Mamosteyê dibistana Annales bi şeweyekî

din gotiye: Dîroka Ferensa ji serî heta îroj, têkilhev, cihê-reng, yekbûyî û domdarî ye. Dîsa bi vî awayî, li Misrê îroj erebiya ku tê bikaranîn, têkiliya wê bi zimanê Faronan re tune ye. Lê dîrok û welatê wan yek e. Heke mirov vê pîvanê ji bo kurdan bi kar neyîne, wê demê mirov dikara ji dilreşîyê şik bike.

Dîroka Kurdistanê ne tenê li erdinîgariyê, lê di heyameke diyar a sedsalekê, di bûyerekê, di raman û kesekî de dikare bête dahûrandin. Ev metod, di pêvojoyê de bi cih tê.

#### 4) Pîvana Dema Bihuri

Nûjeniya radîqal a dibistana Annales a Frensi ew e ku pîvana dahûrandina rabirdûyê her gav mîna hev nabîne. Rabirdû, di demeke kurt de, bi salan, bi rojan, an jî di nav sedsalan de, weke ku Braudel lê nêriye, dikare were nirxandin. Mînak ji bo ku dîroka gerdûnê hebûnên asîmanû û dîroka kişwerê bête nivîsin demên jeolojîk ên ku têne xebitandin hene. Weke encam, li ser mîzinê doktrîna Annalvaniyê ya bingehîn û dema bê tevger jî heye.

#### 5) Divê Kîjan Rêç Bête Şopandin

Li cihekî din min qala wê kiribû, ez li vir, li ser dibistanê dîrokî ranawestim. Ji nîvî sedsala 19 an ve, li Ewrupayê dîrok, di hemû rewşan de, li gorî sê çar azîne-

yên ku hevdû dişopînin hate nivîsin.

Pêşî li derûdora zankoyên liberal ên weke Berlîn, Ie-ana, Leîpzig, Gottîngén, Heîdelbergê, metoda ku di sed-sala 19 an de derkete holê û bi lez belav bû, dibistana Po-zîtîvist pêşve çû. Ev azîne bûyelerî bû. Bi tenê bûyeler di-hatin nivîsin. Di nav nûnerên vê metodê de, yên bi nav û deng, Leopold von Ranke, Droysen, Mommsen, Curtîus û von Zîbel dikarin bêne

veşartin, tê. Kêmasiya wê ya mezin, îdeolojîkbûna wê ye.

Ev metod rabirdûya ku pir têkilhev, li gorî pîvanê ma-teryalîzma dîrokî û şerê cî-nayetî rave dike. Bûyerên derbasbûyî li gorî dilê xwe û îdeolojiya xwe şirove kiriye. Li Sovyetîstana berê û welatîn ku diktatoriya proleter-ya" lê serdest bû, dîrokzan azad nîn bûn. Mecbûr bûn ku'li gorî kêfa dilê rayedarên partî û dewletê bimeşin. Her ku serokê partiyê hatiye gu-

*Hinek dibêjin ev metodeke împeryalist e.*

*Nûnerê Analesparêzan ê herî binavûdeng Braudel bû. Qada zanîsiyê alîkar jî tevî qada xwe kir. Metodên wan jî pejirand.*

hejmartin. Heta îro jî li nik derûdorê fermî bihayê vê metodê heye. Ev ekol li ser yek belgeyê lêkolînê dike, şirove dike û digihîje encamakê. Di vê metodê de, kesatiya nivîskar dernakeve pêş. Kemasiya vê metodê ev e ku mirov bêzar dike. Bêtir li gorî dilê pisporêñ bijarte û şagirteyên wan e. Navgîn û qadêñ lêkolînê di nav vê metodê de kêm in. Tiştê ku bingeh digre, rîza avabûna dewletan, dîroka zagonêñ bingehîn, politîka, diploma-sî û leşkeriyê ye.

Piştî vê metodê, dîroka Marksîst-Lenînst a ku bal kişandiye ser dîroka civak û aboriyê û ji ber çavan hatiye

hertin, dîroka partiya komînst a sovyetîstanê jî hatiye guhertin. Ji nû ve hatiye nivîsin. "Dîroka nûjen an jî dibistana Annales a frensi" ji aliyê Lucien Febure û Marc Bloc ve di sala 1929 an de li Parîsê hatiye avakirin. Vê ekolê zanîsiya dîrokê serobîno kir û li her deverê belav bû.

Hinek dibêjin ev metodeke împeryalist e. Nûnerê Analesparêzan ê herî binavûdeng Braudel bû. Qada zanîsiyê alîkar jî tevî qada xwe kir. Metodên wan jî pejirand. Girêgirêñ ekolêñ Annales û şagirtêñ wê li ser mijarêñ bê hed û hesab lêkolîn çekirin. Her tiştê di jiyanâ civak û mirov de ji wan re

bû mijara lêkolînê. Dîroka civakî û aborî û ekola pozitîf-vîst di şûna ekolên ku betal bûne de cih girt. Êdî ji niha û pê ve dîroka hesp, riya trênenê û çûn û hatina li ser bahrê, ceyranê, bajarvaniyê gerê, teknolojiya çandiniyê, budîzm û wêneyên dîroka herêmî ya xelayê, evîn û nexwesiyê ya werzîş û ramanê çi were bîra mirov dîroka wê hate nivîsin. Belgeya nivîskî êdî ne çavkaniya tekane ye. Dema agahî hindik bûn, ji arşîvên şirketên taybet, an jî ji yên giştî hate berhevkirin.

Hejmar û nifte dê ji van bêne berhev kirin, bêne veqetandin û rîkirin û di komputurê de bêne komkirin. Weke ku tê dîtin, Annalesparêzan, têgiha dema bê tevger, dema kurt, dema dirêj kirine ferhengê. Pîvana dema rabirdû ji holê rakirin. Evqasî pir cure hebûn qala "dîroka hûrikan" dihate kiin. "Dîroka hûrikan" navê pirtukeke P. Dousse ye. Dîrokeke ku hestuyên wê hatibin derxistin, ango dîroka ku işaretên rîzê nebin, mirov nikare wê di hişê xwe de bigre.

## 6) Dîrok û Îdolojî

Ne bi tenê marksîzm û lenînîzm, hemû îdedlojî zerarê didine dîrokê. Xweseriya wê ya zanistî ji holê radikin û dikine navgîneke propagandayê. Hewldana olî, mezinkirina kesan û pê sond xwarin, nîjadperestî, serî tewandina li ber dewletê an jî hikmetê, rûmeta dîrokzanekî

qels dike. Ev tişt dîrokzan dike weke karmendekî û nivîsarên wî jî dibine weke nivîsarên ji rîzê. Bi alîkariya hinek nivîskarê Ewrûpî yê bêşermî hinek nivîskarê tirk dibêjin, tirk nîjada bingehîn ya şaristaniyan in. Lewra dibêjin, hemû ziman ji tirkî zede bûne. Xwediyê vê baweriye dibêjin, kurd gelekî koçber û rîbir e. Bê çand e. Hestê wî yê neteweyî jî tune ye. Ji loda êlan pêk hatiye. Ew tirkên çiyayî yênu ku ziman ji bîr kirine ne. Dîtina nivîskarê Kemalist weha ye.

## 7) Dahûrandin û Berhevkirina Çavkaniyan

Divê ku dîrokzan mijara xwe hem ji cih û hem jî ji demê hilbijêre. Ev yek pirsgirêka çavkaniyê ye.

Destnîşankirina herî sere rast û ya bi rîk û pêk belgeya nivîskî ye. Destnîşar, belge, hestû û kevirên nivîsi, nivîsarên li ser singê gorê û yêni li ser diravan, belgeyên herî baş in. Ev belge, bi piranî li müze û pirtûkxaneyan, têne parastin. Carinan jî di arşîva bajarêñ kevnare de peyda dîbin. Divê ku nivîskar bi çavêñ rexnegir û biawayekî zanistî li ser van belgeyan xebetê bikin. Dibe ku belgeyek, ji ber xwe hatibe çêkirin, kopya be, bi ser ve hatibe zêdekirin, an jî pê hatibe lîstin û hatibe rastkirin. Belkî, mîrekî zede pesnê xwe dabe gotin, dagerkirina xwe û çalakiyên xwe zede dabe nîşan. Lî dîsa jî ev belge giranbiha ne. Ji bo ku tiştîn di belgeyan de bêne eseh kirin, pêwîst e ku labaratuvoran de, di bin kontrola dîrokzanan re derbas bibin. Pispor zimanê belgeyên nivîskî dizanin. Ew dikarin şêwra xwe pêşkeşî nivîskaran bikin.

*Dibe ku rabirdû, di van belgeyan de weke wêne batibe destnîşankirin. Wêneyên avayî, kenişt, rîyêñ kevn û yêni zinaran û hwd... Íro jî belgeyên weha hene. Audio, visuel (film, wêne, filmên bi deng) û hwd. Dibe ku delîl, metoda ku bi destê*

*Heredot batibû bikaranîn, a kevn û ya ku berê jî batibû bikaranîn; gotina ku ji devê mirovîn ku bi çavêñ xwe dîtine dikare bibe belge. Tiştîkî kesanî jî dikare bibe belge*

Dibe ku delîl, metoda ku

bi destê Heredot hatibû bikaranîn, a kevn û ya ku berê jî hatibû bikaranîn; gotina ku ji devê mirovên ku bi çavênxwe dîtine dikare bibe belge. Tiştekî kesanî jî dikare bibe belge. Ev anket e.

Dîrokzan çavkaniya lêkolînê, bi xwe diafirîne. Li gorî rewşê, ji birêvebirinê, wezaret, nexweşxane, benqe, acenteyên turîzmê, febrîqeyan, ji navendêن istatistikê û ji gelek cihêن munasib belgayan berhev dike.

### 8) Serhildane Zanînê Alîkar

Ji bo ku dîrokzan lêkolînê xwe zengîn bike, rast û rê an jî bi alikariya pisporekî, dikare ji zanînênu ku alîgirê dîrokê ne, sûdê wergire. Zanînê alîkar ên dîrokê, zimançanî, arkeolojî, paleografi, epigrafi onomastik, nûmîzmatik, sosyolojî, etnolojî, antropolojî, aborî, istatistik û fizik û kimya ne. Weke mînak, ji bo ku mirov temenê hebûnê zindî an jî mîri kiş bike pêwistî bi gelek zanînan heye

### 9) Kîjan Cureyê Dîrokê

Dîroka kevnêşopî bi sînor e. Bi tenê, jiyana mîr û beg û xanedanan, jiyana dewletan, ya berhem; şer, zagon û hekumetên mîran, têkiliyên mîran ên bi dewlet û mîritiyyê din re û bûyerên di navbera wan de tîne zimên.

Hinek caran jî, derheqê ol û felsefeyê de, jiyana mirovên navdar û keşeyan dinivîse. Demekê şûn de, li ewrû-

payê, dîroka edebiyat û hunerê derkete holê.

Piştî ku Ewrupa dest bi metingeriyê kir, gelek welatênu kişf kîrin. Piştî wê demê, zimançanî, arkeolojî, etnolojî û etnografi pêş ve çû, lewma jî zanîna me ya der-

aborî bi nivîskarê marksist û lenînst dest pê kir. Bêtir li Emerîqayê, pêşve çû. Bi vê metodê re, danûstandin, rîyê ragihandinê, dîroka têkiyîen navneteweyî jî pêşve çû.

Weke welatê rojhilat ên din, dîrok, aborî û civakiya Kurdistanê, ji ber kîmasiya istatistikî, bi awayekî hêsan nikare derkeve holê. Tevî vê, di Şerefnameyê û berhemên Ewliya Çelebi û berhemên rojhilatnasan de, derbarê civak, jiyan, navgînê afirandinê, bazar, çîna gundiyan, dewlet û mîrîtiyên kurdan de gelek agahdariyên zengîn hene. Ji xeynî van agahdariyan, derbarê rista rîjiyê, saziyên hikmetê, navgînê parastinê, çînê civakî, û derbarê çand û baweriyan, derbarê gund, bajar, mimeriya kelehan û berhemên hunerî de agahyên zengîn hene.

Derbarê dîroka civakî û aboriya Kurdistanê de, di çavkaniyê kevtirîn, ên ereb-misilman de, gelek agahî hene. Di axavtina xwe ya vebûna Enstituya Kurdi ya Berlinê de, di sala 1994'an de, min qala kîmasiya jiyana bajarvaniya kurdan kiribû.

Derbarê dîroka aborî û civakî ya kurdan de, çavkaniyê greko-romen, sûrî û yên Ermanan hene.

Malbata ku beriya bûyina Isa bi 14 salan jiyabû, Nuzî, Kerkûk û Arrapha, pênc, derheqê jiyana civakî, çalakîyên aborî û tîcarî de, çavkaniyek baş e. Navê malbatê Wullu bû. Li ser tabletê kîlê agahdarî nivîsibûn. Tomâ-

*Weke welatê rojbilat  
ên din, dîrok, aborî û ci-  
vakiya Kurdistanê, ji ber  
kîmasiya istatistikî, bi  
awayekî hêsan nikare  
derkeve holê. Tevî vê, di  
Şerefnameyê û berhemên  
Ewliya Çelebi û berhemên  
rojhilatnasan de, derbarê  
civak, jiyan, navgînê afirandînê,  
bazar, çîna gundiyan, dewlet û  
mîrîtiyên kurdan de  
gelek agahdariyên  
zengîn bene.*

barê welatê Asya, Efrîqa û Emerîqayê de zêde bûn. Her gelek xwedîyê dîrokeke etnolojîk a ku li ser qurmê dîroka zimançaniye rûdinê ye. Bi awayekî siruştî ev mijar kurdan têkildar dikin.

Bi saya serê qadênu ku ekola disbistana Anal vekirin, dîrok pêş ve çû û giyanek demokratik wergirt. Jê û pê de, bi taybetî, dîrokeke civakî û yeke aborî heye. Dîroka

rên wan bi Inglîsî "The Arshîves of the WullFamîly" hatinê weşandin û dîrokzan ji çavkaniyêن vê malbatê ku 34 sedsalan berê li Başûrê Kurdistanê jiya ye, sûd wernegirtiye. Hêj gelek çavkaniyêن weha hene.

Gelek kar li ber dîrokzanen kurd ên ku nîfşen nû ne, heye. Gencineyêن arkeolojîk ên Kurdistanê pir hindik hâtine vekolîn. Bi ser de jî, ji aliyê arkeologên biyanî ve kolandin pêk hatiye, agahiyêن ku derketine holê ji gelên din re kirine semyan.

### a) Pirsgirêka Termînolojiyê

Dema ku nivîskarên kurd, heremên Kurdistanê yên mezin rave dikan, tevlîheviyek mezin çêdibe. Kurdistanana navberê, bakurê Kurdistanê, rojavayê Kurdistanê, başûrê Kurdistanê û rojhilatê Kurdistanê, herêmên ku bi sînorren welatê perçebûyî re li hev nayêن. Divê ku mirovan herêman bi rêk û pêk rave bike.

Di Tîrmeha sala 1995'an de li Lozanê, min di, axaftina xwe ya vekirina konferansa derbarê dîroka kurdî de, got; divê ev herêm digel nexseyekê bêne destnîşan kirin. Ez dê dîsa du xalan dubare bikim. Kurdistanana ku Başûr jê re tê gotin, ji ber ku di nav dewleta Iraqê de maye, Kurdistanana Iraqê ye. Belê bakurê Iraqê an jî Iraq Bakur nîne. Dîsa Kurdistanana Bakur û Kurdistanana navê herêma Enedola Başûr an jî

herêma Enedola Rojhilat nîn e. Mirov nikarê vî navî lê bike. Ev nav lê kirin, ji aliyê komara tirk ve, ji bo ku navê Kurdistanê winda bike hatiye bi lêv kirin.

### Şerefeddîn Bedlisî

Weke ku me li Lozanê bîyar dabû, sala 1997'an dê bibuya sala Şerefnameyê. Mîrê ku li Bedlisê hukim kiriye, Mîr Şerefeddîn Bedlisî, di sala 1597'an de, yekemîn dîroka Kurdistanê "Şerefname" 400 sal berê hatiye nivîsin. Salvegera wê dê were

pîroz kirin. Şerefeddîn rojekî ev berhem, bi farisî nivîsî bû. Di sedsala bîhûrî de, li Petersburgê, li kurdî, erebî û ferensi hate wergerandin. Li Newyorkê hempîşeyê me Mehrdad Izady ev berhem, digel not û ravekirinan li Inglîsî wergerand.

### Pêşnûmeya me ya Mezin Ansîklopediya Kurdistanê ya bi Rêk û Pêk

Ji bo rêexistina neteweyî ya kurd, perçeyek ji pêşnûmaya me ya bingehîn ansîklopediya kurdî ya bi rêk û pêk e. Ev ansîklopedî dê bi kurmanciya jorîn û jérîn be. Heman dem dê bi Inglîsî û Rûsî be. Me ev pêşnûmeyan digel, Enstituya lekolînê ya Rojhilat a Akademiya Zanîna Rusî hatiye amede kirin. Ev ansîklopedî di dîroka me de yekemîn e. Di tîrmeha 1996 an de, li Brukselê derbarê wê de civinek hate li dar xistin. Birêvebirî û kargeriya pêşnûmayê hate hilbijartîn. Komên xebatê hatine çêkirin. Kargerî ji Profesorê Rusî Mîkhaîl Lazarev, Profesorê Kurd Celîlê Celîl, Mehrdad Izady, Cebar Qadir û min pêk tê. Ji bilî van, asîstan û nûnerên ku li Kurdistanê ne jî di nav xebatê de cih girtin.

*Ji bo rêexistina neteweyî ya kurd, perçeyek ji pêşnûmaya me ya bingehîn ansîklopediya kurdî ya bi rêk û pêk e. Ev ansîklopedî dê bi kurmanciya jorîn û jérîn be. Heman dem dê bi Inglîsî û Rûsî be. Me ev pêşnûmeyan digel, Enstituya lekolînê ya Rojhilat a Akademiya Zanîna Rusî batîye amede kirin.*

Gelên ku hindiktir girîngîya wan ji ya kurdan heye xwedî ansîklopedî ne. Dîroka me tune kirine, biçük kîrine. Çanda me li ber tehdîte ye. Ji ber vê yekê, ansîklopedî mîna dîroka me ji me re pêwist e.

# HEMLEYEK LI DIJÎ KURDAN

**HELMUTH VON MOLTKEMA**

(Werger, DR. Kemal Sido-Kurdaxî)

**Ciyayê Xerzan 4.6.1938**

Piştî ketina kela Seyîd begê, berxwedana kurdan bi şêweyekî giştî, weke me hêvî dikir nehate şikestin; di navbera Mûşê û Hazo (**Kozluk**) de çiyayekî bilind heye; ev çiya heta niha ji ali-yê tu orduyên tirkan ve nehatiye derbaskirin; orduyeyeke wek ya Reşîd paşa jî nikaribûye têkeve vî çiyayî. Li vir kûv û qûçikine bilind û asê bejn û bala xwe bilindkirin û berfê ji ser serê wan de heta 1000 - 2000 pêyi bi jêr de girtiye; ev çiya yek ji bilintirîn çiyayên Assaya piçûk e. Navê vê herême jî bi giştî Xerzan e û bi gund û qese-be, zevî û dar, kanî û cogeyên xwe dewle-mend e; tu gund salyanê (baca salane) nadin dewletê û nahêlin ku zarokên wan biçin leşkeriya tirkan.

Ji bo ku Xerzan niha têkeve bin destê bab al-alî, seferberiyeke pir mezin hatiye çêkirin; çimkî niha ne tenê tabûra Mehmet Paşa, ya ku ez pê re, xwe nêzîkî dilê kurdistanê dike, lê belê qumandarê serekî ji Amedê tevî alaya 19 an ya peyda bixwe, du alayên siwar, çend sed ji sipahiyan, çend sedên din ji nîzamiyan û sê topxaneyan, bi-

tanê dike, lê belê qumandarê serekî ji Amedê tevî alaya 19 an ya peyada bixwe, du alayên siwar, çend sed ji *sipahiyan*, çend sedên din ji nîzamiyan û sê topxaneyan, bi-giştî 3000 çekdar dest bi merça xwe kirine. Xeynî ji

Ü wisa pêwîst e Xerzan ji her aliyekî ve bête çemberkirin û di eynî wextê de bête lêdan. Tê gotin ku hejmara dij van (yê beramber) 30 000 e; belam wan ne yekîti, ne rîber ku serkêsiya wan bike û ne jî kela ye ku parastineke dirêjxayeñ bide wan.

Riha me ber bi Xerzan ne-walên jorîn yên bi cobarê

Dicle re hevraz (paralel) e bi dijwariyekê bêhempa derbas dibû; ew newalên ku qasî 1000 - 2000 pêyi bilind bûn û her ku diçûn bilindir jî dibûn. Me deh hespên xurt kiribûn pêsiya her topxaneyekê, û wisa xar em di ser kevir û rêşan re, di newalan û di ser pişta çiyan re derbas dibûn; gelek caran rêk wisa xar û zehmet bûn, ji des-

ten mirovan ji bo derbaskirînê baştırîn kar dihat xwestin. Li ser van çiyan pir zehmet bû ku em ji konan re cîhekî bibînin. Min tu carî bawer nedikir ku zeviyê zad dê ji sînorkirina hêwirgehê re bibin asteng, lê li vir wisa bû.<sup>(1)</sup> Em di nav gundên kurdên dost re derbas dibûn û me

*Ji bo ku Xerzan niha têkeve bin destê bab al-alî, seferberiyeke pir mezin hatiye çêkirin; çimkî niha ne tenê tabûra Mehmet Paşa, ya ku ez pê re, xwe nêzîkî dilê kurdistanê dike, lê belê qumandarê serekî ji Amedê tevî alaya 19 an ya peyda bixwe, du alayên siwar, çend sed ji *sipahiyan*, çend sedên din ji nîzamiyan û sê topxaneyan, bi-giştî 3000 çekdar dest bi merça xwe kirine.*

wisa rêz li zeviyên zad di-girt, te digot qey ew zeviyên çeleman (şeweder) yên Tel-tovê<sup>(2)</sup> ne; ev reftareke aqilmend û hewceyî pesnê ye. Ji bo ku leşker zorê li xelkê nekin, hin caran paşa bi xwe saetekê, ta ku karwanê leşkerî ji gund derdiket, li ber gundekî radiwestiya; kurd jî ji bo firotina malê xwe bê tirs dihatin bazara baregeha me. Ev gaveke pîr mezin e ji bo nîzameke baş, ya ku tu dikarî li ba seresker bi for-tê mezin bînî ziman. Asten-ga herî mezin li ser riya me çem bûn; *dogan su* (Botan su) bi qasî 150 gavî fireh bû û hîn ji dîclê lezgîntir diherikî; ev av hewqas bi lez diherikî ku dema em ji aliyekî avê derbasî aliyê din dibûn darkeşenên me 1000 - 1500 gavî bi jêr de digihîstîn aliyê din ê avê; cil û heşt saet ji me re lazim bûn ta ku em leşkerê xwe yê piçûk tevî kariyên xwe derbasî aliyê din bikin; di wê demê de min derfet dît ku ez serdana Sêrtê bikim; Sêrt bajarekî çiya-yî xweşik e, lê di şerê vê dawiyê de hatiye wêrankirin û hîn jî wek xerabeyekî xuya dike. Piştî merşêke din dîsa em gihîstîn ber aveke bi na-vê *Yezid-bane-su*, ya ku bi qasî 300 - 400 gavî fireh, lê ne kûr bû; me nedixwast ku em li vir jî pir dereng bîmî-nin, lema me bi her şewe-yekî hewl da ku em avê derbas-kin; di hewldana yekemîn de

piçek mabû ku ez û hespê xwe bi avê de herin, lê kêlîka dawî pêyên hespê erd gir-tin û me xwe xelas kir. Bi qasî saetekê bi jor de me cihekî baştır dît û tabûrê yekser dest bi derbaskirinê kir; her

vekê dûr bû û ew cihekî baş bû ji bo berdawam kirina éri-şa me bi aliyê çiyan ve; bi rê de dema ku çend gule li me hatin barandin, nenîzamiyan (kurdan) nexwastin pêş de biçin, ji ber ku min nikarîbû

*Ji bo ku leşker zorê li xelkê nekin,  
bin caran paşa bi xwe saetekê, ta ku karwanê  
leşkerî ji gund derdiket, li ber gundekî  
radiwestiya; kurd jî ji bo  
firotina malê xwe bê tirs  
dibatin bazara baregeha me.*

ciqas ku em li devereke bi qasî 800 pêyî di ser rûyê behrê re diman jî kûrbûna avê dida sîngê peyadeyan û topxane jî bi temamî di avê de wenda dibûn.

Em nihâ gihîstîne nêzîkî bajarokê Hazu, yê ku bi me re dijmin e. Le roja din em bi du rêzan û di bin parastina topxanê de, ya ku ji bo agir-vekirinê amade bû, û hajêki-rineke mezin û hêdî hêdî pêş de çûn, lê me dît ku di wî bajorokî de tenê xelkê sivîl ma-ye, çekdaran xwe bi paş ve kişandibûn û ketibûn çiya-yên derderô. Me baregeha xwe li ber deriyêن bajêr çê-kir: ji bo dozîna cihekî din ji baregeha me re, pêşî ez şan-dim keşfê; wî bi min re çend destê kurdên siwar, yên ku bi rim, mertal û şûran çek-dar, birêkirin. Gundê ku min dixwast ez bicimê, saet û nî-

bi wan re biaxivim, ji xêynî pêşdeçûnê tu rêk ji min re nemabûn; dema ku min riya xwe bi tenê berdewam kir, kurdekî da dû min û hat. Tu-kes di wî gundî de nemabû û min dît ku ew cih ji baregeha me re gelekî baş e. Dema ku ez vejerîm û min repota xwe pêşkêşî pêse kir, min her wi-sa ji wî re diyar kir ku li cem me, gava efserekî dişînin keşfê dewriyeke peyda, û eger pêwîst be betalyonekî jî tevî topxanê bi wî re dişînin.

Roja din em zû çûn bare-geha xwa ya nû; em gelekî kêfxweş bûn bi dîtina kani-yeke avê ya xurt, ya ku cira-veke zelale zîvrengî pêk ta-nî; em her wisa bi darêñ gû-zê yên mezin, zeviyên zad yên fireh û rîyeke rêkûpêk jî pir dîlxweş bûn. Di cî de agir-berdan gund û ew bi temamî sewitandin; hewildanê min

1- Sinorkirina hêwirgehê yanê bêlikirina sinorê cihê kon, çadir...

2- Teltow devereke li nêzîkî Berlinê ye.

li dijî birtyara sotandina gund bê encam man û tirkân got ku divê em şidet û sertiyê nîşanî kesen bazdayî bidin û ji yên ku man re ji bêjin: *par-don!*, eger em wisa nekin, em dê tu carî ji van xelas nebin.

Hema di dema gihiştina me de ferman ji qumandarê gişfi hat û daxwaz kir ku herdu leşker bi hev re bibin yek; leşkerên peyda topxane li

şûn xwe hîştin û berê xwe dan aliyê nîşankirî. Di rê de ji diwazdeh gundêñ din hatin şewitandin; dawî em gihiştin gundekî bi navê **Papurê** ku di newaleke kûr de dima, xelkê wî gundiñ nereviyabûn; ew derketibûn ser pişa xaniyêñ xwe û hîn ji dûr ve agir berdan me û hawar dikirin: Eger hûn mîr in pêş de we-rin! Me bihîst ku diho leşkerê Hafiz Paşa li ber vê **Defilê**<sup>(3)</sup> şkestiye, zerar dîtiye û mecbûr maye bi şûn ve bikişe. Cihê gund qasî 200 pêyi bilind bû û li ser sewkiya dîwarekî zinarî berz dima: dema ku ji min hate pirsîn, min ji Mehmed Bey re tektîka **Tirailleur**<sup>(4)</sup> pêşniyaz kir û got ku gereke em di aliyê gund yê çepê re derbas bin, li ku derê hin dar û sirt dikarin me ji êgir biparêzin, û di piş re hilperikin serê çiyê û ji jor ve êrişê bînin ser gund û wisa em dê riya revê ji li gundiyan bigirin; eger em wisa nekin gundiñ dê bikişin û têkevin çiya roja din divê em dîsa bi wan re têkevin şer. Leşkerên peyda bêtirs pêş de diçûn, herçiqas ji jor ve ji hin agir dihat vekirin ji, lê ew bêbandor bû; di demeke nêzîk de em gihiştin jor û em di ser serê gundiyan re rawestiyan; gule li gundiyan wekî zîpikê hatin barandin û ew mecbûr mabûn ji ser xaniyan birevin û ew pir tarsiyan dema dîtin ku riya paş-kêşiyê ji li wan hatiye birîn.

Niha bi qêrinê Allah! Allah! leşker daketin gund. Ji gundiyan hinekan xwe bi zehmetî xelaskir, lê belê pi-raniya wan bi singiyan hatin kuştin.

- Min ev kar hemî li ser pişa hêstir qedand, çimkî ez di rojêñ dawî de ji ber helakiyê pir bêhêz bûbûm. Ma-lêñ vî gundiñ ji tiştan dagirtibûn (xuya ye ev tişt ji gundiñ derdorê ne), û leşker mal bi mal digeriyan û ew talan dikirin; leşkerekî hema bi şêweyekî sade hefsarê hespê xwe da dest min û rica kir ku ez hêsp bigirim heta ku ew berik û tûrêñ xwe tijî dike. Lê belê mandina li gund pir xeternak bû, ji ber ku ji jor ve hîna gule li me dihatin barandin; guleyek li destê **kolagasi** (sernobedar) ket û lema min hêstirê axayê xwe da wî ta ku ew xwe ji vir dûr bixe. Pêwîst bû ku em xwe bidin ber dîwaran û bimeşin; li dawiyê tenê xaniyek ma û wî xanî bi bêhêvî û kîn 4-5 sa-etan ber xwe dida; serwerê wî gundiñ tevî alê xwe aveti-bû erdê. Xelasbûn ji wî re li ser rûyê erdê nebû, çimkî tu hêviyêñ wî di berat û rehmê de nemabûn, loma wî nedix-wast jiyana xwe bi erzanî bifrose; agir ji hundir û derve ve di eynî pencaran re di-hate berdan.

Ez di wê demê de siwar-bûm û çûm ba Hafiz Paşa, yê ku **Defilê** ya vekirî dîti-bû û ji xwe re ji berzahiya

3- Ji zimanê fransî ye û tê wateya di ber re derbasbûnê.

4- Ji frans. tektîka ji hev belavbûnê.

girekî de li şer temaşe dikir; dîl û her cure nîşanên serketinê dianîn ser wî girî; mîr û jînîn birîndar (ji birînê wan hîna xwîn dadiwerivî), şîrmij û zarokêni ji her umrî, serî û guhêni ku hatibûn birîn, li ser wî girî kom dikirin û ji ber ve xelateke ji 50 -100 qurşî werdigirtin. Mühlbach,<sup>(5)</sup> he ta ku ji dest dihat, birînê birîndaran dişûştin û derman dikirin; êş, azar, melûlî û xemgîniya bêdeng ya kur-

demeke kurt merşê dîsa dest pê kir û me berê xwe de çiyan, li ku derê hejmareke pir mezin ji dîl û girtiyan hatibûn kom kirin; min nema dikarîbû ku ez bi wî karwanî re bimeşim, ‘loma ez gelek bi zehmetî û li gel êskorta pêse vegeriyam bargehê, ya ku li derveyî çiyê bû û ez çar rojan li ser hev û bi giranî nexweş ketim. Dawî jî li şer hatibû û her tiştî hawara baxş û rehma xwedê dikir.

rî û di ser çem û cogeyan re heta bi vir, tabûra me pêxwas kiribû, leşkeran solêñ westi-yayî kiribûn desten xwe; cil û bergen xwe jî kiribûn pişte û li dor navên xwe girêdabûn û dimeşîyan. Tiving jî xerab in û mirov nikare bi wan baş nîşan bike; leşkeran jî qet nîşan nedikirin. Dema ku me êris dibir ser gund, min çawişek dît ê ku agirê tivinga xwe berdida ezmanê şîn. Min bang kir û got: “arkadaş tu guleyên xwe ku de berdi-dî?” wî li min vegerand û got: “zarar yok babam” - xem nake bavê min - “înşallah vurdu!” -eğer xwedê bixwaze, dê gule bi xwe li armanca xwe bigre -û wî careke din tivinga xwe da ezmên û agir berda. Tiştê hîna ecêb ew bû ku piraniya birîndarên me bi guleyên me, yên ku ji pişt ve dihatin, birîndar bûbûn.

Li vir hin tişt ne li gorî, lê belê pir li dijî nîzama beregeha me têne kirin; dema ku leşker digihîje baregehê ew metreyê xwe tijî av dike, vedixwe yan jî xwe davêje goleke avê, eger hebe; pişt re ew saetekê an du saetan radikeve, û dema ku ro hinekî dadikeve, ew di erdê de, li tenişt konê xwe, qulekê dikole û tê de êgir vêdixe. Li wir jî nan hema bi hazirkirina xwarinê tê kirin; hêvîr distirêñ û hinekî pehn dikin û davêjin ser sêlan û ew zû weke tu hêkan biqelînî dibe. (258- 265)

### *Lê tiştê xerab ew e, ka tu yê çawa li nav van çiyan şerekî gelêri bê van kiryarên pîs bidî meşandin? Zirer û zîwanên me ne hindik bûn. Min Mehemet bey û Mehemet paşa di rêzen êrişa peyadeyan ên yekemîn de dîtin; guleyek li hespê Mehemet Paşa ketibû û ew hatibû kuştin.*

dan, hawar û qêrînê bêçarehiya jinan dîmenekî wisa pêk dianîn ku dilê mirovan disotand.

Lê tiştê xerab ew e, ka tu yê çawa li nav van çiyan şerekî gelêri bê van kiryarên pîs bidî meşandin? Zirer û zîwanên me ne hindik bûn. Min Mehemet bey û Mehemet paşa di rêzen êrişa peyadeyan ên yekemîn de dîtin; guleyek li hespê Mehemet Paşa ketibû û ew hatibû kuştin. Çend röpjên di dû re rewş hinekî aram bû, lê piştî

Ji dema ku ez bi van hêzên tirkan re teví vê hemlaya kêm nirx bûbûm baweriya min hinekî zêdetir bûye; çimkî leşkerên tirkan hemûne wekî van herdu alayan in. Leşker bi çelengî diçûn şer; helbet bêhêvî, bextbaweriya bêsinor û talanxwazî di rewsheke wisa de dibin sedemên vê qehremaniyyê, bi ser de jî dijvanên leşkerên tirk *iblîs-perest* û dewlemend in. Techizatên me ne baş in, lê belê dunya ne sar e; merşâ dijwar, ya di rêçikên çiyyayîn kevi-

5- Efsarekî alman e, li jor behsa wî hatiye kirin.

6- Ji lat. û frans. ye. Hêzékê ji bo parastin yan jî ji bo rêzlîgirtinê bi kesekî re tête bi rê kirin.

# GENGEŞİYÊN DERBARÊ ZIMÊN DE (II)

**F. HUSEYN SAĞNIC**

Ev pergala pir peywir ku yek ji wan peywiran peywendî û ragihadina kesanî û civaki ye. Ew pergal, vê ye-kê ji kirûya dîrokê hildide û heya roja em tê de, her qir-nek li gorî pêwistiyêن rojê peywirêن xwe yên taybetî pêk anîne û tîne jî. Bi pêşveçûna jîna civakî re bi pêş ve diçe, nû dibe, zengîn dibe û pêdiviyêن kesî û civakî pêk tîne ku her gel û neteweyek li gorî iqlîm, çand û qaydêن xwe navek lê kirî (wekî lî-san, zeban, zunge, dil û êd.), bi kurdi jê re ziman hatiye gotin. Me di nivîsa xwe ya kovara Zend, hejmara sêyemîn de dabaşa wî parçeyê goşt ê di devê candaran de heyî û jê re jî ziman tê gotin kiribû. Em ji wir pêşvetir çû-bûn û me qasekê dabaşa çê-û bi alî tekûzbûnê ve çû-zimanê civakî jî hilanibû test û li gorî agahdarî û zanîna xwe nivîsandibû. Di vê nivîsê de, emê bi piranî li ser beşek dîroka zimên digel hi-

nek gengeşîyan rawestin. Heger ev celeb nivîs quncikeke tarî, piçekî ronahî bike em dê bextiyar bibin. Lewra quncikêن me yên tarî, yên tarî mayî û yên tarîhiştî gelek in. Ew jî bi zor bi kiçviçinê weha ronahî bibin û ewrê tarîtiyê li ser wan rabe. Ev yek jî li benda gelê kurd e, nemaze yê ciwanêñ wî rawestaye.

Ez dixwazim vê yekê jî bibêjim: Heger cî derfet bide min, ezê qasekê jî li ser fel-safeya zimên rawestim. Heger ne, ev yek dê bimîne nîvîsek din.

Ziman pergala ragihan-din û hevdu serwextkirinê ye. Bi awayekî tekûz hevdu serwextkirina kesan û civatan taybetiya mirovan tenê ye. Ew jî yan bi hevdu re peyivînê tê holê, an jî bi nivîsinê ye. Tiştekî xwezayî ye, bi hinek pergalan jî cara hinek curêن hevdu serwextkirinê hene. Lê dawiya wî digihîje zimên û peyivînê. Belê hevdu serwextkirina têkûz taybetiya mirovan e. Lê ev na-yê wê wateya ku sewal bi tu awayî nikarin hevdu serwext

bikin. Sewal bi navajoyê, nemaze tirs û şahiyêن xwe bi dengêن xwerû, bi alastinê û bi ricifandina laşê xwe bi hevalen xwe dide zanîn. Celebêن hevdû serwextkirina se-walan, naguhere. Anglo, ew deng, alastin, ricifandin û êd dî serdetpêkê de çawan bû-ye, îro jî bêguhertin welê ye. tucar dervazê peyvan nebûye û nabe jî. Hinek sewalêñ wekî teyra totî hene, dengêñ wekî peyvan ji devê wan tênhîstîn. Ev yek ji navajo û ji layîn (texlît) ê wêvetir gavek navêje. Jixwe hejmara van celeb sewalan hindik in. Digel vê yekê mirov, gelek celebêñ sewalan hînê gelek peyvan dikin, gava ferman bidine wan bê kemasî tînin cî. Lê nikerin peyvan ji devê xwe derêxin, Gelek rind tê zanîn ku ew hînbûn ji çarço-va navajoyê dernakeve.

Mirov, heyînek ramandar e. Raman û sehekêñ xwe, bi peyivîn û nivîsinan dervazê kesan û civatan dike. Bi vê yekê tenê ranaweste; bi hinek peyvan û dengan dervazê hinek curêñ ajel (sewal, heywan) an jî dike. Bi vî awayî mirov, daxwazêñ xwe, pêdiviyêñ xwe, xwestinêñ xwe, serweriyêñ xwe, dest-hilatiyêñ xwe, bi kurtasî hemî celeb têkiliyêñ xwe bi hê-sanî pêk tîne. Heger vê yekê bi kurtasî bidin nasîn, ziman, berê têgih û dengan e. Zimanê mirovan bi navajoyê nayê, bi movikî û bi hevedanîna dengêñ cur be cur tê ho-

lê. Bi vê şiroveyê, peyvên serbixwe û watedar diafirin. Bi rêzkirina peyvan jî hevok tekûz dibil. Di hemî ziman nan de hevok, bi serê xwe têgihek, xwestinek tîne cî, kes û civat jî pê serwext dibil. Bi zor serwextiya tam bi rêzkirina hevokan tê holê.

Ziman, ne tenê ji qirnek heyâ qirnek din, an jî di navber du civatêن cuda de, guhertin didin nîşan. Di eynî gavê de, di welatek de û di nav ziman û çandek de, ji herêmek heyâ herêma din qasek guhertin dixwiyêن. Carinan ew guhertin hindik jî be, di navber du gundêñ rex hev de jî tê dîtin. Li hinek never, herêm, kişiwer û welatan, ew guhertin heyâ derencek ji dil jî radibin. Di vê neyê jibirkirin ku ev yek ji têkliyêñ cur be cur têñ û di hemî zimanêñ cîhanê de pir û hindik heyê. Ji ber vê yekê di cîhanê de çend ziman he ne û çend jê têñ bikaranîñ û peyivîñ bi vebir nayê zanîñ û careya tesbîtkirina wan jî gelek zor e. Bazor heger xar û jor hejmarek bê xwastin, di karin di rûberê cîhanê de da-basa qasî sê hezar (3000) zimanân bikin.

Ziman, ne têgihek râwestyar e. Ango çawan pêş-veçûna mirovan, civatan û şehrezayê tu car ranaweste û her dem di tentêla guhertin û pêşveçûnê de ye. Lewra da-hen (îcad) ên kevin têra pêdiviyêñ demên nû nakin. An

têkûzkirina wan an jî dahê-nêñ nû dikevin dewrê. Di van herdu tentêlan de jî, hinek peyv ji zimêñ dikevin û hinek jî lê têñ zêdekirin. Ew pergal, an jî parçeyêñ ji xebatê bikevin navêñ wan jî hêdî hêdî ji zimêñ dikevin; yêñ nû jî navêñ xwe bi xwe re tînin û di zimêñ de cî di-kin. Dixwazim di vê mijarê de, derbarê çandiniyê, mînakek berçave pêşkêş bikim:

Li welatê ku ez li wir ji dayik bûme û gihame; gelo li wir (li hawîrê Bedlîsê) di dema 15 - 20 saliya temenê min de, yanî 50 - 60 sal berî, çandiniya dexlî bi ci û çawan dihate kirin? Bi hevcar (hewcar) i, an jî bi kotanê, amolkî (bi cotek ga) an jî çargayî dihat cotkirin, bi mangirê kulantêñ wî dihat şkînandin û hûrkirin, dexil bi dest dihat çandin, bi şipnê dihat binaxkirin û hilûkirin, bi tirpanê an jî bi mangax (das) ê dihat dirûn (çinîn), bi paxêlê an jî bi erebeya qanî dihat kêşan, bi gêra ga û conegan dihat bênderkirin, (xwezay kam û cercere jî pergalen bênderkirinê bûn) Bi melhêban dihat hlavêstin (danebaykirin), bi seradê dihat xwerûkirin û êd... Niha xar û jor yek ji van di kar û xebatê de nemane. Navê van pergalan û ji dusedan jor na-vêñ parçeyêñ wan, beşek jê, ji zimêñ ketine; beşa din jî li ber ketinê ne. Di ciyêñ wan pergalen kevin de, traqtor,

makîna çinînê, romoq (romorq), dîsqaro, mubzelo, patos û êd. têñ bikaranîñ. Hemîne ku ev pergalen nû û nûdem dê navêñ xwe û na-vêñ parçeyêñ xwe di zimêñ de cî bikin. Çawan beşek jê cî kirine jî. Divê bê zanîñ ku peyvên kevn û yêñ ji ziman nan dikevin her dem ji yêñ nû ku di zimanan de têñ cî kirin kêmter in. Lewra ziman roj bi roj zengîntir dibil. Ji ber vê yekê, di zimanek de çend peyv hene, bi vebir na-yêñ zanîñ. Ev şirove ji bo hemî zimanêñ xizan û zen-gîn jî dervazbûyi ye.

Vêca bi hêsanî dikarin bi-bêjîn, ew zimanê sed sal be-rî hatî bikaranîñ û têra ragihan, peywendî û pêdiviyêñ roja xwe kirî; bi vebir têra peyivîñ û hevdu û serwextki-

---

*Ziman, ne tenê ji  
qirnek heyâ qirnek  
din, an jî di navber du  
civatêñ cuda de,  
gubertin didin nîşan.*

*Di eynî gavê de, di  
welatek de û di nav  
ziman û çandek de, ji  
herêmek heyâ herêma  
din qasek gubertin  
dixwiyêñ. Carinan ew  
gubertin bindik jî be,  
di navber du gundêñ  
rex hev de jî tê dîtin.*

rina îro nake. Lewra çawan di şirova jorîn de jî dixwiyê, ziman bi diyalektikî û guhertina peyvan, di tentêla guhertîn û pêşveçûnê de ye. Dîsa çawan ji vî metnî, ji serî heya li vir tê zanîn û dîtin, ziman ne ji keseke, ne ji civatek û ne jî ji qirnekê re nayê malkirin. Bizor dîroka belgâyên nivîsandî yên di dest me de heyî heya pênc hezar sal berî roja me diçe.. Ji vê dema kurt, hemî gehînekên

awayek têkûz û edilandî ji mirovan re hatiye pêşkêşki- rin. Ji ber vê yekê, dixwazim di vê bendê de dîtinê hinek olan yên derbarê mijara me de bi kurtî derpêş bikim: Di mîtolojiya Îskandinavyê de Elfaba Rûnik (Elfaba Fut- hark) ji alî xweda Odîn ve hatiye afirandin. Gor ola Hindî jî, xweda Îndra ziman afirandiye. Ji pirtükên pîroz Quran, "Xweda, Adem hînê navêñ hemî heyînan kîr" di- bêje. Di Tewratê de "Adem, hemî afirînekên cîhanê bi alîkariya xweda navandine (nav lê kirine)" nivîsandiye. Tewrat hê pêşdetir diçe û di beşa teqwîn de, "Di serdes- pêkê de, zimanê cîhanê hemî yek bûn peyvîn wan yek bûn, dide zanîn. Lê dema mirovan ji bo xwe gihadîna esman û stêrkan dest bi çêki- rina qulekî (Qula Babîlê) ki- rin, ji bo bi hevdû re nekarîn bipeyivin, xweda zimanê wan bi wan da jibîrkirin û her yek ji wan zimanek cuda bi wan da zanîn. Dema dev ji çêkirina qulê berdan; ji ber ku bi hevdû re nekarîn bipeyivin, bi peywistî ji hev cuda bûn û belavê hemî kuncen cîhanê bûn. Bi vî awayî zi- manê têvel hatin holê" hî- ma dike. Li ser vê mijarê ge- lek şîroveyên olî hatine ki- rin. Lê emê bi vî qasî bes bi- kin û bêne li ser gengeşî û nîqaşen li ser zimên hatine kîrin.

***Di sedsala 18 an de,  
nemaze di felsefeya  
Eleman ya romantizmî  
de, bi rûmet  
bilindbûna têgiba  
çavkaniya zimanan,  
carek din hate holê,  
pêşveçûna zimên kete  
rojevê û li ser gelek  
gengeşî hatin kîrin.***

zimên yên di wan demêñ kevnare de, ji bê belgetiyê rast û durist nayêñ zanîn, Bi- zor bi texmînêñ ji dil dabaş ji demêñ berî pênc hezar salê tê kîrin. Di taybetiya zi- mên de, ji bil belgâyên nivî- sandî yên din tenê texmînê hêzdar dîkin.

Baweriya mirovan ya be- rê, Zimên ji alî xweda ve bi

maze di felsefeya Eleman ya romantizmî de, bi rûmet bi- lindbûna têgiba çavkaniya zimanan, carek din hate ho- lê, pêşveçûna zimên kete ro- jevê û li ser gelek gengeşî hatin kîrin. Lê têra ronahi- yek ji dil nekir. Li vir carek din jî hat zanîn, ji bil belge- yên nivîsandî, yên din, bi awayek zanistî têra şîrova kana (çavkanya) zimanan nake: Ew jî çawan me li jo- rîn hildabû destê xwe ku bel- gâyên nivîsandî ji pênc he- zar salan wêve naçe.

Mirov gava li ser zimanan diponije, bi hêsanî peywen- diya zimanan bi raman û hi- şê re dibîne. Gor Arîstoteles "Peyivîn, nimandina ponijîn, raman û hişê ye". Ev dane- nasîna Arîstoteles, demek pir dirêj li ser ponijîna rojavayî bandor kiriye. Di qirna 17 an de felsefa hişmendî jî di mijara zimên de manendê Arastoteles an jî nêzîkê dîti- na wî dîtinek datîne. Di fel- sefeya wan de, "Peyivîn, ji bo ifadekirina ponijînê hati- ye afirandin. Ji bo ifadekirina ponijînen guhertî, peyvîn guhertî têñ afirandin an jî bi- karanîn" cî girtiye. Ev fel- sefe, berî peyivînê li îspatkiri- na heyîna ponijînê dixebite. Bi vî awayî, desthilatiya po- nijînê ji hêza wî gelek zêde- tir derdikeve pêş û sînorê zi- mên jî tê tenkirin. Lewra ji bil ifadekirina ponijînê, ge- lek peywirêñ zimên yên din hene.

Di sedsala 18 an de, ne-

Dîtina hişmandiyan, hê di sed sala 18 an dê ji alî feylezofen wekî Qondilaq û Herder ve hatine rexnekirin. Ev feylezof bi awayek vekirî, "Gor felsefeyâ hişmendiyan, zimên, pergala ponijîna ji berî de heyiye" dibêjin. Ji ber birek kêmasiyêن vê dîti-nê, ev yek nayê pejirandin, li gotina xwe zêde dîkin. Heçî gor Herder û Qondilaq, berî zimên û ji zimên tam cuda

kirin. Ev ronahiya han, bêrawestan û guherandinêن ji dil heya roja me hatiye û hê didome. Bi gor tesbîta wê rojê; Zimên di hêman de ji girêdana têgihek û dengekî wêna (îmaja) hişê dizê (tê holê). Ev girêdan, xwezay û peywistî nîne. Gor çand û sazimanê civakî û herêman e. Her wekî ku kurd dengêni mih (mî), Tirk koyun, Ereb şat û Faris gosfend (gos-

lan ji van sedeman tê. Diwemîn, nîşanê endamên zimanê mirovan, dikare li parceyên piçûk bîr bibin. Bi awayêñ: guhertî vêkhatina wan parceyên piçûk, wateyêñ nû û peyvên nû tên holê. Dema ew peyv û wateyêñ nû li zimên bar dîbin, zimên diguhere û zengîntir dibe. Di zimanê ajalan de bûyerak weha (birbûn û vêkhatin) tune. Bi kurtasî zimên re û giyana jîna civakî ye, bibêjîn ne çewt e û ne ji qubqubandine. Lewra heger zarokek ji jîna civakî bê tecrîtkirin; dema mezin bibe jî wekî ker - lalan hîç nikare bipeyive û ji hemî celebêñ peyivînan jî tiştek fehm nake û serwext nabe; Eynî mirov ku bikeve nav jîna civakî, piştî domekek, mîna zarokan dê pêlpêlok hînê peyivînê bibe û dê bikare bipeyive jî...

Bi zimanê Kurdi, şîroveya hilkolînê zanyarî, him nivîsîria wê him jî xwendina wê, di roja me de gelek zehmet e. ji bo durist nivîsandin û bi hêsanî xwendinê, me ji hêza xwe zêdetir zor da xwe ku durist binivîsin xwende jî bi hêsanî bikarin bixwînin. Èv qas ji me hat. Ji xwendeyêñ xwe tika, hêvî dîkin, hûn jî qasek zor bidine xwe, qenc bixwînin û li serwextkirina xwe bixebeitin. Heger çewtî û kêmasiyan ji me re verê bikin bextiyar dibin.

***Di sedsala 19 an de ji alî zimanzanêñ  
bêja ve gelek kuncikêñ zimên yêñ tarî, gor  
derfetêñ rojê batine ronahîkirin. Ev ronabiya  
ban, bêrawestan û guberandinêñ ji dil beya roja  
me batiye û hê didome.***

ponijîn nabe û bûna wê nayê hizirîn jî, çewtiya hişmendiyan, bi awayekî zanistî raxis-tin ber çavan. Ev her du fey-lezof (Qondilaq û Herder), "Bi zor ponijîn jî bi zimên re hatiye holê. Ango ev her du heyberên hêja hevalcêwîkîn hevdû ne. Ji ber vê yekê, ji bo zimanêñ guhertî, ponijînêñ guhertî peywist e bibêjin ne çewt e. Guherîna di navber mirovan û çandan de, rexek wê digihîje zimanêñ guhertî" dibêjin û gor sedsala xwe, ji alî zanan ve pejirandin jî ditine.

Di sedsala 19 an de ji alî zimanzanêñ hêja ve gelek kuncikêñ zimên yêñ tarî, gor derfetêñ rojê hatine ronahî-

pend) bikartînin. Digel vê yekê, di nav endamên civatek de eyînî girêdana têgih û wêna dengî bikaranîn peywistî ye: heger ne hevdu ser-wextkirin bê çare ye. Cudakirina zimanê mirovan ji zimanêñ hemî heywanan dutaybetiyêñ bingehîn he-ne. Yekemîn, mirov zimanê xwe, ne wekî zimanêñ ajalan di rîya îrsiyetê de û ji navajoyê hildide; di hawîrê civakî de û bi rîya hînbûnê kar dike. Ji nifşek heya nifşen-din, di nav domeka mercen-jîn û hînbûnêñ guhertî de, zimên jî dikare biguhere. Guhertin û cur be curbûna zimanê mirovan; yekneseqî û ne guhertina zimanêñ aja-

# Ji Şaristaniya Arya Ber Bi Kurdan Ve

**KEREM SOYLU**

Arya navê gelek neteweyê ku bi piranî di Mezopotamyayê de jiyana xwe domandineye. Berî ku wekheviya di navbera şaristaniya Arya û kevneşöpiya kurdan de were dîtin, divê ku hinek agahdarî ji Mezopotamyayê bêne dayin. Mezopotamyâ:

Bi yûnanî (Mesopotamia, welatê di nav çeman de) Di rojavayê Asyayê de

herêma ku di nav çemên Dijle û Firatê de dimîne ye. Bi wateya teng, ji wê xweliya ku êdi navber herdu çemên nêzî hev û din dîbin re tê gotin. Ji Bexdayê heyâ basûrê rojhilatê çiyayê Toros.

Dema bi firehî mirrov lê temaşe bike digel vê herêmê berjêri ber bi kendava Besrayê ve dibe.

Di Rojhilat de çiyayen Zagros, di Rojava de dorpêça platoya Erêbistanê, tîne holê. Beşa mezin a Mezopotamyayê di hundirê Iraq'a iroyîn û başûr û bakurê Kurdistanê de ye. Di dîrokê de ji gelek şaristanyan re hêlekanî kiriye. Bi nêzikayî, ji 1840 î

vir de bastannasî (erdkolînî) didin xuyan ku ji 10 hezar sal pêş de li vir jiyan domi-yaye. Bi erdnîgariya xwe ya bi xêr û bereket bi çem û kaniyên cemidî, bi sedan deşt û zozanên adan bûye êwirgeh û spargeha girseyê neteweyan û bûye hinceta şaristaniya bi kok. Ji çanda nêçîrvaniyê derbasî ber bi çandinî û cotkarî, pez û dewar xwe-

herêmê ber bi herêmên dîtir ve ji çûye.

Derbârê Mezopotamyayê de gelek dîrokñas û lêkolîneran dîtinê xwe dane nîşan ku ew bi çem û kaniyên xwe, bi deşt û zozanên xwe, bi fêkî û rezên xwe beşek ji besên cenetê ye. Bi şaristanî û zematkariyê di dinê de pêşketî ye.

Dîtina ku tê gotin Mezopotamya qederê 10 hezar sal e ku avaye ew nêzî hinek tespitên ku tên gotin; Hz Adem 10 hezar sal e hatiye dinê. Di hinek pirtûkên olî de ji aliyê zanyaran ve hatiye gotin ew cineta ku Hz Adem tê de ji-yayê cinetek ji cinetên erdê ye.

Di Tewratê kitêba pîroz de, cilda 2. de wiha tê gotin: "(8) Xwedayê giştî di rojhilata Ednê de cenekek çêkir. Ademê ku hatiye afirandin tê de danî. (9) Xwedayê mezin temamê darênu ku medekêş bûn û xwarinên ew xweş bûn tê de hêşin kir. Dara jiyanê dî nav de çêkir. Her weki dara naskirina qencî û xerabiyê ji (10) di wê de çemek hebû ji ednê derdiket ji bo ku cenetê av bide. Li wê dihat parkirin çar serî jê çêdibû. (11) Navê yekî ji ew Feyşûn ê duyemîn Ceyhûnê



dîkirinê û rez hêşinkirinê bûye. Ji hinek kolinên goran kevirên bi qîmet derdikevin, didin nîşan ku kevir ji herêmên dîtir hatine anîn. Ev ji dide xuyan ku bazirganiya

sêyemîn Hedaqilb (dijle) çaremîn Feraf" Ev beşa xweliya dinê (Mezopotamya) him di pirtûkên olî de him jî li cem zanyaran hatiye pesindayîn, ji bo şaristaniya gelan bûye herêmeke pir pîroz. Neteweyê Arya bi şaristaniya xwe di dîrokê de tim hatiye pesindayîn û di herêma Mezopotamyayê de jiyana xwe bi nav û deng daye domkirin. Ji bo wekheviya bingeha ziman û çandê ji civaka Hind-Ewrûpayiyan re dibe ku Aryan bê gotin.

Zanyarên wekî Huslap, Uyfalvî, Zaborosk, Homel dane xuyan ku ew civakêni di navbera deryaya Hezarê û çemê Dîjle, di qada çiyayî de dijîn, taybetiyêñ wan ên hevkari hene.

Ew mêt, haldî (urartu) lubî, gûtî (kurteti) kassîd (kardonya) hattî (hittit), mîtanî, hurrî, muşkî, elam û su-

mer in. Bi vê rewşê sînorê Aryayê rojhilat digihîje deraya Hezarê. Kolînên arkeolojîk wisa didin xuyanê. Wisa tê fêmkirin ku Arya bi dirêjiya çemê Kurayê, deraya Hezerê û deryaya reş xeta bakurê dide nîşan. Ji aliyê başûrê kendava Besrayê, aliyê rojava jî kendava İskenderunê heyâ Kızılırmakê (Halys) ye. Di nav van sînoran de ji gelek herêman re gelê binecîh niha jî Aran dibêjin. Aryayên ku bi navê cure cure hatine nasîn kâlikêñ kurdêñ iroyînin. Ew nav di pêyajoyêñ derbasbûyî de di nav eşîrêñ kurdan de hatine xebitandin.

*Regezen çandê di navber wan de taybetiyekê dide nîşan ku ol û ziman e.*

Hevkariya temamêñ civakêñ Arya di taybetiyêñ ziman û çandê de bi gelek lêgerînêñ etimolojîk û filolojîk hatiye tesbîtkirin. Di çaxê Aryaya berîn û yên kevn de bi navê cur bi cur şaristanî afirandine. Gelê Arya iro bi tenê bi navê kurd tê zanîn. Bi kinayî şaristaniyêñ di demêñ berê û yên kevn ên ku xîmêñ şaristaniyêñ nû jî pêk tînin de şaristaniya hatemti (elam), kengi (sumer), hattî (hittit) Kardun (kassit), lulubî, mîtanî, hurrî, muşkî, haldî (urartu) luwî, pala, med hwd. in.

Civakêñ ku bi van navan hatine navandin bi temamî Aryayî ne. Neviyêñ wan jî kurdêñ iroyîn in. Çand û pişeyen Arya ji wênekişandina

zinaran û amadekirina pereyên maden heyâ pişeyê avasaziyê gelek pêş de birine û derxistine kopê herî jor. Gelê aryâ bi nasnameya kurd van pişeyan di xalîce û emeniyêñ kurdan de dane bi cih kirin. Arya di nav pişeyen xwe yên hevkari de şer, xezal, eylo, ga û wekî dara jiyan gelek mijar bi piranî neqişandine, piraniya wan di roja me ya iroyîn de, wekî bingeh û pîroz têne xuyakîrîn.

Xezala di destana namîdar de derbarê Xecê û Siyabend de ji vê mijarê mînakek ve kiriye. Bi kinayî 10 hezar sal pêş de, di Asyaya pêşin de li ser zinar û şkeftan wêneyêñ cure bi curê kîjan gelî çekiribe ew şaristaniya di Mezopotamyayê de hatiye afirandin û pişeyen ku metelî daye diyarkirin wekî; Hîtît, Ûrartu, Med û hinek gelên ditir ku bûne çavkanî ji şaristaniya Ewrûpayê re ew jî ew gel in. Ew gelên di wan deman de navê wanarya bû iro jî navê wan kurd e. Bi van gotinêñ kin hat zanîn ku kurd ji nîjada Arî ne, kalikêñ wan ênarya di çiyayê Zagros de şaristani wekî ava spî û zelal dane zayîn. Wê kaniya pişeyan, wêne û çandê der û dorê xwe bi merheleyen dirêj û fireh ay daye, hêşin kiriye di encamê de kulîlkêñ reng û reng û fêkî daye gelên din.

Yek ji bingeha şaristaniyaarya ya kifşe avasazî ye. Pişeyan avasaziyê bi rewşek dorfireh di nav aryan de belav bûye. Di çekirina qesrîn

*Regezen çandê di  
navber wan de  
taybetiyekê dide nîşan  
ku ol û ziman e.  
Hevkariya temamêñ  
civakêñ Arya di  
taybetiyêñ ziman û  
çandê de bi gelek  
lêgerînêñ etimolojîk û  
filolojîk hatiye  
tesbîtkirin.*

Argıştî (imparator) de wêneyên gayên bi bask, şér, qeratal, xezal, ejderha û yên tevlihev bi rewşek teknikî hatiye çêkirin û hêzên Argıştiyê di van pişeyan de bi rewşek pir vekirî hatiye bikaranîn.

Ev pişeyên aryan ên avasaziyê bi taybetiyên xwe li cem Yewnaniyan û dûvre jî li cem Romayıyan hatiye pejirandin. Pişeyên aryan ên ku narîniyê dide xuyan dîqetên pir kûr dikişîne ser xwe. Wekî tiştê xemlê guldang, firaqên aşxaneyê, çekên leskerî, derî, pencereyên quesran narinbûn û tenikbûna van pişeyan ji bilî aryan di tu çandê de çenabe û nayê dîtin.

Derbarê koçertiya arya de tu nivîsek nehatiye xuyan. Lê jiyana binecihtî gihiştiye bajartiyekê pir xurt û pêşdeçûyi. Mînaka pêşdaçûyina bajartiyê bi wateyeke rasteqînî ji pêşî ve di rojavaya Îranê de, dûre jî di Mezopotamyaya jêrîn de xwe daye kifşkirin û aryan rewşa bajartiyê bi lezgînî şopandise û di paş re li gelek waran bajartî belav bûye. Yên berî ji van bajaran B.Z. bi 4 hezar salî di nîvê dawîn de bajarê Sûs û Rûkê ne. Di dawiyê de bûne wekî bajarê dugeltiyê. Dugeltiya arya di bajartiyê de wisa pêş de çûye her wekî (Hatamtî û Hattî) ya gihiştine ba Argıştiyê. Dema ku ev dugel xerab bûne jî di pey re çêkirina dugelêن bajarî dîsa hatiye dîtin. Di rûyê dinê de şaristaniya herî mezin û nivîsen nemir ji aliyê aryan ve hatine dîtin.

Nivîsen wêneyan ku jê re Hiyegrolif tê gotin, cara pêşîn ji aliyê hatemtiyan ve ji Dîclê pitografikê hatiye gühertin ber bi nivîsa bizmarî ve. Du heb tablê ku zimanê proto-hatamti (elam) tê gotin hatine nivîsandin di muzeya Luvrê de niha seknandine, ji vê re mînak in. Ev tabletên ku B.Z. bi 4 hezar sal ve girêdayîne tabletê wekî wan di Mezopotamyaya jêrîn de jî hatine dîtin û, elam, sumer didin nîşan şaristaniya aryan bi hev û din ve girêdayîye û pêş de çûye. Dibe ku Elamtî û Sumertî be. An jî zaraveyên aryanê dîtir bin yek ji yekî cudatir zimanek nîn e. Dema mirov li mînakek du duyên kin pêwîst bibîne divê peyva gal/kal (mezin/kalik) Nînda (nan) gişatî (temamî)

binêre tê dîtin ku sumer, elam, hitit, kasîtan di zimanê xwe de ev peyvan xebitandine.

Dr. Şêrgo Belec wiha dibêje:

*Bi ci awayî dibe bila bibe civaka kurd a niha û di gel her çar çiqên xwe; kurmanc, goran, lor, kelhor pêşketî ne, ji wan ometên aryanê ku şaristaniya bi rewneq di jora Îran û ew bajarên girêdayî bi Îranê de ne belav kirine û kirne jiyanê. Bi vê tewrê mezinatî li ser temamê civakên aryanê brayê xwe yên pêşin kirine. Di serê sibê de zimanê ew ê kurdî bûye ferhenga giştî. Temamî eşîr û civakên di nav wê argıştiyê (imparator) de ku heya çavkaniya Dîcle û Feratê û heya dawiya beraca xelîçê dirêj dibe, pê diaixin. Di wê demê de serbajarê Argıştiyê Akbatan bû. Li aliyê Kermanşahê di wê demê de ji wî zimanî re Behlewan an jî Behlewanan dihat gotin an ku zimanê Egitan, mîrxasan. Di vir de mînakeke vekirî heye ku kurd ji civakên arya yên pêşdeketî ne ku ola fermî li Kurdistanê di gel belavbûna ola İslâmî jî ola zerdeş ew ola ku bi tenê di nav neteweyên aryan de dihat naskirin loma jî olek neteweyî bû. Bi giştî di nav temamê aryan de dihate jiyandin. Bi derbasbûna gelek qîrn û pêvajoyan jî û di gel şupal û aşîten li ser mirovahiyê de dihatin dîsa ola zerdeş di nav gelek herêmên Kurdistanê de îro jî tê parasin. Birêz Şelahaddin Miho-*

*Bi ci awayî dibe bila  
bibe civaka kurd a  
niha û di gel her çar  
çiqên xwe; kurmanc,  
goran, lor, kelhor  
pêşketî ne, ji wan  
ometên aryanê ku  
şaristaniya bi rewneq  
di jora Îran û ew  
bajarên girêdayî bi  
Îranê de ne belav  
kirine û kirne jiyanê.  
Bi vê tewrê mezinatî li  
ser temamê civakên  
aryanê brayê xwe yên  
pêşin kirine.*

tolî di pirtûka xwe ya bi navê "arya Uygarlıklarından Kürtlere" de tîne ziman ku:

Hinek qewman bi zordesiyên leşkerî neteweyê dinê dagir kirine û şaristaniya wan neteweyan hildane bin destêن xwe û talan kirine. Herçî yên ji bin talankirina wan filitîne jî dirûsim (damga-nişan) ên xwe yên qelb (sexté) lê dane û ji xwe re kirine mal. Di Asyaya pêşîn de ev bûyer bi piranî tê dîtin.

Mînak: Dema ku turkmenan, parsekan, ereban, yewnanan ev deran (welatê aryan) dagir kirine rastî şaristaniyeke geleki pêşveçûyî hatine û bi wê hovîtiya xwe ya koçerî gelek şaristaniyên arya tune kirin û di nav hinekîn din de jî bi xwe heliyan û dîsa jî ew şaristaniyêن mayînî (Patenta) aryan e. Mînak:

Di vê pêvajoyê de li bajare Antalyayê di sazgeheke tûristî de li ser neqşê mozaikê motîfa nik xebitandin. Di

bin motîfa tirkan de dekore kirine û dane lanse kirin. Ev rewşa çiqas bi rastiyen ve tê girêdan. Li ber çavan em pir rind dizanin ku çand û kolanêni nika digihêن ci merhale-yê. Divê Antalya, Bexda û li Tehranê bê laseyîkirin (taklit). Dîsa jî rastiya ku ev zade han çanda aryanan ji holê nikare bide rakirin. Jê girtibin jî afirandin nîn e. Dibe ku rewşek dagirkerî û helandinê be. Ew neteweyê ku navê wan li jor hat gotin û bi koçerî hatine Asyaya pêşîn ew afirandinê ku bi aryan ve girêdayîne çiqas boyaxêñ xwe lê dixin bira lêxin, çiqas qet û pariyêñ xwe pê ve dîzeliqînin bira bizeliqînin dîsa jî ew afirandinê arya û neviyêñ wan kurdan in. Yêntim pîşeyêñ netewî û civakî bisekinin.

Tirk bi rewşek berbiçav jî dîsa dibêjin geleki bi navê kurd tune ye, Newroz eyda tirkan e, Seraya îshak Paşa şaheserek tirk e. Ev gotin çiqas rast bin gotinêñ ku dibêjin Hamûrabî heykelek erebî ye, heykelêñ mirovîn rût û tazî yên yewnaniyan in, qesrîn bi neqşen stûn hatine çekirin ên Îraniyan in ewqas rast in. Divê ku afirandin û laseyîkirin neyê tevlîhevkirin. Lê çiqas bê tevlîhevkirin û laseyîkirin jî ji orjinalê bedewtir bê xuyan jî dîsa jî kûraya pîşeyê orjinalê tim li pêş e. Di warê dîrok û çanda Bastanasi de li gor enca ma lêkolinan di dinê de navenda zadê şaristaniyê berî

her neteweyî bi navê aryan di nîvê rojhilata Anadolu û bakurê Mezopotamya di gel rojavayê Îranê qada çiyayê Zagrosan de bûye. Aryan bi serê xwe li van deran ev şaristaniya afirandinê û ev jiyan dane domkirinê.

Di van demêñ dawîn de zimanzanêñ Rûs di qada lingüistik(zimanzanî) ê di encama xebatêñ wan de dane zanîn ku aryan xwedî yekîtiya ziman bûne û zimanê jê re Hind-Ewrûpa hatiye gotin, navenda wan Rojava û Rojhilat bûye, navenda zayîna aryan bûye. Çawa ku navê çand û şaristaniyê jî ev deran bûne her wisa ji aliyê linguistîkê (Binêr: Rojnameya Milliyeta 5.11.1990 i)


Dema ku mirov li kûrahiya dîroka dinê mêze dike û neteweya aryan tîne ber çavêñ xwe divê bûyera Hz Nûh jî were bîra mirov. Bi hezaran sal e ku tofana Hz Nûh û serpêhatîya wî ya keştiyê di gengesiyêñ neteweyê dinê de û li cem gelek zanyar û lêkolîneran pir cihekî girîng girtiye û bi hinek rêtê nêzî hev û din hatiye ziman.

Bi gelempêri tofan di nav mijarêñ dinê de cihê xwe bi zêdeyi girtiye. Hinek şexsiyetan ev bûyera li ser çiyan û bermahiyêñ keştiyê vekolandîye. Bi giştî tê gotin ku ev bûyera di Asyaya pêşîn de hatiye hilqewişandin. Di B.Z. 4 hezar salan sumeran ev pîrsa anîne ziman û rewşa bûyerê bi nivîskî di vê derê de rewşa xwe ya pêşîn girtiye.


*Dema ku mirov li kûrahiya dîroka dinê mêze dike û neteweya aryan tîne ber çavêñ xwe divê bûyera Hz Nûh jî were bîra mirov.*

# ANATOMİ


**GÜLSEREN DENİZ**




- 1-Masulka bia zik (golimê) /hundir
- 2-Masulka bin zik(golimê) / der
- 4-Masulka zik kevane (derva)
- 24-Pirda mil (sergirk)
- 42-Tila xweziyê / bin guh
- 43-Tila xweziyê / bin çenê
- 46-Gupik
- 54-Temarê bin kîr
- 55-Rehê golimê û ran
- 57-Xeza gewr
- 59-Xeza kevane
- 61-Hestiyê çengelê/bin
- 72-Masulkeya gepê(alek)
- 79-Masulka tilorê (sêalî)/navîn
- 83-Masulkên navbera parsû(parxan) derva
- 85-Masulkên cûtinê
- 87-Masulkên zik xar
- 88-Masulkên mil û zik Xor (kevane) hundir
- 89-Masulkeyên bêrikê û hestiyên zimên
- 90-Masulkên dora dev(glover)
- 91-Masulkên sîng(mezin)
- 97-Masulkên heta(çarserî)
- 98-Masulkên zik/rast
- 99-Masulkên golimê(honanê)-pizî û junî
- 101-Masulkê bin çeng(kêrtikê)/paş
- 102-Masulkên stukûr(pişt guh)-  
hestiyê sermil û hestiyê sîng)
- 103-Masulkên qırıkê
- 106-Masulkê sêwinçê(çenikê)
- 107-Masulkên nuxumandina hetra girtinê
- 109-masulkên zik(ser berî)
- 111-Masulkê kêrtik(hestiyê sergirtkê  
û hestiyê patikê)
- 112-Masulkên pîl(sê serî/alî)
- 113-masulkên hinarekê/mezin
- 117-Rêhê nava pîl
- 125-Parxan
- 129-Hestiyê tasa serî(nîv-tasa rastê  
niv tasa çepê)
- 134-Hestiyê hinarek
- 151-Kîsikê avikê/ Gujnik(hêlik)
- 159-Hestiyê kemaxa serî pêşin  
(hestiyê tenıştê)
- 160-Dapa (kapa)/ser sîng
- 179-Xwinhenêra (Mexanî)/ bin çeng




- 1-Masulkên bin zik (bergolimê)/hundir  
 24-Hestiyê sergirkê (Pirka mil)  
 33-Kolix(qafika serî)  
 34-Betanê zik  
 41-Tila(beza) histêrên çavan  
 42-Tila (beza) xwaziyê bin gûh  
 43-Tila(beza) xwaziyê bin çenikê  
 55-Gurzê temqrê ber golimê (bin ran)  
 56-Gurzê temarê kezebê /yên glover  
 57-Xeza spî(gewr)  
 58-Xeza kevane  
 59-Xeza hivok(nîv kevane)  
 61-Hestiyê çengelê/jêr  
 62-Hestiyê çengelê jor  
 84-Masulkên nav parxanê (hundir)  
 86-Masulkeya bin dev  
 89-Masulkeya bêrikê û hestiyê zimên  
 91-Masulka sîng û pîl /mezin  
 92-Masulka sîng û pîl/piçûk  
 95-Masulka qirpikê(perikî)  
 98-Masulka zik (rast)  
 99-masulka honanê pizî û junî  
 102-Masulka peleguhê û hestiyê kolanê (pirda mil)  
 103-Masukên hestiyê ziman û hestiyê sîng  
 104-Masulkên hestiyê sîng û qiratika tiroïd  
 108-Masulka Hestiyê zimên û qiratika tiroïd  
 109-Masulka zik (ser berî) berayî  
 110-Masulka sîng ser berî(berayî)  
 125-Parxan  
 137-Kîr (cûlik)  
 151-Kîsikê avikê(hêlik)(gujnik)  
 153-Gicika(sinus) eniyê  
 154-Gicika çengela jorîn  
 159-Qor hestîHestiyê sêvikê (kemaxê) serîşin(hestiyê teniştê)  
 160-Dapa sîng




- 3-Şehtamar(Aort)
- 8-Xwinbera serete
- 9-Xwinbera heta
- 21-Qratika tiroîd
- 24-Sergirkê (pirka mil)
- 25-Loqle (ruvî mezin) ya ber bi jor
- 26-Loqle (ruvî mezin) ya ser bi jêr
- 27-Loqle (ruvî mezin) (sigmont)
- 28-Loqle (ruvî mezin) / bewrarî
- 34-Betanê zik (diyafram)
- 36-Riya ava mertiyyê (xwir) (mêzi)
- 45-Tila tiroid
- 47-Kezeb(cerga reş)
- 50-Bûmbar (ruviya zirav)
- 53-Gurzê temarêñ kezebebê /qılçıkî
- 55-Gurzê temarêñ golumê û ran
- 60-Ziman
- 61-Hestiyê çena jêrîn
- 62-Hestiyê çengela jorîn
- 69-Masulka hestiyê pîl du alî
- 73-Masulka ser bêrikê û pîl
- 74-Masulka jor pîl (kolanê) deltoit
- 76-Masulka du zik
- 79-Masulka tilarê(qorikê)navîn
- 86-masulka bin dev
- 97-Masulka hetê çar serî
- 105-Masulka bin pidî
- 107-Masulka nuxumandinahesiyê ran / rakişandinêa
- 111-Masulka sergirkê .û hestiyê patikê
- 112-Masulka pîl sê serî
- 117-Rehêñ nava mil
- 124-Şilava piçûk
- 126-Hestiyê eniyê
- 129-Tasaserî(niv tasa rastê niv tasa çepê)
- 130-Hestiyê (navseqê) rûv
- 132-Hestiyê xençerkî
- 133-Hestiyê sêwicê
- 137-Kîr/cûlik
- 140-Tora(koma) rihêñ pîl
- 146-Pişik
- 151-Kîsikê avikê (hêlik)/gujnik
- 153-Qicika (sinûsê)enî
- 154-Gicika çengela jor
- 159-Hestiyê kenaxê ser peşin hestiyê teniştê
- 162-Kîsikê gün/gujnik
- 169-Temarêñ ser gedek(hûr)
- 176-Xwingerên hêlik
- 178-Xwinhênera bin çeng
- 179-Xwinhênera (Xwincivarda) pîl
- 180-Xwinhênera pîl û serî
- 183-Xwinhênera jor pîl(navpîlê)
- 184-Xwinhênera heta/qorê
- 188-Xwinhênera stu hundir
- 195-Xwinhênera sergirkê navpîlê(pirda mil)bin
- 196-Gedek(hûr)
- 197-Mlikên dil (rastê)
- 200-Zefran(ziravik)
- 201-Kîsikê mizê




- 1-Masulka binzik(temarê pilikê hundir)
- 5-Apandisit
- 24-Sergik (pirda mil)
- 25-Loqle(roviya mezin) ervi jor
- 26-Loqle(roviya mezin) û serbi jêr
- 27-Loqle (ruviya stûr) (sigmot)
- 28-Loqle (roviya mezin) / berayî
- 29-Qula (bêvil) poz ya bin
- 30 Qula (bêvil) poz ya navîn
- 31-Qula (bêvil) poz ya ya ser
- 33-Qolik(qafika seri)
- 34-Betanê zik
- 35-Qenala /riya (qula)zefranê
- 45-Tila tiroïd( dor gewrî)
- 47-Kezeb (cerga reş)
- 50-Ruviya zirav(berik)
- 51-Qirpik (gewrî) Zimanê zenglorê
- 55-Gurzê temarê golimê û ran
- 60-ziman
- 61-Hestiyê çengela jêr
- 62-Hestiyê çengela çengela jor
- 65- suncıqa roviyan
- 91-Masulka sîng û pîl/ mezin
- 97-Masulka hetê çar alî
- 99-Masulka golimê(honanê)
- 124-Şilava piçûk
- 128-Hestiyê patikê
- 146-Pişik
- 151-Hêlik(kisikê avikê)gujnik
- 153-Gicika (sinûsa)enî
- 158-Gicika hestiyê sipanê(xençerkî)
- 159-Hestiyê kemaxê (hestiy tenistê)/serî pêşin
- 160-Depa sîng
- 180-Xwinciwanda /serî û mil
- 182-Xwinhênera (xwincivanda) mezin  
(MEXANI) sereke jor
- 183-Xwinhênera navpîlê
- 188-Xwinhênera stu/hundir
- 195-Xwinhênera bin sergirkê
- 196-Gedek (hûr)
- 200-Firşik
- 201-Kisikê mizê



- 3-Şehdemar (aort)  
 6-xwinbera bin çeng  
 7-xwinbera mil(kolanê)  
 8-Şehdemara serete(mezin)  
 9-Xwinbera heta  
 10-Xwinbera (tengalê) kôlakan mezin  
 11-Xwinbera (tengalê) kôlakan dervai  
 12-Xwinbera (tengalê) kôlakan hundir  
 13-Xwinbera sipilê (paterekê)  
 14-Xwinbera sunciqê loqlan /bin  
 16-Xwinbera pişikê  
 18-Şehdemra bin (pirda mil)Sergirkê  
 20-Bronşa serte çepê  
 24-sergirkê (pirda mil)  
 34-Betanê zik  
 35-Qenala zefranê (qula ziravikê)  
 36-Qenala ziravikê  
 37-Roviya dewazdeh girê  
 44-Tila ser gurçikê  
 52-Spil  
 55-Gurzê(koma) temarê ber golimê  
 62-Gurzê(koma) temarê jor  
 69-Masulka pîl/du alî  
 73- Masulka ser bêrikê  
 74-Masulkeya (jorpîl) deltoit  
 79-Masulkeya tilorê navîn  
 82-Masulka kôlekê  
 91-Masulka sîng mezin  
 92-Masulka sîng piçük  
 97-Masulka qorikê navîn  
 107-Masulka nuxumandina heta ragirtine  
 111-Masulka kovik  
 112-Masulka pîl (sêseri)  
 116-Rehê ber golimê û piziyê  
 117-Rêhê nava pîl  
 120-Rêhê heniskê  
 126-Hestiyê eniyê  
 128-Hestiyê patikê  
 129-Hestiyê beleguhê  
 132-Hestiyê (xençerkî)kôlaka eniyê  
 133-Hestiyê sêwicê  
 136-Ziravik  
 149-Gurçik  
 152-Navberika poz  
 158-Gicika hestiyê siperanê  
 163-Zengilor  
 164-Şehdemara kolanê (serê mil)  
 165-Şehdemara kolanêzik serete  
 169-xwingérin ser pilikê (bin)  
 174-Xwingérin sinuqa loqlan ser  
 176-Xwingérin hêlikê  
 181-Mexaniya Serete bin  
 182-Mexaniya Serete ser  
 185-Mexaniya pîzî bergolimê sereke  
 186-Mexaniya bergolimê (der)  
 187-Mexaniya bergolimê (hundir)  
 188-Mexaniya bergolimê stû(hundir)  
 190-Xwingérin gurzê sincuqa loqlan /ser  
 191-Maxaniya dericeya du niçik



- 3-Şehdemar(aort)  
 6-Xwinbera bin çeng  
 7-Xwinbera mil  
 9-Xwinbera heta  
 10-Xwinbera tengalê(teniştê)sereke  
 11-Xwinbera tengalê(teniştê) der  
 12-Xwinbera tengalê hundir  
 14-Xwinbera gurzê suncûqa loqlan  
 17- Xwinbera gurçikê  
 18-Xwinbera bin pirda mil (Sergirkê)  
 25-Loqle(ruviya stûr)ya bervi jor  
 26-Loqle(ruviya stûr)ya serbi jêr  
 33-Kilox  
 34-Betanê zik  
 36-Qenala avikê (gûn)  
 44-Tila ser gurçikê  
 51-Qirtik(gewri)zimanê zemglorê  
 55-Gurzê temarên bergolimê û ran  
 60-Ziman  
 61-Hestiyê çenikê jêr  
 62-Hestiyê çenikê jor  
 68-Masulkahestiyê hetadirêj/nêzikkirinê  
 69-Masulka mil du serî  
 74-Masulka (deltoit)jorpîl kolanê  
 79-Masulka tilorê navîn  
 80-Masulka tilorê piçük  
 81-Masulkeya tenik  
 97-Masuka hêtê çar serî  
 97a-Masulka heta pizî  
 112-Masulka pîl sêserî (sê alî)  
 117-Rêhê pîl navîn  
 120-Rêhê enişkê  
 122-Sorîcik(sorsorik)  
 130-Hestiyê rûv(sêalî)nav seq  
 140-Koma rêhên pîl  
 145-Tila prostat  
 146-Pişik  
 149-Gürçik  
 152-Navberika poz.  
 153-Giçika(Sinûsê) emî  
 158-Giçika(sinûsê) hestiyê xençerkî  
 159-Hestiyê qonê(kemaqê) qaçê ser pêşin  
 163-Zenglor  
 166-Qenala mizê  
 176-Malzarûk  
 181-Xwinhênera serte ya jêrin  
 184-Xwinhênera serte ya golimê qorê  
 185- Xwinhênera serete  
 186- Xwinhênera golimê der  
 187- Xwinhênera golimê hundir  
 193-Xwinhênera gurçikê  
 199-Marîpişt[pirûsk)  
 201-Kisikê mizê(kulmizik)  
 202-Tila kisikan



- 24-Sergirk(pirda mil)**  
**29-Kepû bêvil(binî)**  
**30-Kepû bêvil navîn**  
**31-Kepû bêvil ser**  
**39-Hestiyê hêtê**  
**48-Hestiyê zirê(pazû)**  
**51-Qirpik (zimanê zenglorê)**  
**60-Ziman**  
**61-Hestiyê çengelê jêr**  
**62-Hestiyê çengelê jor**  
**64-Mejiyî pişê**  
**67-Masulka hestiyê heta (nêzikkirinê) kîn**  
**68-Masulka hestiyê heta dirêj**  
**79-Masulka tilorê navîn**  
**80-Masulka tilorê piçûk**  
**81-Masulka tenik**  
**82-Masulka kîlkê**  
**94-Masulka navpiştê(newqê) mezin**  
**114-Rêhê hêtê**  
**115-Rêhê golimê û.hûr(bin)**  
**116-Rêghê tengalê û piziyê**  
**118-Rêhê xitimandinê**  
**125-Parxan**  
**126-Hestiyê eniyê**  
**127-Kunhestî (hestiyê qonê)**  
**128-Hestiyê patikê**  
**129-Hestiyê tasa serî niv tasa'rastê nîv tasa çepê**  
**130-Hestiyê rûv (navşeqê)**  
**131-Hestiyê boçikê**  
**132-Hestiyê xençerkî(kêlaka eniyê)**  
**133-hestiyê sêwicê**  
**140-Tora rêhê mil(pîl)**  
**141-Tora rêhê nivpiştê (Koma rêhê boçikê) mamzikê û hestiyê kortixê**  
**148-rûviya berik**  
**150-Hestiyê berikê**  
**153-Giçika(sunisê) enî**  
**158-Giçika hestiyê teniştâ enî pêşin (sipanê)**  
**199-Marî pişt(bazinê hestiyê pitê)**

**TORÎ**

Weke ku em di her meferî de dibêjin, nivîskarî karê zanayiyê ye. Tê vê yekê ku kesen zana karin binivîsin. Heke zanayiyên kesî fireh be, bêguman wê ew kes nivîskariya xwe bi salan bidomîne. An na wê nivîskariya wî kesî di midekî kurt de biqede. Nexwe, kesen ku bivên nivîskariyê bikin, divê xwe bi azînên nivîskariyê, nexusim di fîrbûna rastnivîsandinê de tekûz bikin. Kes dikare

# LÊK Û DAWÎNEYÊN KURDÎ

romana, kurteçirokan an bendan bi wî awayî an dê vî awayî binivîsîne. Lê tu nivîskar nîkare bi rêzimana zimanê ku bikartîne, li gorâ xwe bikar bîne. Rêzman, tevayıya rêzikîn rastnivîsandin û rastaxaftina ziman e. Ev rêzik jî ziman bi xwe diafirîne. Bi gotineke din, ziman di afirendinê de rêzikîn xwe bi xwe re tînin. Ew rêzik ji parzûnga hezar salan dibuhurin, dizelilin û rûdinin. Tê vê yekê ku rêzikîn rêzman ji aliye kesinan, rêxistinan nayênine dayin û ziman li wan rêzikan nayê suwarkirin. Kes an rêxistin (sa-zî), bitenê li wan rêzikan lê dikolin û wan derdixine holê da ku nivîskar nivîsarên xwe li gora van rêzikan binivîsînin. Em jî bi lêkolînan têgihiştî rêzikîn rezimanê zimanê xwe yê delal bûn. Ji bo ku, hineke din jî têgihiştî van rêzikan bibin, em van pêskêş dikan.

## LÊKÎN KURDÎ

Dewlemendiya Kurdî li gel zaraveyan, heynâ lêk û dawîneya ye. Lêk, lewna peyvê ye ku bixweser

ku bixweser tu ramanî nadîrin. Lê têne pêş, nav û paşıya binyadênavan, bi wan binyadan ve dibin, raman, texlît an bi tenê raman an jî texlîten wan peyvan diguberînin, ji wan peyvine nû didamezrînin. Lêkên Kurdî du nifş in.

- 1- Lêkên guherber.
- 2- Lêkên neguherber.

### 1) Lêkên guherber.

Lêkên guherber têne pêş û paşıya binyada peyvan, bi wan binyadan ve dibin. Bi sitandina wan lêkan binyadê peyvê raman û texlîten xwe an jî, bi tenê texlîten xwe diguberînin.

Du nifşen lêkên guherber hene.

- 1)Lêkên guherber ên pêşgir,
- 2)Lêkên guherber ên paşgir.

### 1)Lêkên guherber ên pêşgir.

Di zaraveyê kurmancî de 13 lêkên guherber ên pêşgir hene. Ev lêk, (bê), (bi), (ne), (hil), (re), (wer), (da), (der), (bin), (rê), (ber), (nav), (ve) ne.

Erkên lêkên guherber ên pêşgir têvel in. Her wekî:

- 1) Ji navan rengdêrê radikêşenin. Ev lêk,

*Dewlemendiya Kurdî li gel zaraveyan, beyîna lêk û dawîneya ye. Lêk, lewna peyvê ye ku bixweser tu ramanî nadîrin in. Lê têne pêş, nav û paşıya binyadênavan, bi wan binyadan ve dibin, raman, texlît an bi tenê raman an jî texlîten wan peyvan diguberînin, ji wan peyvine nû didamezrînin. Lêkên Kurdî du nifş in.*

(bê), (bi) ne.

**Nîşe: 1**

- |           |          |
|-----------|----------|
| a)1) bê   | b) 1- bê |
| 2) zirav  | 2- dil   |
| 3)bêzirav | 3- bêdil |

Pêşgira (bê) hatiye ber navên (zirav) û (dil) bi wan navan ve yek bûyi ye. Bi standina pêşgira (bê) van navan wateya xwe guhertine. Ji texlîtê nav, wergeriyane texlîtê rengdêrê.

**Nîşe: 2**

- |         |          |
|---------|----------|
| a)1- bi | b) 1- bi |
| 2-çek   | 2- deq   |
| 3-biçek | 3- bideq |

Pêşgira (bi) hatiye ber navên (çek) û (deq). Bi wan navan ve yek bûyiye. Bi standina pêşgira (bi) van navan wateya xwe guhertine. Ji texlîtê nav, wergeriyane texlîtê rengdêrê.

**2- Ji rengdêrêan rengdêrê radikişînin.**

- |                 |           |
|-----------------|-----------|
| <b>Nîşe: a)</b> | <b>b)</b> |
| 1- ne           | 1- né     |
| 2- wêrek        | 2- mér    |
| 3- newerek      | 3-nemér   |

Pêşgira (ne) hatiye ber rengdêrê (wêrek) û (mér). Bi wan rengdêrêan ve yek bûyiye. Bi standina pêşgira (ne) rengdêrê bi tenê wateya xwe guhertine. Ji rengdêrê rengdêrê din rakişandine.

**3- Ji lêkeran lêker radikişînin.**

(ve), (hil), (re), (wer), (da), (der), (bin), (rê), (ber)

- |            |            |             |            |
|------------|------------|-------------|------------|
| a) 1-ve    | b) 1-hil   | c) 1-re     | d)1-da     |
| 2- kirin   | 2-kirin    | 2- xistin   | 2-ketin    |
| 3- vekirin | 3-hilkirin | 3-raxistin  | 3-daketin  |
| e)1- wer   | f)1-rê     | g)1-be      | h)1-bin    |
| 2- kirin   | 2-kirin    | 2-avêtin    | 2-ketin    |
| 3-werkirin | 3-rêkirin  | 3-beravêtin | 3-binketin |
| k- 1- der  |            |             |            |
| 2-dan      |            |             |            |
| 3- derdan  |            |             |            |

Weke ku di nîseyêñ jor de hate raberki-

rin pêşgirêñ di ristêñ yekemîn de têne ber lêkerêñ ristêñ duyemîn. Bi standina wan pêşgiran lêkerêñ rista duyemîn wateya xwe di guherînin, ji wan lêkeran lêkerine nû radikişin.

**4- Ji navan nav radikişînin.**

(bin), (nav), (rê), (ber)

- |           |          |           |           |
|-----------|----------|-----------|-----------|
| a)1-bin   | b)1-nav  | c)1-rê    | d)1-ber   |
| 2-dest    | 2-mal    | 2-ziman   | 2-bang    |
| 3-bindest | 3-navmal | 3-rêziman | 3-berbang |

Weke ku di nîseyêñ jor de hate raberkin pêşgirêñ ristêñ yekemîn hatine ber navên ristêñ duyemîn. Bu standina pêşgirêñ ristê yekemîn navên ristêñ duyemîn, di ristêñ sêyemîn de wateya xwe guhertine, ji wan navan navine din rakişandine.

**2- Lékêñ Guherber ên Paşgir**

Di zaraveyê kurmancî de bîst (20) lékêñ guherber ên paşgir hene. Ev lêk : (anî), (oyî), (ek), (dar), (mend), (nas), (în), (ayî), (tî), (î), (istan), (kar), (ker), (van), (geh), (zan), (dang), (xane), (kî), (and), in.

Erkêñ lékêñ guherber ên paşgir têvel in.

**1- Ji navan nav radikişînin.**

- |  |           |          |          |
|--|-----------|----------|----------|
| (anî), (oyî), (ek), (dar), (mend), (nas), (în) |           |          |          |
| a) 1-anîb                                      | 1-oyî     | c) 1-ek  | d) 1-dar |
| 2-keç  | 2-sews    | 2-pars   | 2-çek    |
| 3-keçanî                                       | 3-séwsoyî | 3-parsek | 3-çekdar |

- |             |          |         |
|-------------|----------|---------|
| e)1-mend    | f)1-nas  | g)1-în  |
| 2-huner     | 2-maf    | 2-zér   |
| 3-hunermend | 3-mafnas | 3-zérîn |

Weke ku di nîseyêñ jor de hate raberkin paşgirêñ ristêñ yekemîn, têne paş navên ristêñ duyemîn. Bi standina paşgirêñ rista yekemîn, navên rista duyemîn taxlîten xwe di guherînin, werdigerine texlîtinex navên din.

**2- Ji rengdêrêan nav radikişînin.**

(ayî), (tî), (î)

- |         |         |         |
|---------|---------|---------|
| a)1-ayî | b)1- tî | c)1-î   |
| 2-kor   | 2-birçî | 2-fereh |

## 3-korayî 3-birçitî 3-ferehî

Weke ku di nîşeyêñ jor de hate raberkirin paşgirêñ ristêñ yekemîn hatine paş rengdêrên duyemîn, bi wan rengdêrêan ve yek bûyine. Bi standina paşgirêñ ristêñ yekemîn, rengdêrêñ ristêñ duyemîn, di ristêñ sêyemîn de raman û texlîten xwe guhertine, vegeriya-na texlîten navan.

## 3- Ji navan nav radikişîmin.

(tî), (î), (istan), (kar), (ker), (van), (geh), (zan), (dang), (xane), (în).

- |            |             |              |           |
|------------|-------------|--------------|-----------|
| a) 1- tî   | b) 1-î      | c) 1-istan   | d) 1-kar  |
| 2-bira     | 2-kurd      | 2-gul        | 2-coht    |
| 3-biratî   | 3-kurdî     | 3-gulistan   | 3-cohtkar |
| e) 1-ker   | f) 1-van    | g) 1-xane    | h) 1-în   |
| 2-kar      | 2-nêçîr     | 2-pirtûk     | 2-dar     |
| 3-karker   | 3-nêçîrvan  | 3-pirkûkxane | 3-darin   |
| i) 1-geh   | J) 1-zan    | k) 1-dang    |           |
| 2-havîn    | 2-dîrok     | 2-kevçî      |           |
| 3-havîngeh | 3-dîrok-    |              |           |
| zan        | 3-kevçîdang |              |           |

Weke ku di nîşeyêñ jor de hate raberkirin paşgirêñ ristêñ yekemîn, hatine paş navêñ ristêñ duyemîn, bi wan navan ve yekbûyî ne. Bi standina paşgirêñ ristêñ yekemîn, navêñ ristêñ duye-mîn wateya xwe guhertine, ji navêñ din rakişan-dine.

## 4- Ji navan daçek radikişînin.

(kî)

- Nîşe: a) 1-kî      b) 1-kî  
 2- nîvroj      2-gundor  
 3-nîvrîjî      3-gundorkî

Weke ku di nîşeyêñ jor de hate raberkirin, pêşgira (kî) hatiye paş navêñ (nîvroj) û (gundor). Bi wan navan ve bûyiye. Bi standina paşgira (kî) herdu nav raman û texlîten xwe guhertine. Ji texlîten navan, vegeriyana texlî-

tê daçek.

## II- Lêkerêñ Neguherbar.

Di kurdî de hin lêk hene ku têne navbera du peyvan, bi wan peyvan ve yek dibin. Ji wan peyvan peyvine din ên yekbûyî didamezrînin. Bi standina wan, ew peyv wateya xwe naguherînin, bi tenê werdigerînin peyv-en yekbûyî. Her wekî:

Nîşe: a) 1-e

2- jîn, bî, pişt, zik

3- jinebî, bîştezik

Weke ku di nîşeya jor de hatiye raberkirin, lêka neguherber (e) hatiye navbera navêñ rista duyemîn. Bi standina vê lêkê, navêñ rista duyemîn di rista sêyemîn de wergeriyane navine yekbûyî.

Nîşe: 2)b-1-û

2- bîr, bawerî, qul, qewar

3- bîrûbawerî, qulûqewar

Weke ku di nîşeya jor de hatiye raberkirin, lêka neguherbar (û) hatiye navbera navêñ rista duyemîn. Bi wan navan ve yekbûyî ye.

Bi standina lêka (û) navêñ rista duyemîn, di rista sêyemin de wergeriyane navêñ yekbûyî.

## DAWÎ:

Peyvîn hêsan, rakişayî û yekbûyî sê awayêñ peyvîn Kurdi ne. Peyvîn rakişayî, ji peyvîn hêsan û lêkan didamezrin. Dema ku

me lêkan ji ser peyva rakişayî rakirin, peyva hêsan, bi raman û texlîte xwe ve derdikeve holê. Tê vê wateyê ku peyvîn rakişayî bi wan hêmanan pêk têñ. Di vî warî de me li jor bi qasî heyî nîşe dan.

## Dawîneyêñ Kurdi

Di nav de bi peyvîn din re têkiliyê li dar bixe hin lêkan distînin. Ev lêk dawîne ne. Dawîne di peyvî de tu guhertinê çê nake. Bi tenê karê têkiliyê pêk tînê, ango nav bi wan

layenê xwe, tewang û hejmarên xwe raber dikan û bersivan didine dayîn.

Dawîne di van nifşan de xwiya dikin:

- 1- Dawîneyêن layenan,
- 2- Dawîneyêن veqetandekan,
- 3- Dawîneyêن tewangê
- 4- Dawîneyêن hejmaran,
- 5- Dawîneyêن masdar.

### **1-Dawîneyêن Layenan**

Tev peyvên Kurdî mî, nîr an du layen in. Li gora vê:

a) Dawîneya layena mî.

Dawîna layena mî li gora cihê ku tê bi kar anîn û bi tîpêن têvel xwe raber dikan. Her wekî:

- 1- Di veqetandeka binavkirî de layena mî,
- 2- Di veqetandeka nebinavkirî de layena mî,
- 3- Bi baneşan re layena mî.

1- Di veqetandeka binavkirî de layena mî.

Peyv di veqetandeka binavkirî de bi standina dawîneya (a) layena xwe ya mî raber dike. Her wekî:

-Pirtûka dotmama xwe lê vegerand.

Di hevoka jor de navê (pirtûk) xwe veqe-

-Keçeke xwiheke xwe şande dibistanê.

Di hevoka jor de navê (keç) xwe veqetandiyе ser navê (xwi).

Lê di vê veqetandinê de, em nizanin bê kîjan keç û kîjan xwi e. Lewma ev veqetandin, veqetandineke nebinavkirî ye. Navê (keç) û navê (xwi) di vê veqetandinê de nebinvkirî ne diyar kirin. Weke ku tê dîtin, navê (keç) û (xwi) di vê veqetanê de pêşî dawîneya (ek) pişt re dawîneya (e) standine. Bi standina dawîneya (ek) herdu nav nebinavkirîya xwe, bi standina dawîneya (e), layena xwe ya veqetana nebinvkirî standine.

3-Bi baneşan re layena mî.

Peyv ku bi baneşanan re tê bikaranîn di yekhejmar de (ê) bi pirhejmar ya nebinavkirî(in) re (o) ye. Her wekî:-Wa Dêrsimê, malxerabê, ma soza te wilo bû lê?

-Xwihi, dotmamino zarokên xwe bidine xwendin.

Di hevokên jor de gazinek- daxwaziye kîjan keç û kîjan xwi e. Lewma ev veqetandin, veqetandineke nebinavkirî ye. Navê keç û navê xwi di vê veqetandinê de nebinvkirî ne diyar kirin. Weke ku tê dîtin, navê û di vê veqetanê de pêşî dawîneya pişt re dawîneya standine.

### **b) Dawîneya Layena Nîr.**

Layena nîr jî weke layena mî li gora cihê ku hatiye bikaranîn û erka tê de, bi tîpîne têvel xwe raber dikan. Her wekî:

- 1- Di veqetandeka binavkirî de layena nîr,
- 2- Di veqetandeka nebinavkirî de layena nîr,
- 3- Bi baneşan re layena nîr.

tandiye ser navê (dotmam). Bi gotineke din, veqetandek bi navkirî ye. Navê (pirtûk) û (dotmam) di veqetandinê de dawîneya (a) standine. Bi standina dawîneya (a) her du nav layena xwe ya mî raber kirine.

2-Di veqetandeka nebinavkirî de layena mî.

Peyv di veqetandina nebinavkirî de bi standina dawîneya (e) layenê xwe li mî raber dike. Her wekî:

1-Di veqetandeka binavkirî de layena nîr. Peyv di veqetandeka binavkirî de bi standina dawîneya (ê) layena xwe ya nîr raber dike. Her wekî:

-Bavê Bengîn di devê deriyê hewşê de râwestiya bû.

Di hevoka jor de navê (bav), veqetiyaye ser navê (Bengîn), navê (dev) veqetiyaye ser navê (derî) û (hewş). Di vê veqetandinê de

navêñ jor dawîneya (ê) standine. Bi standina dawîneya (ê) ew nav an layena xwe ya nêr raber kiriye.

**1- Di vejetana nebinavkirî de layena nêr.**

Peyv di vejetandeka, bi standina dawîneya (î) layena xwe ya nêr raber dikin. Her wekî:

**2-Di vejetandeka nebinavkirî de layena nêr,**

**3- Bi baneşan re layena nêr.**

**1-Di vejetandeka binavkirî de layena nêr.**

Peyv di vejetandeka binavkirî de bi standina dawîneya (ê) layena xwe ya nêr râber dike. Her wekî:

-Bavê Bengîn di devê deriyê hewşê de râwestî bû.

Di hevoka jor de navê (bav), vejetiyaye ser navê (Bengîn), navê (dev) vejetiyaye ser navê (derî) û (hewş). Di vê vejetandinê de navêñ jor dawîneya (ê) standine. Bi standina dawîneya (ê) ew nav layena xwe ya nêr raber kirine.

**2- Di vejetana nebinavkirî de layena nêr.**

Peyv di vejetandeka, bi standina dawîneya (î) layena xwe ya nêr raber dikin. Her wekî:

Hevalekî Dastan li gundekî welat ma.

Weke ku di hevoka jor de tê dîtin navêñ (Heval) û (gund) pêşî dawîneya (ek), pişt re dawîneya (î) sitendine. Bi sitandina dawîneya (ek) ew nav nebinavkirî ya xwe, bi sitandina dawîneya (î) layena xwe ya nêr raber kirine.

**3-Bi baneşan re layena nêr.**

Peyv ku bi baneşan re têne bikaranîn di yekhejmar de dawîneya (o), di pirhejmar de bi dawîneya (in) re, dîsa dawîneya (o) distînin.

Her wekî: - Hevalo, pismamo ka rewşa xwe bibêjine min.

-Hevalino, pismamino ka hûn li ku man?

Di hevoka jor a yekemîn de navêñ (heval) û (pismam) dawîneya (o), di hevoka duyemîn de ew nav bi dawîneya (in) re, dîsa dawîneya (o) sitandine. Bi sitandina dawîneya (o) ew nav di awayê baneşan layena xwe nêr raber kirine.

### c- Dulayeniya navêñ kurdî

Weke ku me li jor got, navêñ kurdî mî, nêr an dulayen in. Layenêñ mî û. nêr bi nîşeyên wan re raber kîrin. Duylayeniya navêñ kurdî bi gelempêri di navêñ dêmaniyêñ cih û waran, di pîşeyêñ kesan de raber dibin. Her wekî:

**1- Di veqatandeka binavkirî de dulayenî.**

Nîşe: - Bajariya te û bajariyê te doh hatin.

Mamosteya te û mamosteyê min li dibistanê bûn.

Weke ku di hevokêñ jor de hate raberkirin navêñ (bajarî) û (mamoste) dawîneyêñ mî û nêr, di veqatandeka binavkirî de sitandine. Bi sitandina herdu dawîneyan ew nav dulayeniya xwe raber kirine.

*Weke ku me li jor got, navêñ*

*kurdî mî, nêr an dulayen in.*

*Layenêñ mî û nêr bi nîşeyên wan re raber kîrin. Duylayeniya navêñ*

*kurdî bi gelempêri di navêñ dêmaniyêñ cih û waran, di pîşeyêñ kesan de raber dibin.*

**2- Di veqatandeka nebinavkirî de dulayenî.**

Nîşe: -Gundiyeke te û gundiyekekî min hatine bajêr.

-Bijîşkeke û bijîşkekî nexweşxanê bi hev re hatin.

Di hevokêñ jor de navêñ (gundi) û (bijîşk) pêşî dawîneya (ek) pişt re dawîneyêñ (e) û (î) sitandîne, Bi sitandina van dawîneyan herdu navan dulayeniya xwe raber kirine.

**2-Dawîneyêñ Vejetandekan**

Vejetandek, vejetiyane û xwe berdانا ser navine din. Vejetandek li gora cihê ku tê bikaranîn û bi tîpîne têvel têne bikaranîn. Her wekî:

**1- Vejetandeka binavkirî,**

**2- Vejetandeka nebinavkirî,**

**3- Vejetandeka rêzdayî.**

**Kurdî, zimanekî tewangbare. Lê ev tawangbarî ne weke zimenê din tawangbar ji rayê xwe, ji binyadê xwe, xwe ditewîne. Ev tewang jî girêdayî mercinan e.**

ya cînava (min). Bi vê veqetanê ew nav bi zelalî xwe veqetandine. Dîsa bi veqetanê navê (soz) dawîneya (a), navê (saqo) bi tîpa têkiliyê (y) re, dawîneya (ê) standiye. Bi standina wan dawîneya ew navan dawîneyên veqetandeka binavkirî standine.

**2- Veqetandeka nebinavkirî**  
Peyv di veqetandeka nebinavkirî de dawîneya (ek) û dawîneyên (e) û (î) distînîn. Her wekî:

**Nîşe:** - Li devê derî dareke şîn heye.

- Zilamekî kal em birine malê.

Di hevokêن jor de navê (dar) û (zilam) weke ku tê dîtin, dawîneya veqetandeka nebinavkirî (ek) pişt re dawîneyên xwe ên layen standine.

**3- Veqetandeka rêzdayî**

Hin nav xwe ji wékhevên xwe vediqetînin ser du û bêhtir navan. Di vê veqetanê de ew nav dawîneyên layenan distînîn. Her wekî: - Zelala Eyşana Elî ji mal dihat.

Di hêvoka jor de navê (Zelal) ser navê (Eyşana Elî), navê (Eyşan) jî xwe veqetandide ser navê (Elî). Bi vê yekê veqetandeka rêzdayî damezrandine. Di vê veqetanê de navê (Zelal) û (Eyşan) dawîneya (a) standine.

**1- Veqetandeka**  
Binavkirî  
Peyv di veqetandeka binavkirî de dawîneya (a) û (ê) distînîn.

**Nîşe:** -Soza êvaran, dikeve kuwara  
-Sakoyê min hêj nedirûtin.  
Di hevoka jor a yekemîn de navê (soz) xwe veqetaniye ser navê (êvar), navê (sako) xwe veqetandi-

3- Dawîneyên têwangê

Kurdî, zimanekî tewangbar e. Lê ev tewangbarî ne weke zimenê din tewangbar ji rayê xwe, ji binyadê xwe, xwe ditewîne. Ev tewang jî girêdayî mercinan e.

**1- Bi xweguhertina dengan tewang.**

**2- Bi standina dengan tewang.**

**1- Bi xweguhertin denga tewang:**

Hin nav di veqetandeka de dengekî xwe bi dengakî din diguherînîn. Ev jî:

**1- Di navê veqetandî de xweguhertina dengan,**

**2- Di navê veqetayî de xweguhertina dengan.**

**1-Di navê veqetandî de xweguhertina dengan.**

Di vêqetanê de dengê (ê) û (î) bi dengê (i) diguherînîn. Her wekî: 1- dê, pê, rê.

**2- Diya xezal, riya bajar, piyê min.**

**Nîşe: 2**

**1- zevî, masî, dasî, devî.**

**2- zeviyê gund, masiyê derya, deviyê çiyê, dasiyê masî.**

Weke ku di nîşeyên jor de hate raberkirin, di veqetanan de dengê (ê) û (î) xwe bi dengê (i) guhertine. Di nîşeya duyemîn de, dengê (î) bi tîpa têkiliyê (y) re hatiye bikaranîn.-Tê vê yekê ku dema dengê (î) tê ber tîpa (y), xwe bi dengê (i) diguherîne. Lê dîsa tewana wî dengî ye.

**2-Di navê veqetandî de xweguhertina dengan.**

Di vê veqetanê de dengê (a) bi dengê (ê), di navê veqetayî ser navekî din de xwe diguherîne. Her wekî:

**Nîşe: 1** 1- sewal, welat, bajar,

2- Emê sewêl, bêhna welêt, taxa bajêr.

**Nîşe: 2** 1- aş, ba, xanî, zilam, agir.

2- coka êş, dengê bê, serê xêni, cilê zilêm, pêta êgir.

Weke ku di nîşeyên jor de hate raberkirin, dengê (a), di veqetandekan de xwe bi navê (ê) diguherîne û bi vî awayî xwe ditewîne.

**2- Bi Standina Dengan Tewan.**

Di vê tewanê de peyvên mê (ê), ên nêr (î) distînîn. Her wekî : **Nîşe: 1.**

-Suxte ji dibistanê hatine malê.

-Berî tev suxteyan dakete xwarê.

-Bavê Sînemê doh ji gund hat.

- Wê gotinê li buwarî min neke.

Weke ku di hevokên jor de hate raberkirin peyvên (mal) (xwar), (Sînem) û (gotin) mîne û xwe di hevokê de tewandine. Ji dêla dawîneya xwe ya (a), dawîneya (ê) ya tewanê standine.

**Nîşe: 2.**

- Ew, kesekî raserî xwe nabînî.
- Serî û binî weke hev pijiya bûn.
- Wî kurî bê xwendin nehêle.
- Kerî û hespî bi xwe re bibe çêriyê.

Weke ku di hevokên jor de Hatin raberkirin, peyvên (raser), (ser, bin), (kur), (ker, hasp) nîr in û xwe di hevokê de tewandine. Ji dêla dawîneya xwe ya (ê), dawîneya (î) standine.

### TÊBINÎ :

**1- Du awayên cînavêñ kesîñ hene.** Awayek ji wan, ango cînavêñ min, te, wî/wê- me, we, wan, tewana awayê cînavêñ kesîñ ez, tu, ew, em, win, ewan dipejirêñin. Seba ku tewan ne guhertina, peyva ji binî ye. Weke ku me li jor raber kir, guherîna dengêñ binyada peyvan standina dengan e. Lewma ew cînav bi tenê awayekî cînavê kesîñ e. Veqetana wan cînavan, girêdayî hinek mebestan e. Her wekî, dema ku kesê lêkerê bûyinekê raber dike, cînavêñ kesîñ di awayê ez, tu, ew/ em, win, ewan de diyar dibe.

**Nîşe:-Ez** ne bi dilê xwe ji welat veqetiyam.

- Te berî me tevân dibistan qedand.
- Ew gelek hez ji gulêñ sohr dike.

Weke ku di hevokên jor de tê raberkirin, lêkerêñ wan hevokan bûyerinan raber dikin. Seba vê di hevokan de cînavêñ kesîñ di wî awayî de hatine bikaranîn. Li hember vê, aveyê din cînavêñ kesîñ ji sê mebestan di wî

awayî de têne bikaranîn. Her wekî :

**1- Dema** ku lêkêñ di hevokê de kirinekê raber dike cînavêñ kesîñ di awayê min, te, wî/wê- me, we, wan de têne bikaranîn.

**Nîşe:** -Min pirtûkek ji te re anî.

- Me ew li dibistanê dît.

- We çîma ew bi xwe re bir.

Weke ku di hevokên jor de hate raberkirin lêkerêñ wan hevokan kirinekê raber dikin. Seba vê, di hevokan de cînavêñ kesîñ di wî awayî de hatine bikaranîn.

**2- Dema** ku pêgera hevokê hebe, hingî kesîñ lêkerê di awayê duyemîn ango min, te, wî/wê de têne bikaranîn.

**Nîşe:** - Min baqek gul pêşkêşî te kir.

- Min pirtûkêñ heyî xwendin.

Pêgerêñ hevokên jor (baqek gul)û (pirtûk) in. Tê vê yekê ku pêgera hevokê heye, ji vê sebê jî ew cînavêñ kesîñ hatine bikaranîn.

**3- Dema** ku lêkêñ barê kîrinê ji ser milê xwe avête ser milê hine din, hingî kesîñ lêkerê ên kesîñ di awayê duyemîn de ne.

**Nîşe:** -Doh jî min re çend nanê tenûrê anîn.

-Dewlemendiyêñ welatê min tev şelandin.

Weke ku di hevokên jor de hate raberkirin , dikarin, bûyinê ku ji aliye lêkerê hevokan hate, ne ji aliye kesîñ lêkerê, ji aliye kesine din hatine kîrin an qewimandin. Lewma di wan hevokan de cînavêñ kesîñ ên awayê duyemîn hatine bikaranîn.

**2- Di kurdî de daçeka dê heye.** Ev daçek karebûnê raser dike û di awayê (ê) de tê pêş cînavêñ kesîñ, bi wan ve yek dibe. Ev daçek jî tewana cînavêñ kesîñ tê hejmartin. Lê tu têkiliya wê daçekê bi tewanê re nîne. Bi tenê karebûnê raber dike. Her wekî: Ji dêla ku (ez dê herim malê) di awayê (ezê herim malê) tê bikaranîn. Bi vê tê diyarkirin ku ji min bê, an karibim, ezê herime mal. Weke vê, ev daçeka (dê) tipa xwe ya (d) diavêjî, di awayê

dawîneyê bi cînavhêne kesin re yek dibe.

Naxwe, divê ku tewangbariya Kurdî xwes fêr bibin û awayekî rast di nivîsarên xwe de bikarbînin.

3- Xweguherîna lêkerên bêrist jî ne tewana kurdi ye. Her weki:

Lêkeran (hatin) di dema niha de (te) di dema bê de (bê) ye.

#### 4, Dawîneyên Hejmaran.

Peyvîn Kurdî di tu awayî de bixweser pirhejmar nabin. Pirhejmariyên wan girêdayî erkine têkel e. Dawîneyên pirhejmar di veqetandekê binavkirî de (ên), di veqetandeka nebinavkirî de (in/ina), dema ku peyv di hevokê de di erka têrker an pêger de têne bikaranîn, dawîneya (an) distînin. Her weki:

a) Peyv di erka têrker de dawîneya (an) distînin.

**Nîşe:** - Li serê çiyayêne me berf nema.

Têrker, di hevokê de cihê kirin an bûyinê raber dike. Di hevoka jor de cihê ku berf lê nema (çiya) ye. Nexwe têrkera hevokê (çiya) ye. Ev peyv jî, weke ku tê dîtin dawîneya (an) standiye. Bi standina dawîneya (an) peyva (çiya) pirhejmariya xwe raber kiriye.

b- Peyv di erka pêger de dawîneya (an) distîne.

**Nîşe:** - Mehteşî gundiyan neçar hişt.

Pêger, di hevokê de peyva ku dikare kirin an bûyinê lê tê kirin. Di hevokê de karê neçariyê li peyva (gundî) hatiye kirin. Nexwe pêgera hevokê peyva (gundî) ye. Weke ku di hevokê de tê dîtin, di hevokê de peyva dawîneya (an) standiye. Bi standina dawîneya (an) peyv pirhejmariya xwe raber kiriye.

**Awerter:** Di rewşinan de hin serenav dawîneya (an) distînîn. Lê ew dawîne, dawîneya pirhejmariyê ye. Her weki:

- Ev gelê birêz wê hêj gelek Melayên Cezîriyan, Ehmedê Xaniyan biafirîne.

Di nîşeya jor de navê Melayê Cizirî û Ehmedê Xanî dawîneya (an) standine. Lê wan ev dawîne pirhejmar nekiriye.

2- Peyv di veqetandekê binavkirî de dawîneya (ên) distînin.

**Nîşe:** - Qulingên deşte bi tev xweşikayiyêne

xwe ve dest bi koçê kirin.

Di hevoka jor de peyvîn (quling), (xweşikayî) dawîneya (ên) standine. Bi standina dawîneya (ên) ew peyv pirhejmariya xwe raber kirine.

3- Peyv bi standina dawîneyên (in/ine) pirhejmariye xwe raber dikin.

**Nîşe:** - Pirtûkin di destê hevalan de man.

- Li vegerê jê re gulinan, beybûnina bînin.

Di hevokê jor de peyva (pirtûk) dawîneya (in), peyvîn (gul), (beybûn) dawîneya (in) standine. Bi standina wan dawîneya ew peyv pirhejmariya xwe raber kirine.

#### TÊBINÎ:

1-Peyv bi standina dawîneya (ek) jî yekhejmariya xwe raber dikin. Herwekî, gulek, pirtûkek, welitek.

2-Peyv di hevokê de bi lêkeran hevokê jî pirhejmar dibin.

**Nîşe:** - Pirtûk hêj nû çap bûn.

- Suxte hêj ji dibistanê derneketin.

Di hevokê jor de peyvîn (pirtuk) û (suxte) bi lêkeran hevokê pirhejmariya xwe raber kirine.

3-Dawîneyên layenan, veqetandekan, hejmaran, ji aliyekî jî dawîneyên xwemalîn in.

4- Dawîneyên hewmaran di tu awayî di nabîne dawîneyên layenan. Bi gotineke dinpeyv bi standina dawîneyên pirhejmaran layenê xwe raber nakin.

5- Dawîneyên Masdar

Peyv di erka masdar de dawîneya (n) û (in) disitînin.

**Nîşe:** 1- afîrin, barîn, cehimîn, çerixîn, derizîn, fetisîn.

2- avêtîn, firotin, guheztin, hêrivîn, kesaxtin, qeşartîn.

Peyvîn nîşeyê jor seba ku kes û demên wan nîn in, di aveyê masdar de ne. Anglo di awayê navê lêkeran de ne. Weke ku tê dîtin ew masdar di nîşeya yekemîn de dawîneya (n), di nişeye duyemîn de dawîneya (in) standine. Nexwe tê vê yekê ku dawîneyên masdar in.

# Tuwêjewanîk le mer gij û giyay dermanî û pizişkayetî resen û suninetî le Kurdistan da.

**EHMED ŞERİFİ**

Kurdistanî niha ke beşêkî serekî welatî dîrînî made, her le konewe, heta êsta zîd û nîştimanî tîrêl û hozekanî kurdî ïranî regez buwe. Em ser zewî û welatê, be hoy taybetmendikey û çiya û ku-wêstaniyewe, xêwî aw û he-wayekî mamnawendî buwe her bem hoyewe, cêgerekî le bar û baş buwe bo ruwan û bijîwî gij û giyay cûr be cûrî xoriskî û xelk û daniştuwanî em heremeş le berewe aşinayıyan, le gel taybetmendi-yû sûd û qazancî gij û giyay xoriskî peyda kirduve. Sereray eweş, bo xuwardin û xuwardemenî xweyan û ajal û patliyan kelkiyan lê bînî-wîn û sûdiyan lê wergirtun bo çareseriyan û derd û ne-xoşînekanîs gundiyanlê bî-nîwin. Pêşînêy sûd wergirtin le gij û ciya, wek kereseyekî pizişkî, lem ser zewiye da, yan be weteyekîtir, beşî sere-kîwelatî mad degerêtewe, bo sediy şe şûmî pêş zayin. Çünke zerduştî pêxember (1) û pizişkî ïranî regez, le dewr û berî salî 600'î pêş zayin, lem zîde da jiyawe.(2) Be pêy bîr û bawerî rojhelat-nasekan le binemaley made-

kan bawe û le kar û barî çare serî nexoşîn û pizişkayetîş da destêkî balay hebuwe. Zerdeş, le eyzedî xwey Ahorûmûzda “Le Hurmu-zelyest-beş 12-4 da” be nawî derman bexîş û çareyerî ne-xoşîn “Êşe zyoteme” naw deba û aşinayetî degel tay-betmendî pizişkî “PENGE” û “HOME” hebuwe û lewan wek gij û giyay dermanî û pizişkî nîw debat. Lêre da, gotinî em qiseye pêwîste ke bilêm, be daxewe mutrecim û paçivanekanî ïranî bêgane [PENGE] iyan be [BENG] û [HOME] iyan be [MEY] le qelem dawe. Leferwerdîn

yeş [beşî 124] da, le Zerdeş be nawî [Peurûbinge-ya-PE-EOR Û PENGE] naw bira-we. Mutircimekan û pacîv-wananî xomali û henderî eweyan be [XÊWÎ bengî zor] wergêrawe, bem cure ke debînîn, hewelîn pêxember û pizişkî ïraniyan, be hogirî beng û dûkel le qelem dawe. Le katêka ne [PENGE] ban-ge û ne [HOME]meye. Bel-ku le rastîla, penge her heman giyay [Pune] î farisiye, ke be kurdî êstaş her pêy delen penge û sûd û qazancêkî taybetî le pizişkî da heye. [HOME] iş tirêy [hengur] reşî kêwiye, ke le arakî da û le seryanî da pêy delen [KE-REME] û le erebî da bote [kirima] we, le kurdî da he [HOME] ya “Xome” ye ke, taybetmendî û qazencêkî zo-rî pizişkî heye û dû rewkiş, her êstaş le Kurdistan da he-ne û kej û koy Kurdistan me-lay ew rewkanen.

*Le edebiyatî awêstayiya da, bas le giyayekîtir be nawî [kinibis] yan [kîhifis] de kîrê, ke her le konewe le naw gelanî dunya da taybetmendî pizişkî û dermanî hebuwe.*

Le edebiyatî awêstayiya da, bas le giyayekîtir be nawî [kinibis] yan [kîhifis] de kîrê, ke her le konewe le naw gelanî dunya da taybetmendî pizişkî û dermanî hebuwe.

Paçivwanan û ravekeranî awîsta, em giyayeşîyan beng û dûkelawî kirduve û way bo çûn ke Zerdeş cîge le ser

xoşî be hoy beng û dûkelewe karekîtirî nebuwe. Belam le rastî da em giya dermaniye ew kone dosite le mêtîney mirov "Kerevis"yan "Mendok"e kêwiye. Hoy em hela-neş degerêtewe bo ewey ke mutircim û paçivîwan û râvekeranî awêsta, hîç çeşine aşinayekîyan degel ferheng û edebiyatî kon û nûwiy wîlat û ser zewî MAD û Kurdistanî êsta nebuwe.

Be her hal, bo pak û sirî-newey bîcim û sîmay yezdânî pizîşk û ferzane û hewalîn pêxemberî kon û dîrînî Îranî, naçar bûm le çend giyayek ke le Awêsta da nawîyan hatuwe yarmetî bexwazim û dozeke rûn keme-we û hewelîn pizîşkî Îra-nî le tawanî lêdiraw pak û bê tawan bikem û diyarde bike-me ser ew rastiye, ke ew gij û giyayey ke Zerduşt le pi-zîşkayetî da kelkî lê wer gir-tûn û paşan hekîmekanî kurd û Îranîş, tenanet duway piş-şing hawêjî ayînî İslâmîş her sûdiyan lê bînîwin.

Be daxewe, be hoy kemter-xemî û nekiranî tuwêjewanî nêwçane, le Kurdistan da, aşinayetî û naskaryekî ew toman degel hekime ku-wedekanî rabirdû niye sere ray eweş be şêweyekî piş û bi-law, le naw kitêb gelî cûr be cûr (be taybetî le degel kur-diye kan) da ne tenya nawî hêndî hekîmî kurd we ber-çaw dekewê, belku tenanet

basî şêwey pizîşkî û çîlnaye-tî kelk wergirtin le gij û giya û şêwey dirustkirdinî areqey û şerbetekanîş kirawe. Le hurmuzd yeştda, Zerduşt le eyzedî xwey be nawî "ÊŞE ZYO TEME" yanî [derman bexşîtrîn] û dermanekan yad-dek û yezdanî mezin, serça-wey çareserî hemû derd û azarêk le qelem deda. Aya,

da yarmetî xuwazî le xwe û deste û dawêن bunî mirove-pîrozkanî İslame û le ser em baweren ke nexoşîn le la-yen xwawe ye çareşî her le dest ew da ye û debê penay bo bibirdirê.(6) Lem burewe le Hezireti Ayşê Hawserî pê-xembere we gêrdirawetewe: her kat pêxemberî İslam gî-rordey jan û derd û azarı les

*Belam lêre da palêkî serincrakêş ke  
dête pêşê ewe ye, ke hêndê car kurde  
muslumenekan, bo çakbunewe û rizgarî le nexoşîn  
û azar deçine ser gilkoyî xeyrî muslimanîş. Lew  
babetewe tumabuwa basî hekîm û qeseyekî kurdî  
Îsawi be nawî dekat ke le salî 1779'i zayinî le Zaxoy  
Kurdistanî Êraq da mirdiwe, belam êtaş kurdanî  
musulman û diyani deçine ziyaretî û yarmetî  
rizgarî le nexoşînî lê dexwazin.*

ewe her ew taybetmendiyey kurdekan û gelanîtirî Îranî û Musliman niye ke nexoşîn le xwe dezanîn û bo çareşî her lew deparênewe û der-maniyan lê dewê?

Kurdekan û gelanîtirî Îra-nî, paş ewî ke bawermendi İslâm bûn, em reçeleke rese-nêyan her parastuwe û bo çareserî nexoşîn û bimarı destê û dawênî nûştûnusîn û gewre piyawani pîroz bûn û debin. Xatû "HENNY HROLD HNSEN" le Sefer-namekey da bo Kurdistan basî çeşine gelî cur be curî em dua û nûştıuwane dekat û [tumabuwa] denusê: Rêga gelî berberekanî legel nexoşîn û bîmay le naw kurdekan

debû gurey [qoleho ellaho ehad .....] û [el FATİHE ....] û le ser leqî desî rastî telawet defermû, evcar lepî destî be ser ew cêgaye da dekêşa ke duçarî derd debû û dêşê û be cure çak debuwe. (7) Em suninet û kirdare pêxemberiye êtaş le naw kurdan da her bawî heye û rêzî lê degîre.

Reng e her lem riwangeşe-we bê ke bo çak bumewe le nexoşîn deçine ser gor û me-zarî pîrozan û pîran (pîrûpiyaw çak gelî pîroz ke nexoşîn çareser dekan mezâr û gilkoyiyan le Kurdistan da zor heye). Belam lêre da palêkî serincrakêş ke dête pêşê ewe ye, ke hêndê car kurde muslumenekan, bo çakbune-

we û rizgarî le nexoşîn û azar deçine ser gilkoyî xeyrî muslimanîş. Lew babetewe [tumabuwa] basî hekîm û qeşeyekî kurdî Îsawî be nawî "Liyûpuldo" dekat ke le salî 1779'î zayinî le Zaxoy Kurdistanî Éraq da mirduwe(8), belam êstaş kurdanî musulman û diyânî deçine ziyareti û yarmetî rizgarî le nexoşînî lê dexwazin. Her wesa lem barewe "Smaîl Begî Çolu" egerçî yezidî mezheb buwe, belam çunke hekîmekî pispor buwe û pizîşkayeti kirduve êstaş kurdan berêzeweyadî deken.(9) Le her hal pizîşkayeti sunnetî û resenî be şeweyekî cûr be cûr le Kurdistan da le bawan dabuve û pizîşke sunnetekan, gelekî zor xizmetiyan be gelekiyan kirduve.

Vay HÎNÎ HANS basî hekîmekî kurd dekat ke piyawêkî gundî Marangazî le merg rizgar kirduve,(10) Ewliya Çelebî gestêri turk ke le salî 1065'î koçî mangî da le welitekanî ser be împaratori Osmanî da gerawe û hemûşoy nawçêkûrdnişîne-kanî Kurdistanî wênderiy kirduve, le sefermamekey da, basî hekîm û cerah û dirag û şikistebend gelekî mahîr û karamey kurd dekat ke her kam le çaxî xoyan da pisporêkî nîw be derewe bûn.

Lem barewe le emaretî Bedlîs da basî Hekîm Mela

Mîsî, Hekîm Mela Qereseci- ca, Hekîm Yencalî û Sarîlî- zade dekat û denusê: Çunke êre Kurdistan e û pir şer û kêşe hellaye pêwîst be hekîm û pizîşkî şareza heye. Paşan dête ser basî cerah û diragî karamey wek westa Heyder -Kurî besare -Sofi Qulî û Şerif Alî ke le dirag û şikaw helbestewe da zor meşhûr in. Ewliya Çelebî le Mîr û fermanreway Bedlîs "Abdalxan" wek pizîşkêkî Mahîr û çîredest yad dekat û denusê: Le felsefe zanyarî gelî seyrî wek kîmya û sîmya da destêkî balay heye û be pê fermûdey pêxemberî islam danîş û zanyarî dû şewe- ye: Zanyarî leşî û zanyarî dînî, ewîş (Yanî Abdalxan) le her dû şêwe da beladeste bê hawta ye. Le pizîşkî da weha şarezaye ke debê le rêzî Ca- linûs û Boqirat û Suqurat û Filûsî da le qelem bidin.(12) Ewliya Çelebî paşan sebaret be Hekîm Ebdal Xanî Mîrî Bedlîs denusê:

Ew Nebiznas û dermansa- zêkî bê wêne ye, pîremêrdî heşa saley pek kewte wekar dexa û Hogîrî Tiriyakî ke de- çine lay çak debinewe. Dem û wedmêkî êsayaney heye. Le diragî û cerahî da û le şikistenbendî da taqana ye û le didan pizîşkî da bêwêne ye û cêgeypesende.(13) Ewliya Çelebî paşan basî emelêkî dirayî û cerahî dekat ke bo xwey şahîdî buwe û le Kare-

mey Ebdalxan le çaw pizîşkî û diragî çaw deduwê û le karzanî lem babetewe sita- yîşt dekat.(14)

Emaretî Bedlîs le salî 1065'î koçî mangî da legel pîlan û gêreşewînî xelîfekanî Osmanî rû be rû debê û Ewliya Çelebî ke xwey bînerî em plan û têşikarî ew emarete debê basî kitêb û kitêbxaney giranbeha û kem wêney Ebdulxan deka û ewan be barî hewt wiştir deqeblelê- nê(15) û zorbeyan be zimanî farisî dezanê û paşan denûsê:(16) Le naw ewan da çend nexşî regame hebûn ke bîner le ruwanîniyan têr nedebû cuneke lew nexşane da hema

**Emaretî Bedlîs**  
*le salî 1065'î koçî mangî da legel pîlan û gêreşewînî xelîfekanî Osmanî rû be rû debê û Ewliya Çelebî ke xwey bînerî em plan û têşikarî ew emarete debê basî kitêb û kitêbxaney giranbeha û kem wêney Ebdulxan deka û ewan be barî hewt wiştir deqeblelê- nê û zorbeyan be zimanî farisî dezanê û paşan denûsê.*

çêşne gij û giyayekî dermanî û pizîşkî û endamekanî leşî mirov kîşirabûn.(17)

Le duwîn salekanî sedey hejde û seretay sedey nozdehan da, ke Mîr Mehemedî Soran dijî Osmaniye kan û xalefetekeyan raperî û şarî Rewandizî kirde meko û pêttextî xoy bo parastinî sax û silametî û tenduristî nêwçey jêr fermanî korêke hekîm û pizîşke kurdekan pêk hêna.(18) Le naw ewan da debê diyarde bikeyne ser Hekîm Fetah Beg ke destêkî bala y le pizîşkayetî da hebuwe.(19)

Minoriskî le kîtebî kurdekan da diyarde dekate ser hekim û pizîşk gelekî kuramî kurd û basî çilonayıti kariyan dekat.(20) Belam le naw kurdan da tênya piyaw destî pizîşkayetî nebuwe, belkû zor carîş jinanîş şan be şanî piyaw an le kare ênsaniye û İslameye da besdariyan kirduve. Dr. Markozî feransseyî le salî 1948'î zayinî da le Kurdistanî Turkiye jin gelekî hekîm bînîwe ke le ciyatî pinsilîn, le hewîre tîrşîyan bo çareserî bîmarî kelk wer-girtuwe.(21)

Le kurde beytî Suwaro da katê Suwaro le şer legel Osmaniye kan da zamdar debêkî bang dekete hekîman û delê: "Eger hîç kamtan zeferrî pê naben, destî mekenê û

destî lê meden, heta bo xom melhemekî bo saz bikem le hêlê, le darçinê, le qenefil û jengî de guwarê û be areqî ber gerdinê boy bigirmewe be destî, be dest niwêjewe û bixeme ser birînê.(22) Gerokêk be nawî "KAMPANÎL" debêjê, kurdekan bo çareserî nexoşîn, le gij û giyay cûr be cûr kelk werdegirin kuzele rewkêke ke areqekey bo begir le sekitey dil le layen kurdekanewe kelkî lê werdegirê, ewan her wa le belgî helale birayme boyan birî

buwe û le gelay qeyteran "Persiyanweşan" saz kirawê ewan her wa basî şerbetî giyay bereza [biza] dekan ke bo nexoşînî ulf û gurçile be sôd buwe.(24)

Profesor Oskarman, le jehirî mar yad dekat ke le Kurdistan da bo çareserî nexoşî gulî kelkî lê wergîrawe û le beytî biraymok da denusê: Ketê Mîr Şêx gul bû, dewru-berî le çarey acizbûn biraymok degel xwî birdiye sehi-raye çû kasêkî şîr bo hêna, merêk hat û kase şîrî helnoşî, paşan rişawe biraymok ke em karesatey dî le dile xwey da gotî wellahî wa baş e ew şîrey bidem be Mîr Şêxî, ba le destî rizgarin bê. Belam Mîr Şêx her ke şirekey xwardewe dest be cê tuwêjî heldan û çak çak buwe.(25)

Emrokanê, sereray ewey ke rayelkeyekî ber bilaw le pizîşkanî xuwendewar le seranserî Kurdistan da heye, belam hekîme sünintiyekanî kurd her wesa dirêje be kar û barî xweyan deden. Le Kurdistanî Iraq da basî dirag û şikişte bendêk be nawî Hemey Nadîrî le ser zerane û le çapemeniyekanî kurdî wêndeyş da nawî jineylî wek hekîme Ferehbiraym û xecice şel dekirê ke destêkî balyan le pizîşkayetî resen û suninetî da heye.(26) Le Kur-

*Le duwîn salekanî sedey hejde û seretay sedey nozdehan da, ke Mîr Mehemedî Soran dijî Osmaniye kan û xalefetekeyan raperî û şarî Rewandizî kirde meko û pêttextî xoy bo parastinî sax û silametî û tenduristî nêwçey jêr fermanî korêke hekîm û pizîşke kurdekan pêk hêna.*

gede "Meade" û sıfira û le gulî lawlaw "niluper- nilüfer" bo hênanê xwarî nobetê û yaw we. Le tuwî raziyane bo nexoşînî dil û areqî rîha-ne bo dabînkirdinî pirînî gedê sôd werdegirin.(23) Dû gerokîtir be nawî "GUST" û "Alizzi" le salî (1956)'î zayinî le bazarî şuroçkey Diyanay Kurdistanî Iraq da şerbetekîyan dîwe be nawî xale raşt ke bo jane zig sôdi he-

distanî îraniş da, binemaley hekîmekanî Sebedlû xêwî mearufiyetekî taybetin ke êstaş her wa pîsey malbatîyan dirêje pê deden. Hekîmekanî Sebedlû zam û birîn be rewki xorîşik debirjêne-wê, melhemêk be nawî "Macun" saz deken û birînî pê sarêj deken û tozêkî sewz reng le gelay giyawgij çêdekan ke zamî pê nasor debête-we.(27)

Le şarî Mehabadîş da bine-maley Mewlewî û Mela Mewlud heta çend sal leme û ber her xirîkî karî pizîşkayetî bûn. Ew du malbatîye tozêkî binewşîyan saz dekird ke bo nexoşînî çaw kelkî lê werdegira. Pîrepiyawêk be nawî Sofî Mestafay Peswiy hebû ke dukaneyek Mekoy hemû cure gij û giyanî dermanî bû. Ew pîremêrde, beharan û hawînan we kej û ko de kewt û gij û giyanî dermanî. Gird û ko dekird û nexoşînî pê çareser dekirdin. Belam mirdinî bû be hoy ewî ke razî beşekî zorî gij û gi-yay dermanî nêwçey Mehabad le gel xwey bibate jêr xakewe. Le şarî Sineş da ês-ta diray û carehêk be nawî Şêx Birahîm heye ke zor car debête yawerî lê qewmawan. Le kotayî da sereray sipasmendî le pêkhêneranî Kongrey Cîhanî Pizîşkayetî le Îslam û Îran da lîzgâyekî na-weylî giyay dermanî cûr be cûr ke le Kurdistan da hen, pêşkeşî nûsîngey kongire

dekem. Zor sipas bo gwêda-rîtan.

### TÊBÎNÎ:

Em witare bo Kongirey Nêwgelanî Mêjuy Pizîşkî le Îslam û Îran da amade kira-bû ke rojanî "11-14 Mêhirî

1371 = 4-7/10/1992" le Zanistgey Taran da pêk hat û 30 welatî dunya besdariyan têda kirdibû. Eme witare rojî dûsem 13/7/71 6/10/92 le katjimêr 14.40 het 15= pêş-keş kira.

### Ser Çawekan:

- 1- Zırđış Siyasetmedar ya Cadugir = Walniz Brono Hining. Farsî Kamiranî Fanî çap Tehiran- 1365, laperey: 14
- 2- Serçawey yek L. 24
- 3- Heman serçawé L. 62-36-15
- 4- Heman serçawé L. 19
- 5- Heman serçawé L. 22
- 6- Jîyanî Kurdevarî- Hinî Harold Hanis, kurdî Mehmed Streed Mehemed çap Sulêmanî 198.L.175
- 7- Jîyanî Afireti Kurd H. H. Hanis, kurdî: Ezîz Gerdî çapî Bexda 1983. L. 355
- 8- Serçawey jimare 6, L. 176
- 9- Serçawey jimare 6, L. 177
- 10- Kiçanî kurd H. H. Hanis, kurdî: Dr. Ebâs Naci Ehmed çap Bexda. L. 112
- 11- Kurd Le Mêjuy Dirawsêkanî da Ewliya Çelebî, kurdî: Saïd Nakam, çapî 1979 Bexda, L. 113
- 12- Kurd dir tarîx himsayigan Evliya Çelebî, farsî Muhendîs Farûq Kîxusirewî. Çap 1364, Urmê. L. 114
- 13- Serçawey jimare 11, L. 121
- 14- Serçawey jimare 11, L. 123-122
- 15- Serçawey jimare 11, L. 282
- 16- Serçawey jimare 11, L. 284
- 17- Serçawey jimare 11, L. 284
- 18- Kurdekanî İmparatorî Osmanî Dr. Celîlê Celîl kurd: Dr. Kawis Qeftan. Cap Bexda, 1987. L. 143
- 19- Mêjûy Miranî Soran, Husêن Hozanî Mukuryanî çap Hewlêr- 1962, L. 104
- 20- Kurd: Mînorisky, kurdî: Muhemed Saïd Mehmed. Çap Bexda-1984. L. 167
- 21- Serçawey jimare (6) L. 178
- 22- Beyti Kurdî Destûsi Nuserî witar
- 23- Sarçewey jimare (6) L. 175
- 24- Govarı KARWAN jimare 51, sal 1986. L. 92
- 25- Tuhefey Muzefeiye O. Man çapî ewel 1905 Berlin, çapî duwem 1975 Bexda, L. 372-373
- 26- Şari Sulêmaniye, çap Sulêmaniye 1989 L. 21-20
- 27- Cuxirafiyan w tarîxi bane Kurdistan farsî M. R. Tewekullî, çap Tihiran-1363, L. 58

# LÊGERÎNEK LI SER

## MELAYÊ BATEYÎ

**MEHMET REŞİT IRGAT**

**M**elayê Bateyî yek ji ronakbîrên kurdan ê herî navdar e. Di edebiyat, çand û wêjeya kurdî de bi nav û deng e. Di rêza koma edîb û nivîskarên kurdan ên bi rûmet de cihekî bala û hêja digire. Bi qasî dem û derfetên xwe xebat û kedeke bê-hempa , di warê edebiyatê de kiriye û hinek berhem jî li pey xwe ji gelê xwe re hîstine. Lê sed mixabin ev berhem bes bi destnivîs mane. Mela li ser jînenîgariya pêxember (mewlûd) bi kurmancî nivîsiye. Di warê olî, bengî, evîn û evîndarî de gelek nivîsên Bateyî di nav gel de hene. Dîsa pesina-meyeke watedar li ser pêxember hûnandîye. Lê heyf û mixabin derbarê jiyan, rewş û berhemên vî nivîskarê birêz de agahiyêner têr û berfireh di destê me de nîn in. Gelek nîvîsên Melayê Bateyî jî mîna nivîskarên me

yên din winda, belave û berze ne. Ji ber ku heya, roja îroyîn ew bêxwedî û berhemên wan jî bê hêjandin mane. Sedemên bingehîn ên bêxwedîtîmayînê, yekane bindestî, perçebûn û paşvemayîn e. Lewre kesen bindest nikarin çand, huner, wêje û bi tevayî hemî heyînên xwe yên jiyanî, civakî, çandî, ramyarî û dîrokî ji bin hilma gemara nijadperestî û jenosîdê paqîj bihêlin û ji bin bandora konevaniya pişafîn û helandina dagirkerî û deshilatdariyê biparêzin. Lê wa ye îro êdî sazî, komele û weşanxane ûrêxistinînên me yên zagonî hene. Divê êdî em li van edîb, nivîskar û ristevanên xwe xwedî derkevin, li berhem û mîratêwan ên zanistî bigerin, berhev bikin û ji bo çand û hunera gel bikin find û fanos. Bawer im ev xebat bê guman peywîreke pîroz, neteweyî û niştimanperwerî ye.

### NAV, JÎN Û DANIŞINA MELAYÊ BATEYÎ

Mela xelqê gundê Batê ji bajarê Çolemêrgê ye. Navê wî Ehmed e, lê hinek jî dibêjin ku navê Melayê Bateyî Huseyn e. Mela di navbera sedsalên 14-15 ên zayînî (miladi) û 800-900 ê koçî (hicri) de jiyaye. Dr Bilîç Şérko di "El Qedîye El Kurdiye" de dibêje navê mela, Ehmed e. Dîsa Mehmed Emîn Zekî Beg, Eladîn Secadî û Aleksander Jaba, Mela bi Ehmed bi nav kirine. Dîroknaş Mehmed Emîn Zekî Beg di Tarîxa Kurd û Kurdis-

*Mela xelqê gundê Batê ji bajarê Çolemêrgê ye. Navê wî Ehmed e, lê hinek jî dibêjin ku navê Melayê Bateyî Huseyn e. Mela di navbera sedsalên 14-15 ên zayînî (miladi) û 800-900 ê koçî (hicri) de jiyaye. Dr Bilîç Şérko di "El Qedîye El Kurdiye" de dibêje navê mela, Ehmed e. Dîsa Mehmed Emîn Zekî Beg, Eladîn Secadî û Aleksander Jaba, Mela bi Ehmed bi nav kirine.*

**Mela di gelek medreseyên Kurdistanê yên bi nav û deng de xwendiye. Bo nimûne: Medreseyâ li Cizîrê, medreseyâ Mîr Hesenê Welî li Muksê, medreseyâ Finikê li Botanê, medreseyâ Mîr Evdal û medreseyâ Mîr Nasir li gundê Tanzehê û hwd. Mela piştî qedandina xwendina xwe li gorî azîneyê îcazeya seydatiyê jî standiye.**

tan, rûpelê 336 an de dibêje: Melayê Bateyê ji gundê Bateyê ji lêwaya Hekarî ye û navê wî Ehmed e. Di navbera salên 820-900 ê hîcrî (1417-1495) de jiyaye. Dîsa dîrokzan Eladîn Secadî di "Mêjûyê Edebiyê Kurdi", rûpel 536 an de bi navê Ehmed behsa Melayê Bateyî kiriye. Nivîskar A. Jaba jî wiha dibêje: M. Ehmedê Bateyî li gundê Batê, bajarê Hekariyê di sala 820 ê hîcrî (1417) de ji dayîk bûye û di sala 900 ê hîcrî (1491) de çûye ber rehmê. Dîwanike M. Bateyî ya helbestan heye. Lê bes ji wê dîwanê du nivîsarên di dest de hene: Mewlûda Pêxember an jî Mewlûda Şerîf û helbesta Zembîlfiroş. (Qanatê Kurdo. Rûpel:65)

### XWENDINA MELAYÊ BATEYÎ

Mela di gelek medreseyên Kurdistanê yên bi nav û deng de xwendiye. Bo nimûne: Medreseyâ li Cizîrê, medreseyâ Mîr Hesenê Welî li Muksê, medreseyâ Finikê li Botanê, medreseyâ Mîr Evdal û medreseyâ Mîr Nasir li gundê Tanzehê û hwd. Mela piştî qedandina xwendina xwe li gorî azîneyê îcazeya seydatiyê jî standiye. Mela li gelek dever û herêmên Kurdistanê bi seydatî dersên şagirtan daye. Di her war û qonaxên zanistî de kedâ mela tê dîtin.

### BERHEMÊN MELA

Melayê Bateyî nivîskarê Mewlûda kurmancî ye. Wî jînenîgariya pêxember bi rishtî (manzum) nivîsiye. Ev nivîsar di nav gel de tê hezkirin û tê ecibandin. Di tevaya herêmên Kurdistanê de di rojên taybet û pîroz de tê xwendin. Ev mewlûd ji dil û can, û bi coşeke mezin tê guhdarî kirin.

Ev Mewlûdnameya han cara yekemîn e ku bi zaraveyê kurmancî hatiye nivîsin. Ev berhema giranbiha, di sala 1324 an (koçî) de ji aliyê Kurdîzade Ehmed Ramêz ve li Misrê hatiye çapkirin. Destpêka Mewlûdê ev e:

Hemdê bê hed bê xwedayê alemîn ew xwedayê daye me dînê mubîn

Raziqê bê dest û pa û mar û mûr alimê sir negotî ders û dor

Karesazê bende û Sultanê can Rahîm û Rehman, Letîf û Mîhrêban.

Mela gava çûye hecê wiha gotiye:

Bi gotina goyendeyan (rêwiyan) ku mela di rîwîtiya hecê de serdana pêxember pêk anîye. Di vî warê de helbestek hûnandiye. Wiha dibêje li ser gora pêxember:

Hilo rabe Ebûlqasim hilo ey qasidê ekber  
Hilo rabe fexra benî haşem hilo rabe tu yî rehber

Îmamê enbiyanî tu li Quranê xudanî

Yeqîn xweş şivan î tu şivanê umetê yekser

Bike mehder li dîwanê di roja heşr û mîzanê  
Efû kin Bateyê nebit şermende ey ser wer  
Mela pesinameyek li ser pêxember gotiye. Wiha ye:

Mihemed seyidê alem, şefî roja mîzanê, ciraxê dide ê adem xudanê weny û Quranê

Ela ey seyidê setwet tu roja heşr û fitnet şefaet kî ji bo Bateyê bide ber zilê sîwanê

Nigonser bûn senem aciz ji tewlîda gula qirmiz bi kesrayê gaha muciz tezelzul kefte eywanê.

Her kesek bê guman evînek wî-wê heye, bivê nevê yarek dihewîne. Lê ev eşq, bengî, sewda û vînî cur be cur û ji hev cuda ne.

Evîna hin kesan olî ye ya hinan kêfî ye û ya hinekan jî doz û ramyarî ye. Bê guman evîna Mela jî evîneke biha û hêja ye. Dibe ku olî be dibe jî ku gelperwerî û niştimanperwerî be. Mela di warê evîndariyê de wiha bi axîn, kovan û bi keser dibêje:

Derd û dax im bê qerar im bê bihar im bê cîmen  
Bê hebîb im bê tebîb im hem xerîb im bê weten  
Monisê derd û xeman im sakênê beytulhezen  
Tar û mar im întûzar im şehsuwara min nehat  
Meclîsa bê saz û hey hey min navêt naçme yê  
Bê def û bê çeng bê ney min navêt naçme yê  
Bezmeya bê yarê Bateyî min navêt naçme yê  
Wer nesotin ateşe Dilşehriyara min nehat  
Mela di helbesteke ku li ser Zembîlfiroş  
hûnandiye de wiha dibêje:

Ey dil werin dîsan bi coş carek ji caran mey binoş  
Bikin qiseta Zembîlfiroş da seh bikin Hikayetê  
Zembîlfiroş lawkê rewal bû bi kilfet û ehl  
û eyal bû  
Hisnekî Yosifi li bal bû heq rezaqê qismetê

Her dema selkan ku tîne Xatûnek jor de dibîne  
Bi dil û can dihebîne dil kete pêl muhbetê  
Xatûn dibê lawkê rîval were nav reyhan û sêvan  
Tu şekir bimij bi herdu lêvan şibhê cama şerbetê  
Law dibê tu qenca temamî her wekî şeker  
di camî  
Bi ser û piyan tu li min heramî tirsim ji  
roja axretê

### Wefata Mela

Derbarê wefata Mela de vebir (qetî) agahiyek di dest me de nîn e. Lê goyende (Ra-wî) dibêjin ku Mela û Mîrê Muksê gelek dost û hevalên hev ên nêzîk bûne. Mîr her sal mela bi mêvanî vedixwend li ba xwe. Salekê Mela di meha cirya paşîn de diçe ba Mîrê Muksê û hetanî Kanûnê li wê derê dimîne. Gava vedigere gundê xwe li zozanê Berçela dikeve bagera berfê û dixeniqe. Laşê wî hetanî biharê di bin berfê de dimîne.

Gava demsala biharê tê berf dihele laşê  
Mela tê dîtin û ev helbesta jêrîn li ser der-  
dikeve:

Jî cirya paşiyê pê de Melayê Bateyî kanê  
Sefer kêşa bi Muksê de di wextê zivistanê

Zivistanê evê yolê, evê beriyê, evê çolê  
Mijê avête der û dolê xunavê girtî kistanê

Boye tarî û zulmete sir û serma ji nû hate  
Yeqîn Kanûn eda hate binêrin dewranê

Binêrin daxa meêxsîra  
Xezam zer bûn rezê Mîra  
Rihan barîn di avê da  
Rihan barîn di eywanê

Bateyî derbarê rengdêrê pêxember ên herî  
bala û bilind de helbesteke bi dilovanî  
hûnandiye û wiha dest pê dike:

Ey nêtê tu ez erş heta ferşê şehîra  
Ey pertewê nûra te cîhan geşte minîra


Ey seyidê alem bike perwayê esîra  
Qad kane lekel-fedlû lekel-cûdû kesîra  
Ursilte îlel-xelqê besîren we nezîra

Ey seyidê alem senedê nûra hidayet  
Hêvî dikin em ji te ey serdarê rîsalet

Mehrûmê negirî me ji dîwanê şefaet  
Bateyî bi cehenem bîte war qiyamet  
Qed kunte lehû seme şeffîen û zehîra.

Hêvidar im ji îro şûn de di rojêñ dahatû  
de wê êdî nema ronakbîr û nivîskarê me ji  
bîr bibin. Berhemêñ wan jî êdî dê bêxweyî  
û winda nemînin. Ev kesên hêja wê bi rêz û  
rûmet bi bîr bêne anîn û di dilê gel de konê  
xwe vekin. Berhemêñ wan jî gupik, şax û  
terafe bidin. Şitîl, xerz û pelêñ wan jî reng,  
bêhn û ber bidin. Çand, wêje, huner û  
pişeyâ gel bi vê hewayê xurt û geş bibe.

ساله میلادی



# دریشان

۱۳۱۰

( پازده روز اده جاری بیت نیساندن جریده کردی به )  
کردلی غصیل علوم و فنون تشویق این در نسایع و ادبیات کردی به حادی  
( اوف بش کونده بر نشر اولتود کردجه غزنه تهر )

## KURDISTAN

Adressue : Rue de Carouge, n° 7, GENÈVE (Suisse)

نەمک سلکنە موافق مریعە زرگە ۋارىجە مكتوبىز كردىجە بەالتىرىجە تىراولتود

*Li koçberiyê ji bin axa mirinê bilpekîna  
çirûska vejîna kurdan: KURDISTAN*

